# RUHÊ PÎROZ

NAVEROK

CON BÎVÊR
TEVÎ ÊDÎSON BÎVÊR

Hevalê giranbiha,

Hûn şabûna Xwedê û şabûna dilê Wî ne. Ew dixweze we nas bike û ji alîyê we da bê naskirinê. Li rex nêzîkbûna tevî Wî, Xwedê hûn dewat kirine bona hevkarîyê, ku padişatîya ezmîn li ser dinîayê bela bikin. Çawa ku Pawlosê şandî dibêje, Xwedê “ji nû va me nava Îsa Mesîh da çê kir, bona ku em bikaribin wan karên qenc mîaser bikin, kîjan Ewî zû va bona me dabûne bernamekirinê” /Efesî. 2:1O/.

Em lawên Xwedê ne û em hemû jî dixwezin  Bavê xwe bidine razîkirinê. Çawa jî hebe, gelek cara em wê yekê texmîn nakin, çi ku Îsa zelal got. Em bona mîaserkirina bernamên Xwedê qewatê distînin, wextê ku em tevî Ruhê Pîroz dikevine nava tevgirêdana. Xwedê naxweze ku hûn tenê bona Wî kar bikin. Ew we dewat dike, ku tevî Wî kar bikin. Ew dixweze bibe hevalê weyî herî baş û her demeke nava emir da tevî we nîvî bike. Ew dixweze tevî we xeber bide û qewatê bide we. Wê tevgirêdanê bedewtir   tevgirêdan tune, kîjan Xwedê bi rê ya Ruhê Xwe pêşnîyar dike.

Xwedê dilê min ra xeber da û gote min, ku ez vê berbirîbûnê bidime we û serwêrên ruhanî yên li rex we, yên li temamîya dinîayê. Ez hîvî dikim wê yekê tevî hizkirin û piştgirîya min qebûl bikin. Wê derbazî li cem hemûya bikin, kîjana hûn nas dikin. Ez bawerim, wekî ev berbirîbûn wê bibe ya diha kûr û usa jî destpêka tevgirêdanên tevî Xwedê, him bona we û him jî bona endamên komên we.

Heger hûn lawên Xwedê ne, Ruhê Pîroz soz daye, ku wê tu cara ji we dûr nekeve. Hevaltîya Wî, bêyî tu tiştî, ya we ye.  Rastîyên nava rûpelên vê kitêbê da emirê min guhartine û ez dua dikim, wekî hûn jî bi lêkolînkirina rastîya ji Gotina Xwedê eyantîya kivş bistînin. Minê bi dil bixwesta bizanibûya, ku evê berbirîbûnê hukumekî çawa nava emirê we û emirên wan mirova da  hişt, derheqa kîjana da hûn difikirin.

Birayê we, yê nava Mesîh da:

Con Bîvêr



Con Bîvêr
JohnBevere@ymail.com

Messenger International
MessengerInternational.org

# RUHÊ PÎROZ

## NAVEROK

CON BÎVÊR

TEVÎ ÊDÎSON BÎVÊR

The Holy Spirit. An Introduction by John Bevere, Kurmanji/tîpên latînî/
© 2014 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Originally published in English as The Holy Spirit. An Introduction
Additional resources in Kurmanji /bi tîpên latînî/ by John & Lisa Bevere are available for free download at: www.CloudLibrary.org
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

“Ruhê Pîroz: Naverok”, xudanê kitêbê Con Bîvêr, bi zimanê kurdî /tîpên latînî/
© 2014 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Pêşda bi zimanê înglîzî, bi sernivîsara «The Holy Spirit. An Introduction» hatîye çapkirinê.
Hûn dikarin belaş matêrîalên bi zimanê kurdî /bi herfên latînî/, yên Con û Lîza Bîvêra yên mayîn li vê saytê dest bînin: www.CloudLibrary.org
Bona îzbatkirina tevgirêdana tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

# SERECEM


Derheqa vê kitêba întêraktîv da........................................................4

Naveroka wê ji alîyê Êdîson Bîvêr da............................................5

1. Ruhê Pîroz kî ye?............................................................................7

2. Şexsîtîya Ruhê Pîroz....................................................................43

3. Sê derecên heleqetîya...................................................................79

4. Bi Ruh va Qewatbûyî..................................................................111

5. Zimanê Ruh.................................................................................153

Serê kitêbêyî zêdekirî Pirs û bersiv..........................................197

ZÊDEKIRIN Çawa xilazbûnê bistînin.......................................222

# DERHEQA VÊ KITÊBA ÎNTÊRAKTÎV DA

Hûn dikarin vê kitêbê ji destpêkê hetanî dawî, mînanî hemû kitêbên mayîn bixwînin. Feqet, em dibêjine we ku hûn wan beşên hukumdar bidine xebatê, ku wan matêrîala diha bi kûrayî fem bikin.

Her serîkî vê kitêbê pareveyî ser pênc beşên xwendina herroje dibe, lê xilazîya her beşekê jî matêrîalên dersa yê anegor hene. Hûn dikarin bi xwestina xwe, par–par, tevî wan matêrîala, nava rojekê da bixwînin, yan jî beşên raberkirî jî lêkolîn bikin. Em pêşnîyar dikin ku tevbûyên hînbûna bi komê beşên xwendinê nava serîkî da ser hevda bînin, lê matêrîalên başqe raberkirî jî nava hevtêkê da.

Heger hûn vê kitêbê nava dorana dersên cêrga “Mêsîncêr berevok”–ê ya “Ruhê Pîroz: Naverok”–êda dixwînin, em pêşnîyar dikin, ku hûn her matêrîaleke fêrbûnê ya her hevtê, yan bi vîdêoyê binihêrin, yan jî guhdar bikin û bi koma xwe va bersiva pirsên guvtugokirinê bidin. Pişî wê yekê serê kitêbê yê anegor bixwînin û pê ra jî matêrîalên zêde yên kivşkirî. Vîdêo ya her serîkî vê kitêbê heye. Pirsên guvtugokirina her serîkî kitêbê piştî matêrîalên dersên herroje raberkirîne.

Ev hemû tişt bo we ye.

# NAVEROK

Dema ku bavê min cara ewlin hîvî kir ku ez alî wî bikim û em vê kitêbê binivîsin, min carekêra bêîtbarî texmîn kir. Ez fikirîm: *"Diqewime ewî hela hê derheqa vê yekê da dua nekirîye"*. Bi rastî gotî ez ne difikirîm, ku ezî kandîdatê layîq im. Dema ku ez derheqa hîvîkirina wî da difikirîm, min sertbûna mînanî carekê, ya dema leca brêykdansê, texmîn dikir.

Min bi qedirgirtin hîvî ji bavê xwe kir, ku em çend cûrên başqe lê binihêrin û wede cuda bikin bona duakirina vê yekê /diqewime nava salekê yan duda da/. Piştî duakirina rojekê ew li ser xwe guman bû, wekî ez bona wê pirsê kandîdatê herî baş im. Bona bavê min ew yek girînge, wekî Ruhê Pîroz bona nivşên diha cahil "qedexekirî" nîbe. Ez nêzîkî 25 salî me û ew emekê min yê nava vî karî da qîmet dike. Ez û bavê xwe zanin wekî gelek, dixwezî cahil, yan jî mirovên emir da mezin, wê ji evê têmayê xwe dûr bigrin, heger ew fem nekin ku Ruhê Pîroz kî ye û Ew çawa kar dike.

Dêmek, ez ditirsiyam ku çawa min dikaribû hîvîkirina bavê xwe înkar bikira. Ez mecbûr bûm wê yekê ra qayîlbim.

Çi ku piştî wê yekê qewimî, bû mînanî rêwîtîkê /seferekê/, kîjanê emirê min guhart. Min destpê kir Kitêba Pîroz bi ronahîke nû bivînim, dema ku Xwedê çavên min vekirin û gelek tiştên başe nava Ruhê Xwe da nîşanî min da. Zûtirekê min dît, wekî Ruhê Pîroz li civînê ji wan Şexsa ye, Yê ku bi cûrê herî şaş hatîye femkirinê. Gelek nav û fikir hatine dianînê li ser Wî, lê ji me hindik mirov Wî bi cûrê rast nas dikin.

Ev kitêb nava Kitêba Pîroz da wek rêwîtîke cuda ye, armanca kîjanê ewe ku raberkirina Şexsê Ruhê Pîroz diha zelal bikin. Hinek tiştên nava vê kitêbê da bi texmîn diqewime dijwar bêne femkirinê, lê ez soz didim, ku hêja ye wextê xwe û qewatên xwe bona vê rêwîtîyê başqe bikin.

Dema xwendina rûpelên vê kitêbê hîvî bikin ku Ruhê Pîroz nava temamîya rastîyê da rêberîyê li we bike. Ewê wan tişta bide dûrxistinê, kîjan li ser Gotina Wî nehatine bingehkirinê. Hûnê bivînin, wekî Wî nikarin bona tu nivşekê bidine sînorkirinê. Ew hatîye şandinê ku Îsa bide eyankirinê û temamîya Bedena Mesîh bide qewatkirinê. Ewî dilên

me da jîyan kirîye û soz daye ku emirên me bo qencîyê bide xebatê. Tiştê tek– tenê ku em gerekê bikin ewe ku em emirên xwe teslîmî Wî bikin.

Ew yek tiştê bûyînê nîne, ku heval yan hevalkarekî diha baştirîn bivînin. Ruhê Pîroz her dem wê tevî we be, him dema dijwar, him jî nava şahîyê da. Ewî soz daye, ku Ewê tu cara ji we dûr nekeve, çimkî hûn tiştên hizkirina Wî ne. Niha xwe hazir bikin ku Ruhê Pîroz bidine eşkerekirinê.

**Êdîson Bîvêr,**

**Serkarê "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–êyî sereke**

> Em hemû jî dikarin bi saya Ruhê Pîroz bêne cem Bavê, bi saya wê yekê çi ku Mesîh bona me kir.
>
> –Efesî 2:18

# 1

# RUHÊ PÎROZ KÎ YE?

*Lê Piştovan /Şêwirmend, Alîkar, Advokat, Yê ku li rex mirov e/– Ruhê Pîroz, ku Bav wê bi navê Min bişîne /dewsa Min, bona raberkirina Min û karkirina dewsa Min/, Ewê we hînî hemû tiştî bike. Û Ewê usa bike, ku hûn her tiştên ku Min we ra gotine, wê bîne bîra we.*

–Yûhenna.14:26, AMP

## Roja 1–emîn

Pêşîya sala Nû bû . Min nava xwe da xwestina duakirinê û rojîgirtinê texmîn kir. Min ji Xudan pirsî:

–Ez gerekê ji Kitêba Pîroz kîjan kitêbê bixwînim?

Ez zendegirtî mam, dema ku min ev yek bihîst:

–Karên Şandîya.

Menîya zendegirtîbûna min ew bû, wekî pêşîya wê yekê, dema ku ez bona rojîgirtina demdirêj û duakirinê amede dibûm, min dîsa hema ev gotin stend: "Kitêba Karên Şandîya bixwîne". Wextê rojîgirtina pêşda bona min dijî hev derketina meremê û kirinaye nava emirê Pawlosê şandî da vebû, nava encamên çi da jî ewî gelek dijwarî dîtin. Destûrê bidin ku ez şirove bikim.

Pawlos ji Xwedê da hate hilbijartinê, ku Kitêba Pîroz belake. Ewî got: "…Vê mizgînîyê ra ez dannasînkir, şandî û dersdar hatime kivşkirinê" /B Tîmotêyo. 1:11/. Eva emirkirineke zelale. Ewî derheqa şandîtîya xwe da, nava emirê xwe da çend cara xeberda. Wextê rêwîtîya xwe ya ewlin, ewî gote cihûîya: "…awa em vedigerine berbi necihûîya. Çimkî Xudan awa emirî me kir: "Min tu kirî ronahiya necihûîya, wekî heta serê dinîayê bibî mecala xilazbûnê"" /Karên Şandîya. 13:46–47/.

Wextê rêwîtîya xweye duemîn ewî li ser xwe guman got: "…ji vir şûnda ezê herime cem necihûîya" /Karên Şandîya. 18:6/. Ewî romaya ra nivîsî: "…ez şandîyê necihûîya me" /Romayî 11:13/. Ewî ser hev nava kaxezên xwe da elametên wî cûreyî dikirin.

Feqet ji hizkirina hindava cihûya û bi xwestina xilazkirina wana, ewî her dem li her bajara civîn derbaz dikirin. Anegorî xeysetê xwe, ewî pêşda tevî cihûya xeber dida, hetanî ku bicêribanda bighîşta necihûîya. Hûn çawa divînin, cihû bûne menîya dijwarî û zêrandinên Pawlose here berk. Wana tehevbûn nava binelîyên necihû da pêşda anîn û di navbera şandîya û serkarên necihû da dijminatî çê kir. Bernamên wane tevhevkirinê bûne menîya tevrabûnên dijî Pawlos teşkîlkirî, girtin û zêrandinên wî. Destûrê bidin, ku ez tiştekî bêjim: "Xwedê derheqa cihûya da bi kûrayî difikire. Awa bona çi Aqûb, Petrûs û Yûhenna şandine gel wan: "Gava Aqûb, Petrûs û Yûhennayê ku çawa stûnên civînê dihatine hesabê… ew qayîl bûn, ku em herine nava necihûya û ew jî herine nava cihûya" /Galatî. 2:9, NLT/.

Wextê rojîgirtina pêşîya wê yekê, min gotina vî cûreyî stend: "Kurê min, nava doranên wê keremê da bimîne, bona çi Min gazî te kirîye. Îzinê nede, ku hizkirina te ya himberî tiştekî ji wê teslîmkirina Xwedê te dûrxe, kîjan li cem te heye". Min ew yek gelekî zelal bîr dianî û ez zendegirtî mam, wextê ku Xwedê hîvî ji min kir ku ez carekê jî bi temamî kitêba Karên Şandîya bixwînim. Bi kutasî, 65 kitêbên başqe jî bona bijartinê hebûn.

Ez awqas şa me, ku ez teslîmî wê yekê bûm û vê carê, bi xwendina kitêba Karên Şandîya, min tiştekî lap başqe dît /kîjan dide kivşê, ku Gotina Xwedê bi rastî saxe/. Vê carê min zelal dît, wekî rêber û endamên civînê çawa xwe li Ruhê Pîroz dispartin û tevî Wî hevkarî dikirin. Min dît ku çawa ew Ruhê Pîroz va girêdayî bûn û wana çiqas derheqa Wî da xeber didan. Ruhê Pîroz beşeke emirê wanî sereke bû. Ew tevî hemû karên rêberên civînê û hemû endama dibû. Ew nava civîn, qulixa civakî, berevbûna da li cîkî cuda cihê xwe digirt. Ew her dem nava şuxulkarîya wan da bû. Awa cêrge gotin, kîjana guhdarîya min dewatî li ser xwe kirin:

- "…eva çawa bû, ku mîrêcin qelpê xirab kire dilê te, ku tu Ruhê

Pîroz ra derewa bikî û ji qîmetê erdê hinekî veşêrî?” /Karên Şandîya. 5:3/.

- “…hûn çima bûne yek, ku Ruhê Xudan bicêribînin?” /Karên Şandîya 5:9/.
- “Em şedê van tişta ne, usa jî Ruhê Pîroz, kîjan Xwedê da wan, yên ku gura wî da nin” /Karên Şandîya 5:32/.
- “…hûn her dem dijî Ruhê Pîroz disekinin” /Karên Şandîya 7:51/.
- “Ruh min ra got: “Tevî wan here, dudilî nebe” /Karên Şandîya 11:12/.
- “Ji wana yek, ku navê wî Hagabo bû, rabû bi ruh elam kir, ku wê temamîya dinîayê da bibe xelayîke giran” /Karên Şandîya 11:28/.
- “…awa evana, ku ji Ruhê Pîroz hatine şandinê…” /Karên Şandîya 13:4/.
- “Li Ruhê Pîroz xweş hat, usa jî li me…” /Karên Şandîya 15:28/.
- “…nava sînorên Firîgya û Galatîyaê da gerîyan, çimkî Ruhê Pîroz nehişt, ku qeza Asîayê da xebera Xwedê bêjin” /Karên Şandîya 16:6/.
- “…gava nêzîkî Mîsyayê bûn, kirin ku herine Bîtênîayê, lê Ruhê Îsa îzin neda wan” /Karên Şandîya 16:7/.
- “…Pawlos bi xîret temamîya wextê xwe da hînkirina xeberê û cihûya ra şedetî dida, ku Mesîh Îsa ye” /Karên Şandîya 18:5/.
- “…Gava we bawer kir, we Ruhê Pîroz stend?” /Karên Şandîya 19:2/.
- “Pawlos ji Ruhê Pîroz xwe mecbûr texmîn dikir, ku here Mekedonîyaê” /Karên Şandîya 19:21, NLT/.
- “Tenê Ruhê Pîroz hemû bajara da temîyê dide min…” /Karên Şandîya 2O:23, NLT/.
- “Niha miqatî xwe û temamîya wî kerê pêz bin, ku Ruhê Pîroz hûn ser berpirsîyar kivş kirine” /Karên Şandîya 2O:28/.

Gotinên vî cûreyî nava rûpelên vê kitêbê da berbiçav bûn. Rastî ewe, ku em wê yekê nava civîna îroyîn da navînin. Ew, çi ku bona bawarmendên kitêba Karên Şandîya tiştê herroje bû, roja îroyîn em hindik tiştên wî cûreyî divînin. Ez derheqa mirovên başqe da xeber nadim, berê ewlin ez derheqa xwe da dibêjim. Wextê ku min kitêb dixwend, min fem dikir, wekî gelek cara ez ji rêberî, hevkarî û hukumê Ruhê Pîroz dûr diketim. Min ev hemû tişt texmîn nedikir, min berbi vê yekê nedicedand û vê yekê va girêdayî nîbûm. Wextê ku ev rastî bona min zelal bû, min qerar kir vê yekê tevî we nîvî bikim.

## GOTINÊN PÊŞDA

Destûrê bidin, çend gotinên pêşda we ra bêjim, kîjanê diha gelekî zelal bin, dema ku em evê têma girîng bidomînin:

Berê ewlin, emirê mesîhîtîyê bêyî Ruhê Pîroz tune ye.

- Bêyî Ruhê Pîroz Mesîhîtî cûrekî hişk û acizî ye.
- Bêyî Ruhê Pîroz karên me me bêqewat dikin û diwestînin.
- Bêyî Ruhê Pîroz tevgirêdana tevî Xwedê tune ye.

Heger Ruhê Pîroz ji civînekê dûrxin, ji her du ya yek wê bibe:

- Civînê werguhêzî klûba civakî be.
- Civînê bibe serwêrtîya ruhanî.

Rastî ewe, ku…

- Bêyî Ruhê Pîroz eyantî tune ye. Bi rastî bêyî Ruhê Pîroz Kitêba Pîroz dibe ya mirinanînê, çimkî nivîsar e: "…çimkî qanûna nivîsar dikuje, lê Ruh dide jîyînê" /B Korintî 3:6/.
- Bêyî Ruhê Pîroz şabûn tune ye.
- Bêyî Ruhê Pîroz aşîtî tune ye.
- Bêyî Ruhê Pîroz azayî tune ye.
- Xudan Ruh e û li kîderê Ruhê Xudan e, li wir jî azayî ye /B Korintî 3:17, NLT/.

Guhdarîyê bidine li ser gotina "li kîderê Ruhê Xudan e".Werin em derheqa wê yekê da bifikirin. Ruhê Xwedê li her cihî ye. Dawid digot:

"Ji Ruhê Te ez ku da herim û rûê Te da ez ku da birevim?" /Zebûr 139:7/.

Bersiva wê pirsê eyan e, ku tu cihî da jî wê neçe. Dawid gotina xwe didomîne: "Ez banzdime ezman, Tu li wir î. Eger ez peyayî binê erdê bim,Tu li wir î. Eger ez berbi rojavayê bifirim, Tê min carekê ra bivînî: Tu îdî li wir hîvîya min î" /Zebûr 139:8–1O, MSG/.

Zelale, wekî ew her dem li *her cihî ye.*

Wî çaxî em gerekê pirsa mayîn bidin: "Gelo li *her cihî* azayî heye?". Careke mayîn xeberên Pawlos bixwînin: "Li kîderê Ruhê Xudan e, li wir jî azayî ye". Me da kivşê, ku Ew li *her cihî ye*. Dêmek, gelo li *her cihî* azayî heye?. Bersiva vê pirsê eyan e? Na xêr. Azayî li hebsa , li cihê vexwerinê, li nexweşxana tune ye. Ez li mehel, li mekteb, li malbet û civînên usa qesidîme, li kîderê azayî tune ye. Wî çaxî gelo Kitêba Pîroz van gotina bona çi elam dike. Bi fikira min şirovekirina vê yekê diha rast e:

> Û ew Xudan Ruh e û Ruhê Xudan ku derê be, li wê derê jî azayî heye.
>
> –B Korintî 3:17

Nava zimanê yûnanî da xebera "Xudan" xebera "kyûrîos"–e. Fikira wê çawa "ewê ku xweyê serkarîya here bilind e" tê qebûlkirinê. Destûrê nadine Ruhê Pîroz, ku nava piranîya bara /cîyê vexwerina alkoholê/, hebsa, nexweşxana yan jî malbeta da serkarîyê bike û gelek cara ew yek li gelek civîna heye. Çawa jî hebe hûn dikarin azayê û heqîtîyê bona hemûya li wan dera bivînin, li kîderê Ew çawa yê serkarîya here bilind tê qebûlkirinê.

## MEREMÊ VÊ BERBIRÎBÛNÊ

Meremê vê berbirîbûnê ewe, ku nasîya we bidime Ruhê Pîroz, çawa Şexs. Derheqa Wî da meriv dikare gelek cildên kitêba binivîse. Derheqa Wî da meriv dikare bi roja, meha, hetanî sala jî ser hev xeber bide.

Eva ji 3O–î salî zêdetir e, ku ez zewicîm e û min jina xwe Lîza

stendîye. Bi baş naskirina wê va tevayî, ez hela hê alîyên şexsîtîya wê yên usa eşkere dikim, derheqa kîjana da ez hela hê ha ji pê tunebûm. Van axirîya me çend roja tevayî derbaz kir, me 3O–salîya zewaca xwe da kivşê. Wî çaxî ez derheqa hinek xiyalên wê da û karebûnên wê da pê hesîyam, derheqa kîjanada ez ha ji pê tunebûm.

Çi ku derheqa karebûnên Lîzayê da ne, ez ha ji pê tunebûm, wekî merîfeta wê ye mezine nava lîstika golfê da heye. Lîza zane, ku ez evî cûrê sportê gelekî hiz dikim û ewê pêşnîyar kir tevayî bilîzin. Jina min her dem hiz kirîye, ku xebatên dijwar bike û nava wê lîstikê da min jê pirsî, ku dixweze gaveke çetin nava lîstikê da biavêje. Top gerekê 14O mêtra biçûya û li ser gelîyê bi kûraya 6O mêtrî ra derbaz bûya. Heger ewê hêdî tope xista, topê biketa nava okêanê. Min topeke kevin bona Lîzayê dît, çimkî ez difikirîm, wekî ewê unda be. Ewê usa lê xist, wekî top 16O mêtra çû û kete çela anegor, kîderê lazim bû. Bi vî cûreyî merîfeta wê ya lîstikê piştî 3O salên zewacê hate eşkerekirinê.

Her êvar, wextê şîvê, Lîza bi ulm, zanistîyê, hewaskarîyên cuda–cuda û cedandinên cûre– cure va fikirên xwe tevî me nîvî dikirin, derheqa kîjanada ewê pêşda gilî nekiribûn. Bi gilîkî gotî, ez difikirîm ku nava evê şexsê da çiqas tiştên ecêb hene, kîjanê ez çawa jina xwe qebûl dikim. Ew yek tiştê bûyînê nîne ku ez derheqa wî hemû tiştî da gilî bikim, çi ku ez derheqa Lîzayê da zanim. Çi jî hebe, ez dikarim bêjime we ku hûn çawa dikarin nasîya xwe bidinê û pê ra bikevine nava tevgirêdana. Ez dikarim bêjim çi wê xweş tê, hewaskarîyên wê kîjanin û çawa meriv dikare tevî wê bixebite û nava tevgirêdana da be. Ez dikarim derheqa alîyên wê ye qewat û sist da wera bêjim. Ez dikarim gilî bikim, ku ew çi hiz dike, yan jî çi bona wê hewaskar nîne. Ev hemû tişt dikarin çawa rasteke pêşîya we bona tevgirêdanên tevî wê qulix bikin.

Heger bi temamî gilîkirina derheqa Lîzayê da tiştekî dijwar e, kîjan çend sala tevî min jîyan kiriye, gelo ezê çawa bikaribim bicêribînim bi temamî derheqa Ruhê Pîroz da we ra bêjim, emirê Kîjanî yê heta–hetayê ye. Ew yek tiştê bûyînê nîne. Lê çawa jî hebe, ez dikarim raberî we bikim ku Ew kî ye. Ez dikarim derheqa şexsîtîya Wî û hewaskarîyên Wî da û usa jî derheqa wê yekê da, ku Ew çi hiz dike, we ra gilî bikim.

Ez dikarim eleqetên me yên tevî Wî da bêjim û mecala bînime ber çava, bi kîjana meriv dikare tevî Wî bikeve nava tevgirêdana û hevkarîyê bike. Ez dikarim wê yekê jî gilî bikim, ku bona çi tevgirêdana tevî Ruhê Pîroz awqasî girîng e û Ew çawa qewatê dide me, ku em xwestinên Xwedê yên bona me mîaser bikin. Ev zanebûnên hîmlî wê alî we bikin, ku hûn diha bi kûrayî tevî Wî bikevine nava tevgirêdana.

### Roja 2–emîn

## FEMDARÎYA RAST

Şaşîk heye, kîjanê gelek mirov dikin. Ew mirov dicêribînin *cûrê şuxulkarî* û *qewata* Ruhê Pîroz, bêyî naskirina Wî ya çawa *Şexs*, fem bikin.

Ew yek tiştekî girîng e, ku em dil û fikirên xwe da qerar bikin, ku gelo em bawer dikin, ku Ruhê Pîroz Şexsê ji Xwedê ye, Yê ku pîroz, bi îman û qewat e, lê pê ra jî nerm û dilrehm e? Gelo em bawer dikin, ku Ew layîq e, ku Ew tirs, sîmpatîya, bawerî, hizkirin û xwepêşkêşkirina me qebûl bike? Gelo em bawerin, ku gerekê em xwe pêşkêşî Wî bikin? Yan dewsa wê yekê em gumanin, wekî Ruhê Pîroz hukumê ji Xwedê ye û Ew qewat e, yê ku ji Xwedê tê? Diqewime em bi fikira xwe li rex gotinên “ruhê merd”, yan jî “ruhê lecê”–ra pêşda diçin?

Fikira xilazîyê bi kûrayî nîne û pê ra jî gihîştî nîne. Heger em bawerîya xwe vê yekê bînin, emê cî bidine kubarîya ruhanî û nava feydayên wê yekê da emê destpê bikin xwe çawa wekîlên “klasa mesîhîtîyê ye bilind” bidine kivşê.

Feqet heger em hesab dikin, ku Ew bi mezinayî, qedir, îman, ulm û pîrozaya bêsînor e û eger em bawer dikin, wekî Ew çawa Şexs, dikare tevî Bav û Kur nava emirê me da serkarîyê bike û wî hemû tiştî bo rehmê bide xebatê, wî çaxî emê bi tirsa pîroz deverû bikevine ber Wî.

Ew merivê ku li ser wê fikirê ye, ku Ruhê Xwedê hukum yan jî qewata mezin e, wê her dem bêje: “Ez dixwezim diha gelekî ji Ruh bistînim”. Wekî mayîn, ew merivê ku hesab dike, ku Ruhê Xwedê

Şexsê gelekî baş e, wê bêje: “Ez çawa bikim, ku xwe diha gelekî teslîmî Wî bikim?”.

## TEXMÎNKIRINA ME YA DERHEQA WÎ DA

Menîke derheqa wê yekê da, ku gelek texmîn dikin, ku Ruhê Xwedê hokum e, lê ne ku Şexse, ewe ku meriv çawa derheqa Wî da xeber didin. Gelo we bihîstîye, ku yek derheqa Ruhê Pîroz da usa xeber bide, ku tê bêjî Ew şexsekî bêsifet e. Eva îdî serê 3O salî ye, ku ez qulix dikim û heger her car dolarek bidana min, wextê ku min bihîstîye ku çawa kesek wî cûreyî derheqa Ruhê Xwedê da li ber min xeber daye, ezê merivekî gelekî dewletî bûma. Telebextra ji me gelek mirov tijîbûna haziriya Ruh texmîn nakin, çimkî em qedirê Wî çawa Şexs nagirin. Ruhê Xwedê li wê derê wê neyê kivşê, li kîderê himberî Wî qedir nayê dîyarkirinê /Bixwînin– Metta 13:54–58, Zebûr 89:7/.

Ez bêjim, ku bi navkirina Ruhê Pîroz çawa “Şexs”, ez naxwezim bêjim, wekî tebyeta Wî ye mirovatîyê heye. Awqasî ez dixwezim bêjim, wekî cudatiyên xeysetê Wî ye usa hene, kîjan çawa yên şexsîtîyê tên hesabê . Ruhê Pîroz Xwedêtî ye, lê ne ku merive. Feqet em gerekê bîr bînin, wekî meriv bi resmên Xwedê çê bûne. Usa dertê, wekî ne ku Ew mînanî me ye, lê em mînanî Wî ne.

Dêmek me /civîn/ qerar kiriye, Wî çawa “heyîna pîroz” qebûl bikin, lê ne ku çawa Şexsê *Here Pîroz.* Ew dixweze bibe hevalê meyî here nêzîk, lê me tevbûna Wî ye nava emirê me da daye sînorkirinê. Tiştê herî xemgîn ewe, wekî me tevgirêdana here xweş înkar kiriye, kîjanê em dikarin bivînin.

Werin em hinek beşên nivîsarên pîroz binihêrin, kîjan şexsîtîya Ruhê Pîroz tîne ber çava:

- Fikira Wî heye /bixwînin Romayî 8:27/.
- Xwestina Wî heye /bixwînin A Korintî 12:11/.
- Texmînkirinên Wî hene, mînak– hizkirin û şabûn /bixwînin Romayî 15:3O, Galattî 5:22/.
- Ew ber dilada tê /bixwînin Karên Şandîya 9:31/.

- Ew xeber dide /bixwînin Îbranî 3:7/: zêde– ew zelal xeber dide /bixwînin A Tîmotêyo 4:1/.
- Ew hîn dike /bixwînin A Korintî 2:13/.
- Dikarin dilê Wî biêşînin /bixwînin Efesî 4:3O/.
- Dikarin tiştên xirab bêjine Wî /bixwînin Efesî 1O:29/.
- Dikarin dijî Wî derkevin /bixwînin Karên Şandîya 7:51/.
- Dikarin li ber Wî derewa bikin /bixwînin Karên Şandîya 5:1–11/.

Heger ev tişt eşkere Kitêba Pîroz da hatine raberkirinê, em gerekê pirsê bidin: bona çi texmînkirina meriva ya derheqa Ruhê Pîroz da awqas şaşe?

## KEVOTK

Gelek mirov, bi fikirmîşbûna derheqa Ruhê Pîroz da carekêra kevotk tê ber çavê wan. Gelo bona çi ev himberîhevkirin ya ewline û gelek cara rastî mirova tê? Gelo Ruhê Pîroz bi resmê kevotkê hatîye ber çava? Bersiva vê pirsê zelal e– *na xêr* .Nava her çar Kitêbên Pîroz da em dixwînin, ku Ruhê Xwedê mînanî *kevotkê* peyayî li ser Îsa bû /bixwînin Metta 13:16, Marqos 1:1O, Lûqa 3:22, Yûhenna 1:32/.

Gelo em navêjin?: "ew mînanî bayê direve", yan jî "ew mînanî ga qewat e". Eger ez bêjim, ku kurê min mînanî ga qewat e, gelo gotinên min didine kivşê, wekî ew heywanê çarnigî ye? Bêfitîya na. Wî cûreyî jî wextê ku tê gotinê, wekî Ruh mînanî kevotkê peya bû, ew yek nade kivşê, wekî Ew kevotk e.

Merivek dikare bêje: "Feqet Con Ew çawa agirê gurbûyî li ber textê Xwedê hatîye raberkirinê" /bixwînin Eyantî 4:5/. Belê, raste, lê Kitêba Pîroz jî dibêje: "Min dît û awa… çar ruhber û rûsipîya dorê girtibûn, Berxek sekinî bû, çawa ku serjêkirîbe…" /Eyantî 5:6/. Awa Yûhenna çawa derheqa Îsa da dibêje. Şikberîya me tune, wekî Îsa heywanê çarnigê nîne. Bi wî cûreyî jî Ruhê Pîroz agirê gurbûyî nîne, kîjan li ber textê Xwedê dişuxule.

# WÎ ÇAXÎ KÎ YE RUHÊ PÎROZ?

Kitêba Pîroz zelal dibêje, wekî Ruhê Pîroz Şexsê Xwedêtîyê yê sêemîn e. Derketin 1:26–ê da hatîye nivîsarê: "Û Xwedê got: "Em meriva dilqê xwe da û mîna xwe bixuliqînin…". Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Xwedê nabêje: "meriva bixuliqînim". Nava vê şuxulkarîyê da sê rol hene. Xwedê derheqa Xwe da xeber dida, xwe çawa Bav, Kur û Ruhê Pîroz nav dikir.

Werin em Karên Şandîya 1O:38–a bixwînin, ku Bav, Kur û Ruhê Pîroz çawa Şexsên başqe–başqe dibînin.

Çawa *Xwedê Îsa yê* Nisiretê bi *Ruhê Pîroz* û qewatê kivş kir, ku bi qenckirinê gerîya û hemû yên ku bindestîya mîrêcin da bûn, qenc kirin, çimkî Xwedê tevî wî bû.

Nava vê gotinê da em divînin, ku çawa *Bav Îsa* bi *Ruhê Pîroz va* rûn dike: em sê Şexsa dibînin, Yên ku bona meremekî tomerî bi hev ra hevkarîyê dikin.

Werin em mînakekê jî binihêrin:

> Hema çawa Îsa hate nixumandinê û ji avê derket, ezman vebû û ewî dît, ku Ruhê Xwedê mîna kevotkekê hate xwerê û ser wî danî. Û dengekî ji ezmana got: "Eve Kurê Minî delal, ku ez ji wî razî me" /Metta 3:16–17/.

Nava nixumandina Îsa da hûn carekê jî dibînin, ku çawa Xwedêtî bi sê Şexsên cuda va tê ber çava. Berê e'wlin *Îsa* bi destê Yûhenna hate nixumandinê, paşê *Ruhê Xwedê* li ser Wî danî. Bi kutasî Bav Xwedê ji ezmana elam kir: "Eve Kurê Minî delal, ku ez ji wî razî me". Careke mayîn her sê Şexsên Xwedêtîyê bi hev ra bona meremê tomerî hevkarîyê dikin.

Destûrê bidin, ez mînakeke zelal bînime ber çava, kîjanê alî bike, ku derheqa vê rastîyê da xeberdin. Sê cûrê avê hene, girêdayî dereca wê ra. Av dikare bi cûrê tîr be, yan jî avî be, yan jî bi cûrê gaze be. Av çawa qinyat sîstêma xwe ya molêkûlîyê naguhêre, lê cûrê wê yê ber çava dereca wê va girêdayî ye.Wî cûreyî jî heyîna Xwedê nayê guhartinê.

Bi dîtina Kur hûn Bavê divînin. Wî cûreyî jî Ruh hate şandinê, ku Kur elamî me bike /bixwînin Yûhenna 17:21, Efesî 1:17–18/. Xwedê bi meremê Xwe yek e, lê sê Şexsên wî hene, Yên ku şuxulên cuda– cuda dikin, nenihêrî wê yekê, wekî sê Şexs hene, lê Xwedêk tenê heye. Nava Qanûna Ducarî 6:4–ada nivîsar e: "Bibihê Îsraêl! Xudan Xwedê yê me Xudanek e". Romayî 3:3O–da nivîsare: "…çimkî Xwedê yeke û ew yên sinetbûyî bi bawerîyê rast h'esab dike…". Aqûb 2:19–da wî cûreyî nivîsare: "Tu bawar dikî, ku Xwedê yek e: qenc e". Ev rastî kevirê enîşka vê kitêbêye mayîn e: sê Şexs hene, lê Xwedê yek e.

### Roja 3–emîn

## ŞEXSÊ EWLIN

Bi rastî nava xwedêtîyê da Ruhê Pîroz Şexsê ewlin e, Yê ku Kitêba Pîroz da eyan dibe. Nava serê ewlin da, yê kitêba Destpêbûnê, nivîsar e: "Destpêbûnê da Xwedê erd û ezman afrandin" /Gotin 1/. Niha em gotina duda bixwînin: "Erdî bêcûre û vikî–vala bû, terîstanîyê li ser rûyê ava bêbinî girtibû û Ruhê Xwedê li ser rûyê avê digerîya". Em Ruh hema li vir divînin. Ew Kitêba Pîroz da Şexsê Xwedêtîyê yê ewlin e, Yê ku bi nav tê navkirinê.

Kesek dikare bipirse: "Con lê nava xebera ewlinda nivîsar e– "Pêşda Xwedê erd û ezman çê kir". Çawa tu dikarî bêjî, wekî Ruhê Pîroz Şexsê Xwedêtiyê yê ewlin e, derheqa Kîjanî da Kitêba Pîroz da hatîye nivîsarê, heger gotina ewlin da derheqa Xwedê Yê Bav da nivîsar e. Eva pirseke gelekî baş e. Tê bîra we, wextê ku Xwedê got: "Bi dilqê me… meriva bixuliqînin". Nava gotina ewlin da berbirîbûn bona Xwedêtiyê ye, lê ne ku bona Şexsekî Xwedêtîyêyî cuda. Bona wê yekê jî, Şexsê Xwedêtiyêyî ewlin, Kîjanî em Kitêba Pîroz da divînin, Ruhê Pîroz e. Nava gotina duemîn da nivîsare: "Ruhê Xwedê /Ruhê Pîroz/ li ser rûyê avê digeriya".

Werin em careke mayîn paşda vegerine li ser pirsa ewlin, ku Ruhê Pîroz kî ye? Ez dikarim bidime bawerkirinê, wekî li ser vê dinîyayê

Ew Şexsê herî rehm, nerm û qewat e. Diqewime hûn pirsê bidin: “Con, li ser vê dinîayê?”. Bêfitîya li ser vê dinîayê. Em gerekê fem bikin, wekî Bav li vir li ser topa dinîyayê nîne. Ew li ser textê Xwe, li ezmîn, rûniştîye. Wî cûreyî jî Îsa li vir nîne. Ez her dem dibihêm, ku çawa meriv dibêjin: “Îsa dilê min da ye”,– lê Kitêba Pîroz zelal dide kivşê, wekî Ew li alîyê Bavê yê rastê rûniştîye /Marqos 16:19/. Nava Karên Şandîya 1:9–11–ada nivîsar e:

…ber çavê wan berbi ezmên hate hilatinê û ewirekî ji ber çavê wan ew veşart. Ew hê zûr bibûn li çûyîna wî ya ezmên dinihêrîn, wa du merivên kincsipî cem wan sekinîn û gotin: “Gelî celîlîya! Hûn çima usa sekinîne û ezmên dinihêrin? Ew Îsa Yê ku ji nav we hate hilatinê, wê usa jî bê, çawa we dît, ew çû ezmên”.

Ev herdu meriv, yên ku bi rastî milyaket bûn, zelal elamî şagirta kirin, wekî Îsa wê hema wî cûreyî paşda bê, çawa ku ew çû. Ewê paşda neyê ser topa dinîyayê, hetanî hatina Wî ye li ser ewira. Gelo Îsa îdî paşda hatîye li ser ewira? Na xêr. Ev yek dide kivşê, wekî niha Îsa hela hê li alîyê Xwedêyî rastê ye, li ezmîn.

Niha serhatîya derheqa Steyfan, dema ku ew dane ber kevira, bîr bînin. Nava Karên Şandîya 7:55–56–ada nivîsar e: “Lê Steyfan, bi Ruhê Pîroz tijî, berê xwe ezmînda kir, rûmeta Xwedê û Îsa li milê Xwedêyî rastê sekinî dît û got: “Vay e ez ezmana vebûyî dibînim û Kurê Însan li milê Xwedêyî rastê sekinî!”. Bicêribînin bînine ber çavê xwe, wekî çawa Îsa bi temamîya şikirîya Xwe sekinî ye û hîvîya wê demê ye, kîjanê bi nisileta /nivş/ bê bîranînê. Ev yek derheqa yekbûyîna Steyfane tevî Îsa ye û careke mayîn derheqa rastîyê da bîr tîne, wekî niha Îsa li rex Bavê Xwe ye.

Bi rastî îdî nêzîkî du hezar sala ye, wekî Îsa li ser vê tabîyê ye. Ew li vir, li ser topa dinîyayê nîne. Ez zanim, wekî me xweş tê, em bêjin, wekî Ew dilê me da ye, lê bi rastî Ruhê Pîroz Ruhê Îsa Mesîh ye, ku dilên me kirîye cihê jîyana Xwe.

Ew yek girîng e ku em fem bikin, wekî Ruhê Pîroz him çawa Ruhê Xwedê yê Bav û him jî çawa Ruhê Îsa Mesîh tê navkirinê. Werin em çend mesela binihêrin:

Fîlîpî 1:19–ada Pawlos dinivîse: “Çimkî ez zanim, ku ev yek wê axiriyê li ber azabûna minkeve, bi duayên we û alîkarîya *Ruhê Îsa Mesîh*”. Îsa gelekî zelal got, wekî Ew gerekê here bona ku Ruhê Pîroz bikaribe dewsa Wî bê. Tiştekî eyane, wekî nava vê gotinê da Pawlos derheqa Ruhê Pîroz da xeber dide, lê ne ku derheqa Îsa da, çimkî Îsa li ser vê dinîayê nîne.

Metta 1O:2O–î da Îsa elam dike: “Çimkî ne ku hûnê xeberdin, lê Ruhê Bavê weyî ku nava we da ye wê xeberde”. Îsa derheqa wî wedeyî da xeber dida, wextê ku şagirtên Wî wê rûyê Kitêba Pîroz da bihatana zêrandinê û biketana nava çetinaya /dijwariya/. Ruhê Bavê /Ruhê Pîroz/ wê rêberî li wana bikira û wê gotinên rast bida wana.

Hema niha jî, dema ku ez dinivîsim, gotinên vê kitêbê feydayê zanebûn, yan jî cêribandina min nînin. Ruhê Bavê min e, wekî bi destê min dide hînkirinê. Min cêribandiye, ku ez bi qewata xwe hîn bi /fêr/ bikim, lê ez we didime bawerkirinê, ku cêribandinên wî cûreyî diteribin. Bi saya Wî, rûyê qewatdayîna Ruhê Pîroz da ye, ku ez ev im. Mizgînî ew e, wekî Ewî tu cara ez tenê nehiştime. Ew hertim hatîye arîkarîya min. Dema ku ez bi gurêkirin berbirî Ruhê Keremê dibim /bixwînin Îbranî 1O:29/, Ew qewatê dide min.

## HER SÊ ŞEXSÊN XWEDÊ ÇI CÛREYÎ KAR DIKIN?

Ev femdarîya “her sê nava yekê da” dikare gelek çetinaya nava femkirinê da pêşda bîne, çimkî ew yek ne anegorî texmînkirinên merivatiyê ye. Nava Korintî 12:5–7–a da tê kivşkirinê, ku çawa Her Sê çawa Yek kar dikin.

> Cûre– cûre qulix jî hene, lê hema wî Xudanî ra qulix dikin, usa jî cûre– cûre karîn hene, lê xût ew Xwedê ye, ku van dayîna da karînê dide her kesî. Lê her kesî ra Ruh bona kara hemûya xuya dibe.
>
> –A Korintî 12:5–7

Bi xwendina vê beşê, em eşkere dikin, wekî Bav, Kur û Ruhê Pîroz borcdarîyên cuda–cuda mîaser dikin. Bav pêşnîyar dike /gotin 6/, Kur

serkarîyê dike /gotin 5/, lê Ruhê Pîroz elam dike /gotin 7/. Çawa jî hebe, Ew tevayî, bona meremekî tomerî, kar dikin.

Eger em qerar bikin malê çê bikin, em gerekê çi bikin? Em gerekê arxîtêktor û xebatkara bona çêkirina malê kirê bikin. Anegorî vê meselê, Xwedêyê bav arxîtêktor e, Îsa serkarê xebatkara ye, lê Ruhê Pîroz jî xebatkar e. Ev hemû jî malê çê dikin. Ev her sê jî bona çêkirina her malekê girîngin.

## DESTÊ XWEDÊ

Werin em du nivîsarên pîroze derheqa vê yekê da lêkolîn bikin. Îsa merivek qenc kir. Merivê dor– bera zendegirtî man, lê fêrisî fikirîn: "*Ew cina bi alîkarîya mîrêcin derdixe*" /bixwînin Metta 12:23–24/. Nava xebera 28–a da caba Îsa, ya bona fikirên wan hatîye nivîsarê: "Feqet eger ez cina bi Ruhê Pîroz derdixim, usa ye padişatîya Xwedê gihîştîye ser we".

Lûqa jî vê gotinê bîr tîne, lê ew hinekî himberî ya Metta firqîyê dide. Lûqa 11:2O–î da nivîsar e: "Lê eger ez bi destê Xwedê cina derdixim, usa ye padişatîya Xwedê gihîştîye we". Him Lûqa û him jî Metta derheqa Ruhê Pîroz da xeber didin. Lûqa tiştekî dide xebatê, kîjanê nivîskar gelek cara nava nivîsarên xweda didine xebatê. Ew wê şuxulkarîyê tîne ber çava, kîjan anegorî Ruhê Pîroz e, bi xeberdana derheqa Şexsê Wî da. Li vir em dikarin bên ser wê fikirê, wekî meriv Ruhê Pîroz dikare çawa "Destê Xwedê" bîne ber çava.

Şuxulkarîya Ruhê Pîroz meriv dikare ne tenê çawa *destê Xwedê*, lê usa jî *milê Xwedê* hesab bike. Kitêba Pîroz dibêje, wekî Xwedê cimeta xwe "Bi destê qewat û bi milê dirêjkirî xilaz kir" /Zebûr 136:12/. Nava Zebûr 8:3–a da nivîsar e: "Wextê ku ez ezmanê Xwe divînim, *karê pêçîyên Te*–hîv û steyrk, kîjan Te îzbat kirin…". Piranîya bawarmenda fem nakin, wekî nava ezmîn da steyrk û tiştên mayîn Ruhê Pîroz cih û war kirine. Temamîya afrandinê Ewî elam kirîye. Derketin 1:2–a da nivîsar e: "Ruhê Xwedê li ser rûyê avê ra digerîya". Ew hîvîyê bû, wekî Bavê afrandinê destpê bike. Kur gerekê serkarî li wê yekê bikira, bi gotina : "Bira ronahî be", çimkî Îsa Gotina Xwedê ye. Wextê ku gotina

“Bira ronahî be” hate bihîstinê, Kur serkarîya xwestina Bavê kir û Ruhê Pîroz ew tişt efirandin, çi ku Kur xeber da.

Bona min beşeke nivîsara ye hizkirî derheqa mezinaya Ruhê Xwedê û şikiriya Wî da ye, kîjan Îşaya 4O:12–15–a da nivîsar e:

> Kî okêan çenga destê Xweda girtîye? Kî ezman bi pêçîyên Xwe çap kirine? Kî zêde giranîya dinîyayê zane, yan jî çîya kişandine û top dane li ser mêzînê? Kî dikare şêwirê bide Ruhê Xudan? Kî zane ye, ku şêwirê bide Wî, yan jî hîn bike? Gelo Xudan kengê hewcê şêwira yekî mayîn bûye? Gelo Ew hewcê wê yekê ye, ku bêjine Wî, ku kîjan tişt yê rehmê ye? Gelo yekî Ew hîn kirîye, ku kîjan rast e, yan jî rîya heqîtîyê nîşanî Wî daye? Na xêr, çimkî hemû miletên dinîayê mînanî niqitkeke ava nava derdanêdanin. Li ser mêzînê ew mînanî tozê ne. Ew temamîya dinîayê bilind dike û tê bêjî bona wî dinîya mînanî libeke qûmê ye.
>
> –Îşaya 4O:12–15, NLT

Nava xebera 12–a da nivîsar e: “Kê bi pêçîyên Xwe ezman çap kirine?”. Hûn dikarin bivînin, wekî Ruhê Pîroz bi vî cûrîeyî tê raberkirinê. Derheqa vê yekê da bifikirin, wekî Ruhê Xudan temamîya okêanê çenga destê Xwe da girtîye. Gelo hûn navînin, ku Ew çiqas qewat e? Lê çawa jî hebe, Ew qayîl bûye tevî Bavê û Kur bê û nava me da bijî. Gelo tiştekî çawa ecêb e.

### Roja 4–emîn

## RUHÊ PÎROZ XWEDÊ YE

Werin em binihêrin, ku rola Ruhê Pîroz nava afirandina mêriv da çi cûreyî bû. Nivîsar e: “Xudan Xwedê ji axa erdê qalibê mêriv çê kir, bîna jîyanê hulmî poza kir û meriv bû bînberekî sax” /Destpêbûn 2:7/. Ruhê Pîroz Ew e, Yê ku bi rastî Adem “çê kir” û emir da wî.Ruhê Pîroz ne t’enê Adem “çê kir” û emir da wî, lê Ewî usa jî em “çê kirin” û emir kire nava me. Nava Zebûr 139:13–a da nivîsare: “Çimkî Te ez

afirandim û nava dayîka min da ez veşartim". Bi rastî Ruhê Xwedê ew hemû tişt afirandiye, çi ku em divînin. Çimkî Metelok 26:1O–da nivîsar e: "Xwedê Yê Mezin, Yê ku hemû tişt afirand…" /NKJV/. Ew afrandin kîjanê em divînin, pêşda hat, çimkî Ruhê Pîroz xwestina Bavêye afrandar mîaser kir.

Ez hêvîdarim, wekî niha bona we zelal e, ku kî ye Ruhê Pîroz. Werin em çend navên wî binihêrin, kîjan nava Kitêba Pîroz da tên xebitandinê. Navên Wî:

- Ruhê Pîroz /96 cara/,
- Ruhê Xudan /28 cara/,
- Ruhê Xwedê /26 cara/,
- Ruhê Heta–Hetayê /Îbranî 9:14/,
- Arîkar /4 cara ji alîyê Îsa da, nava kitêba Yûhenna da/,
- Pîroz /Zebûr 78:41/,
- Xudan /B Korintî 3:17/,
- Ruhê Rastîyê /4 cara/,
- Ruhê Mesîh /Romayî 8:9, A Petrûs 1:11/,
- Ruhê Îsa Mesîh /Fîlîpî 1:19/,
- Ruhê Şêwirê /Îşaya 11:2/,
- Ruhê Ulm /Îşaya 11:2/,
- Ruhê Qewatê /Îşaya 11:2/,
- Ruhê Merîfetê /Îşaya 11:2/,
- Ruhê Îmanê /Îşaya 11:2/,
- Ruhê xofa Xudan /Îşaya 11:2/,
- Ruhê Bavê we /Metta 1O:2O/,
- Ruhê şikirîyê /A Petrûs 4:14/,
- Ruhê destûrê /Îşaya 4:4/,
- Ruhê ku dişewitîne /Îşaya 4:4/,
- Ruhê emir /Romayî 8:2/,
- Ruhê hizkirinê /B Tîmotêyo 1:7/,

- Ruhê serxwebûnê /B Tîmotêyo 1:7/,
- Ruhê pêxembertîyê /Eyantî 19:1O/,
- Ruhê pîrozayê /Romayî 1:4/,
- Ruhê Xwedê Yê Pîroz /4 cara kitêba Danîêl da/.

Ew layîq e, Ew qewat e.

## ÎSA BI TEMAMÎ RUHÊ PÎROZ VA GIRÊDAYÎ BÛ

Îsa bi temamî Ruhê Pîroz va girêdayî bû. Derketina Wî ji Ruhê Pîroz bû. Ew ji Ruhê Pîroz hatibû hînkirinê. Ewî bi Ruh li ber çemê Îordanê qewat stend û tu tişt nekir, hetanî ku bi Ruh hate nixumandinê /bixwînin serhatîya Yûhenna, ya derheqa kirina wîye ewline li Galîlêya Kanayê: Yûhenna 1:29–34 û 2:1–11/. Ew bi Ruh dihate rêberkirinê û tenê ew tişt xeber didan, çi ku Ewî ji Ruh dibihîst.

Yûhenna 14:1O–da Îsa got: "…Ev xeberê, ku ez we ra dibêjim, ne ku xwe serî xwe dibêjim, lê ew *Bavê ku nava Min da dimîne,* ew e, ku ya xwe dike".

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Îsa negot : "Bavê li Ezmîn". Ewî got: "Bavê, ku nava Min da dimîne".

> "Deqekê, Con, tu dixwezî bêjî, wekî Îsa Ruhê Pîroz çawa Bav nav dikir?". Lê bo çi na? Awa Milyaket çi gote Ûsiv: "…Netirse ku dergîstîya xwe Meyremê bistînî. Ewî ku wê ji wê bibe, ew ji Ruhê Pîroz e" /Metta 1:2O, NLT/. Bûyîna Îsa ji Ruhê Pîroz bû û meriv dikare fem bike, ku bona çi Ewî Ruhê Pîroz wa nav dikir: "Bavê ku nava Min da dimîne".

Bi rastî, Îsa û Ruhê Pîroz wextê emirê li ser dinîayê tevayî hevkarî dikirin. Îsa got:

> "…Kur tu tiştî nikare xwe serî xwe bike, Ew tenê wan tiştên ku divîne, Bav dike. Bav çi dike, kur jî usa dike" /Yûhenna 5:19/.

Bi çiqasîva Îsa hewce bû tevî Ruhê Pîroz hevkarî bikira, bona mîaserkirina mîsîya Xwe, bi awqasîva zêde em hewcê arîk'arîya Ruh

in, ku em mîsîayên xwe mîaser bikin.

Tu kes Ruhê Pîroz awqas baş nas nake, çawa Îsa. Werin em binihêrin, ku Îsa derheqa rola Ruhê Pîroz, qewata Wî û karebûnên Wî ye mayîn da çi got. Yûhenna 14:15–18 da Îsa dibêje:

Heger hûn Min hiz dikin, hûnê temîyên min xweyî bikin. Ezê jî ji Bavê hîvî bikim û Ewê Piştovanekî din bide we, wekî heta–hetayê tevî we bimîne. Ewe ew, Ruhê ku rastîyê elam dike û dinîya nikare wî qebûl bike, çimkî ne Wî dibîne û ne jî Wî nas dike, lê hûn Wî nas dikin, çimkî ew tevî we dimîne û wê nava we da be. Ez we sêwî nahêlim, ezê dîsa ser we da bêm.

Nava vê beşê da gelek xizne hene. Ya ewlin, we dît ku Îsa got: “Heger hûn Min h’iz dikin, temîyên Min xweyî bikin”. Hewaskar e, wekî pêşîya xeberdana derheqa Ruhê Pîroz da Îsa derheqa naskirina serkarîya Xwe ye bilind da bîr tîne. Ew xweyîkirin û mîaserkirina temîyên Xwe, yên ji alîyê me da girîng hesab dike. Petrûs vê rastîyê îzbat dike: “Em şedên van tiştan e, usa jî Ruhê Pîroz, kîjan Xwedê da wana, yên ku gura Wî da nin” /Karên Şandîya 5:32/. Xwedê Ruhê Pîroz dide wana, yên ku gura Wî da nin.

Niha guhdarîyê bidine ser wê yekê, ku Îsa Yûhenna 14:16 da çi dibêje: “Ezê jî ji Bavê hîvî bikim û Ewê Piştovanekî din bide we”. Werin em binihêrin, ku xebera yûnanîye tercimekirî “yekî din” çi dide kivşê. Nava Kitêba Nû da du xeberên yûnanî hene, kîjan bi xebera “yekî din”–va tên tercimekirinê. Ev xeberên yûnanî “hêtêros” û “allos”–in. “Hêtêros” dide kivşê “yekî mayîn– cûr’ekî mayîn”, lê “allos” dide kivşê “yekî mayîn–wî cûreyî”. Pirs eve, ku gelo ji van xebera kîjan Îsa nava vê gotinê da dide xebatê.

Hetanî dayîna bersiva pirsê destûrê bidin, ku ez meselekê bînim, kîjanê firqîya van her du xebera bide kivşê. Mesele, ez fêkîkê didime we, mesele sêvê. Wextê ku hûn dixun, ez ji we dipirsim: “Hûnê fêkîke mayîn jî bixwezin?”.

Heger hûn bêjin “belê” û ji min portûqalekê bistînin, wî çaxî usa dertê, wekî ezê fêkîke “mayîn” bidime we. Çawa jî hebe min *fêkîke cûrekî mayîn* da we. Portûqal jî fêkî ye, lê firqîya wê û sêvê heye. Eva

mesela xebera “hêtêros”–e. Lê eger hûn ji min fêkîke mayîn bixwezin û ez sêva duda bidime we, wî çaxî hûn dikarin bêjin, wekî min *fêkîke mayîn, lê dîsa ya wî cûreyî da we.* Eva mesela xebera “allos”–e.

Werin em paşda vegerine li ser pirsa xwe. Wextê ku Îsa dibêje, wekî Bavê Piştovanekî “mayîn” bide me, Ew kîjan xeberê dide xebatê? Ew xebera “allos” dide xebatê. Ew dibêje “Bavê Piştovanekî mayîn bide we, Yê ku rast mînanî Min e”. Bi gilîkî mayîn Îsa dibêje, wekî Ew û Ruhê Pîroz cûrekî ne.

## Roja 5–emîn

# HEVALÊ MEYÎ NAVA TEMAMÎYA EMIR DA

Xebereke mayîn, kîjan Îsa nava Yûhenna 14:16 da xebera Piştovan /yan jî Arîkar/ dide xebatê. Nava zimanê yûnanî da xebera “piştovan” xebera “paraklêtos”–e. Nava kaxezên Yûhenna da Îsa “paraklêtos” dide xebatê: “Zarokên min, ez vê yekê we ra dinivîsim, wekî hûn guna nekin, lê heger yek gune bike, li cem Bavê Piştgirê me, Îsa Mesîh, Yê heq heye” /A Yûhenna 2:1/. Him Îsa, him jî Ruhê Pîroz rola arîkar, yan jî “paraklêtos” diqedînin. Dêmek ev xeber çi dide kivşê. Nava Kitêba Nû da ev xeber bona fikira advokat dihate xebitandinê, yê ku karê kesekî diparast. Ew xeber usa jî bona nîşandayîna şêwirmendê şexsî, yan şêwirdar dihate xebitandinê, yê ku hîn dike, ku emir da bighîjine açixîyê.

“Paraklêtos” ji du xebera çê bûye– “para” û “kalêo”. “Para” nîşan dide “gelekî nêzîk”. Pawlos ev xeber bona eleqetên xweye tevî Tîmotêyo dida xebatê. Pawlosê şandî xêncî Tîmotêyo gelekî nêzîk tevî merivên mayîn nîbû /bixwîne Fîlîpî 2:2O/. Jina min Lîza, bona min “para”–ye. Li ser vê dinîayê xêncî wê kesekî usa tune, ku awqasî nêzîkî min be. Minê ev xeber derheqa eleqetên xweye tevî Lîzayê bida xebatê.

Xebera yûnanîye duemîn– “kalêo” fikira “Bi heja desta gazî bike” dide kivşê. Yan jî “gazîkirin”. Ev xeber gelek cara Kitêba Pîroz da tê xebitandinê, wextê ku şandî derheqa xwe da raber dikin. Mesele, wextê

ku Pawlos dibêje: “Ez çawa şandîyê necihûya hatime *gazîkirinê*”. Ewî xebera yûnanîye “kalêo” da xebatê. Ew yek derheqa şuxulkarîya emir da ye.

Wextê ku van her du xeberên yûnanî dighînine hev, em fikira gotinên Îsa diha baş fem dikin. Dêmek, Ew dibêje, wekî *Ruhê Pîroz bona her dem bûyîna li rex me hatîye gazîkirinê, ku şêwirdarîyê, şîreta û rênîşandayînê bide me.* Ev yek teslîmkirina bona Wî ye. Ew her dem tevî me ye, ku alî me bike û Ew tu cara naweste. Îsa got, wekî Ruhê Pîroz wê heta– hetayê tevî me bijî /Yûhenna 14:16/. Ewê tu cara me nehêle û dûr nekeve. Gelo eva sozdayîneke ecêbmayînêye çawa ye! Îsa dibêje, wekî Ruhê Pîroz wê xebat û mîsîya Wî /Îsa/ bidomîne.

Gelek cara ez dibihêm, ku çawa meriv dibêjin: “Xwezî ez bikaribûma tevî Îsa bigerîyama, minê awqas pirs bidana Wî”. Gelo bona çi wan pirsa nadine Ruhê Pîroz? Eva govekeke gelekî girîng e, li kîderê fikirên meye derheqa Ruhê Pîroz da eyan dibin. Eger em hesab dikin, wekî Ew şexsekî nekivşe, emê wî çaxî nêzîkî Wî nebin, Yê ku dikare me hîn bike û şêwirê bide me. Ruhê Pîroz Xwedêtî ye, lê ne ku şexsê bêsifet. Eger em bi rastî bawer in, wekî Ew wî cûreyî ye, çawa ku Gotin Wî dide kivşê, emê bi xofê nêzîkî Wî bin û fem bikin, wekî Ew hemû tiştî zane û ji hemû tiştî qewattir e, wekî Ew dikare hîn bike, alî bike û şêwira bide. Ew dixweze nêzîkî me bibe.

Telebextra li Civînê Ruhê Pîroz ew Şexse, Yê ku ji gişka zeftir hatîye bîrkirinê. Çiqas car em berev bûne û Ew layîqî wê yekê nebûye û ji alîyê me da nehatîye bîranînê. Nava temamîya rojê da em hema xeberekê jî nabêjine Wî, Yê ku bona jîyana heta–hetayê tevî me hatîye gazîkirinê.

## GOTINA ECÊBMAYÎNÊ

Yûhenna 16:7 da Îsa tiştekî wa got: “Lê Ez rast dibêjime we…”.

Em bidomînin vê beşê bixwînin, îzinê bidin, ku fikira we da şikilekî wa çê bibe. Îsa tevî şagirtên xwe xeber dide. Ji sê sala zêdetir e, ku Ew tevî wan meriva ye. Ew çi ku Îsa gotîye wana, mîaser bûye. Ewî gotîye: “Ba, bisekine” û ba sekinîye. Ewî gotîye: “Hûnê li vî cîyî kerekî

bivînin”, û usa jî qewimîye. Ewî zanibû, wekî nava şagirtên Wî da xayîn heye û hetanî gavavîtina wî xayînî, Ewî hemû tişt zanibû. Ewî gote darê, ku dar hişk bibe û dar hişk bû. Ew hemû tişt, çi ku Îsa gotibû, usa jî bûbû, lê ew mecbûr bû pêşîya gotina Xwe bêje “lê ez rast dibêjime we”. Bi texmîn, wî çaxî Îsa wê tiştekî usa bigota şagirta ku wana bawer bikira, wekî gotina Wî rastî bû.

Bi vî cûreyî, Îsa çi gote wana?: “Lê Ez rast dibêjime we, wekî bona we başe, ku Ez herim, çimkî heger Ez neçim, Piştovanê /paraklêtosê/ neyê cem we, lê heger Ez herim, Ezê Wî bişînime cem we /Yûhenna 16:7/. Nava tercima nû da nivîsar e: “Çûyîna min bona we tiştê herî başe”.

Niha hûn xwe dewsa şagirta daynin. Rêberê we, Yê ku, hûn çawa zanin, Kurê Xwedê ye, hema hêja got, wekî gerekê we bihêle û çûyîna Wî bona kara we ye. Ew xeber wê çawa tiştê bêfikir bihatana femkirinê? Heger Ew Xwedê ye, wî çaxî bona we diha kardar nîne, ku Ew li cem we bimîne? Ez bawerim, wekî şagirt jî wî cûreyî difikirîn. Hema rûyê vê yekê da Îsa pêşîya gotina Xwe got: “Ez rast dibêjime we”.

Bona çi diha baş bû, ku bo şagirt û nisiletên bawermendên pêşerojê Îsa biçûya? Vî cûreyî bifikirin. Hger Îsa ji dinîayê dûr neketa, Ruhê Pîroz wê nehata ku li rex me bibe. Eger min bixwesta ji Îsa tiştek bistenda, ez gerekê hezara kîlomêtra derbaz bûma, ku rastî Wî bihatama. Rêwîtîya min wê bi firîna berbi Têl– Avîvê destpê bûya, kîjanê bibûya firegeha dinîayêye here giran. Peyî wê yekê ra gerekê min avtomaşînek kirê bikira, biçûyama Galîlêyayê û gerekê guman hebûya, wekî minê bikaribûya cihê lê mayînê bidîta. Paşê gerekê min bicêribanda Îsa bidîta, çimkî bi mîlîona meriv wê hîvîya Wî bûna. Peyî dîtina wî ra gerekê ez nava sîstêma sirêye here cetin ra derbaz bûma, çimkî hemû kes jî wê bixwesta pirs bida Îsa, yan jî bi hîvîkirinê berbirî Wî bûna.

Wî çaxî sirê wê gelekî dirêj bûya û rasthatinê bi deqekê bihata sînorkirinê û min gerekê pirs û hîvîkirinên xwe pêşda hazir bikirana. Wê yekê jî bizanibin, wekî Ew gerekê raza, bixwera. Ewê bi texmîn bikaribûya rojê 14 seh’eta cem cimetê bûya? Wî çaxî Îsa wê bikaribûya rojê rastî 84O merivî bihata û deqek bida her kesî. Bi vî cûreyî bona rasthatina tevî mîlîonek meriva, Îsa ra wê 119O roj lazim bûna . Feqet

wê yekê jî hesab hildin, wekî nava sire da wê hertim merivên nû zêde bûna. Gelo wê çawa biqewimîya, heger pirsên merivaye girîng hebûna. Ew meriv jî wê her dem biketana sirîya pêşin. Bi fikira min rasthatina tevî Îsa wê tiştê bûyînê nîbûya.

Mizgînîya baş ew e, wekî Ruhê Pîroz her dem nêzîkî me ye. Ew ne dixweze razê, ne jî dixweze bixwe. Ew carekê ra dikare tevî bi mîlîarda meriva xeber bide. Wextê ku em îzinê bidin, ku fikira meye derheqa Ruhê Pîroz da hîmlî bi Gotina Xwedê va bê guhastinê, wî çaxî emê destpê bikin fem bikin, ku bona çi Îsa got: “Bona we başe, ku Ez herim”.

Bîr bînin, wekî Ruhê Pîroz rast mînanî Îsa ye. Ew mînanî Îsa hîn dike, Ew mînanî Îsa hemû tiştên xwedêtiyê eşkere dike û hema niha jî Ew tevî me ye. Hema niha jî wextê ku ez van xeta dinivîsim, Ruh çavên min ve dike, nîşan dide, ku min çawa dengê Wî û hazirîya Wî ye nava emirê xwe da daye sînorkirinê. Diwekilînim, Ew rêber, şêwirdar, parêzerê me ye. Bona me pêwîste ku Ew tevî emirê me bibe.

Serê kitêbêyî mayîn da emê wê yekê guvtugo bikin ku nêzîkbûna tevî Xwedê çî ye.

# RUH NAS BIKIN

*Ezê jî ji Bavê hîvî bikim û Ewê piştovanekî /Şêwirmend, Arîkar, Piştgir, Advokat, Yê ku li rex mêriv e/ din bide we, wekî heta–hetayê tevî we bimîne…*

–Yûhenna 14:16–17, AMP

Bi rastî, Ruhê Pîroz ecêb e. Peyî xilazbûnê ra, kîjan bi destî Mesîh me stend, Ew pêşkêşa here başe. Kî ye Ruhê Pîroz? Ê. Û. Tozêr, yê ku nivîskarekî cêribandî bû û serwêr bû, hetanî dawîya emirê xwe, dinivîse:

> "Ruhê Pîroz şabûn nîne… Ew Şexs e. Bira ev yek we da bimîne: Ruhê Pîroz meriv nîne, wekî cûrê Wî jî cûrekî mayn e: Ew Şexse, bi hemû alîya va. Ew matêrîal nîne, lê Ew hîmê material ye… Li cem Ruhê Pîroz him xwestin û him jî fikirdarî, him jî zanebûn, him jî karebûnên hizkirinê û dîtinê, fikirmîşbûnê, guhdarkirinê, xeberdanê û wê xwestinê hene, kîjan li cem her merivî hene".

Pêşîya destpêkirina vê dersê we Ruhê Pîroz çawa texmîn dikir? Gelo ev serê kitêbê çi cûreyî texmînkirina we da berfirekirinê, ya derheqa wê yekê da ku Ew bona we kî ye?.

________________________________________________________________

________________________________________________________________

________________________________________________________________

_______________________________________________________________

Bi guhdarî dora wê navnîşa navên Ruhê Pîroz ji Kitêba Pîroz hildayî bifikirin. Gelo ew nav derheqa Wî da çi elamî we dikin?

________________________________________________________________

________________________________________________________________

_______________________________________________________________

Zanebûna derheqa wê yekê da, wekî Ruhê Pîroz wek Bav û Kur e, bi bîolocî girîng e bona çêkirina tevgirêdanên saxleme tevî Xwedê. Tozêr didomîne…

> "…Heyîna Kur heyîna Ruhê Pîroz e û heyîna Bavê jî dîsa heyîna Ruhê Pîroz e û Ruhê Pîroz li Civîna Xwe ye. Heger hûn Wî nas bikin, gelo Ewê çi cûreyî be? Ewê rast mînanî Îsa be. We Kitêba Nû da xwendîye û zanin, ku Îsa çi cûreyî ye. Ruhê Pîroz rast mînanî Îsa ye, çimkî Îsa Xwedê ye û Ruhê Pîroz Xwedê ye û Bav rast mînanî Kur e. Hûn dikarin bizanibin, ku Îsa çi cûreyî ye, bi zanebûna wê yekê, ku Bav çi cûreyî ye û hûn dikarin pê bihesin, ku Ruh çi cûreyî ye bi zanebûna wê yekê, ku Îsa çi cûreyî ye".

Gelo hûn Ruhê Pîroz ji nû va dibînin? Gelo alîyên xeysetê Wî yî cûre– cûre xwestinê li cem we pêşda tîne, ku Ew diha gelekî tevî emirê we be?

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

**Bona lêkolîna paşê…**
Yûhenna 12:44–45, 14:8–11, B Korintî 4:4,
Kolosî 1:15–19, Îbranî 1:3.

Ders Roja 2–emîn

# EW XWEDÊTÎ YE, LÊ NE KU YEKÎ BÊYÎ SIFET E

*Xudan û Ruh yek in û mînanî hev in…*

*B Korintî 3:17, CEV*

Awa hûn ku lawên Wî ye gihîştîne, Xwedê Ruhê Kurê xwe şande nava dilên me, ku gazî Xwedê dike: "Abba!", awa gotî "Bavo!" /bixwînin Galattî 4:6/. Ruhê Wî qewata nebînayî nîne, kîjan temamîya galaktîkayê da digere. Ruhê Wî yî Pîroz *Ew bi Xwe ye*, tijîbûna temamîya heyîna Wî.

**Êndryû Myûr**, yê ku qulixçîyê sedsala 19–a bûye û xudanê ji 2OO–î zêdetir kitêba bû, dinivîse, wekî Ruhê Pîroz "tevî Bavê û Kur yeke", û Ew "eyantîya temam, ya şikiriya Xwedê dide. Ew xebera xwe didomîne:

> "Niha Ruhê Pîroz gerekê wî hemû tiştî bike yên me, çi ku Xwedê pêşda soz dabû û wan hemû tiştên ji keremeta Xwedêtiyê, kîjan nava Îsa da eyan bû û nêzîkî me bû. Bi saya Wî hemû sozdayînên Xwedê mîaser dibin, temamîya keremetê û xilazbûn nava Îsa da dibine hebûna meye şexsî".

We ev yek fem kir? Bi saya Ruhê Pîroz hemû sozdayînên Xwedê mîaser dibin û dibine hebûna meye şexsî. Eva fikira merivatîyê nîne, lê rastîya nivîsara pîroz e. Bi guhdarî van gotina bixwînin û dora wana bifikirin.

> Şikir ji Xwedê ra, Bavê Xudanê me Îsa Mesîh, ku pê hemû dua– dirozgên ruhanîye li dîyarê ezmana yekîtîya Mesîh da dua li me kirin.
>
> –Efesî 1:3, AMP

Qewata xwedêtîya Wî her tiştê ku li jîyana xwedênasîyê dikeve, pêşkêşî me kir, bi wê zanebûna me ye hindava Wî da, yê ku rûmetê û qencîyê ra gazî me kir.

–B Petrûs 1:3, MSG

Lê çawa ku nivîsar e: “Ew tiştên ku çava nedîtine û guha nebihîstine, dilê mêriv ra derbaz nebûne, Xwedê bona wan hazir kirine, yên ku Wî hiz dikin”. Lê belê, Xwedê *bi Ruhê Xwe* ev yek li ber me vekir. Çimkî Ruh her tiştî guvtugo dike, heta nêt– meremên Xwedê ye kûr jî.

–A Korintî 2:9–1O, J.B.Philips

Bi van gotina gelo Ruhê Pîroz çi elamî we dike?

______________________________________________________

______________________________________________________

______________________________________________________

______________________________________________________

Gelo hûn hazirî û qewatbûna Ruhê Pîroz rûuê texmînkirinên nava emirê we da didine sînorkirinê, kîjan derheqa Wî da li cem we hene? *Bisekinin û dua bikin.* Ji Wî hîvî bikin, ku nîşanî we bide, ku kengê hewcetîya alîkarîya Wî heye bona guhartina wan texmînkirina. Wê yekê binivîsin, çi ku Ew elam dike.

______________________________________________________

______________________________________________________

______________________________________________________

______________________________________________________

**Bona lêkolînkirina paşê…**

Mecalên gera bi întêrnêtê yen gotinên Kitêba Pîroz bidine xebatê /mesele sayta biblia.com/ bona ku gotinên bi xeberên “Ruh va”, “Bi saya Ruh” û “Ji Ruh” bivînin. Usa jî van beşa bixwînin: A Korintî 12:4–11, Galattî 5:5, B Têsalonîkî 2:13.

# EW RUHÊ JÎYANÊ YE

*Çimkî qanûna Ruhê ku jîyanê dide, bi saya Mesîh Îsa ez ji qanûna guna û mirinê xilaz kirim.*

–Romayî 8:2

Ruhê Pîroz Ruhê jîyanê ye. Gelo navekî çawa ye! Derheqa vê yekê da bifikirin. Jîyan *hemû tişt e*. Nava wê da saxlemî, gihîştin, tezebûn, qewat, aktîvbûn û serxwebûn hene. Nava Ruhê jîyanê da sîya mirinê tune– nexweşî, yan zeyîfbûn, westandin, yan jî xiravbûn. Tu tiştekî mirinê nava wê da tune ye.

Ruhê jîyanê wextê afirandinê hazir bû. Ewî emir dida temamîya dinîyayê. Mîsîonêrê navnetewî Lêstêr Samral vê yekê îzbat dike:

> "Para Gotina Xwedê ye nivîsar da, ya ewlin da, li kîderê em şuxulkarîya Ruhê Pîroz divînin, Destpêbûn 1:2 ye. Ew tişt layîqî guhdarîyê ye, wekî rûpelê Kitêba Pîroze ewlin û gotina duemîn şuxulkarîya Ruhê Pîroz didine kivşê… Ewî erşê ezmîn û bedewetî ji kaosê /krîzîsê/ derxist. Dinîya bêcûre û vala bû. Xwedê karê Xweyî mezin mîaser dikir û Ruhê Pîroz bona arîkarîya Wî livîya. Ruhê Xwedê li ser rûyê avê livîya û erşê ezmîn ji kaosê pêşda hat".

Hûn nava k'îjan govekên emirê xwe da vala bûnê û kaosê texmîn dikin? Li kîderê hûn hewcene, ku Ruhê Pîroz *bedewetîyê, qeyde–qanûna û azayê* bîne? Dua bikin û hîvî ji wî bikin, ku ew van goveka nîşanî we bide. Bi rîya duakirinê wana teslîmî Ruhê Pîroz bikin û hîvî ji Wî bikin, ku Ew li wan goveka bilive, qeyde–qanûna bîne, çawa ku ew yek wextê afirandinê bû.

Gelo hûn rûyê mijûlbûn û cûrê jîyîna xwe da zeyîf bûne? Ruhê Pîroz dixweze bi karebûna Xwe qewatê bide we. Wextê ku hûn tevî Wî wede derbaz bikin û destpê bikin Wî nas bikin, Ewê qewatên we çê bike. Demekê dora van gotinên Xwedê ye qewat bifikirin:

> Gelo hûn pê nehesiyane? Gelo we nebihîstîye? Xwedê Yê Xudan Yê heta– hetayê, Afrandarê dinîyayê naweste. Femdarîya Wî nayê guvtugokirinê. Ew qewatê dide yên sistbûyî û westîyayî û ew qewata wana zêde dike, karebûna kîjana tune ye.
>
> –Îşaya 4O:28–29, AMP

> Û heger ew Ruhê ku Îsa ji mirinê ra kir, nava we da dijî, ku usa ye, ewê Mesîh ji mirinê ra kir, wê bi wî Ruhê xweyî nava we da, jîyanê bide qalibê weyî pûçî– mirî jî.
>
> –Romayî 8:11, MSG

> Qewata min nava Mesîh da bona hemû tiştî heye, Yê ku qewatê dide min /Ez hazirim bi saya Wî her tiştî bikim, Yê ku qewata hundur dide min…
>
> –Fîlîpî 4:13, AMP

Ruhê Pîroz bi rîya van gotina çi dibêje we? **Duakirinê binivîsin,** bi hîvîkirina ji Ruh, ku Ew *qewata hundurîn bide we* û we werguhêzî asta usa bike, ku hûn emir va usa tijî bin, çawa ku Îsa bû, dema ku Ew li ser vê dinîyayê digerîya.

________________________________________________________________
________________________________________________________________
________________________________________________________________
________________________________________________________________

**Bona lêkolînkirina paşê…**
Destpêbûn 1:2, Nêmîya 9:6, Îşaya 4O:12–15, Zebûr 8:3–9, 1O4:24–3O

Ders Roja 4–emîn

# EM GEREKÊ BI TEMAMÎ WÎ VA GIRÊDAYÎ BIN

*... Tê bi karebûnê yan jî qewatê negihîjî açixîyê, lê bi Ruhê Min tê bigihîjî açixîyê, Xudanê Eskera dibêje.*

–Zakarîya 4:6, GW

Îsa Mesîh–Kurê Xwedê, bi temamî Ruhê Pîroz va– Ruhê Bavê va girêdayî bû. Hemû tiştên nava emirê Wî da– ji hemlebûna Meyremê hetanî hilatina Wî, feydayê xebata Ruh bû. Kitêba Pîroz da nivîsar e, wekî…

Ew ji Ruh bibû – **Metta 1:2O, Lûqa 1:31–35**

Ew bi Ruh dihate rêberkirinê – **Metta 4:1, Lûqa 4:1**

Ew bi Ruh qewat dibû – **Lûqa 4:14, 18–19, Yûhenna 3:34**

Ew ji Ruh hîn dibû û gura Wî da bû – **Yûhenna 5:19,2O,3O, 14:1O**

*Îsa gote cuhîya: "Ez rast, bê xêlif we ra dibêjim, ku Kur nikare xweserîxwe tiştekî bike, ew tenê wan tiştên ku dibîne, Bav dike, Ew jî dike. Bav çi dike, Kur jî usa dike. Çimkî Bav Kur hiz dike û tiştên ku xwexwe dike, nîşanî Wî dike. Ewê hê tiştên mezin nîşanî Wî bike û hûnê ecêbmayî bimînin. Ez xwexwe nikarim tiştekî bikim. Çawa ku ez dibihêm, usa jî dîwanê dikim. Dîwankirina Min rast e, çimkî Ez ne ku bi xwestina xwe digerim, lê bi xwestina Yê ku ez şandime".*

–Yûhenna 5:19–2O, 3O, GW

Bi guhdarî dora elametîya Îsa ye serê 5–a, ya Yûhenna bifikirin, li kîderê Ew derheqa tevgirêdana Ruhê Pîroz va xeber dide. Ruhê Pîroz derheqa tevgirêdanên Îsa û Xwe da çi elam dike? Gelo ev elametî bona çî ye?

Bixwînin Karên Şandîya 5:32, Romayî 8:16, Galattî 4:6, A Yûhenna 3:24 û 4:13. Hûn dikarin du rastîyên ku diwekilin, yên derheqa tevgirêdanên Ruhê Pîroz û Wî da, bivînin?

Mînanî bawermendên civîna Galatîayê em carna bîr dikin, ku em çiqas hewcê Ruhê Pîroz in. Bi guhdarî beşa Galatî 3:2–9 tevî Lûqa 11:13 bixwînin.Hûn dersên çawa dikarin derheqa qebûlkirina arîkarîya Ruhê Pîroz da hildin û çawa hûn dikarin wana nava emirê xwe da bidine xebatê?

Ders Roja 5–emîn

# EW HEVALÊ WEYÎ HETA–HETAYÊ YE

*Ezê jî ji Bavê hîvîkim û Ewê Hevalekî din bide we, wekî heta–hetayê tevî we bimîne. Ev Heval Ruhê Rastîyêye.*
–Yûhenna 14:16–17, GW

Ruhê Pîroz dixweze bibe hevalê weyî herî baş. Ew dixweze bibe Piştovanê we, yê ku her dem li rex we ye– rojê 24 seheta û nava hevtê da hevt roja. Kitêba Pîroz elam dike: "Ew Ruhê ku Ewî nava me da da jîyanê, me hiz dike û ew dixweze, ku Ruh bi hizkirina kumreşîyê bê qebûlkirinê" /Aqûb 4:5, AMP/.

Bahê hevaltîya raste tevî Ruhê Pîroz tune. Hazirî û qewata Wî lezeta heta– hetayê didine me, li ser kîjanê ra ya mayîn tune. Bi xeberdana derheqa Ruhê Pîroz da, Îsa got: "Lê ewê ku ji vê avê vexwe, ya ku Ez bidimê, ewê tu car tî nebe. Belê, ew ava ku Ezê bidime wî, wê dilê wî da bibe kanîke avê, ku wê bona jîyana heta– hetayê jîyanê bide" /Yûhenna 4:14, GNT/. Bi şirovekirina vê gotinê, R. A. Torêyê dersdar dibêje:

> "Nava vê gotinê da av Ruhê Pîroz e. Dinîyayê tu cara nikaribe lezetê bide. Derheqa hemû tiştên şabûnê da, kîjan li vê dinîyayê hene, gerekê vî cûreyî bê gotinê: "Kî ku ji vê avê vexwe, ewê careke mayîn tî bibe". Hilbet, qewata Ruhê Pîroz heye, ku her xwestineke mêriv mîaser bike. Tenê Ruhê Pîroz dikare xwestina dilê mêriv mîaser bike.
>
> Heger hûn dilê xwe da cî bidine kanîya Ruhê Pîroz, hûnê tu cara tî nebin. Gelo bi şabûneke çawa Ruhê Pîroz ava Xwe ye sax kirîye nava gelek meriva! Gelo ev kanîya sax nava we da heye? Gelo ev kanî nehatîye sekinandinê? Gelo ew bona emirê heta–hetayê dikişe?".

Dora pirsên Torêy bifikirin: "Gelo nava min da ev kanîya sax heye, yan na? Gelo ewê yekê ez texmîn dikim, yan na? Heger na, wî çaxî

menî çî ye?”. Peyî wê yekê ra hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew nîşanî we bide, ku hûn çi dikarin bikin, ku her roj xwe pêşkêşî hevaltîya Wî bikin. Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku Ew elamî we dike.

Bi bêdengî nêzîkî Xudan bin /Yê ku Ruhê Pîroz e/. Hîvî bikin, ku Ew Xwe li we eyan bike, diha zêde, ne ku wek berê. Hîvî bikin, ku Ew hizkirinê, begemîyê û aşîtîya Xwe mînanî baranê li ser we da bibarîne. Lez nekevin. Rehet û bi cêribandî nas bikin, wekî Ew Ewe Xudan. Her tiştî çi ku ew dibêje we, binivîsin.

Hûn dikarin aza usa bin, çawa ku hûn hene, wî cûreyî nêzîkî Ruhê Pîroz bin. Ew bi temamî we nas dike. Carna hûn texmîn dikin, ku hûn nikarin “xwe bivînin”, lê Ew dikare nîşan bide, ku hûn “li kîderê ne”. Ew her dem nava we da dijî, ku qewatê bide we û rêberîyê li we bike. Her dem hûn dikarin berbirî Wî bin. Hûn nikarin Wî bidine westandinê, yan jî acizkirinê. Ew Hevalê weyî herî başe.

**Dua**

Ruhê Pîroz, texmînkirina Min, ya derheqa Te da, bide berfirehkirinê. Alî min bike, ku ez rola Te, ya çawa Piştovanê min bivînim. Alî min bike, ku ez tu cara hazirî, qewat, yan jî dengê Te, yê nava emirê min da, nedime sînorkirinê. Ez bona xwe, malbeta xwe û temamîya Civîna te dua dikim. Bi Navê Îsa, Amîn.

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz" çawa beşeke "Berevoka Mêsîncêr", ya dersa, lêkolîn dikin, em hîvî dikin ku hûn matêrîala vîdêoyêye 1–emîn temaşe bikin.*

1 I Emirê mesîhîtîyê *bêyî* Ruhê Pîroz ziha û bêqewat dibe. Eger usa ye, wî çaxî emirê meyî tevî Ruhê Pîroz gerekê çawa be? Niha awqas tiştên baş, yên ku emir bi Ruh va tijî kirine, bîr bînin, çiqas tên bîra we.

*Çimkî Xudan Ruhe û li kîderê Ruhê Xudan e, li wir jî azayî ye.*

– B Korintî 3:17, NLT

2 I Ruhê Pîroz şexsê bêsifet nîne, ne jî qewata xwedêtîyê ye. Ew Şexsê Xwedêtîyê ye, Yê ku bereketa Xwedê Yê Bav û Kur e. Gelo çi dibe, wextê ku Ruhê Pîroz çawa şexsê bêsifet, bêşikil, yan jî qewateke cuda qebûl dikin? Gelo çi feydayên baş pêşda tên, wextê ku Ruhê Pîroz çawa Xwedê qebûl dikin?

3 I Tevbûna Ruhê Pîroz bona bawermendên pêşin tiştekî herroje bû, lê niha ew yek bûye tiştekî kêm nava bawarmendên roja îroyîn da. Bi fikira we, çi îzinê nade ku em Ruhê Xwedê texmîn bikin, Wî bigerin, rêberîya Wî va girêdayî bin. Çend menîyên wî cûreyî nav bikin.

4 I Niha Îsa Mesîh li k'îderê ye? Heger hûn bawermendin, gelo Ew dilê we da dijî? Hûn çawa dikarin bi cûrê r'ast xilazbûna me û şêwira derheqa wê yekê da bînine ber çava, ku çawa Xwedê dilê we da dijî?

**Serwêr:** T'eslîmî endamên koma xwe bikin, ku van beşa bixwînin Marqos 16:19, Karên Şandîya 1:9–11, 7:55–56, Romayî 8:34, Kolosî 3:1 û Îbranî

1O:12–13 bona beşa vê pirsêye ewlin, paşê Romayî 8:9–1O, A Korintî 3:16, 6:12 û A Yûhenna 3:24 bona beşa mayîn bixwînin.

*Îsa bersiv da û gote wî: Heger yek Min hiz dike, gotina Min xweyî dike, Bavê Min wê wî hiz bike û emê bên, ku li cem wî bijîn.*

– Yûhenna 14:23

5 | Xudan Xwedê Yê me Yeke, lê sê pêşdahatinên Wî ye cuda– *Bav, Kur û Ruhê Pîroz hene*. Her şuxulkarîke Şexsê Xwedêtîyê ye hîmlî lêkolîn bikin û bînine ber çava, ku Ew bona mîaserkirina xwestina Xwedê çawa bi hev ra hevkarîyê dikin.

**Serwêr:** Teslîmî endamên koma xwe bikin, ku A Korintî 12:5–7, dîroka afirandinê nava Destpêbûn 1–ê da û gotinên Îsa ye nava Yûhenna 5:17, 19–2O–îda bixwînin.

Ruhê Bav Xwedê= Ruhê Îsa =Ruhê Pîroz

6 | Îsa got: wekî Ruhê Pîroz Piştovanê me ye, *paraklêtosê me*. Ew yek dide kivşê, wekî Ew "h*er dem* bona bûyîna li rex her kesî hatîye gazîkirinê, ku me hîn bike û bibe şêwirdarê meyî nava şuxulkarîya herroje ye tevî Xwedê". Gelo zanebûna derheqa vê yekê da çi cûreyî piştgirîyê dide we bona tevgirêdana herroje ye tevî Xwedê.

7 | Hûn tiştên nû ye çawa, yê Şexsê Ruhê Pîroz, divînin, derheqa kîjana da we pêşda nizanibûye? Zanebûna derheqa vê yekê da çawa çavên we vekirine û fikira we ye derheqa wê yekê da berfireh kirîye ku Ew nava emirê we da Kî ye?

## KIVŞKIRIN

## TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Ruhê Pîroz Şexsekî Xwedêtîyê ye, Yê ku bereketa Bav Xwedê û Kur Xwedê li ser Xwe dibe.
- Ew şexsê bêsifet û bêşikil, yan jî qewata xwedêtîyê nîne: Ew Xwedê ye.
- Ew bi wede yan jî bi têrîtorîyayê nayê sînorkirinê: Ew carekêra dikare tevî gelek meriva nava tevgirêdana da be û alî wan bike.
- Ew nava emirên bawermendên ewlin da bû. Roja îroyîn jî Ew gelekî dixweze nava emirên me da be.
- Bêyî Wî emirê mesîhîtîyê tune ye. Ew merivên ku hevaltîya Wî qebûl dikin, emirê tijîbûyî hîvîya wana ye.
- Bi xwe Wî nas bikin.

## 2

# ŞEXSÎTÎYA RUHÊ PÎROZ

*Kerema Xudan Îsa Mesîh, ya ecêb, hizkirina Xwedê û eleqeta Ruhê Pîroz tevî we hemûya be.*

–B Korintî 13:13, MSG

### Roja 1–emîn

Bona çêkirina eleqetên nêzîke tevî kesekî em pêşda gerekê bicedînin fem bikin, ku dilê wî da çi heye. Zanebûnên diha kûr derheqa wê yekê da lazimin, ku çi Wî xweş tên, çi xweş nayên, meremên Wî kîjanin. Ew yek wê alî me bike, ku em diha gelekî nêzîkî wî bin. Wî cûreyî jî em hazir dibin tevî Ruhê Pîroz bikevine nava eleqeta û pêşda em gerekê şexsîtîya Wî fem bikin.

Serê kitêbêyî pêşinda me gotinên Îsa xwendin: "…bona we hê rinde, ku ez herim. Heger ez neçim, Piştovan wê neyê cem we, lê heger ez herim, ezê Wî bişînime cem we" /Yûhenna 16:7/. Eva hema ew Îsa ye, Yê ku carekê got: "Ezê bi mesela wan ra xeber bidim: Ezê tiştên ji wextê afirandina dinîyayê da veşartî gilî bikim" /Metta 13:35, AMP/. Îsa, Yê ku dersdarê herî mezin e, Yê ku peyî çêbûna dinîyaêra tiştên veşartî elam kirin, dicêribîne peyîhatîyên Xwe ye here nêzîk bîne li ser wê fikirê, wekî ne ku Ew– Îsa, Yê ku bi bedena xwe va tevî wan bû, lê Ruhê Xwedê wê bibe hevalê bawermendayî herî baş. Ez nizanim hûn derheqa vê yekê da çi difikirin, lê ez dixwezim ku hûn derheqa femkirina gotinên Wî, derheqa Ruhê Pîroz da diha gelekî bizanibin.

Werin em B Korintî 13:13 bixwînin. Pawlos dinivîse: Kerema Îsa Mesîhê Xudan, hizkirina Xwedê û eleqeta Ruhê Pîroz tevî we hemûya be.

Pawlos rola her Şexsê Xwedêtîyêyî nava emirê me da dide kivşê. Ew bi vê nivîsarê destpê dike: "Kerema Îsa Mesîhê Xudan…". Çawa bawermend, em gerekê bîr nekin, wekî tabîya me ye raste li ber Xwedê,

kîjan kevirê enîşkê ye eleqetên tevî Ruhê Pîroz e, wê nebûya, heger kerema Îsa Mesîhê Xudan û Xilazkir nîbûya. Vê keremê meriv nikare qazanc bike û meriv nikare layîqî wê yekê bibe. Kerem pêşkêşa emirê Wî yî qewat e, bi kîjanê em baxşandinê, xilazbûnê û qewatê distînin.

Pawlos gotinê didomîne: "…û hizkirina Xwedê…". Wextê ku ez difikirim, ku ez çiqas gelekî kurên xwe hiz dikim, ez nikarim bînime ber çavê xwe, ku emirê min wê çawa bûya, heger tenê kurekî min hebûya. Feqet, heger ez bînime ber çavê xwe ku tenê kurekî min heye û wê yekê, wekî gerekê wî bişînim, ku ew bona dijminên min bimire, minê texmîn bikira, wekî ew yek tiştê bûyînê nîne. Em dijminên Xwedê bûn, wextê ku Ewî bêyî tu tiştî Kurê Xwe yî tek– tenê bona me da /Romayî 5:1O/. Gelo hizkirineke çawa ye? Gelo hûn şa nînin, wekî Bav we hiz dike? Raste, hûn dijminên Wî bûn, lê niha lawên Wî ne. Dêmek, Ewê çawa hizkirina Xwe bide? Ew we bi hizkirina tam hiz dike. Ez usa zarokên xwe hiz dikim, lê karebûna mine hizkirinê û şabûna mine bi wana, nikare himberî wê hizkirinê be, ku Xwedê himberî me dide kivşê. Gotina Wî elam dike: "…çimkî ez eseyî zanim, ku ne mirin, ne jîyan, ne milyaket, ne şexsek, ne tiştên hazir, ne tiştên wê bên, ne tu qewat, ne yên jorin, ne yên jêrin û ne jî afirînekî mayîn dikare hizkirina Xwedê ser me sar bike, ya ku bi destê Xudan Mesîh Îsa para me ketîye" /Romayî 8:38–39/. Gelo sozdayîneke çawa ye! Gelo hûn razî nînin, ku tu tişt nikare we ji hizkirina Bavê bide qetandinê.

Lê niha werin para B Korintî 13:13–ye xilazîyê bixwînin û bîra xwe da xweyî bikin, eva nama Pawlose xilazîyê ye, ya bona korintîya. Ev kitêb, kîjan bi rastî name ye bi zanebûn û eyantîya va tijî ye. Pawlos, bi rêberîya Ruhê Pîroz, vê gotinê bona xilazîya namê dibijêre: "Eleqeta Ruhê Pîroze tevî we hemûya be". Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos xebera "eleqet" Ruhê Pîroz va dide girêdanê. Ez li Civîna Katolîk mezin bûme û min ew xeber himberî nan û şerabê kirîye. Feqet eyan e, wekî nava vê gotinê da Pawlos bi wê fikirê nabêje. Eger em dîna xwe bidine orîjînala yûnanî, emê bibînin, wekî ew xeber bi yûnanî "koînonîa"–ye. Çend şirovekirinên vê xeberê min dîtine: "*eleqet, hevaltî, tevgirêdan, nêzîkbûn, hevkarî û hevaltîya nêzîk*". Eva navnîşeke gelekî dirêj e. Îzinê bidin, ku ez wana pareveyî ser sê k'omên hîmlî bikim:

- Tevgirêdan
- Hevkarî
- Hevaltîya nêzîk

## ELEQET TEVGIRÊDAN E

Nava ferhenga /xebername/–min da xebera tevgirêdan dide kivşê "eleqetî ya bi hevaltî, hevaltî". Hevalên nêzîk bi hev ra nava tevgirêdana da nin. Ew bi hev ra qise dikin, gilîyên xwe dibêjine hev û her dem derheqa şuxulên hev da ha ji pê hene.

Çawa ku min da kivşê, ez lîstika golfê gelekî hiz dikim. Ez wê lîstikê tevî çend hevalên xwe ye nêzîk dilîzim.Û em wextê lîstikê bi hev ra qise dikin. Ev cih, cihekî gelekî başe, li kîderê em wedê xwe derbas dikin, çimkî li vir tiştên usa tune ne, ku guhdarîya me bidine dûrxistinê. Lîstika tênîsê jî li ûnîvêrsîteyê gelekî min xweş dihat, lê pirs ew e, wekî wextê lîstika tênîsê min nikaribû tevî hevalên xwe qise bikira. Menîke hîmlî, ya bona lîstika golfê ew e, ku ez tevî hevalên xwe qise bikim, nava tevgirêdana da bim. Eleqetên mine here nêzîk li deşta golfê çê bûne. Awa li vê derê "tevgirêdana" min dixebite. Niha diqewime hûn fem dikin, ku ez bona çi *bi dil* dixwezim tevî jina xwe golfê bilîzim. Menî ew e, wekî li temamîya dinîyayê merivekî usa tune, tevî kîjanî ez bixwezim diha gelekî nava sohbetê da bim, çawa tevî wê.

Çend hevalên min yên here nêzîk endamên k'oma "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–ê ne. Em gelek cara derheqa nêt– merem, çetinayên xwe da xeber didin. Ez bi rastî xwe dispêrime cêribandin û hevaltîya wana. Ez nizanim,wekî bêyî vê koma baş ezê îro li kîderê bûma. Em her dem rastî hevdu tên. Bêyî wê yekê meyê nikaribûya mîsîya "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–ê mîaser bikira, meremê kîjanê hînkirin, pêragihîştin û xilazkirin e.

Kitêba Pîroz da eşkere tê kivşê, wekî şandî wê tevgirêdanê va girêdayî bûn, kîjan tevî Ruhê Pîroz hebû. Kitêba Karên Şandîya da nivîsare: "Û va ez bin destê Ruhê Pîroz da diçime Orşelîmê, wir wê çi bê serê min, ez nizanim. Tenê Ruhê Pîroz hemû bajara da temîyê dide min û dibêje, ku : "Qeyde û tengasî pêşîya te ne" /Karên Şandîya

2O:22,23/. Pawlos Ruhê Pîroz ra derheqa wê yekê da xeber dida, ku çi wê bê serê wî. Guhdarîyê bidine ser, wekî Ruhê Pîroz elam nekir, wekî hebs û zêrandin tenê li *bajarekî* benda wî bûn. Dewsa wê yekê, çawa ku Pawlos her dem tevî Ruhê Pîroz nava tevgirêdana da bû, zanibû, wekî *li hemû bajara* çetinayî pêşîya wîn e, kuda ew diçû.

Ez nizanim hûn çawa, lê heger hevalkarê min, tevî kîjanî ez nava eleqetên nêzîk da me, bigota min, ku ez herime kîderê zêrandin hîvîya min in, diqewime ez miqabilî wî derketama. Diqewime min bigota: “Te hela hê fikira xwe neguhartîye?”, yan: “Lê heger em gotinên te hinekî biguhêrin?”, yan: “Ne hewce ye, ku em dewsa wan zêrandina çend tiştên sivik daynin?”. Ruhê Pîroz bi wê menîyê şa nabe, wekî zêrandin hîvîya Pawlos bûn. Dewsa wê yekê Ewî Pawlos bona wî hemû tiştî hazir dikir, çi ku pêşîya wî bûn. Û Ewî dikaribû ew yek bikira, çimkî eleqetên wan yên nêzîk bûn.

Carna Ruhê Pîroz tiştên usa gotine min, kîjan min nexwestine guhdar bikim. Min ser hev derheqa wan tişta da, çi ku min bihîstîye, pirs didane Wî, bi wê gumanê, wekî ezê cabê bistînim. Lê min her car dîsa ew cab distend. Wextê ku em wî cûreyî nêzîkî Ruhê Pîroz dibin, bi kutasî Ew xwe ker dike. Tê bêjî ew dixweze bêje: “Min îdî zelal gotîye te. Niha tu gerekê qerar bikî, ku gelo tê gotinên Min qebûl bikî, yan na”. Wextê ku hûn Ruhê Pîroz ra nêzîk in, carna Ewê tiştên usa bêje we, kîjana hûnê nexwezin guhdar bikin.

Beşa kitêba Karên Şandîyaye 1O–a da Petrûs gotineke usa ji Ruhê Pîroz stend. Xwedê nîşanî Petrûs kir, wekî Ew dixweze xilazbûnê usa jî bide necihûya. Gotina 12–a da nivîsar e: “Petrûs hê ser wê dîtinokê difikirî, Ruh jêra got: “Va, ne sê merî li te digerin”. Ew meriv hatibûn, ku rêberîyê Petrûs bikin, hetanî mala serwêrê necihû. Çawa cihû Petrûsê tu cara neçûya li wir. Bo wê yekê jî, Ruhê Pîroz zelal gote wî: “De îdî rabe, here xwarê û dudilî nebe, tevî wan here, çimkî min ewana şandine”. Ruhê Pîroz zanibû, wekî Petrûsê bi şabûn ew yek qebûl nekira, lê Ewî teslîmî Petrûs kir ku bêyî şirovekirinên zêde wê yekê bike, çi ku Ewî dixwest.

Pêşîya wê yekê em dîsa meseleke usa divînin, li kîderê hewcetî hebû, ku îtbarîya xwe Ruhê Pîroz bînin. “Hingê *milyaketekî* Xudan Fîlîpî ra

got: “Rabe, here alîyê Başûr, ser wê rîya ku ji Orşelîmê berjêrî Xezeyê dibe”, ku çol– bestek bû” /Karên Şandîya 8:26/. Li vira nivîsare, wekî Xudan wî cûreyî teslîmî Fîlîpî kir. Li vir nivîsar nîne, wekî li ber Fîlîpî milyaketek *sekinî*: Dewsê nivîsar e: “Milyaketê Xudan Fîlîpî ra *xeber da”*. Ev beşa nivîsarê nava hemû tercima da cûrekî hatîye nivîsarê. Bona çi ev tişt girînge? Ji vê beşê em dikarin bên ser wê fikirê, wekî Fîlîpî dengê milyaketa ji dengê Ruhê Pîroz cuda dikir, çimkî hema wî serê kitêbê da dîsa nivîsar e: “Ruh Fîlîpî ra got: “Pêşda here û rex erebê va here” /Karên Şandîya 8:29/. Fîlîpî dengê Ruhê Pîroz nas dikir û ewî dengê milyaketa ji dengê Ruh cuda dikir.

Ez awqas zelal dengê jina xwe nas dikim û dikarim li her dera dengê wê ji yên mayîn başqe bikim, heger wê nevînim jî. Diqewime em serake tijî da ji hev dûr bin jî, lê wextê ku ew xeber bide, ezê dengê wê nas bikim. Bi vî cûreyî bawermendên ewlin dengê Ruh nas dikirin. Dikarim bînime ber çavê xwe, ku Fîlîpî çawa ev serhatî Lûqa ra gilî dikir, yê ku kitêba Karên Şandîya dinivîsî. Diqewime Fîlîpî digot: “Na, Lûqa, ew Ruh nîbû, ku li bajêr min ra xeber bida. Yê ku xeber dida, milyaket bû. Feqet Ruh gote min ku ez nêzîkbim”. Gelo em bi wê astê dengê Wî nas dikin? Diqewime hevaltîya diha mezin tevî Ruh heye, kîjan hela hê li cem me tune ye?

Wextê ku Fîlîpî li qûmistanê bû, Ruhê Pîroz gote wî, ku ew nêzîkî erebê bibe. Gelo ew rasthatin bo çi girîng bû? Merivê erebê da rûniştî, merivê Yêtovpîaêyî sisîya bû. Xilazbûna wî merivî bû destpêka belabûna Kitêba Pîroze li welatê wî merivî, bi saya serkarîyê û hukum. Heger Fîlîpî rêberîya Ruh texmîn nekira, ewê mecaleke mezin ji destê xwe berda.

Çend beşa şûnda em serhatîke mayîn, ya derheqa Tîmotêyo, Pawlos û Sîlas da divînin.

> Nava sînorên Firîgya û Galatayê da gerîyam, çimkî Ruhê Pîroz nehişt, ku qeza Asîayê da xebera Xwedê bêjin. Gava nêzîkî Mîsyayê bûn, kirin ku herine Bîtênayê, lê Ruhê Îsa îzin neda /Karên Şandîya 16:6–7/.

Guhdarîyê bidine ser: nivîsar e, wekî ew “hatine qedexekirinê” ji alîyê Ruhê Pîroz da û wekî “Ruh îzin neda wan”.

Gelo hûn destpê dikin fem bikin, wekî ev bawermendên ewlin çiqas gelekî tevî Ruhê Pîroz diketine nava tevgirêdanê? Gelo îro hemû tişt gerekê cûrekî mayînbe? Gelo mecala qulixa bona Xwedê, ya diha baştir heye, ne ku rêberbûna bi Ruhê Pîroz? Gelo mêtodên rêberên Civîna Ewlin bi wê yekê diha gelekî sade bûn, ku têxnologîayên wedê niha tune bûn? Ew rêber hîvîyê bûn, ku Ruh tevî emirên wan bibe. Wana hazirîya Wî silav dikirin û bi qedir nêzîkî Wî dibûn. Tu tişt nehatîye guhastinê. Roja îroyîn Ru dixweze ku tevgirêdana Wî tevî me hebe.

Meriv çawa dikare texmîn bike, wekî ez û Lîza li malê roja tevî hev derbaz bikin, lê tu xeberekê nebêjine hev. Ewê bibûya tiştekî pêkenînê. Kî wê bixweze, ku zewaca wî wî cûreyî be? Ez jina xwe hiz dikim û dixwezim her dem tevî wê nava hevaltîya nêzîk da bim. Ji 3O–î salî zêdeti re, ku em zewicîne û eger ew mêrkirî nîbûya /şikir ji Xwedê, wekî usa nîne/ ezê her dem bengîyî li ser wê bûma. Ew li dinîyayê meriva tek– tenê ye, tevî kîjanê ez ji gişka zeftir dixwezim nava tevgirêdanê da bim. Hema wî cûreyî jî Ruhê Pîroz dixweze tevî we nava hevaltîya nêzîk da be.

Eva serê 24–sala ye, ku ez car tê, li odên mêvanxana şevên xwe derbas dikim û ez tu cara aciz nebûme. Ez çawa dikarim aciz bim, wextê ku her deqe ez tevî Xwedê me? Ew li oda min e, tevî min. Bo wê yekê jî ew wedê ku ez mêvanxanê da me, parastîye. Gelek cara ez dibêjim: “Ez naxwezim wede tevî koma xweye rêwîtîyê derbas bikim. Ez dixwezim başqe bim ku tevî Ruhê Pîroz bikevime nava tevgirêdanê”. Ez hiz dikim Wî guhdar bikim. Min şaş fem nekin. Ez nabêjim, ku tevgirêdana tevî meriva min xweş nayê. Bi rastî, ez tevî meriva nava tevgirêdana da me. Ez meriva gelekî hiz dikim, lê ez qîmetê didime wedê xwe, wextê ku wî wedeyî tevî Ruhê Pîroz derbas dikim.

## Roja 2–emîn

# ELEQET HEVKARÎYÊ DIDE KIVŞÊ

Xebera mayîn, ya bona şirovekirina “koînonîa”–ê hevkarîye. Mesela xebera “hevkarî” em kitêba Lûqa da divînin: “Û gava usa kirin, awqas mesî ketinê, ku torên wan diqetîyan. Û bi nîşana gazî *hevalên* xweye qeyika din da dikirin, ku bên alî wan bikin. Û ewana hatin, her du qeyik jî tijî kirin, hindik mabû nuqû bûna” /Lûqa 5:6–7/. “Xebera “heval” yûnanîda “mêtokos”–e, kîjan tê şirovekirinê çawa “hevalkar, hevalê ku tevî wî kar dike”. Ew merivana hevalkar bûn. Ji mesela wana em fem dikin, wekî bona hevkarîya açix him tevgirêdan û him jî şuxulkarî lazim in. Wana gerekê nîşanî hevalkarên xwe bikirana, lê yên mayîn jî gerekê bona alîkirinê bihatana.

Niha werin em gotinekê bixwînin,, kîjan diqewime nava Kitêba Nû da, ya here bi xof e. Pawlos dinivîse: “Em hevalkarên Xwedê ne” /A Korintî 3:9/. Gelo tiştê ecêbmayînê nine? Ev gotin bi tercima Vêymût min xweş tê: “Em hevalkarên tevî Xwedê û bona Xwedê ne”. Mecal hatîye dayînê, ku tevî û bona afirandarên ezmîn û dinîyayê bixebitin. Vê rastîyê meriv dikare cûrekî mayîn bêje: em *bi hevkarîya tevî Xwedê dixebitin.*

Hevalkarên kardar hîn dibin, ku gelekî six tevî hev hevkarîyê bikin. Ez li ber gola Mîçîganê mezin bûme û min gelek wede pêşkêşî qeyikajotinê kirîye. Min bi hizkirin qeyika malbeta me diajot. Xêncî wê yekê ez çûme mekteba qeyikajotinê û gelek cara tevî lehca jî bûme. Carekê ji min hîvî kirin, ku ez tevî koma kapîtanekî eyan bixebitim, koma kîjanî yeke baş bû. Endamên komê hîvîya min bûn. Wextê qeyikajotina ewlin min xwe zêde texmîn dikir. Kapîtan emir dikir û koma wî jî anegorî gotinên wî dixebitî. Ez li wir şaş bibûm, çimkî ez hela hê hînî rola xwe nebibûm. Endamên komêye mayîn mînanî merivekî, bi hev ra nava şuxulkarîyê da bûn û ez gerekê hînî wê yekê bûma.

Hevkarîya tevî Ruhê Pîroz mînanî bûyîna endamê wê komê ye. Hûn gerekê tevî Wî bixebitin. Wextê qulixa min a ewlin , jina min û hevala wê cêrga ewlin da xewra çûn. Menî ew bû, wekî min hevkarî tevî Ruhê Pîroz nedikir. Hinek wede şûnda, wextê ku ez hînî hevkarîya tevî Wî

bûm, îdî min karê xwe pêşda dibir. Wextê ku min destpê kir kitêba binivîsim, dîsa ew tişt qewimî. Kitêba xweye ewlin min nav salekê da nivîsî. Rast e, usa min xweş nedihat, lê ez hîn dibûm tevî Wî hevkarîyê bikim. Paşê min destpê kir diha hêsa û lez binivîsim. Ez pê hesîyam, wekî nava van her du goveka da jî rola Wî heye. Lê usa jî rola min heye. Hevkarîya tevayî jî xwestina Wî ye.

Nava beşa Karên Şandîaye 15–a da em cûrekî hevkarîyê divînin. Şandîya name dinivîsîn, kîjan gerekê bawermendên necihûra bişandana. Wana nivîsî: "Li Ruhê Pîroz xweş hat, usa jî li me…" /Karên Şandîya 15:28/. Awa, çi cûreyî ye hevkarî. Van rêbera fikira Ruhê Pîroz û usa jî fikira xwe derheqa vê pirsê da zelal bela kirin. Her du alîya jî tevayî qerar qebûl kirin. Rolên her du alîya jî hebûn. Nava karê padişatîya Xwedê da ew hevalkar bûn.

Bîr– bawerîya hevkarîyêye wî cûreyî meriv usa jî dikare Kitêba Kevin da bibîne. Bîr bînin, wextê ku Xwedê li ber darên gûza hate cem Birahîm /Destpêbûn 18/. Tiştekî kivşe, wekî Xwedê Birahîm çawa hevalkarê Xwe qebûl dikir. Xwedê û Birahîm bi gerê çûn û hilkişîyane ser zinarekî û Xwedê got: "Ez bi rastî dixwezim van her du bajara biteqînim. Tê çi bêjî, Birahîm?". Birahîm gelekî xemgîn bû, çimkî pismamekî wî li bajarekî dima. Peyî gelek guvtugokirina ra, bi kutasî ewî usa kir, ku Xwedê wan bajara xirab neke, heger li her bajarekîda deh merivên heq bidîtana.

Tiştekî ber cava ye, wekî emekê Birahîm ji alîyê Xwedê da hate qîmetkirinê. Nava Destpêbûn 18:17–da Ew dibêje: "Gelo ezê wan tiştên ku ezê bikim ji Birahîm veşêrim?". Em divînin, wekî Xwedê dixwest ku haya Birahîm ji bernamên Wî hebe. Menî ew bû, wekî Birahîm hevkarîya gelekî nêzîk tevî Xwedê dikir.

Tiştekî usa nava emirê Mûsa da qewimî. Xwedê gote Mûsa: "Niha bihêle, ku ez hêrsa xwe li ser wana da birêjim, qira wan bînim. Lê ez te bikime miletekî mezin" /Derketin 32:1O/. Bi bihîstina vê yekê, Mûsa destpê kir lava bike, ku Xwedê bernama Xwe biguhêre û hêrsa Wî jî dayne. Roja îroyîn em bi hêsanî vê beşê dixwînin û kemalê nadine vê yekê, ku çi qewimî. Feqet bifikirin: Mûsa dikaribû banîya bîra Xwedê, ku bona Wî û cimeta Wî çi baş bû, hela serbara serda peyî wê yekê ra,

wextê ku Xwedê got: “Niha bihêle, ku ez…”. Menî ew bû, wekî Mûsa tevî Xwedê nava hevkarîyê da bû.

Çawa jî hebe, ew yek girîng e, ku em fem bikin, wekî Xwedê her tiştî dikare bike û Ew her dem layîqî xofa me ye. Tenê bi şikirî û qewata Wî ye, ku em dikarin bibine hevalkarên Wî. Ewî qerar kirîye, me bike parçekî bernama Xweye ezmîn û bi qirara wê yekê Ewî rê daye me.

Me du serhatîyên ji Kitêba Kevin anîne ber çava, lê gilî derheqa wê yekê da ye, wekî Birahîm û Mûsa wî çaxî ne xweyê wan tişta bûn, çi ku îro yên me ne. Mezinên vê bawerîyê dikaribûn tevî Xwedê nava hevkarîyê da bûna. Çawa jî hebe Ruhê Pîroz nava me da ye. Hewce nîne, ku em li ber darên gûza hîvîya Wî bin, yan jî em hilkişine çîyayê Sînayê, ku tevî Wî bikevine nava tevgirêdanê. Ew bona me her dem li vir e. Ya here girîng ew e, wekî Ew dixweze tevî me hevkarîyê bike. Ew dixweze rêberîyê gavên me bike û guhdar bike, ku em çi difikirin.

Ruh her dem nava me da ye û xêncî wê yekê Ew tu cara ranazê. Van axirîya, şev, seheta duda derbas 2O deqe, ez hişyar bûm û ez ji şabûnê nikaribûm razama, çimkî rojtira mayîn min gerekê nava temamîya rojê da qulix bikira. Ez ji nava ciha rabûm û min tevî Hevalkarê xwe xeberda. Hûn zanin, ku ew hişyar bû? Tiştê ecêbmayînê ye! Ewî negot: “Con te çima ez hişyar kirim?”. Heger min bicêribanda jina xwe ra xeber bida, ewê bigota: “Con, bo çi te ez awqas zû hişyar kirim?” Heger min bersiva wê vî cûreyî bida: “Min awqasî dixwest tevî te qise bikira”, ewê bi texmîn bi belgî min xista. Ew wedê razana xwe qîmet dike û ez zanim, ku gerekê wê hişyar nekim. Feqet Ruhê Pîroz min her wedeyî qebûl dike. Ew dixweze tevî min Roja Nû guvtugo bike û carna hinek tişta nîşanî min dide, çi ku gerekê wê rojê biqewime. Ev e menî, ku ez hiz dikim her rojeke xwe bi hazirîya Wî derbas bikim. Ew hevalkarê min e û eleqeta me beşeke roja min a girîng e.

Ew yek jî girîng e, ku bê kivşkirinê, ku Ruhê Pîroz nava vê eleqetê da Hevalkarê mezin e. Pawlos gote serwêrê Civîna Efesîya: “Niha miqatî xwe û temamîya wî kerê pêz bin, ku Ruhê Pîroz hûn ser berpirsîyar kivş kirine. Şivantîyê li civîna Xwedê bikin, ya ku Wî bi xwîna Xwe qazanc kir” /Karên Şandîya 2O:28/. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos got: “…wî kerê pêz, ku Ruhê Pîroz ser berpirsîyar kivş kirine…”. Ev

gotin hevkarîya Îsa a tevî Ruhê Pîroz dide kivşê. Îsa Civîna Xwedê bi “xwîna Xwe” kir’î. Ruhê Pîroz, çawa Şexsê Xwedêtîyê, Yê ku niha li ser dinîyayê dijî, berpirsîyarên Civînê kivş dike û serwêrîyê karên Civînê dike. Ew serwêr e, bi gilîkî mayîn Hevalkarê mezin e. Pawlos derheqa wê yekê da baş zanibû, wekî Ruhê Pîroz tevî me û nava me da dijî.

Meseleke vî cûreyî meriv dikare Karên Şandîya 13–a da bivîne: “Evana ku nava hebandina Xudan da bûn û rojî digirtin, Ruhê Pîroz wan ra got: “Barnabas û Şawûl min ra bona wî şuxulê ku min gazî wan kirîye, cuda bikin… Awa evana ku ji Ruhê Pîroz hatine şandinê, berjêrî Sêlûkyayê bûn û ji wir bi gemîyê derbazî Qibrisê bûn” /Gotinên 2 û 4/. Careke mayîn nava vê meselê da Ruhê Pîroz hevkarî tevî şandîya dikir. Bîr bînin, wekî Îsa tevî Bavê Xwe li ezmîne. Ruhê Pîroz hate şandinê, ku tevî me nava vî emirî da hevkarîyê bike.

## Roja 3–emîn

# HEVALTÎYA NÊZÎK

Werin em carekê jî B Korintî 13:13 bixwînin: “Kerema Xudan Îsa Mesîh, hizkirina Xwedê û eleqeta Ruhê Pîroz tevî we hemûya be”. Niha, wextê ku me *eleqeta* Ruhê Pîroz çawa *tevgirêdan* û *hevkarî* şirove kir, destpê bikin vê gotinê anegorî wan her du xebera qebûl bikin, kîjan me lêkolîn kirin. Gelo hûn niha destpê dikin mezinaya gotina Pawlos fem bikin? Lê ev hela hê tam nîne. Xebera *koînonîa* jî bi fikira “hevaltîya nêzîk”–e.

Ez koma “Bîtilz”–ê bîr tînim. Wextê ku ez hela hê cahil bûm û kesekî navê Pol Makkartnî digot, min carekê ra endamên komêye mayîn– Con Lênon, Corc Harîson û Rîngo Star bîr dianîn. Wî çaxî ez derheqa wan da nedifikirîm, çawa merivên cuda–cuda. Ew awqasî *koma “Bîtilz” bûn.*

Meseleke hevaltîya nêzîk jî fîlmek e, li kîderê sê meriv bi hev ra hevaltîke nêzîk dikirin. Her kadreke fîlmê da hersê heval jî tevayî kar dikin û tevbûna tevî yekî wê meriva ra cûrekî mayîn bihata kivşê. Ew her sê meriv jî bi hev va girêdayî bûn.

Wextê ku ez derheqa wan meriva da difikirim, yên ku tevî Ruhê

Pîroz nava hevaltîya nêzîk da nin, berê ewlin doktor Dêyvîd Yonggî Ço tê bîra min. Doktor Ço serwêrê civîneke dinîaêye here mezin e. Ezê tu cara bîr nekim, wextê ku salêd 198O–êyî ez cara ewlin rastî wî hatim. Ew cara ewlin li wê civînê diqesidî, endamekî kîjanê jî ez bûm. Min civînê da kar dikir û ew yek dikete nava borcdarîyên min, ku ez mêvana pêşwazî bikim. Hetanî rasthatina tevî doktor Ço, ew îdî çend sal bûn, ku ez nava qulixêda bûm û pêşda min êdî gelek serwêr û mêvanên cuda pêşwazî kiribûn. Çawa jî hebe, rasthatina min, ya tevî doktor Ço cuda bû. Wextê ku Ew avtomaşîna min siwar bû, hazirîya Xudan tevî wî kete hundur. Ez giriyam, hêsir li ser sûretê min ra dikişiyan. Min cêriband ker bimînim, çimkî min nedixwest hetanî destpêka qulixê nerehetîyê bidime wî, lê paşê min xwe zeft nekir. Min bi dengekî germ gote wî:

–Doktor Ço, Xwedê li vir e, avtomaşîna me da ye.

Ew kenîya û serê xwe hejand:

–Ez zanim.

Ew çi ku qewimî, bona min tiştekî normal e, wextê ku ez bîr tînim, ku doktor Ço çiqas derheqa eleqeta tevî Ruhê Pîroz nivîsîye û gotîye. Min bihîstîye, ku çawa ew rojê ji duda hetanî çar seheta dua dike, hîmlî bi Ruh. Doktor Ço derbazkirina wedê başe tevî Ruhê Pîroz çawa pirsa ewlin hesab dike. Bo wê yekê jî hazirîya Xwedê nava emirê wî da bi qewat tê kivşê.

Çend sal pêşda derheqa Ruhê Pîroz da min li civîneke mezin xeber dida. Ewê êvarê, wextê ku em paşda vegerîyane civînê, bona derbaskirina qulixê, min gerekê nava 45 deqa da, peyî pesindayînê ra, hîn bikira. Dewsê Ruhê Pîroz destpê kir kar bike: meriv qenc dibûn û xilaz dibûn. Nava du sehetada min nikaribû mîkrofon hilda destê xwe. Bi gilîkî, wextê ku ez hilkişyame ser dikê, serwêrê civînê, çavê kîjanîda hêsir bûn, nêzîkî min bû û got:

–Con, nava heyşt sala da, çiqas min li vê civînê rêberî kirîye, min awqas bi qewat hazirîya Xwedê texmîn nekirîye.

Min carekê ra bersiva wî da:

–Menî ew e, wekî îro şebeqê me derheqa Ruhê Pîroz da xeberda. Wextê ku derheqa Wî da xeber didî, Ew îdî hazir e.

Ev mesele dide kivşê, ku wê çawa bibe, heger em, bawermend tevî Ruh nava hevaltîya nêzîk da bin.

## ELEQET NÊZÎKBÛNÊ DIDE KIVŞÊ.

Fikira xebera *koînonîa*–êye xilazîyê "hevaltîya nêzîk"–e, kîjan bi rastî, diha gelekî anegorî gotina B Korintî 13:13–ye. Hevaltîya nêzîk dikare bi saya eleqetê, yan jî tevgirêdana bighîje, lê ew diha zêde ye, ne ku ev her du. Hevaltîya nêzîk eleqeta kûr e, kîjan fikir, sur û xwestinên dil dike nava xwe.

Nava tercima Kitêba Pîroze bi navê "Berbirîbûn"–da /MGS/ nivîsar e: "Eleqeta Ruhê Pîroz tevî we hemûya be" /B Korintî 13:13/. Bona min hevaltîya nêzîk dereca hevaltîyêye here kûr e. Tu cara bîr nekin, ku Ruhê Pîroz dixweze bibe hevalê we. Ew dixweze tevî we nava heleqetîyada be. Nava Aqûb 4:5–da nivîsar e: "…ku Xwedê demana wî ruhê ber me da ye?". Ew dixweze wede û guhdarîya we bistîne. Bifikirin, wekî Ruhê Pîroz Xwedê ye û ji Wî tu tişt veşartî nîne. Ulm, îman û kerema Wî bê sînor in. Û Ew dixweze Xwe elamî we bike. Wextê ku ez zanim, ku tiştek qîmetlû yan jî girîng e, ez bi dil dixwezim derheqa wê yekê da tevî hevalên xwe ye nêzîk xeberdim. Ev yek usa jî derheqa we da ye.

Gelek cara bawermend dicêribînin bêyî tevgirêdana tevî Ruhê Pîroz nêzîkî Îsa bin. Eva mînanî şaşîya fêrisîyaye. Wana digot: "Hûn kirên Bavê xwe dikin. Hingê wî ra gotin: "Em rîya zinêkarîyê da dinê neketine. Bavekî me heye, ew jî Xwedê ye. Îsa wan ra got: "Heger Xwedê Bavê we bûya, weyê Ez hiz bikirama, çimkî Ez ji cem Xwedê rabûm, hatime li vir. Ez ne ku xwe serî xwe hatime, lê Ewî ez şandime"" /Yûhenna 8:41–42, NIV/. Fêrisîya dixwest bêyî Îsa tevî Bavê biketana nava tevgirêdanê. Wana nedixwest qebûl bikira, ku bernama Xwedê a başqe hebû. Îsa fêrisîya ra şirove kir, wekî Ew û Bavê Wî yek in. Hê dereng Ewî got: "Eger hûn bi rastî Min nas bikin, hûnê usa jî Bavê Min nas bikin" /Yûhenna 14:7/. Feqet fêrisîya nexwestin guhdarîya Wî bikin. Wana nedixwest, bi saya Kur nêzîkî Bavê bûna, eleqeta wane rast, ya tevî Bavê tune bû.

Hema bi wî cûreyî, Îsa zelal me ra dide kivşê, ku Ew îdî li ser dinîyayê nîne û Bavê Ruhê Pîroz şand bona ku Ew bibe Piştovanê

me /Yûhenna 16:7/. Ruh bona elamkirina Îsa hate şandinê, çawa ku Kur hatibû şandinê bona eyankirina Bavê. Ruhê zelal Îsa li we bide eyankirinê. Feqet Ruhê Pîroz wê tenê li wê derê hazir be, li kîderê Ew qedir distîne. Wextê ku em qedirê Ruh bigrin, Ewê Xwe elamî me bike. Wî çaxî emê him hazirîya Wî texmîn bikin û him jî ulmê kûr ê derheqa Wî da bistînin, Kîjanî Ew e'lam dike.

Nava qulixê da, nava 3O sala da, min ji vê rastîyê tu cara cudatî nedîtîye, wekî ew merivên ku ji nêzîk va Îsa nas dikin, Ew tevî Ruhê Pîroz gelekî nêzîkin. Eva tiştekî normal e, çimkî Ruh Îsa eyan dike.

## ŞEXSÎTÎYA RUH FEM BIKIN

Heger em dixwezin tevî kesekî nava hevaltîya nêzîk da bin, emê bicedînin şexsîtîya wî nas bikin. Wî çaxî tevgirêdana me a tevî wî wê diha dewlemend be, lê nêzîkbûna tevî wî wê diha kûr be.

Wedekî dirêj ez wî cûreyî nêzîkî her çar kurên xwe dibûm.Nava nêzîkbûna wî cûreyî da pirsgirêk /problêm/ pêşda hatin. Gelo bona çi ew cûrê terbetdarîyê kardar nîne. Çimkî her kurekî min şexsîtîke cuda ye. Jina min nava vê pirsê da cûrekî mayîn difikirî û ewê ez hîn kirim, ku çawa firqîya di navbera wana da hesab hildim. Wextê ku min destpê kir cudatîyên kurên xwe fem bikim, tevgirêdanên min ê tevî wan baştir bûn.

Ez tevî jina xwe gelekî nêzîkim û dikarim fem bikim, ku ew çawa xeber dide. Em awqas nêzîk bûne, çimkî ji 3O–î salî zêdetir e, ku me hev stendîye, lê nêzîkbûn jî feydayê derbaskirina wedê baş e. Lîza dikare carekê li min binihêre û ez dikarim bi rûpela derheqa wê yekê da binivîsim, ku ew çi dixweze bêje. Wekî mayîn jî ez îdî zanim, ku Lîza bêyî gotin çi dixweze bêje. Eger we bigota min: “Con, ezê şebeqê goştê qelandî, hêka û savarê kelandî bidime we”, ez dikarim li ser xwe guman bêjim: “Hûn zanin, Lîzayê goştê qelandî û savar nexweze”. Hewcetî wê tune bûya, ku derheqa wê yekê da ji wê bipirsîyana. Ez zanim, wekî ew tişt wê Lîzayê xweş nayên. Eva meseleke gelekî tomerî ye, lê nava pirsên şexsî da ew tişt diha rast e. Hevaltîya nêzîk a wî cûreyî rojekê da nehatîye destanînê. Ew nava sala da çê bûye, bi derbaskirina wedê tevayî û nava tevgirêdana da. Ji min baştir tu kes xeysetê jina min nizane

û ji jina min baştir tu kes xeysetê min nizane. Hema wî cûreyî jî em diha gelekî û gelekî Ruhê Pîroz nas dikin, wextê ku em qerar dikin tevî Wî bikevine nava eleqeta û wedê xwe nava hazirîya Wî da derbaz bikin.

### Roja 4–emîn

## TEBYETA WÎ NAS BIKIN

Nava beşên Yûhenna 14:16–a da Îsa xeberên "Ew", "Wî" 19 cara dide xebatê, wextê ku Ew derheqa Ruhê Pîroz da xeber dide. Kivş e, Ruhê Pîroz Şexs e. Ez careke mayîn Wî çawa Şexs nav dikim, lê Wî çawa meriv nav nakim. Bîr bînin, wekî meriv mînanî Xwedê hatine çêkirinê. Ev yek dide kivşê, wekî cudatîyên "şexsekî" berê ewlin wê yekê didine kivşê, çi ku nava Xwedê da heye, lê Xwedê hema rast mînanî me nîne. Li cem Wî cudatîyên usa hene, kîjan nikarin "qalibê" mêriv da cîwar bin.

Van axirîya min tiştek texmîn kir, kîjan bi rastî alî min dike, ku ez tevî Ruhê Pîroz nava tevgirêdana da bim. Min ew xeber lêkolîn dikirin, kîjan nava Kitêba Nû da, zimanê yûnanî da, derheqa Ruhê Pîroz da nin. Min dît, wekî ew xebera yûnanî, kîjan gelek cara bona navkirina Ruhê Pîroz tê xebitandinê, ya qismê nêytral e /ne yê mêr e, ne jî yê jinê ye/. Bi rastî wê xeberê dikarin bona her du qisma jî bidine xebatê û ew xeber derheqa tenê şexsekî da ne.

Nava zimanê înglîzî da xebera usa tune. Mesele, xebera "he" qismê mêr dide kivşê, lê ya "she" ya jinê. Înglîzî da xebera wî cûreyîye nêytral tune, kîjan bikaribe bi xeberekê him qismê mêr, him qismê jinê bide kivşê. Yûnanî da xebera vî cûreyî heye û ew gelek cara wî çaxî tê xebitandinê, wextê ku gilî derheqa Ruhê Pîroz da ye. Ev xeber derheqa şexsê sax da ye.

Cudatîke vî cûreyî usa jî Kitêba Kevin da heye. Nava nivîsarên bi zimanê cihûîya xeber gelek cara rastî mêriv tên, wextê ku şuxulkarîya derheqa Ruhê Pîroz da çawa ji alîyê qismê jinê da tê raberkirinê. Nava kitêba Pîrozda Rhê Pîroz tu cîya nehatîye raberkirinê çawa şexsê jinê, lê ji hinek şuxulkarîya cudatîyên wî cûreyî hene.

Eva têmake gelekî kûr e, kîjanê ez nikarim bi hûrgilî nava vê kitêbê da raber bikim, lê îzinê bidin, ku ez gelekî zelal vê yekê bêjim, ku ez nafikirim, ku Ruhê Pîroz ji qismê jinê ye. Hene meriv, kîjan tiştên vî cûreyî hîn dikin, lê bi fikira min ev dersa bêhîm e û feydayê qebûlkirineke başqe ye. Hîvî dikim vê femdarîyê ji fikira xwe dûrxin. Ruhê Pîroz xwedê ya jin nîne.

Ez dixwezim vê yekê bêjim. Em gerekê bîra xwe da xweyî bikin, wekî Xwedê bi şikilê me çê nebûye, lê em bi şikilê Wî çê bûne. Ez zanim, wekî ev rastî primitive e, lê bona lêkolînkirina me gelekî girîng e. Destpêbûn 1:27–da nivîsar e: “Xwedê merî dilqê xwe da xuliqand, dilqê Xwedê da ew xuliqand, qismê nêr û mêr xuliqand” /NLT/. Nava tercimên başqe da nivîsar e: “Xwedê merî çê kir”, yan jî “merivatî”. Bi fikira min “meriv” yan jî “merivatî” cûrê tercimêyî here başin. Kitêba Destpêbûnê da em divînin, wekî Xwedê mêr û jin bi *şikilê Xwe* çê kirin. Em gerekê vê pirsê bidin: eger Ewî him jin, him jî mêr bi şikilê Xwe çê kirin, wî çaxî ew yek nade kivşê, wekî cudatîyên girêdayî jinê ra dîsa ji alîyê Xwedê da hatine çêkirinê? Gelo diqewime Şexsîtîya Ruhê Pîroz ji fikira me a derheqa qismê mêr, yan jî jinê da zêdetir e? Gerekê usa be, çimkî him jin, him jî mêr bi şikilê Xwedê hatine çêkirinê.

Ez guman im, wekî we texmîn kirîye, wekî bi xeberdana derheqa Ruhê Pîroz da, ez her dem derheqa qismê mêr da didime kivşê û ezê wî cûreyî jî bidomînim. Fikira derheqa wê yekê da, wekî hinek cudatî hene, kîjan dikarin ji alîyê ziman da çawa qismê jinê bînine ber çava, gelekî cetin e û dikare mêriv bike nava şaşîyê. Min derheqa wê yekê da bi meremekî mexsûs nivîsî. Minê ev têma nekira nava vê kitêbê, heger min hesab nekira, wekî bi zanebûna derheqa vê yekê da hûnê bikaribin diha baş Ruhê Pîroz fem bikin û tevî Wî bikevine nava hevaltîya gelekî nêzîk.

## EW GELEKÎ NERM Û NAZIK E

Îzinê bidin, ku ez hinekî ji emirê xwe ê derbazbûyî gilî bikim. Bavê min vêtêranê şerê Cîhanêyî duemîn e. Ew 99–salîye û ez gelekî wî hiz dikim. Dersên bavê min nava temamîya emirê min da gelek alî min kirine. Feqet tiştek hebû, ku ewî ez bona wê yekê hazir nekiribûm.

Ewî ez hîn nekiribûm, ku çawa gerekê tevî jina xwe biketama nava heleqetîya. Carekê Petrûs got: “Bi femdarî nêzîkî jina xwe bibin, tevî kê hûn dijîn” /A Petrûs 3:7, NLT/. Wextê ku ez zewicîm, min Lîza stend, ez “bi femdarî” nêzîkî wê nedibûm. Lîza evîna min a ewlin bû. Pêşîya wê ez tevî tu jinekê neketibûme nava heleqetîya û ez usa nêzîkî wê dibûm, çawa ku tevî hevalekî xwe bûma. Tiştekî femdarîye, wekî ew nêzîkbûn bêaçix bû. Ez gerekê hînbûma, ku çawa tevî wê biketama nava heleqetîya– *çawa jin.*

Mesele, gerekê ez hînbûma, gelekî nerm tevî Lîzayê xeber bidim. Telebextra min carna gelekî hişk tevî endamên malbeta xwe xeber dida. Ez ji Xwedê razîme, çimkî Ruhê Pîroz dijî wê yekê derdikeve û peyî wê yekê ra ez dikarim baxşandinê bixwezim û heleqetîyên me bidime rastkirinê. Carekê min gelekî hişk tevî kurekî xwe xeberda û ez mecbûr bûm ji wî baxşandinê bixwezim. Kurê min lez baxşande min û heleqetîyên me hatine dasekinandinê. Feqet Lîzayê cûrekî mayîn bersiva evê kirina min da. Ew çend roja ser hev ber xwe diket. Ew ji min nexeyîdî bû, lê awqasî nava heleqetîya da ew gelekî nazik bû. Ez û kurê xwe li hev hatin, lê min gerekê hinek cedandin bidana xebatê, bona ku heleqetîyên min ê tevî jina xwe bida dasekinandinê. Peyî wê yekê ra, piştî du roja, Lîzayê gote min:

–Hetanî niha, wextê ku ez tînime bîra xwe, ku çawa te kurê me ra xeberda, ricaf li min digire.

Min fem kir, wekî ew yek pêşkêşeke emirê Lîzayê e. Mînanî gelek jina, ew gelekî malbetêva girêdayî e û nêzîkbûna wêye himberî malbetê ya parastinêye.

Gelo diqewime, wekî ew yek li cem Ruhê Pîroz jî heye, kîjanê em gelek cara çawa nêzîkbûna jina hesab dikin. Kitêba Pîroz dibêje: “Û dilê Ruhê Xwedêyî Pîroz neêşînin” /Efesî 4:3O/. Çawa ku Rîk Rênnêr nava kitêba “Xiznên zimanê yûnanî”–da dibêje, xebera *êşandin* orîjînalê da bi fikira “êşandina kûr û derd” tê raberkirinê. Ew ji xeberekê pêşda tê, kîjan êşê dide kivşê, kîjanê meriv dikare di navbera du meriva da texmîn bike, yên ku bi kûrayî hev hiz dikin. Pawlos, bi texmîn, vê yekê dibêje: “Ewê bi kûrayî we hiz bike, Wî neêşînin”. Niha em vê gotinê bi hemtêksta wêva bixwînin.

> Tu car bira ji devê we xebereke xirab dernekeve, pêştirî tiştên, ku kêrî guhdara tên û karê didine wana. Û dilê Ruhê Xwedêyî Pîroz neêşînin, bi kîjanî hûn bona roja Azayîyê hatine morkirinê. De bira her talayî, hêrs, berzeqî, qare– qar û kifirî– zifirî ji we dûr bin, tevî her cûre kîn– boxîyê va û hevra şîrin û dilşewat bin, li hev bibaxşînin, çawa Xwedê bi Mesîh baxşande we.
>
> –Efesî 4:29–32, NLT

Gelo hûn nermaya Ruhê Pîroz divînin?

Nermayî qewata rast e, kîjan layîqî hijmekarîyê ye. Pawlos dibêje me, ku bi nermayî nêzîkî hevdu bin. Eger ez dixwezim tevî jina xwe nava heleqetîyên saxlem, sax da bim, diha başe, ez bi cûrê nerm û rehet kurên xwe ra xeber bidim. Wî cûreyî jî, heger em dixwezin ku nêzîkbûna saxlem û sax tevî Ruhê Pîroz hebe, em gerekê himberî wî nava hemû tiştîda nazikbin, çi ku Wî diêşîne. Gelekî tiştekî hewaskar e, wekî Pawlos wê yekê dibêje– xeberên xirab, hêrs, qare– qar, berzeqî û kifirî– zifirî. Jina min jî ji nêzîkbûna vî cûr’eyî diêşe. Eva şedetîya wê yekê nade, wekî Ruh wî cûreyî ye û em gelek cara ewê cudatîyê çawa ya jinê hesab dikin.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Pawlos nanivîse: “Îsa neêşînin”. Ew usa jî nanivîse: “Bavê neêşînin”. Ew hîmlî dibêje: “Ruhê Pîroz neêşînin. Ruhê Pîroz dilên me da dijî. Ew diçe li wir, li kîderê em in. Eva heleqetîya gelekî nêzîk e. Rûê wê yekê da jî, ew bi kûrayî ji wê yekê xemgîn dibe, çi ku em nava emirên xwe da îzinê didine xwe.

Niha ji alîkî mayînva dîna xwe bidine vê beşê. Heger kesek bi cûrê sert tevî we xeber bide, ew yek wê awqasî jî we xemgîn neke. Feqet heger kesek bi cûrê sert jina min ra xeber bide, wî çaxî ew meriv wê rastî pirsgirêka bê. Îsa fikira wî cûreyî elam kir, wextê ku ewî got: “Kî tiştekî dijî Kurê Însan bêje, wê bê baxşandinê, lê eger yek hindava Ruhê Pîroz da bêje, li wî nayê baxşandinê, ne vê li dinyayê ne jî wê li dinyayê” /Metta 12:32/. Gelo ew yek hewaskar nîne, wekî Bav Xwedê parastina Xwe datîne ser Ruhê Pîroz. Bav parastina wî cûreyî nava wan heleqetîya da kivş nekir, kîjan li cem me tevî Îsa, yan jî Wî hene, lê

bona Ruhê Pîroz ew yek kir. Heleqetîyên Bav, Kur û Ruhê Pîroz cuda ne û diqewime em tu cara wana fem nekin. Ew yek hewask'ar e, wekî ev cudatî nava heleqetîyên Ruhê Pîroz û me da ne. Em gerekê qîmetê bidine heleqetîya tevî Wî û wê yekê biparêzin. Ew yek girîng e, ku em bîr bînin, wekî em dikarin Wî biêşînin. Bona çi gelekî girîng e, ku derheqa vê yekê da bizanibin? Menî ew e, wekî hazirîya Wî ye nava emirê we da wê neyê kivşê, heger hûn fem nekin, ku çawa tevî Wî bikevine nava tevgirêdana.

## Roja 5–emîn

# EW GELEKÎ NAZIK E, LÊ GELEKÎ JÎ QEWAT E

Ruhê Pîroz çawa Piştovan tê navkirinê, gelo usa nîne? Zarok, wextê ku dixeyîdin, direvine cem kê? Hilbet li cem dayîkên xwe.Bi hesabhildana wê yekê, wekî li Ştatên Amêrîkaê ye Yekbûyî proêkt çê kirine, kîjana da rola jinên ofîsêr, ya wextê xebata tevî xirabkarên negihîştî, tê dîyarkirinê. Li adên Havayê qanûn heye, kîjan piştgirîyê dide tevgirêdana ewlin, ya xirabkarên negihîştî ye girtî û jina ofîsêr. Wana fem kirîye, wekî cahilên negihîştî diha baş bersivên ofîsêrên jin didin. Li cem jina karebûna hundurîn, ya ber dildahatinê heye. Ez careke mayîn derheqa wê yekê da dibêjim, wekî meremê min tune, bêjim ku Ruhê Pîroz jin e.

Ji alîkî va ez Ruhê Pîroz himberî Dawidê Padişa dikim. We qet texmîn kirîye, ku Dawid çiqas nazik e, çiqas dilrehm e? Wextê ku Abîşalom mir, ew girîya, nenihêrî wê yekê, ku hema ewî emirî li ser esker kiribû, ku şoreşa Abîşalom bidine fetisandinê /bixwînin B Padişa 19/. Gelek cara Dawid digirîya û stiran digotin. Heleqetîyên wî ye tevî Ûnis meseleke hevaltîyêye baş e. Feqet bîr nekin, wekî Dawid şerkar bû, yê ku Golyat alt kir û bi hezara meriv kuştin. Ew rêberê Fermandara bû, kîjan nava dîroka Îsraêlê da koma here serxwe bû /bixwînin B Padişa 23/. Carekê jî Dawid qerar kir merivekî bikuje, yê ku nexwest avê û xwerinê bide peyîhatîyên wî /bixwînin A Padişa 25/. Dawid merivekî sist nîbû, ew şerkar bû, lê pê ra jî ew gelekî nerm û nazik bû.

Îzinê bidin bînime bîra we, wekî navekî Ruhê Pîroz jî Ruhê Qewatê ye /bixwînin Îşaya 11:2/. Ew her tiştî dikare, Ew sist nîne. Bi wê yekê va tevayî Ew gelekî dilrehm û nazik e.

Heger hûn şexsîtîya Wî çetin fem dikin, nav–hev nekevin. Em gerekê her dem bîr bînin, wekî şexsîtîya Wî nikare bi femdarîya merivatîêye sînorkirî bi temamî bê femkirinê. Feqet Ewî soz daye Xwe li me eyan bike, heger em nêzîkî Wî bin.

Çawa ku min pêşda dabû kivşê, meriv nikare hemû tiştên Ruhê Pîroz şirove bike /bixwînin A Korintî 2:6–16/. Meremê min ew e, ku ez Wî raber bikim, ku hûn mezinaya Wî destpê bikin eşkere bikin û hazirîya Wî ye nava emirê xeda texmîn bikin.

## FESAL BIN, KU WÎ NEÊŞÎNIN

Van axirîya min êpêce wede têlêvîzyon temaşe nedikir. Ez nava duakirinê da bûm û bi cûrê qewat ez tevî Xwedê nava tevgirêdana da bûm. Carekê ez ketime oda me ya mêvana, li kîderê kurê min fîlmek temaşe dikir. Fîlm ne ya xirab bû, lê ez wî çaxî ketime odê, dema ku kadreke kuştinê didane kivşê. Çawa ku min ew yek dît, ez carekê ra ji odê derketim. Ez wextê tevgirêdana tevî Ruh usa nazik bibûm, wekî min dikaribû texmîn bikira ku şikilê li ser êkranê Ew diêşand.

Em tu cara gerekê bîr nekin, wekî Ruh nava me da dijî. Wextê ku hûn diçine sînêmayê, ku fîlmekê temaşe bikin, hûn Wî– Xwedê Yê E'zmîn tevî xwe dibin. Ew her dem tevî we ye, çimkî Ewî soz da,wekî wê tu cara we nehêle û neçe. Feqet hûnê bivînin, wekî wextê ku hûn Wî mecbûr bikin, ku Ew li nava halên wî cûreyî da hazir be, kîjan Wî diêşînin, Ewê xwe ker bike.

Meriv çi bike, heger Ruh hatîye êşandinê? Em gerekê baxşandinê bixwezin, lê baxşandin gerekê gelekî kûr be û bêqelp be. Wextê ku ez jina xwe diêşînim, gotina "were em hemû tiştî bîr bikin" arîkarîyê nade. Lîza zane, ku fikira min da çi heye. Ew texmîn dike, ku wextê ez dixwezim derheqa tiştên qewimî da bîr bikim û wextê ku ez bi bêqelpî dixwezim nêzîkî wê pirsê bim, kîjanê heleqetîyên me nav–hev xistin. Meremê Lîzayê gunekarkirina min nîne, lê ew e ku ew bizanibe, wekî

nava heleqetîyên me da qelpî tun ye. Hema bi wî cûreyî jî Ruhê Xwedê ye. Ew naxweze, ku heleqetîyên sera–bera hebin, lê nêzîkbûna bêqelp hebe.

Nava vê kitêbê da diha pêşda min gilî kir, ku çawa carekê min kurekî xwe ra sert xeberda. Nava çend rojên peyî ra, Ruhê Pîroz her dem ew yek dianî bîra min, wextê ku min dua dikir. Ewî ez gunekar nedikirim, lê derbasî heleqetîya min a tevî Wî dibû. Min fem nedikir, ku min çiqasî kûr Ew êşandibû. Pêşda min çend cara baxşandin xwest. Min dixwest vê yekê bîr bikim û pêşda herim. Feqet nêzîkbûna Wî ye nerm li cem min êşeke kûr, ya xwedêtîyê, nava min da pêşda anî, kîjanê şexsê min paqij kir /fikir, xwestin û texmînkirin/.

Pawlos bi wî cûreyî berbirî civîna korintîya bû, wextê ku heleqetîyên wan ên tevî Xwedê rûê gurênekirinê da hatibûne teribandinê. Ewî nivîsî /Û bi xwendina gotinên wî, bîra xwe da xweyî bikin, ku ew ji Ruhê Xwedê ne/:

> De dîna xwe bidine wê berxweketina li gora xwestina Xwedê, ku çiqas kar da we: we çawa cedand bi rûspîtî caba xwe da! Çi hêrs, çi xof, çi hizret, çi xîret, çi cezadayîna bona neheqîyê! We hemû alîaya va xwe da kivşê, ku hûn van yeka da ser nixta helal in /B Korintî 7:11, NLT/.

Şikir ji Xwedê, wekî em bi xwîna Berxê hatine baxşandinê û paqijkirinê. Nenihêrî wê yekê, wekî em, bawarmend, li ber Xwedê li ser tabîya rast in, em hela hê gerekê heleqetîya xwe ye tevî Ruhê Pîroz çê bikin, heger me Ew êşandîye. Pawlosê şandî dijî korintîya derket, hetanî ku ew bi rastî xwe mikur hatin. Hema bi wî cûreyî jî Ruhê Pîroz her dem wî cûreyî dike, çimkî ew dixweze, ku em bi bêqelpî tevî Wî nava heleqetîya da bin. Ew êşa xwedêtîyê, kîjan min li cem xwe texmîn kir, bona rastkirina hal li cem min germayî pêşda anî. Xêncî wê yekê di hundurê min da cedandin pêşda hat, ku heleqetîya xwe ye tevî Xwedê bidime dasekinandinê. Şikir ji Xwedê, wekî Ruhê Pîroz lez li me dibaxşîne.

Tu cara bîr nekin, wekî Ruhê Pîroz nerm e, dilrehm e, piştovan e û qewat e. Em gerekê gelekî şexsîtîya Wî nas bikin, heger em dixwezin

tevî Wî nava heleqetîyên nêzîk da bin. Em gerekê bi qewilên Wî nava heleqetîya da bin. Wextê ku em dest pê dikin diha gelekî fem bikin, ku Ruhê Pîroz kî ye, wî çaxî em dikarin diha gelekî bi kûrayî tevî Wî bikevine nava heleqetîya.

Gelek cara ez dicêribînim tevî jina xwe derheqa golfê da xeber bidim. Mesele, ez dikarim bêjim:

–Tu zanî, wekî îro min 68 misqal berev kirine.

Kurên min wê bêjin:

–Bavo, derheqa her derbekê da me ra gilî bike.

Feqet bona jina min ew yek hewaskar e, ku min wextê lîstika golfê tevî hevalkarên xwe çi xeber daye. Heleqetî, bi rastî, wê didine şakirinê. Heger ez dixwezim tevî Lîzayê li ser heleqetîya wê bim, wî çaxî ez gerekê derheqa wan têma da xeber bidim, kîjan bona wê hewaskar in. Bi wî cûreyî jî em gerekê bizanibin, ku bona Ruhê Xwedê çi hewaskar e. Wextê ku em mezinaya Wî lêkolîn bikin– bi xwendina Gotinê û derbaskirina wede ye nava hazirîya Wî da, ewê bi nêzîkayî Xwe li me eyan bike.

# HÛN DIKARIN DENGÊ XWEDÊ BIBIHÊN

*Ewê ku ji Xwedê ye, wê yekê dibihê, çi ku Xwedê dibêje...*
–Yûhenna 8:47, NIV

Belê, hûn dikarin dengê Xwedê bibihên. Ew îro hela hê tevî cimeta Xwe xeber dide. Û ew bi destê Ruhê Xwe Yî Pîrozî giranbiha tevî me xeber dide. Xwestina **Hênrî Blêkêbî** û **Klod Kîngê** avtor ew e, ku mesîhî bi heleqetîyên diha kûr û şexsîtîyê tevî Xwedê bikevine nava tevgirêdana. Ew dinivîsin:

> "Nava kitêba Karên Şandîya da Xwedê gelekî zelal tevî cimeta Xwe xeber dida. Ji wî çaxî da hetanî roja îroyîn Xwedê tevî cimeta Xwe bi *Ruhê Pîroz* xeber dide. ...çawa ku Ew her dem nava bawarmenda da hazir e, Ew dikare gelekî zelal her dem tevî we her wede û bi her cûreyî xeber bide, çawa ku Ew rê têra divîne".

Îsa elam kir, wekî Ew Şivanê Qenc e, lê em jî berxên Wî ne, yên ku dikarin dengê Wî guhdar bikin û nas dikin. Dora gotinên Wî bifikirin /Yûhenna 1O:3–5, 11, 14, 27/. Gelo Ruhê Pîroz çi elamî we dike?

____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

Navekî Ruhê Pîroz jî *Ruhê Rastîyê ye* Bona çi navê usa li Wî kirine?

Blêkêbî didomîne:

> "...Em nikarin rastîya Xwedê fem bikin, heger Ruhê Xwedê Yî Pîroz derheqa wê yekê da elam neke. Ew dersdarê me ye. Wextê ku Ew Gotina Xwedê me hîn dike, li ber Wî rûnîn û bersiva Wî bidin. Wextê ku hûn dua dikin, guhdarîyê bidine ser ku Ew çawa Gotina Xwedê dide xebatê, ku dilê we da

> wê gotinê îzbat bike, kîjan we ji Xwedê stendîye. Dîna xwe bidinê, ku wî çaxî Ew dora we çi dike. Ew Xwedê Yê, ku tevî we xeber dide, wextê ku hûn dua dikin û ew Xwedê Yê ku ji Kitêba Pîroz tevî we xeber dide, hema ew Xwedê ye, Yê ku dora we kar dike. Xwedê bi destê Ruhê Pîroz nava temamîya Kitêba Pîroz da xeber dide. Ew bi rîya duakirinê û civînê xeber dide, ku merem û rêyên Xwe elam bike”.

Bi vî cûreyî, Ruhê Pîroz çi dikare elamî we bike? Bi guhdarî gotinên Îsa bixwînin /Yûhenna 14:26,15:26 û 16:12–15/, pênc tişta başqe bikin, kîjan Ruh hîn dike.

Kilîta naskirina dengê Xwedê, kîjan e? Blêkêbî û Kîng didomînin:

> “Kilîta naskirina dengê Xwedê ne formula ye. Ew mêtod nîne, peyî kîjanê gerekê herin. Naskirina dengê Xwedê ji heleqetîyên hizkirinêye tevî Xwedê tê. ...Nava heleqetîya weda, wextê ku Xwedê tevî we xeber dide, lê hûn bersivê didin, wede wê bê, wextê ku hûnê diha gelekî zelal dengê Wî nas bikin”.

Kilîta naskirin û guhdarkirina dengê Xwedê *heleqetî ye*.

Henox, Nuh, Birahîm û gelekên mayîn bi xwe ev tişt li ser xwe texmîn kirine û hûn jî dikarin wê yekê bikin. Gelo çi prînsîp nava gotinên Amovs 3:7, Danîêl 2:22 û Zebûr 25:14–da heye, kîjan nava gotinên Yûhenna 15:5, A Korintî 2:9–1O û Efesî 1:9–da tên kivşkirinê? Gelo ev yek piştgirîyê dide we çawa bawarmendên “rojên dawî”?

Bona mesela derheqa eimrê Henox /Destpêbûn 5:21–24/, Nuh /Destpêbûn 6:9–18/, Birahîm /Destpêbûn 18:16–22/ û Petrûs /Karên Şandîya 1O:9–23/ bixwînin.

Ders Roja 2–emîn

# HAZIRÎYA WÎ XWESTINA WE YA NAVA EMIR DA YE

*Te got: Sifetê Min bigerin /hazirîya Min bigerin û bira hewcetîya wê yekê çawa hewcetîya bona emirê we be/. Dilê min dibêje Te: Sifetê Te /hazirîya Te/, Xudan, ezê bigerim...*

– Zebûr 27:8, AMP

Dawid mînanî wan meriva nîbû, kîjana hûn nas dikin. *Tiştek* hebû, kîjan dilê wî da dişuxulî, xwestinek, kîjanê femdarîya Wî dikişand.Ewî hazirîya Xwedê dixwest. “WÎ *tiştî* kîjanî ez ji Xudan hîvî dikim”,– ewî got, – “ew tiştê, ku ez ji giştî zeftir digerim, ew e, ku ez nava temamîya emirê xwe da li Mala Xudan bijîm , li Paristgeha Wî bi kirinên Xudan va hijmekar bim û bifikirim /Zebûr 27:4, NLT/.

Tu tişt awqas qîmetlû nîne, çiqas hazirîya Xwedê û şuxulkarîya Wî ye nava e’mirê mêriv da ye, kîjan tevî mêriv dijî. Çawa ku Bav û Kur li ezmîn in, Ruhê Pîroz e, ku hazirîya Xwedê li nava her bawarmendekî da, elam dike. Nîkolas Hêrman, yê ku bi navê Birayê Loûrêns eyan e, hîn bû çawa “hazirîya Xwedê bide xebatê”. Mîsîya wî ew bû, ku alî meriva bike, ku wê yekê li ser xwe texmîn bike. Gilî derheqa sedsala 17–da ye.

> “Xeysetê meyî nava emirê ruhanî da, yê herî pîroz û lazim xebitandina hazirîya Xwedê ye. Ev yek dide kivşê, ku em lezetê nava hevaltîya Wî ye Xwedêtîyê da texmîn bikin, şikestî û bi hizkirin tevî Wî her dem xeber bidin û her dem wê xeberdanê bêyî sînorkirin bidomînin”.

Niha li vir bisekinin û bifikirin: *Hazirîya Xwedê bi çiqasîva nava emirê min da girîng e? Bêyî Wî emirê çi cûreyî be?* Bînine ber çavê xwe, wekî şebeqê hûn bêyî hazirîya Ruhê Pîroz hişyar dibin. Navnîşa navên Wî dîsa lê binihêrin û bi fikireke çêbûyî binivîsin, ku hazirîya Wî bona we çiqas girîng e.

**Li kîderê û kengê em gerekê hazirîya Ruhê Pîroz texmîn bikin?**

Loûrêns xebera xwe didomîne

> "Eseyî nîne, ku em bona mayîna nava hazirîya Xwedê da li civînê bimînin. Em dikarin dilên xwe werguhêzî malên xwe ye dukirinê bikin û her dem bikevine li wir, bona ku başqe tevî Xwedê qise bikin. Ev qise dikarin bibine yên here bi hizkirin û her yek wî cûreyî dikare tevî Xwedê bikeve nava heleqetîya. Gelo menî heye ku hûn nikaribin wê yekê destpê bikin?".

Bêyî şikberî we ra lazim e, ku hûn wedê baş tevî Ruhê Pîroz derbaz bikin, wextê ku hûn guhdarîya xwe li ser Wî bidine merkezkirinê. Dikeve nava vî wedeyî: Gotina Wî bixwînin, tevî Wî xeberdin, Wî guhdar bikin, ji Wî razî bin û pesinê Wî bidin, pê rua jî ker rûnîn. Bisekinin û dua bikin: "Ruhê Pîroz, gelo wedê min ê başqe, ê tevî Te, ê nava emirê min da, gerekê çawa be?". Binivîsin, ku Ew çi elamî we dike.

**Hûn çawa dikarin hazirîya Xwedê bidine xebatê?** Birayê Loûrêns dinivîse: "Awqasî werin li ber Xwedê... û guhdarîya xwe li ser hazirîya Wî bidine merkezkirinê. Heger fikira we carna diger'e, ber xwe nekevin, çimkî nerehetî wê diha gelekî we şaş bike. Îzinê bidin, wekî emirê we bi cûrê nerm guhdarîya we paşda bîne li ser Xwedê... *xeysetê Pîrozî bona xeberdana tevî Wî bidine pêşxistinê*". Li vir bisekinin û dua bikin: "Ruhê Pîroz, ez dikarim bêjim, ku ez guhdarîya xwe li ser Te bidime

merk’ezkirinê”. Guhdar bikin, ku Ew çi dibêje û wê yekê nava emirê xwe da bidine xebatê.

**Bona lêkolînkirina paşê...**
Bixwînin A Dîrok 16:9–11, Zebûr 22:26, 1O5: 3–4, Gotinên Silêman 8:17–18, Îşaya 55:1–3,6, Yêrêmîya 29:11–13, Metta 6:33, Îbranî 12:1–2.

Ders Roja 3–emîn

# EW DIXWEZE NÊZÎKÎ WE BİBE

*Va Ez li ber derî sekinî me û li dêrî dixim. Heger yek dengê min bibihê û dêrî li Min veke, Ezê herime hndur, tevî Wî nan bixum û ew jî tevî Min.*

– Eyantî 3:2O, TLB

Xwedê bi destê Şexsê Ruhê Pîroz dixweze diha gelekî nêzîkî we be, ne ku merivekî başqe, yê ku li ser vê dinîyayê dijî. Ew asta heleqetîyên nêzîk a li ser dereca here kûr dixweze.

Kesekî gotîye, wekî nêzîkbûna tevî Xwedê usa ye, çawa ku "Xwedê di hundurê min da divîne", û ew yek rast e. Ruhê Pîroz dikare bikeve li her ciha, li kîderê tu merivek nikare bikevê. Ev yek bi wede û şîva sînorkirî nîne. Ruh ne tenê dilên me guvtugo dike û zane, lê usa jî dilê Xwedê zane û guvtugo dike. Ew fikirên Xwedê ên kûr, sur û xwestinên Wî elamî me dike, ku em bikaribin "hundurê Wî bibînin".

> Sura Xudan /hevaltîya şîrin û bi lezet/ li cem wan meriva heye, yên ku ji Wî ditirsin /xofê hindava Wî da dikişînin û pesinê Wî didin/ û Ewê heca Xwe bide kivþê û wê kemala wê elam bike.
>
> – Zebûr 25:14, AMP

Careke mayîn biwekilînim, Ruhê Pîroz "Ruhê Rastîyê"–ye, Yê ku nava rastîyê da rêberîyê li me dike. Gelo pirseke usa, ya derheqa Xwedê, yan Îsa da heye, bersiva kîjanê hûn dixwezin bistînin, yan jî beşeke Kitêba Pîroz a usa heye, kîjanê hûn dixwezin fem bikin? Dua bikin û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku rastî, fikira wê a kûr bide kivşê û usa jî wê yekê, ku ew çi cûreyî derheqa we da ye. Çi ku Ew elam dike, binivîsin.

__________________________________________________

__________________________________________________

__________________________________________________

> Û Îsa wî ra şirove kir, çi ku derheqa Wî da kitêbên Pîroz da nivîsar bû, bi destpêkirina ji kitêbên Mûsa û hemû pêxembera.
>
> – Lûqa 24:27, GNT

Ruh ne tenê rastîya derheqa Kitêba Pîroz da elam dike, lê derheqa wî hemû tiştî da jî, çi *ku* nava emirê me da heye.

Gelo govekeke usa nava *emirê* we da heye, kîjanê hûn fem nakin. Diqewime hûn nişkêva hêrs dikevin, yan jî nava hinek halên pêşdahatî da, bêyî tu menîya, hûn tirsê va tijî dibin? Li vir bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, kîjane menîya vê yekê a hîmlî. Çavên Xwe bide min, ku ez bivînim. Nava emirê xwe da ez gerekê çi biguhêrim, ku serkevim?” Çi ku ew elam dike, binivîsin.

__________________________________________________
__________________________________________________
__________________________________________________
__________________________________________________

Gelo *tiştekî* usa nava rojên we ye derbazbûyî, yan jî niha da heye, kîjanê hûn fem nakin? Ruh wê yekê fem dike. Li vir bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz rastîya derheqa halê min da nîşanî min bide. Tu wê yekê çawa divînî? Tu dicêribînî çi nava min da bidî guharitinê û çawa ez dikarim tevî Te hevkarîyê bikim?”. Çi ku Ew elam dike binivîsin.

__________________________________________________
__________________________________________________
__________________________________________________
__________________________________________________

**Bona lêkolînkirina paşê...**
*Î*sa tevî Bavê gelekî nêzîk bû: Metta 14:22–23, 17:1–5, Marqos 1:35, 6:31, 46–47, Lûqa 5:16, 6:12,
Ruhê Xwedê nêzîkî me dibe, dema ku em nêzîkî Wî dibin: Zebûr 16:8, 34:18, 73:28, 145:18, Îbranî 1O:22, Aqûb 4:8.

Ders Roja 4–emîn

# FESALBIN KU WÎ NEEŞÎNIN

*Û dilê Ruhê Xwedê YÎ Pîroz bi cûrê emirê xwe neêşînin.Bîr bînin, wekî Ewî hûn çawa yên Xwe hesab kirine...*
– Efesî 4:3O, NLT

Heleqetîya tevî Ruhê Pîroz nayê qîmetkirinê. Hazirîya Wî ye eyanbûyî emir dide her govekeke emirê me. Bona **Kêtrîn Kûlmanê** heleqetîya tevî Wî cûrê e’mir e. Bi mîlîona meriva bihîstin, ku çawa ewê derheqa hizkirina Xwedê û qewata Ruhê Wî da xeber dida. Geleka qenckirina Wî li ser xwe texmîn kirin. Nava kitêba xwe a bi sernavê “Qewata here mezin a li dinîayê” Kûlman şirove dike, ku çi Ruh diêşîne:

> “...Nenihêrî wê yekê, ku Ruhê Pîroz qewata her tiştî ye, Ew gelekî nazik e û meriv dikare gelekî hêsa Wî biêşîne. Bê şikberî ev şexs dikare rûê telayê, hêrsê û xeberdana xirab da bê êşandinê. Bi gotinên mayîn Ew dikare nava emirê mêriv da bi her tiştî va bê êşandinê, çi ku dijî gurêkirinê, hizkirinê, sebirê ye”.

Tiştekî gelekî girîng e fem bikin, ku Ruh ji çi tê êşandinê û rûê wê yekê da jî hazirîya Wî ye nava emirê me da dikare tune be. Bi guhdarî beşa Efesî 4 bixwînin, kîjan şirove dike, ku êşandina Ruhê Pîroz çi ye /guhdarîyê bidine ser gotinên 1–6 û 17–32–a/.

Gelo nava gotinên 17–24–a da *nêzîkbûn, cûrê fikirdarîyê* û *kirinên ç*awa Ruhê Pîroz didine êşandinê?

________________________________________
________________________________________
________________________________________
________________________________________

Efesî 4:17–24–a da ew cûrê jîyînê û cûrê fikirdarîyê hatine şirovekirinê, kîjan Ruh dide êşandinê û me ji hazirîya Wî dide qetandinê.

Cûrê kirinaye tomerî, yên nava gotinên 25–31–ê da bidine tomerîkirinê, yên ku Ruhê Pîroz diêşînin. Wede başqe bikin û wan şuxulên cuda binivîsin, kîjan wê beşêda hatine kivşkirinê.

Esefî 4:25–31 dide kivşê, ku kirinên hindava merivaye çawa dikarin Ruh biêşînin û Wî ji we bidine qetandinê.

Belê, em dikarin Ruh bidine êşandinê, lê behsa mizgînîyê ew e, wekî em jî bikaribin Wî bidine şakirinê. Bi guhdarî gotinên 1–7, 14–15, 25,29 û 32–a bixwînin û wan kirina nav bikin, kîjan Ruh şa dikin.

Wextê hazirkirina caba xwe guhdarîyê bidine ser wan kirina jî, kîjan Ruh diêşînin.

Kilîta neêşandina Ruhê Pîroz cedandina berbi ruhê pîrozayê û yekîtîyê û parastina Wî ye. Wê demê, wextê ku kubarî û heramî xebata Ruh didine sekinandinê, *gurêkirin* pêşdaçûyînê dide wê yekê. *Bi xwe kerkirin werin ber Xwedê.* Ji Wî bipirsin: “Gelo ez tiştekî usa dikim, kîjan Te diêşîne?”. Hemû tiştî tobe bikin, çi ku Ew elam dike û kerema Wî hîvî bikin, bona ku hûn bi gurêkirin û bi pîrozayî pêşda bên, çimkî nêzîkbûna wî cûreyî Wî şa dike û we dewatî şuxulkirinê dike.

Ders Roja 5–emîn

# HÛN MALA RUHÊ PÎROZ IN

*Bêfitîya hûn zanin ku hûn paristgeha Xwedê ne û Ruhê Xwedê nava we da dijî.*

–A Korintî 3:16, GNT

Xwedê Yê ku her tiştî dikare bike, Afrandarê ku hemû tiştî zane û hemû tiştî dikare bike, Yê ku hemû tişt ji molêkûlên biçûk destpêkirî hetanî galaktîkayên mezin çê kirine, qirar kirîye dilê we da bijî. Belê, heger hûn bawarmend in, hema ew Ruh, Yê ku Îsa Mesîh ji nava mirîya rakir, nava we da dijî. Serwêr, avtor û pêşekzanê zimanê yûnanî Rîk Rênnêr şirove dike, ku mala Ruhê Xwedê çi dide kivşê:

> "Bi hatina li dilê we, Ruhê Pîroz malek çê kir. Ew mal awqas baş bû, wekî Ew şa bû, wekî wê di hundurê we da bijî. Ew cîguhastî bû, îzbat bû û her dem dilê we da, *mala* Xwe ya *nû* da ma. Wextê ku hûn xilaz bûn, ecêba mezin li dilê we da qewimî. Ruhê Pîroz ruhê we hilda, kîjan nava bêqanûnîyê û gunekarîyê da mirî bû û ew bona emirê nû ruhdar kir. Karê Wî Yî di hundurê me da awqas mezin bû, wekî wextê ku ew kar îdî ser hevda hatibû, Ewî elam kir, ku hûn karê Wî Yî herî mezinin /Efesî 2:1O/. Wî çaxî ruhê we *werguhêzî paristgeha Xwedê bû"*.

Hûn Ruhê Xwedê tevî xwe dibine li her cîya, li ku da diçin, Wî tevî hemû xeberdana dikin, li kîderê hûn hazirin, Wî tevî hemû k'arî dikin, li kî derê hûn tev dibin. Bisekinin û bifikirin derheqa wê yekê da.

Gelo ev rastî *piştgirîyê* û *qewatê dide we*? Ew yek çi cûreyî hukumî li ser duakirinên we dike?

___

___

___

___

Sozdayînên Xwedê li nava gotinên Efesî 3:14–2O, Lûqa 12:11–12, Yûhenna 14:12–17, Kolosî 1:27, B Tîmotêyo 1:13–14 û Romayî 8:1–17–da bixwînin.

Gelo rastî dijî we derdikeve? Gelo bersivên we we berbi duakirinê dibin?

Derheqa wê yekê da bifikirin, ku hûn çi divînin û dibihên derheqa wan meriva da, tevî kîjana hûn nava tevgirêdana da nin, usa jî derheqa wan kirina da, tevî kîjana hûn dibin.

Weyê çawa dereca heleqetîya niha ya tevî Ruhê Pîroz bianîya ber çava? Gelo hûn heleqetî, hevkarî û hevaltîya Wî a nêzîk texmîn dikin? Gelo hûn dengê Wî dibihên û hazirîya Wî a nava emirê xwe da texmîn dikin? Diqewime hewcetîya "paqijkirina tomerî", ya di hundurê we da heye bona ku bo Wî nava we da baş be, çawa li malê? Dua bikin û ji Wî hîvî bikin, ku Ew halê dilê we nîşanî we bide. Ew çi dibêje? Ew hîvî dike, ku hûn gavên çawa biavêjin?

> Awa, bira û xwîşkên hêja, ez hîvî ji we dikim, bona wê dilşewatîya Xwedê, qalibê xwe dîyarî Xwedê bikin, çawa qurbaneke sax a durufkirî, li Wî qebûl. Eva cûrê pesindayîna Wî ya bi rastî ye. Û nekevine kirasê merivê vê dinîayê, lê ser hişê xwe da werin, nêt– fikirên we bira nû bin, wekî bizanibin çi ye qirara Xwedê, ku qencî, xweşî û kamilîye.
>
> – Romayî 12:1–2, NLT

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz: Serecem" lêkolîn dikin, çawa beşeke dersa ya tomerî, ya "Berevoka Mêsîncêr", em hîvî dikin, vîdêoya bona hînbûnê, ya duemîn, temaşe bikin.*

Heleqetîya me ye tevî Ruhê Pîroz heye.

Xebera heleqetî nava zimanê yûnanî da xebera koînonîa ye, kîjan dide kivşê: "tevgirêdan, hevaltî, hevaltîya nêzîk, heleqetî, hevkarî". Ev cûrên heleqetîya meriv dikare pareveyî li ser sê komên hîmlî bike– tevgirêdan, hevkarî û hevaltîya nêzîk.

1 I Ruhê Pîroz tevgirêdana bêyî sekinandin /koînonîa/, ya tevî Xwe, tevî me– kur û keçên Xwedê hebe. Dikeve nava vê heleqetîyê *tevgirêdan*–heleqetîyên bi hevaltî. Gelo çima usa girîng e, ku hevaltîya Ruhê Pîroz gerekê qebûl bikin û derheqa Wî da baş bizanibin? Gelo wê çi biqewime, heger em wê yekê nekin?

2 I Bi tevgirêdanê va tevayî, Ruhê Pîroz dixweze tevî me *hevkarîyê bike*. Gelo hevalkar gavên praktîke çawa diavêjin, bona ku alî hev bikin? Gelo hevkarîya tevî Ruhê Pîroz, ya rojên îroyîn himberî hevkarîya peyîhatîyên Xwedê, mesele Birahîm, yan jî Mûsa, bi çi va cuda dibin? Hûn bi zanebûna derheqa wê yekê da şa dibin?

3 I Heleqetîya tevî Ruhê Pîroz diha gelekî kûr e, ne ku tevgirêdan yan jî hevkarî. Ew jî *hevaltîya nêzîk* dike nava xwe. Em, bawarmend, dikarin tevî Ruhê Pîroz bikevine nava heleqetîya li ser vê astê?

**QEDIR**

Her gotineke bi qedir, yan jî qîmetkirina bilind bi cûrê gotinê, yan jî kirinê.

Bi texmîn, qedirgirtin qîmetkirinê, qedirgirtinê û sîmpatîyaê dide kivşê.

– Ev xeber ji ferhenga zimanê înglîzîya amêrîkî, ya Noy Wêbstêr hatine hildanê /1828/

4 I Pirsa Ruhê Pîroz a sereke ew e, ku elam bike, ku Îsa kî ye, û qedir û pesindayînê bona Wî bînin. Ewê Mesîh eyan bike, wê usa jî Xwe elam bike, heger layîqî qedirê bêqelp bibe. Bi guhdarî şirovekirina qedir bixwînin. Em çawa dikarin bi xwe qedirê Ruhê Pîroz bigrin, çawa Civîna Wî?

5 I Nenihêrî wê yekê, wekî Ruhê Pîroz /Ruhê Xwedê/ tu cara nava Kitêba Pîroz da nayê berçavanînê, çawa wekîlê qismê jinê, kirinên Wî carna mînanî wê yekê ne. Bi guhdarî Derketin 1:27 bixwînin û şirove bikin, ku ev gotin çi derheqa xeysetê Xwedê da elam dike, kîjan usa jî xeysetê Ruhê Pîroz dide kivşê. Gelo ev rastî çi cûreyî hukumî li ser heleqetîya we û Ruhê Pîroz dike?

6 I Ruhê Pîroz bi xeysetê gelekî nazik û nerm e. Heger em guhdar nîbin, em dikarin Ruh biêşînin, yan jî bitemirînin. Em dikarin bi wî cûreyî usa bikin, ku Ew nava emirên me da îdî kar neke. Dora gotinên Efesî 4:29–32 bifikirin û hinek tişta cuda bikin, kîjan Ruhê Pîroz diêşînin. Gelo êşandina Ruh ji temirandina Ruh bi çi va cuda dibe, derheqa kîjanêda nava A Têsalonîkî 5:19–22–a da hatîye nivîsarê? Em çawa dikarin ji van her du tişta fesal bin.

7 I Her gunekî mêrive eyan dikare bê baxşandinê, xêncî yekî– *bêhurmetkirina Ruhê Pîroz*. Eşaretîya Îsa di Metta 12:22–32–a da /dîsa Markos 3:22–3O û Lûqa 12:1O/ bixwînin. Bin fikira van xebera da bînine ber çava, ku bêhurmetkirina Ruhê Pîroz çi dide kivşê. Bi fikira we, bona çi Îsa miqabilî vî guneyî awqas berk xeberda?

# KIVŞKIRIN

## TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Ruhê Pîroz dixweze her dem tevî me nava heleqetîyê da be.
- Heleqetî ji tevgirêdanê, hevkarîyê û hevaltîya nêzîk e.
- Tevgirêdan heleqetîyê û hevkarîyê bi hev ra dide girêdanê.
- Hevkarî xebata tevayî ye û ew yek heleqetîya me diha zêde dike.
- Hevaltîya nêzîk asta hevaltîêye here kûr e, kîjanêda em fikirên dilê xwe, xwestin û sura tevî Ruhê Pîroz pareve dikin, lê Ew jî wê yekê tevî me pareve dike, çi ku dilê Wî da heye.
- Ruhê Pîroz, Yê ku bi temamî Xwedê ye, dilên /ruhên/ me çawa mala Xwe bijartîye, bona jîyîna hertimî.
- Em gerekê fesal bin, ku Wî neêşînin, çimkî Ew gelekî nerm û nazik e û dikare rûê kirinên me yên şaş da biêşe.

3

# SÊ DERECÊN HELEQETÎYA

*Bi vî awayî bona Xwedê raw–rizimên xwe hûn xebera Xwedê dikine xwelî. Durûno, Îşaya bona we rast pêxembertî kirîye û gotîye: "Eva cimeta bi zarê xwe qedirê Min digire, lê dilê wan ji Min dûr e. Badîhewa Min dihebînin, temîyên meriva çawa qanûnên Min cimetê hîn dikin".*

– Îsa /Metta 15:6–9, AMP/

## Roja 1–emîn

Îsa berbirî fêrisîya bû bi wê gotinê, çimkî wana îzin dabû, ku *raw– rizim* diha girîng bihata hesabkirinê, ne ku Gotina Xwedê. Ferheng xebera "raw–rizim" çawa "cûrê fikira kirina ye ji kal û bava stendî" şirove dike. Tiştekî kivş e, wekî erf– edet tiştekî xirab nîne. Gelek edetên baş hene, kîjana him ez, him jî malbeta min, yan jî hevalên min xweyî dikin. Fêrisîya edetê bi cûrê fikiraye qebûlkirî pêşda kişandin, ne ku Gotina Xwedê, rûê çi da nava emirên wana da Gotina Xwedê kardar nîbû. Ev rastî roja îroyîn jî ber cava ye. Em gerekê li ser wê fikirê bin, wekî rastî bi Gotina Xwedê tê şirovekirinê, lê ne ku bi texmînkirin, erf– edet, yan jî fîlosofîya meriva.

Îsa şirovekirina xwe berdewam kir û got, wekî edetê fêrisîya heleqetîyên wan ên tevî Afrandar dane teribandinê. Bi gilîkî, Ewî elam kir, wekî hema pesindayîna Xwedê a ji alîyê wan da badîhewa ye, çimkî bawerîya wan diha gelekî himberî gotinên meriva hebûn. Mecala fêrisîya wê tune bûya, ku ew tevî Xwedê nêzîk bûna, çimkî wana gerekê rastî qebûl bikira. Wî cûreyî jî bona heleqetîya tevî Ruh em gerekê fikirên meriva û edeta dayînine alîkî û ewê rastîya derheqa Xwedê da qebûl bikin, kîjan nava Gotina Wî da nivîsar e. Eger usa nîbe, cêribandinên me ên bona nêzîkaya tevî Xwedê wê kardar nîbin, mînanî fêrisîya.

## DERSDARÊ MEZIN

Hetanî nêzîkbûna tevî Ruhê Pîroz min Kitêba Pîroz dixwend û ez difikirîm: *"Ez bi temamîya dilê xwe Xwedê hiz dikim, lê ev hemû tişt hinekî hewaskar nîne".* Bi rastî, min ji Ruhê Pîroz hîvî nedikir, ku tevî dukirina û lêkolînkirina Kitêba Pîroz bibe. Min dît, wekî tenê Ruhê Pîroz Kitêba Pîroz dilê min da dide saxkirinê. Bi saya rêberîya Wî, Kitêba Pîroz ji gotina zêdetir dibe, ew dibe heyîna emir B Korintî 3:6–da nivîsar e:

Ewî ew karîn da me, wekî em bibin qulixkarên Peymana Nû, ne ku yê nivîsarê, lê yê Ruh, çimkî qanûna nivîsar dikuje, lê Ruh dide jîyanê.

"Heca nû", kîjan bi xebera Xwedê hatîye kivşkirinê, navnîşa qanûna nîne. Ew bi xwe emir e û emir dide wana, yên ku gura serkarîya Wî da nin. Em dikarin bereketa Heca Nû bi saya Ruh li ser xwe texmîn bikin, çimkî Ew derheqa wê yekê da elam dike, ku em nava Mesîh da kî ne. Bona vê yekê jî em gerekê Dersdarê Mezin– Ruh dewt bikin, ku Ew tevî lêkolînkirina me a Kitêba Pîroz bibe.

Gelo dersdarê weyî usa hebûye, yê ku bi germayî nêzîkî wê dersê nebûye, kîjanê ew we hîn dike? Min dîtîye, wekî dersên here xirab tevî merivên wî cûreyî derbas dibin. Tevbûna t'evî wan dersa mînanî teyaxkirina êşa diran e. Gelo dersdarê we yê usa hebûye, yê ku şagirta, yan xwendikara hiz nake. Mizgînî ew e, wekî Ruhê Pîroz bi germayî dixweze tiştên xwedêtîyê elam bike û Ew jî we gelekî hiz dike. Ew dixweze, ku her pêşkêşek li cem we hebe, kîjan Mesîh dane we. Heger em hîvî bikin, Ewê hemû şêwirên emir bi temamî elamî me bike.

## ATMOSIFÊRA Û HAZIRÎ

Telebextra fikireke usa pêşda tê, wekî gelek cara em dicêribînin bêyî hazirîya Rêber û şêwirê vî emirê mesîhîtîyê bijîn. Bi praktîkî, roja îroyîn Ruhê Pîroz li gelek civînên me xerîb e. Me bi bêfemdarî hazirîya Wî bi atmosifêra başva guhar'tîye. Tê texmînkirinê, wekî em çetinaya bona Ruhê Xwedê pêşda tînin, çimkî çend meriva bi "cûrê nerast" caba hazirîya Wî dane, yan jî cêribandine wê yekê feş bikin.

Min şaş fem nekin. Ez bawer dikim, wekî qulixên li civîna gerekê

nava atmosifêra baş da derbas bin. Nava çend salên axirîyê da li Civînê gelek guhastinên çandî ên lazim hatine kirinê, kîjan usa jî derheqa atmosifêrayê da nin. Civîn ji gelek alîya va bona dinîyayê bûye tiştê anegor. Ez bawerim, wekî ev yek li Xwedê xweş tê. Çawa Pawlos dibêje: "Çawa ez jî her alîya va li hemûya xweş têm û kara xwe nagerim, lê ya geleka, wekî xilazbin" /A Korintî 1O:33, NLT/. Me xebateke mezin kirîye, me karebûnên şexsîtîyêye afirandarîyê û têxnologîyaên nû dane xebatê. Endamên Bedena Mesîh gerekê merivên nû bin, yên ku radibine ser derecên afirandarîyêye nû. Feqet civînê tu cara tabîya qewat, hizkirin û serwêrîya xwe a li vê dinîayê mijûl neke, heger Ruhê Pîroz dewatî nava şuxulê xwe neke. Bîr bînin, wekî Ew hevalkarê meyî mezin e.

Behsa qenc ew e, wekî em dikarin him nava atmosifêra baş û him jî nava hazirîya Wî da bin. Ez gelekî şa dibim, wextê ku mecal min ra çê dibe, ku ez li civîna biqesidim, kîjan nava van her du goveka da kivş in. Tu cara usa nefikirin, wekî hazirîya Ruhê Pîroz wê çetinayê pêşda bîne, ku meriv herine nava padişatîyê. Em gerekê bîr bînin, wekî yên undabûyî berbi şandîya dicedandin, lê ne ku ew dihatine înkarkirinê, çimkî ew tevî Ruhê Pîroz nava hevkarîyê da bûn. Her pêşketinek bêyî tevbûna Ruh dikare unda bibe.

H'eta Îsa– Kurê Xwedê jî tu tişt nekir, hetanî stendina qewata Ruhê Pîroz /bixwînin Lûqa 4:1–15/. Lûqa 4:14–15–da nivîsar e: "Îsa bi *qewata Ruh* vegerîya Celîlê û nav–dengê Wî hemû alîyên wî welatî da bela bû. Ewî kinîştên wanda hîn dikir û hemûya pesinê Wî didan". Guhdarîyê bidine ser vê yekê, wekî ev gotin elamî me dike, wekî Ew "bi qewata Ruh vegerîya". Nava vê beşê da nivîsar e, wekî peyî wê yekê ra çi qewimî, wextê ku Îsa 4O roj nava qûmistanê da derbaz kirin, wextê ku ew ji alîyê mîrêcin da dihate cêribandinê. Ew ji qûmistanê bi *qewata Ruh* vegerîya Celîlê û elam kir:

> Ruhê Xudan li ser min e, çimkî Ewî ez bi rûnkirinê kivş kirim, wekî Mizgînîyê bidime feqîra û ez şandime hêsîra ra, bo serbestîyê û kora ra bo dîtinê dannasîn bikim, azayê bidime bindesta. Û sala Xudane rehmê bidime naskirinê /Lûqa 4:18–19/.

Îsa karibû xwestina Bavê Xwe ya li ser vê dinîayê biqedîne, çimkî Ew bi qewata Ruhê Xwedê dişuxulî /kar dikir/. Bi wê qewatê jî Civîn gerekê Mizgînîyê bi ruhê kesîba bide naskirinê, dilên şikestî bide qenckirinê, azayê bide bindesta, rêberîyê li meriva bike, ku ew zelal bivînin, rastîyê derheqa wê yekê da elam bike, wekî destê Xwedê bona xilazkirinê kurt nebûye. Emê tu cara evî karê li ser dinîayê nikaribin mîaser bikin, heger em xwe *nespêrine qewata Ruh*. Îsa hewcê qewata Ruh bû. Gelo ev yek derheqa me da nîne?

## Roja 2–emîn

# "EM DIHA GELEKÎ HEWCÊ ÎSA NE"

Ez bi dil dixwezim, wekî hemû meriv, yên ku li civînên me diqesidin, hazirîya Îsa Mesîh texmîn bikin. Ez her dem guhdar dikim, ku çawa meriv dibêjin: "Em li civînên me diha gelekî hewcê Îsan e". Û bi wê yekê ra ez qayîl bûm. Feqet kî Îsa elamî me dike? Ruhê Pîroz. Çawa ku me pêşda da kivşê, Ruhê Pîroz mecal nîn e, berbi kîjanî gerekê em bicedînin. Ew Şexs e, Yê ku gerekê ji alîyê me da bê qedirgirtinê û bi hazirî em Wî qebûl bikin. Gelo bona çi gerekê nexwezin, ku Ruhê Rastîyê nava hemû tiştî da hazir nîbe? Carekê Îsa şagirtên xwe ra got:

> Hê gelek tişt hene, ku ez we ra bêjim, lê niha hûn nikarin wana bibin. Lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, Ewê we berbi temamîya rastîyê bibe. Çikmî Ewê ne ku xweserîxwe xeberde, lê çi ku bibihê, Ewê wê yekê bêje û tiştên ku hê neqewimîne, wê we ra gilî bike. Ewê rûmeta navê Min bilind bike, çimkî Ewê ji Min bistîne û we ra gilî bike. Her tiştên Bavê ku hene, ew yên min in. Lema min got, ku Ruhê ji Min bistîne û we ra gilî bike.
>
> –Yûhenna 16:12–15

Ruhê Pîroz rûmeta navê Îsa bilind dike. Bi saya Ruhê Pîroz e, wekî Îsa li me eyan dibe. Em nikarin dora qeydê ji alîyê Xwedê da kivşkirî, derbas bin. Eger em dixwezin, wekî hazirîya Îsa nava emirên me da diha gelek be, wî çaxî gerekê em tevî Ruhê Pîroz nava heleqetîya nêzîk

da bin. Bo wê yekê Ruhê Pîroz çawa Ruhê Mesîh tê navkirinê /bixwînin A Petrûs 1:11, Romayî 8:9/. Wextê ku Ruq tevî we xeber dide, Ew Îsa raber dike. Ruê Pîroz "zêdekirina" li ser emirê mesîhîtîyê nîne. Ew heyîna Mesîh a li dinîyayê ye. Kivşbûna hazirîya Wî wê li wir tune be, li kîderê Ew qedir nastîne. Bo wê yekê jî, heger em nexwezin qedirê Ruh bigrin, emê hazirîya Mesîh û qewata Wî nevînin. Diqewime hema ev e menî, wekî dinîya gelek cara hesab dike, ku Civîn him ji emir û him jî ji qewatê miqûf e.

## HEVALTÎYA NÊZÎK A TEVÎ XWEDÊ

Meremê heleqetîyêyî dawî hevaltîya şexsî ya nêzîk e. Ruhê Xwedê dixweze bibe hevalê we. Ew dixweze ji nêzîk va tevî we bikeve nava tevgirêdana. Aqûb dibêje: "Yan texmîna we badîhewa dibêje, ku Xwedê demana wî ruhê ber me da ye?" /Aqûb 4:4/. Gelo Ew çi dixweze. Ew dixweze tevî we nava hevaltîya nêzîk da be. Zelal gotî, ev yek dide kivşê, wekî Ewê wê yekê qebûl neke, eger em bi tiştên başqe va hewaskar bin, çawa ku jina min tu cara wê tevî min surên dilê xwe nîvî neke, eger ez tevî jineke mayîn nava heleqetîya da bim.

Xwedê xwepêşkêşkirina bi temamî dixweze. Aqûb nava gotina xwe ya 4:4–ada dibêje: "Hûn nizanin kê vê dinyayê hiz dike, ew neyartîyê li Xwedê dike? Awa kî dixweze bibe yarê dinyayê, ew xwe dike neyarê Xwedê". Xebera "neyartî" nava ferhengê da vî cûreyî tê şirovekirinê: "dijminatî, hiznekirin, xêrnexwezî". Ev xeber gelekî berk in. Em dikarin pirsa vî cûreyî bidin: gelo bona çi hizkirina dinîyayê tevî Xwedê dijminatîyê pêşda tîne?

Bi bûyîna hevalê dinîyayê meriv bi xwestinên bedenê tê rêberkirinê, berbi berjewandîyên xwe dicedîne. Ruhê Pîroz zane, wekî dawîya vî hemû tiştî vala ye. Xwedê bi cûrê hevsûdî me hiz dike û Ew hiz nake, wextê ku divîne, ku em hizkirina xwe himberî tiştên usa didine kivşê, kîjanê me bibine berbi undabûnê. Tu cara bîr nekin, wekî Xwedê Bav e û mînanî her bavekî Ew diêşe, wextê ku divîne, ku lawên Wî xêncî tiştên baş, yên mayîn va mijûl dibin. Bona vê yekê jî Ewê tu cara hevaltîya me ya tevî vê dinîyayê qebûl neke. Îsa dixweze, ku em emirê xwe bi

zêdayê va bijîn, lê Ruh xwestinên Kur elam dike. Bîra xweda xweyî bikin, wekî Xwedêtî bi meremekî ye. Xwedê bi dil berbi heleqetîyên lawên Xwe dicedîne. Wextê ku em lîstikên hizkirinê yên tevî dinîyayê mîaser dikin, em nikarin tevî Wî nava nêzîkaya kûr da bin. Gelo ev yek çawa dilê Bavê diêşîne!

## DIHA ZÊDE, NE KU XILAZBÛN

Min fem kir, wekî meremên Xwedê bona me hê zêde ne, ne ku xilazbûn. Xilazbûn gerekê nebe "cihê sekinandinêyî dawî". Rastîya xilazbûna me awqas baş e, wekî ji femdarîya me zêdetir e, lê cihê meyî li ezmîn tenê destpêka wî hemû tiştî ye, çi ku Xwedê bona me dixweze. Xwedê Kurê xwe şand, ku em bikaribin li ser vê dinîyayê jî layîqî emirê wî cûreyî bin. Bona çi? Çimkî bona me bi rastî wê cetin be, ku bi cûrê kardarî padişatîya Wî belakin, heger em bin hukumê tirs û xwestinên vê dinîyayêda bin.

Carekê Pawlos got: "Hîndarîya qalib kêrî hindik tiştî tê, lê ya xwedênasîyê kêrî her tiştî tê, sozê wê him li vê dinîyayê me ye, him jî li wê dinîyayê" /A Tîmotêyo 4:8/. Guhdarîyê bidine ser xebera *xwedênasî*. Tenê ew merivê ku Xwedê nas dike, dikare xwedênas be, çimkî *xwedênasî dide kivşê ku mînanî Xwedê bin*. Bona min cetin e, ku ez bibime mînanî kesekî, rastî kîjanî ez hindik hatime. Wextê ku em tevî meriva wede derbas dikin, ew hîmlî nava hinek tişta da dibine mînanî me. Bona vê yekê jî Aqûb dibêje: "Xwe li Xwedê bigirin, Xwedê jî wê Xwe li we bigire" /Aqûb 4:8/. Xwedê dixweze wede tevî we derbas bike, ku hûn bikaribin bibine mînanî Wî. Bi rîya heleqetîyên nêzîk ên tevî Xwedê em dibine xwedênas, lê çêkirina heleqetîyên wî cûreyîye tevî Xwedê tenê bi destê Ruhê Pîroz dibe /bixwînin A Korintî 2/.

Gelek cara, wextê ku bawermend dixwînin: "hizkirina vê dinîyayê neyartîya miqabilî Xwedê ye", ew carekê ra dicêribînin ji dinîyayê bi temamî cuda bin.Bêfitîya ev yek tiştekî bêfikir e. Gelo çawa Civîn dikare dinîayê qazanc ke, heger meriva ji xwe bide cudakirinê. Çawa Civîn em gerekê peyî mesela Îsa herin. Yên undabûyî dicedandin tevî Îsa nava heleqetîya da bin. Ewî wede tevî merivên ku bac berev dikirin

û jinên ji rîya xwe derketî derbaz dikir, wan meriva, rêberên kîjanaye ruhanî ji jor wana dinihêrîn. Gelek cara Ew usa jî tevî êvarîyên wana dibû, lê Ew ji wan meriva cuda dibû. Îsa bi mesela Xwe da kivşê, ku çawa meriv dikare li vê dinîayê be, lê ne ji vê dinîayê be. Dilê wî diêşîya bona wan meriva, ji kîjana yên ruhanî xwe dûr digirtin. Gelo bona çi Ewî bi wê derecê xwe pêşkêşî merivên wî cûreyî kiribû? Ewî zanibû, wekî ew meriv şikestî bûn û wana berbi tiştê hê zêde dicedandin. Ew diçû li wan dera bona ku rê nîşanî wan bide.

Bi wî cûreyî, em bona merivên wî cûreyî hatine gazîkirinê. Eger Civîn nebe, dest û lingên Mesîh wî çaxî wê kê bibe? Em û tenê em in bedena Wî. Niha rûê qewata kerema ku diguhêre, em nava *Mesîh da nin*. Em çawa baylozên Wî li ser vê dinîyayê ne. Hxger em rastîya Xwedê nebin, bela nekin, wî çaxî kê wê ewê yekê bike?

### Roja 3–emîn

## CÊNTILMÊNÊ XWE KERKIRÎ

Bi hevaltîya tevî Ruhê Pîroz min tê derxist, wekî Ew cêntilmên e. Ewê tu cara xwestina Xwe dijî me dernexe. Eger em nexwezin tevî Wî nava heleqetîya da bin, Ewê Xwe ker bike.

Eva ji 25 sala zêdetir e, ku ez nava rêwîtîya da me û qulix dikim. Nava vî wedeyîda min hinek şirovekirin derheqa wan şofêra da kirine, yên ku li firegeha tên pêşîya min . Ew her dem bi rehm û dilovan in. Ew bi hûr gilî min ra şirove dikin, ku ezê li kîderê bi mêvandarî bême qebûlkirinê û sehetên qulixkirinên min kîjan in. Feqet ew hîmlî tevî min xeber nadin, hetanî ku ez xeberdanê destpê nekim. Menî ew e, wekî serwêr emirî li ser wan dikin, wekî ew tevî min nekevine nava xeberdanê, çimkî diqewime bona qulixê ez gerekê avtomaşînê da bifikirim û xwe hazir bikim. Nava salên qulixa min da gelek şofêrên bi dilên qulixçî rastî min hatin e û ez ji wana gelekî razîm e. Bo wê yekê jî ez her dem derheqa malbetên wan da dipirsim û ew li civînê çi qulixê dikin, pê dihesim. Heger ez qisê destpê nekim, diqewime ew temamîya rê tu tiştî nebêjin.

Ez bawerim, wekî xeysetê Ruhê Pîroz jî mînanî vê yekê ye. Ewê tu cara tevî me nekeve nava heleqetîya, hetanî ku em nexwezin dengê Wî bibihên. Heger em nêzîkî Wî nabin, gelek cara Ew ker dimîne. Bîr bînin, ku çawa Aqûb got, wekî Xwedê nêzîkî me dibe, wextê ku em nêzîkî Wî dibin. Bona avîtina gava e'wlin em cabdarin.Em gerekê bi femdarî wê yekê destpê bikin, tevî Wî bikevine nava tevgirêdana. Bi gilîkî teglîfkirina here mezin a hemû wedeyî ji alîyê we da ye. Niha hûn gerekê gava biavêjin.

Gelek bawermend derheqa vê rastîyê da ha ji pê tune ne. Bo vê yekê ez gelek cara dibihêm, ku çawa meriv dibêjin: "Bona çi Xwedê min ra xeber nade", yan jî "Eva serê çend sala ye, ku Xwedê min ra xeber nedaye". Gelo ev meriv dicedînin bi cûrê Kitêba Pîroz tevî Xwedê bikevine nava heleqetîya? Heger em dixwezin nêzîkî Xwedê bin, em gerekê bicedînin Wî nas bikin û ew yek jî dide kivşê, wekî em gerekê bicedînin tevî Ruhê Wî hevaltîyê bikin.

Ez piştgirîyê didime we, ku hûn berbi heleqetîya tevî Ruhê Pîroz bicedînin. Hûnê ecêbmayî bimînin, wextê ku hûn bibînin, ku Ew çawa bersiva we dide. Mînanî gelek şofêrên min, Ruhê Pîroz wê tevî we bimîne, nenihêrî wê yekê, ku hûn tevî Wî nava heleqetîya da nin, yan na, çimkî Ewî soz daye, ku wê tu cara me nehêle û neçe /bixwînin Îbranî 13:5/. Heger hûn gava ewlin nevêjin, Ewê çawa qanûn, xwe ker bike û hûnê tu cara hazirîya Wî ya nava emirê xwe da nebînin.

## RASTÎYÊN XWEDÊ ÊN KÛR

Werin em carekê jî beşa xwe, ya Yûhenna 16–ada bixwînin.

> Hê gelek tişt hene, ku ez we ra bêjim, lê niha hûn nikarin wana bibin. Lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, Ewê berbi temamîya rastîyê bibe, çimkî Ewê ne ku xweserîxwe xeber bide, lê çi ku bibihê, Ewê wê yekê bêje û tiştên ku hê neqewimîne, wê we ra gilî bike. Ewê rûmeta navê Min bilind ke, çimkî Ewê ji Min bistîne û we ra gilîke. Her tiştên Bavê ku hene, ew yên Min in. Lema Min got, ku Ruhê ji Min bistîne û we ra gilîke.
>
> –Yûhenna 16:12–15

Îsa derheqa vê yekê da xeberda, wextê ku Ewî wedê xilazîyê tevî şagirta derbaz dikir, pêşîya xaçkirina Xwe. Peyî ra, hinekî dereng, Ew ji alîyê ofîsêrên romayî da hate girtinê û bi mirinê hate gunekarkirinê. Tiştekî kivş e, wekî ev wede bona gotinê grîng û giran bû.

Guhdarîyê bidine ser, wekî Îsa dibêje: "Hê gelek tişt hene, ku ez we ra bêjim, lê niha hûn nikarin wana bibin" /gotin 12/. Îsa bona wan meriva, yên ku çend sala ser hev tevî Wî bûn, hemû tişt bû. Ji wana her yekî malbeta xwe, heval û xebata xwe hiştibû, ku peyî Wî herin. Diqewime şagirt difikirîn: "*Gelo bona tam femkirina hemû tiştî çi me lazime*?". Feqet Îsa nişkêva tiştek soz da: "Lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, Ewê we berbi temamîya rastîyê bibe" /Gotin 13/. Bi gilîkî mayîn: "Rast e, Ez niha /bi bedenê/ tevî we nînim, hûn nava halekî usa da nînin, ku bikaribin wî hemû tiştî bistînin, çi ku Ez gerekê bidime we. Feqet Ez Ruhê Pîroz dişînime cem we û Ewê gotinên Min bêje we, xwestina Min elam bike û wê we bona Wî hemû tiştî hazir bike, çi ku gerekê bibe". Gelo sozdayîneke çawa ye! Niha jî gotinêd Îsa bîr bînin, kîjan Ewî hema wê êvarê hinekî pêşda gotin:

> Lê belê, Ez rastîyê we ra dibêjim, bona we hê rind e, ku Ez herim. Heger Ez neçim, Piştovan wê neyê cem we, lê heger Ez herim, Ezê Wî bişînime cem we.
>
> –Yûhenna 16:7

Ez gumanim, wekî hûn van gotina ji nû va fem dikin. Xwedê usa xeber nade, ku em Wî fem nekin. Em hemû jî dixwezin ji nêzîkva wana nas bikin, kîjana em hiz dikin û Xwedê jî wî cûreyî ye. Wextê ku Îsa li ser dinîyayê bû, Ewî bi cûrê tam da kivşê, ku Bavê çi dabû meriva /bixwînin Îbranî 1:1–3, Kolosî 1:15–19/. Em zanin, wekî niha Îsa li ezmîn li alîyê Bavêyî rastê ye. Ruhê Pîroz ew Şexsê Xwedêtîyê ye, yê ku tevî cimeta Xwedê dijî û li ser vê dinîyayê tevî wan e. Bo wê yekê jî bona naskirina rastîyên Xwedêye kûr em gerekê Ruhê Wî nas bikin–Ruhê Rastîyê.

# TÛMAYÊ ŞIKBER

Peyî wê yekê ra, wextê ku Îsa ji nava mirîya rabû, ji şagirta deh meriv malekê da bûn, derê kîjanê dadayî bû. Nişkêva Îsa li ber wan sekinî. Şagirt zendegirtî mabûn. Îsa mecbûr bû, wana bîne ser wê fikirê, wekî Ew bi Xwe ye li ber wan sekinî. Deh şagirt bo wê yekê şa bûn û hinek wede şûnda wana derheqa wê yekê da Tûma ra gilî kir, yê ku tevî wan nîbû, wextê ku Îsa hatibû. Bi bihîstina wê behsê, Tûma bersiveke vî cûryî da: “Heta ku ez dewsa mixa destên Wî da nebînim, tilîyên xwe nedime ser dewsa mixa û destê xwe jî nekime nekisa Wî, ez bawer nakim” /Yûhenna 2O:25/.

Peyî çend roja ra 11 şagirt maleke mayîn da li cem hev bûn, wextê ku Îsa nişkê va careke mayîn li ber wan sekinî. Hetanî ku tiştek bigota, yan jî bikira, Ew carekê ra berbirî Tûma bû û gote wî: “Baş, Tûma, were em pirsa bêbewrîyê va mijûlbin”. Paşê T’ûma ra got: “Tilîya xwe bîne û li destên Min binhêre, destê xwe jî bîne û bike nekisa Min. Nebawarîyê neke, lê bawer bike /Yûhenna 2O:27/. Tûma lê vegerand û gotê: “Xudanê min û Xwedêyê min!”. Niha bixwînin, ku Îsa çi gote wî:

> Te ez dîtim, lema bawer kir? Xwezî li wan, yên ku nedîtine,
> lê bawar dikin!
>
> –Yûhenna 2O:29

Bi texmîn, Îsa digot: “Tûma heye komeke meriva, yên ku bêyî dîtin wê bawer bikin”.Ez difikirîm: “*Îsa, Tu hindava wî da gelekî berk bûyî. Ew meriv îdî li ser erdê paldayî ye. Eyan e, wekî ew nava halekî xirab da ye. Ew tobe dike. Lê Tu wî dinihêrî û dibêjî: xwezî li wan, yên ku nedîtine û bawer dikin*”. Min nikaribû fem bikira, ku bona çi Îsa awqasî berk berbirî Tûma bû. Lê rojekê, Xudan min ra xeberda: “Ez miqabilî Tûma dernediketim. Min awqasî digot, wekî ewên ku bi Ruhê Min Min nas dikin, dikarin bighîjine dereca nêzîkaêye diha bilind, lê ne ku ew meriv, kîjan bi fîzîkî Min nas kirine”.

## Roja 4–emîn

# SÊ DERECÊN HELEQETÎYA

Bi rastî Îsa bi xeberdana tevî Tûma çi dixwest bigota? Bona dayîna caba wê pirsê îzinê bidin şirove bikim, ku bona çi bi bawarîyê meriv dikare nava nêzîkaya diha kûr da be.

Sê derecên heleqetîya hene– ya fîzîkî, ya ruhdarî û ya ruhanî. Dereca here nimiz ya fîzîkî ye. Gelek heleqetîyên hizkirinê ji vê derecê destpê dibin, bi van fikira: "*Ew jineke gelekî xweşik e*", yan "*Ew mêrekî gelekî baş e*", yan "*Diqewime em destpê bikin rastî hevdu bên?*". Telebext ra, wextê ku meriv dizewicin, piranîya wana li ser vê derecê nava heleqetîya da nin. Ew difikirin: "*Ez dikarim wê yekê hesab hilnedim, ku em baş hev nas nakin, wekî bi rastî bi hev ra nava heleqetîya da nîbûne, hewaskarîyên me mînanî hev nîbûne, bi wê menîyê, wekî ew jina, yan jî ew mêr min xweş hatîye*". Wî çaxî dereca heleqetîyaye ruhdarî kêm pêşdaçûyî ye. Wextê ku şayî tê kirinê, ser hevda tê û emir destpê dibe, ev mêr û jin wê mecbûr bin fem bikin, ku lazime diha gelekî nêzîkayê bi hev ra bikin, çimkî heger usa nîbe, zewaca wan wê ya nebaş be. Heger ew berbi wê yekê necedînin, hewaskarîyên jinêye nava dorana hevaltîya wê da wê cûrekî mayîn bin, lê hewaskarîyên mêr jî nava hevaltîya wî da, wê lap cûrekî mayîn bin. Bi kutasî ewê awqasî bi hev ra bijîn. Bêfitîya, Xwedê usa progiram nekirîye, ku zewaca wan wî cûreyî be.

Dereca heleqetîyaye mayîn, derheqa *ruhdarîyê,* yan *şexsîtîyê da ye*. Dawid û Yonatan li ser vê dereca heleqetîya bûn: "...Dilê Yonatan, dilê Dawid va hate girêdanê. Û Yonatan ew çawa şexsê xwe hiz kir" /A Padişa 28:1/. Wextê ku Yonatan hate kuştinê, Dawid şîn kir: "Birayê min, Yonatan ez bona te diêşim. Tu bona min gelekî hizkirî bûyî. Hizkirina te bona min ji ya jina zêdetir bû" /B Padişa 1:26/. Dawid derheqa heleqetîyên bedenêye ji rîya xwe derketî xeber nedida. Navbera wan da tiştên usa tune bûn. Heleqetîyên Dawid û Yonatan li ser dereca Ruhdarîyê bûn û ew heleqetî ji yên fîzîkî dûr bûn. Feqet wana karibû hevaltîya usaye nêzîk çê bikira, kîjan ji heleqetîyên fîzîkî diha kûrtir bû

/bo çi jî Dawid got, ku ew hizkirin ji ya jinê zêdetir e/.

Zewac gerekê li ser dereca ruhdarî çêbûyî be. Min şaş fem nekin, heleqetîyên fîzîkî jî gelekî girîng in. Jina min gelekî min xweş tê, ez wê hesab dikim çawa jina li vê dinîyayê ye here bedew. Feqet derecên heleqetîyaye diha kûr hene û mêr û jin gerekê bicedînin ku bighîjine wê derecê. Bi rastî, şexsîtîya Lîzayê diha xweşik e, ne ku bedena wê.

Telebext ra min gelek serhatî bihîstine, ku çawa gelek meriva mêr, yan jî jinên xwe rûyê merivekî da hiştine çûne, kîjana bi întêrnêtê nasîya xwe dane hev. Çend sal pêşda min li civîneke qulix dikir û peyî qulixê ra mêrek nêzîkî min bû. Dora wî şeş zarokên biçûk hebûn. Du zarok destên wî da bûn, herduên mayîn nigê wî girtibûn, lê dudu jî li wan dera direvîyan. Ew gelekî xemgîn dihate kivşê. Min jê pirsî:

–Hûn başin?

–Na xêr, ewî got.–Îro jina min ez û şeş zarokên min hişt û bona mêrekî mayîn çû, kîjan ewê bi întêrnêtê nas kiribû.

Heleqetîyên “ruhadrîye” tevî wî mêrî gihîştibûne wê derecê, wekî ewê xwestîye mêrê xwe, tevî kîjanî bi salên dirêj maye, bihêle û here. Tevgirêdana ruhdarî awqas qewat bû, wekî ewê zarokên xwe jî hiştin û çû.

Dereca heleqetîyaye ruhdarîyê gelek cara tevgirêdana fîzîkîye here nimiz e. Bo vê yekê jî heleqetîyên ku di navbera merivên ji hev dûr çê dibin, gelek cara bi zewacên gelekî baş ser hevda tên. Menî ew e, wekî ev meriv xwe li ser pêşdaçûyîna tevgirêdana ruhdarî didine merkezkirinê, bêyî dûrketina rûyê tevgirêdana fîzîkî da.

## DERECA HELEQETÎYAYE HERE BILIND

Dereca heleqetîyaye here bilind û kûr, ya *ruhanî ye*. Îsa tevî Tûma hema derheqa vê derecê da xeber dida. Pawlos dinivîse: “Kî ha ji kêlî– menîyên mêriv heye, pêştirî wî Ryhê nava wî da?” /A Korintî 2:11, NASB/. Bi gilîkî mayîn hûn nikarin derheqa fikirên mêrive rast û menîyên wan da bizanibin, çimkî heleqetîya weye tevî ruhê wî hela hê tune ye.

Çawa ku min îdî da kivşê, van axirîya min û Lîzayê, me 3O–salîya zewaca me da kivşê. Çend bîranînên min ên başe nava wan sala da ew

bûn, wekî em rûdiniştine ber hewzê avê û me derheqa Xwedê û Gotina Wî da xeber dida. Me gelek wede derbaz kirîye, wextê ku me derheqa vê kitêbê da qise kirîye. Dema ku min gilî dikir, ku Xwedê çi kiribû dilê min, ewê bi aqilayî bersiv dida, kîjanê ew hemû tişt ronahî dikir, çi ku Ruh elamî min dikir. Çawa ku heleqetîyên me herdua jî yên tevî Ruh nêzîkin, em dikarin li ser dereca kûr û ruhanî bi hevra bikevine nava heleqetîya.

Heleqetîya Ruhanî menîke hîmlî ye, ku bona çi ez û Lîza tevayî dua dikin. Wextê duakirinê, em dora rastîyên Ruh dikevine nava heleqetîya û navbera me da heleqetîya Ruhanî saz dibe. Me jî qirar kirîye, wekî xebatkarên qulixdarîya "Mêsîncêr Înternêyşinil"–ê her rojeke xweye xebatê, 15 deqe pêşîya xebatê, bi duakirina tevayî va destpê bikin, çimkî em dixwezin, ku navbera endamên komê da tevgirêdana ruhanî hebe. Ev wedê duakirinê, bi cûrekî ecêb hukumî li ser heleqetîyên endamên koma me kirîye. Hema wî cûreyî jî ew yek nava her heleqetîkê da rast e. Heleqetîya dora Gotinê û duakirinê wê navbera meriva da heleqetîya here kûr bide pêşxistinê, çimkî ew yek tevgirêdana ruhanî çê dike.

Di navbera guvtugokirina rastîyên ruhanî û tevgirêdana ruhanîye rast da firqî heye. Carna meriv tevî min derheqa Kitêba Pîroz da xeber didin û ez zanim, wekî ew tenê înformasîyayê didin. Ez çawa dikarim nava wê yekê da guman bim? Ew yek, çi ku ew dibêjin, fikira min didine westandinê. Ew ji fikira xwe xeber didin, lê ne ku ji ruh. Feqet hene meriv, wekî hema ji ruh derheqa rastîyên ruhanî da xeber didin. Ez dikarim bi seheta tevî merivên vî cûreyî, bêyî westandin, qise bikim, çimkî tevgirêdana me li ser dereca ruhanî ye.

### Roja 5–emîn

## XWEDÊ BI RUHÊ WÎ VA NAS BIKIN

Niha werin em bi temamî gotina A Korintî 2:11 bixwînin. "Kî ha ji kêlî– menîyên mêriv heye, pêştirî wî Ruhê nava wî da? Usa jî kes ha ji ya Xwedê tune ye, pêştirî Ruhê Xwedê".

Ew xebera yûnanî, kîjan bi xebera “fikir” hatîye tercimekirinê, çawa “cûrê hal” tê şirovekirinê. Pawlos dibêje, wekî meriv nikare çi ku dilê Xwedê da heye, bizanibe, bêyî naskirina Ruhê Xwedê. Ev naskirin ji zanebûna tomerî zêdetir e, kîjan bêyî xebitandina cedandinê pêşda tê. Hemû kes li Amêrîkayê zane ku kî ye serokê welêt, lê piranîya wana bi şexsê wî wî nas nake. Em nizanin, xwestinên dilê wî kîjan in. Bi wî cûreyî jî emê ji “zanebûna tomerî” Xwedê li ser dereca hê bilind nas nekin, heger Wî bi Ruhê Wî eşkere nekin.

Pawlos gotina xwe didomîne:

> “Me ne ku ruhê vê dinîyayê stendîye, lê ew ruhê ji Xwedê, wekî em wan tiştên ji Xwedê da me ra dayî fem bikin”.
>
> –A Korintî 2:12, ESV

Tu kes fikirên Xwedê nizane, xêncî Ruhê Wî /gotina 11–a/, lê Ewî Ruhê Xwe daye me. Niha, bi tevgirêdana tevî Ruhê Xwedê, em dikarin li ser dereca ruhanî *tevî Efrandar nava heleqetîyê da bin, kîjan dereca heleqetîyaye here bilind e:*

Pawlos tevî Ruh li ser vê derecê nava heleqetîyada ye. Nenihêrî wê yekê, wekî ew tu cara rastî Îsa nehatibû, lê ewî dinivîsî: “Ez vê yekê li we didime hesandinê, xwîşk– birano, ku ew Mizgînîya min dannasîn kir, ne ya meriva ye. Min Ew ji meriva nestend, ne jî ji kesekî hîn bûm, lê Îsa Mesîh min va eyan kir” /Galatî 1:11–12/. Gelo Îsa çawa Pawlos va eyan bû? Pawlos digot, wekî ewî ew mizgînî ji meriva nestendîye. Heger ewî ji meriva nestendibû û rastî Îsa nehatibû, wî çaxî ewî ew eyantî bi *Ruhê Mesîh* /Ruhê Pîroz/ stendibû.

Gelo ew yek tiştê bûyînê ye, wekî Pawlos tevî Îsa nava heleqetîya diha kûr da bûye, bona wê yekê, wekî tu cara ewî Îsa bi bedenê nedîtibû? Petrûs, yê ku Îsa bi bedenê dîtibû, dawîya emirê xwe name nivîsî, kîjanê da da kivşê: “...çawa Pawlosê birê meyî delal jî bi wê serwextîya ku ji Xwedê jê ra hatîye dayînê, we ra nivîsî. Hemû namên xwe da jî ew bona van tişta xeber dide. *Wan da çend tişt hene, ku bi zehmet tên femkirinê...*” /B Petrûs 3:15–16/. Petrûs bi xwe çend sala tevî Îsa nava heleqetîya da bû, Ew dîtibû. Ew li wir jî hazir bû, wextê

ku Îsa xaç kirin, rastî Wî hatibû û peyî hilatina Wî ra jî pêra xeber dabû. Çawa jî hebe, evî şagirtî yê ku bi çend sala ser hev Îsa dîtibû, got, wekî nava eyantîyên Pawlos da çend tişt hene, kîjan ewî ji Ruh stendibûn, bi zehmet tên femkirinê. Ez bi xwe bawer dikim, wekî ev gotin dide kivşê, wekî Pawlos tevî Îsa nava heleqetîya gelekî kûr da bû, ne ku Petrûs.

Petrûs piranîya kitêbên Kitêba Nû bi ruhdarîya Ruh nivîsîne, feqet ew tevî Îsa nava heleqetîyên bi bedenê nîbûye. Ewî karibûye wê yekê bike, çimkî Ruh Îsa eyan dike. Gotinên Îsa bîr bînin:

> "Hê gelek tişt hene, ku ez we ra bêjim. Lê niha hûn nikarin wana bibin, lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, Ewê we berbi temamîya rastîyê bibe" /Yûhenna 16:12–13 NLT/.

Pawlos nikaribû wê bawerîyê bide hîmdanînê, kîjan li cem wî himberî Îsa, li ser heleqetîya fîzîkî hebû, çimkî tu cara ewî Îsa nedîtibû. Ew mecbûr bû bawer bike û bibîne bêyî dîtinê. Heleqetîya vî cûreyî her faktoreke fîzîkî da tê dûrxistinê, kîjan dikaribû çetinayî pêşda bianîna bona çi ku Ruh dicêriband elam bike. Îsa dixwest hema vê yekê bêje, wextê ku Ewî Tûma ra xeber dida. Ew yek, wekî heleqetîya Pawlose bi bedenêye tevî Îsa tune bû, dida kivşê, wekî ew gerekê xwe bisparta *heleqetîya* ruhanîye tevî Xudan. Rêke başqe tune bû.

Mînanî Pawlos me mecal stend peyî Îsa herin, bêyî şaş femkirinê, kîjan dikaribû rûyê helqetîya fîzîkî da pêşda bihata. Tiştekî ecêbmayînê ye, wekî em dikarin bêyî dîtina Îsa diha gelekî nêzîkî Wî bin. Çawa ku karebûna meye bona heleqetîyên fîzîkîye tevî Îsa tune ye, em gerekê bi Ruhê Mesîh va tevî Wî bikevine nava heleqetîya, Yê ku nava me da dijî û heleqetîyên kûr, ruhanî tevî Xwedê çê dike. Gelo çiqas baş e!

## TEVÎ WÎ LI SER DERECA DIHA KÛR BIKEVINE NAVA HELEQETÎYA

Xwedê zane, wekî bedena me hela hê xilazbûyî nîne. Ruhên me xilazbûyî ne û ew mînanî şikilê Îsayî rast in /bixwînin A Yûhenna 4:17/. Şexsên me hela hê nava şuxulkarîya bona dayîna bahê xwe da nin /bixwînin Aqûb 1:21/. Feqet bedenên me hela hê gerekê bêne

xilazkirinê. Gelo we dîtîye ku çiqas bi hêsanî em ji hinek tişta diwestin. Meriv dikare avtomaşîneke nû bikire û peyî hevtêkê ra ew li ber çavê mêriv çawa ya kevin bê kivşê. Eva tebyeta bedena nexilazbûyî ye. Dereca bedenê gelekî kûr nîne. Ew wede kurt e û zû derbaz dibe. Bo wê yekê jî Xwedê bi rehmbûna Xwe dibêje: "Ez bi fîzîkî cimeta Xwe va eyan nabim. Ezê mecalê bidime wan, ku ew bi Ruhê Min tevî Min bikevine nava heleqetîya, bona ku ew bikaribin Min rast nas bikin". Tê bêjî Xwedê dibêje: "Ezê tevgirêdana li ser dûrayê tevî wan meriva xweyî bikim, yên ku Min hiz dikin, bona ku ew bikaribin dilê Min nas bikin".

Çawa civîn –em Dergîstîya Îsa ne. Xwedê me bona zewaca tevî Wî hazir dike. Ew îzinê dide, ku hetanî naskirina bi dereca fîzîkî, em bi dereca ruhanîye here kûr Wî nas bikin. Bona vê yekê jî Pawlos paşê nivîsî: "Çi li me dikeve, em îdî niha kesekî bi teherê merivayê nanihêrin. Rast e, wextekê me bi teherê merivayê Mesîh nihêrî, lê niha îdî em usa nanihêrin /B Korintî 5:16/. Em Wî bi Ruh, bi Ruhê Xwedêyî sax, nas dikin. Wede hebû, wextê ku Mesîh bi bedenê eyan bibû, lê niha, çawa ku Ew bi fîzîkî li ser vê dinîyayê nîne, mecala me heye, ku em bi Ruh Wî nas bikin.

Heger em heleqetîya tevî ruh hesab hilnedin, emê ji mecala naskirina Kur miqûf bimînin. Ruh nava dilê Xwedê û fikira Wî da hemû tiştî guvtugo dike, bona ku me elamî Îsa bike. Heger hûn dixwezin heleqetîyên weye tevî Xwedê hebin, hûn gerekê ji wan zanebûnên tomerî pêşda herin û destpê bikin heyîtîya Wî ye rast eşkere bikin. Ev rêwîtî tenê bi heleqetîya tevî Ruhê Pîroz dikare bibe. Bona vê yekê jî em nikarin li rex her edetekî bin, kîjan li ser hîmê Gotina Xwedêye heta–hetayê nehatîye hîmdanînê. Heger em îzinê bidin ku şirovekirinên bi kêmasîya û cêribandinên xirab fikirên meye derheqa Ruh da nav–hevxin, emê hazirîya Xwedêye nava emirên xwe da nevînin. Em nikarin Xwedê bêyî Ruhê Wî naskin.

Ez bawer dikim, ku hûn dikarin tevî Ruh bikevine nava heleqetîyên usa, wekî hûnê wê yekê bixwezin, çi ku Ew dixweze û hûnê Wî texmîn bikin. Dereca heleqetîyaye Ruhanî bona we nêzîk e. Li ser vê derecê hûnê nêzîkaya tevî Xwedêye usa eşkere bikin, kîjan ne mînanî tu yekê

ye. Hûn gerekê bicedînin Ruhê Pîroz nas bikin, heger hûn hazir dibin tevî Wî bikevine nava heleqetîya. Hûn çawa dikarin Wî nas bikin? Bi xwendina Gotina Wî û bi derbaskirina wedê nava hazirîya Wî da. Xwedê dixweze nêzîkî we bibe, hûn jî gerekê gava ewline berbi Wî biavêjin.

Deqekê dora vê beşa jêrê bifikirin û îzinê bidine Ruh, ku ew dilê we da bixebite. Hîvî ji Wî bikin, ku her cûrekî fikirdarîyê bide dûrxistinê, kîjanî îzin nedaye, ku hûn hazirîya Wî texmîn bikin. Wextê ku ev xêlî bêne dûrxistinê, hûnê bikaribin Wî bivînin. Wextê ku hûn sifetê Wî binihêrin, Ewê we werguhzêzî mînanî Xwe bike.Ezê bi gotinên Pawlosê şandî va ser hev da bînim:

> Lê gava yek li Xudan vegere, hingê “ew xêlî tê hildanê”. Û ew Xudan Ruhe û Ruhê Xudan li ku derê be, li wê derê jî azayî heye. Awa em hemû jî rûkî bêxêlîkirî mîna neynikê şewqa rûmeta Xudan vedigerînin û em tên guhastinê, dibine xût ew sûretê wî û rûmetê da hêdî– hêdî pêşda diçin, ev yek bi alîkarîya Xudan e, ku xwexwe Ruh e.
>
> –B Korintî 3:16–18, NLT

# WÎ ÇAWA DERSDARÊ XWE QEBÛL BIKIN

*Ew Ruhê ku we ji Mesîh stendîye, nava we da dimîne. Îdî ne hwece ye, ku yek we hîn bike, ku çiî ye rastî. Çimkî Ruh wî hemû tiştî we hîn dike, hewcê kîjanêne hûn, û ew çi ku hîn dike, rast e, ne derew e. Çawa Ewî hûn hîn kirin, nav Mesîh da usa bimînin.*

– A Yûhenna 2:27, NLT

Ruhê Pîroz nava emirê me da gelek rola diqedîne, lê bi texmîn rola here mezin, ya dersdarîyê ye. Ew her dem me tiştekî hîn dike. Ew rola dê– bava diqedîne, Yê ku her dem nava me da ye, rêberîyê li me dike û me bi xeysetê Xweyî nerm dide rastkirinê.

Kitêba Pîroz, kitêba dersêye bêwede ye. Kitêba Pîroz da fikirên Xwedê hatine nivîsarê. Bona fikirdarîya, xeberdan û kirina mînanî Xwedê bona me Xebera Wî lazim e û me ra lazim e, ku em wê fem bikin. Meremê Dersdarê me ew e, ku Ew nava rastîyê da rêberîyê li me bike. Ew wê yekê dike û fikira wan xeberên ji Kitêba Pîroz elamî me dike, hewcetîya kîjana wî çaxî ye, wextê ku em hewcê wê yekê ne. Avtor û serwêr Frênsîs Frêncîpêy dibêje:

> Gotina Xudan tevî Ruhê Pîroz ew mecal e, kîjan me dibe berbi guhartina meye bi sûretê Îsa... Gotin Xwedê ye. Kitêba Pîroz Xwedê nîne, lê ew ruh, k'îjan ji wan xebera pêşda tê, Xwedê ye. Qedirê vî Ruhê Pîroz gerekê çawa Xwedê bigrin. Bo wê yekê jî, wextê ku em Xudan digerin... dua bikin, wekî hûn Gotinê tenê bi fikira xwe nexwînin. Dewsa wê yekê hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku bi Gotinê, dilê we ra xeber bide...Bi milûktîyê wê xebera nava we da çandî qebûl bikin, ya ku dikare Ruhê we xilaz bike.
>
> –Aqûb 1:21

Bisekinin û ji xwe bipirsin: *"Ez çi cûreyî nêzîkî Gotina Xwedê*

*dibim? Gelo ez Dersdarê xwe bona hînkirina Xwe teglîf dikim? Gelo ez bi guhdarî Gotinê dixûnim, yan jî gelo ez ji Gotinê tiştekî distînim?*". Lê niha ji Ruh bipirsin: "Ez çi dikarim bi cûrekî mayîn bikim, bona ku Gotin sax be û bibe beşeke heyîna min?". Wê yekê binivîsin û bidine xebatê, çi ku Ew elamî we dike.

Gelo wedê tevî Xwedê derbazkirî yê tek– tenê ye, wextê ku Ruh hîn dike? Na xêr. Ew *her dem* hîn dike û heger texmînkirina weye himberî dengê Wî aktîv e, Ew dikare li ser her gavekê hîn bike. Frêncîpêyn pêşnîyar dike:

> "...her dem bloknotê û qelemê li cem xwe xweyî bikin... em bona jîyana nava Wî da hatine gazîkirinê, lê ne ku bona seredana li cem Wî... Hûn gerekê guhdarîya xwe usa pêşxin, ku Ruh bikaribe li her ciha derheqa her tiştî da we ra xeberde. Qedirê Wî bigrin û Ewê qedirê we bigre".

Ev yek bona her kesî cûre– cûre tê kivşê. Wî tiştî, mecalê, bidine xebatê, kîjan bona we fesal e. Ew yek girîng e , ku hûn guhdar bikin, wextê ku Ew xeber dide û çi ku Ew dibêje bîra we da bimîne.

Bi guhdarî dora van gotina bifikirin. Gelo Ruh derheqa Gotinê da çi elamî we dike?

**B Tîmotêyo 3:16–17, B Petrûs 1:19–21**

**Q. Ducarî 6:6, 11:18, Zebûr 119:9–11, Kolosî 3:16**

**Zebûr 19:8,119:1O5,13O Gotinên Silêman 4:2O–23, 6:2O–23**

**Îbranî 4:12, Aqûb 1:21, Yêrêmîya 23:28–29**

___________________________________________________________

__________________________________________________________

*“Gazî Min bike û Ezê bersiva te bidim. Ezê tiştên gelekî xweş te ra gilîk biim, kîjan teyê tu cara bi xwe nikaribûya fem bikira”.*

– Yêrêmîya 33:3, MSG

# ÇAWA XUDAN XWE PÊŞKÊŞÎ WÎ BIKIN

*Îsa lê vegerand: "Eve temîya here girîng: Xudan– Xwedêyê me, Xudanê meyî tek– tenê ye. Û tu gerekê Xudan Xwedêyê xwe, bi temamîya dilê xwe, bi temamîya canîya xwe, bi temamîya hişê xwe û bi temamîya qewata xwe hiz bikî".*

– Marqos 12:29–3O, NLT

Xudan, Yê ku bi dil me hiz dike û dixweze ku hizkirina me tenê berbi Wî be. Ew naxweze, ku hizkirin û guhdarîya me li ser vê dinîayê yan jî hemû tiştên mayîn bin, kîjan li vê dinîayê ne. Ew dibêje:

> Rê ên vê dinîyayê hiz nekin. Ne jî wan tiştên, ku diniyayê da hene, hiz bikin. Hizkirina dinîyayê we ji hizkirina hindava Bavê dûr dixe. Hemû tiştî, çi ku li vê dinîyayê diqewime û xwestina, ku we ra çawa ya grîng tê texmînkirinê Bavê ra girêdayî nîne. Ew yek we ji Wî dûr dixe. Dinîya û temamîya xwestina wê nêzîkî undabûnê dibe, lê ewê ku emirê Xwedê diqedîne, wê heta– hetayê bimîne.
>
> – A Yûhenna 2:15–17, MSG

Van beşên Kitêba Pîroz ***bixwînin***: Metta 16:24–26, Tîto 2:12–14, Aqûb 4:4–6, Yûhenna 15:18–21, Romayî 12:2.

**We xwe pêşkêşî çi kirîye?:** bi bêqelpî xwe guvtugo bikin. Ji xwe bipirsin:

*Kî yan jî çi piranîya wede û guhdarîya min distîne? Ez bi çi va mijûl dibim, wextê ku wedê min ê aza heye?*

____________________________________________________________

____________________________________________________________

___________________________________________________________

*Kî yan jî çi moralê min bilind dike? Gelo tiştên têxnolongîyaên nû, yan jî tiştên mayîne modêrn nava emirê min da cihekî* kivş digrin?

*Li ser çi ez pera xerc dikim?*

*Ez gişkî zeftir derheqa çi da difikirim? Gelek cara ez derheqa çi da xeber didim? Derheqa çi da ez her dem dua dikim?*

> Gotinên me elam dikin, ku me xwe pêşkêşî çi kirîye. Îsa got, wekî ji devê me ew tişt derdikevin, bi çi va dilê me tijî ye /bixwînin Lûqa 6:45/

Bersivên xwe lê binihêrin. Ji Ruhê Pîroz bipirsin: "Gelo hewcetîya min heye, ku Tu pirsên mine girîng bidî guhartinê? Gelo nava emirê min da tiştekî usa heye, ku bûye pirsa here girîng? Gelo tiştekî usa heye, berbi çi ez diha gelekî dicedînim, ne ku li berbi Te?". Ew çi bersivê dide? Ew we berbi çi dief dide, ku hûn xwe pêşkêşkirina hindava Wî da paşda vegerînin?

Dora gotinên Xwedêye nava Metta 6:19–21 û Kolosî 3:1–17–da bifikirin. Van gotina bidine xebatê, ku bi hîvîkirina Ruhê Pîroz *dua ê xwepêşkêşkirinê* binivîsin, bona ku alî we bike, ku hûn nava gurêkirina Xudan, Xwedêyê xwe da bimînin.

# GIHÎŞTINA BERE–BERE, YA BI KEREMA WÎ

*Em tên guhastinê û diha gelekî dibine mîna Mesîh: emirên me bere– bere ronahî dibin û wî çaxî diha bedew dibin, wextê ku Xwedê dikeve nava emirên me û em dibine mînanî Wî.*

– B Korintî 3:18, MSG

Hinek wede pêşîya xaçbûnê, Îsa gotineke kilît derheqa Ruhê Pîroz da got: "Hê gelek tişt hene, ku ez we ra bêjim. Lê niha hûn nikarin wana qebûl bikin. Lê gava ew Heval bê– Ruhê Rastîyê, Ewê destê we bigire û wê rêberîyê berbi temamîya rastîyê li we bike…" /Yûhenna 16:12–13, MSG/.

Îsa her tiştî zane. Ewî dikaribû derheqa rastîyên cuda–cuda da tevî şagirtên Xwe xeberda, lê Ewî zanibû, wekî wana hela hê gotinên Wî nikaribûn fem bikirana. Bona wana wede lazim bû, ku ew bi Ruhanî bighîştana. Wextê ku Ew mir, ji nava mirîya rabû û berbi ezmîn hate hilatinê, Bavê Ruhê Xwe şand, ku alî me bike, ku bi k'erema Wî em bere– bere bigihîjin.

Gelo bavê baş wê hîvîya wê yekê be, wekî zaroka tezebûyî fem bike, ku çawa hesaba dikin, yan jî wextê ku teze destbi gerê dike, bikaribe kaxezên hesaba tijî bike? Na xêr. Bi wî cûreyî jî Ruhê Pîroz hîvîyê ye, hetanî ku em bighîjin, wê rastîyê fem bikin, kîjanê Ew gerekê bêje me. Ew ne tenê rêberîyê nava rastîya Kitêba Pîroz da dike, lê usa jî berbi rastîyê rêberîyê dike.

Anegorî Gotina Xwedê, em bi Ruhanî digihîjin, dibine mînanî Îsa. Nava vê şuxulkarîyê da beşa me jî heye, mînanî ya Ruhê Pîroz. Dora van gotina bifikirin: Fîlîpî 1:6, 2:12–13, A Têsalonîkî 5:23–24 û Îbranî 13:2O–21. Nava van gotina da Ruh derheqa gihîştina ruhanîye nava Mesîh da çi elamî we dike?

Çarlz Spêrcên nîveka sedsala 19–a da li Brîtanîayê serwêrekî eyan bû. Ew nivîskarekî çawa dibêjin bi bereket bû, yê ku derheqa gelek têma da dinivîsî, nava wan da usa jî derheqa Ruhê Pîroz û gihîştina ruhanî da. Ewî got:

> “Ew çi ku em bi xwe nikarin bikin, bona wê yekê îtbarîya xwe li Îsa tînin. Heger qewatên me têrê bikirana, wî çaxî bona çi emê hîvîya Wî bûna. Karê Ruhê Pîroz çêkirina meye ji nû va ye. Ewê dewsa me bawer neke, ne jî em gerekê dewsa Wî xebatê bikin. Me ra lazim e, em gura Wî da bimînin. Xudan we hukumî li ser bûyîna me bike”.

Diqewime hûn bifikirin: “*Ez gerekê bi ruhanî diha gihîştîbim*”. Cih nedine wê fikirê, ew yek rast nîne. Hûnê wî çaxî tenê gunekarkirinê texmîn bikin û hûnê qewatên xweye ruhanî unda bikin. Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, bi gotina Te ez niha li kîderê me /kîjan e asta gihîştîbûna mine ruhanî/? Ew çi dibêje we?”.

________________________________________________________________________

Hûn gerekê xwe usa bibînin, çawa Ruh dibîne. Hîvî ji Wî bikin, ku Ew keremê bide we, bona ku hûn halê xweyî ruhanîyî niha qebûl bikin û gihîştina xwe bidomînin.

Gelo we cêribandîye, ku hûn xwe biguhêrin? Heger usa ye, wê demê ew yek çawa ye? Niha hûn bi cûrekî mayîn çi dibînin?

# QÎMETÊ BIDINE WAN TEVGIRÊDANÊN XWEDÊTÎYÊ, KÎJANA EW ÇÊ DIKE

*Ji merkeza heyîna xwe hiz bikin, qelpîyê nekin… Hevalên baş bin, yên ku bi kûrayî hiz dikin: her dem rola duda da bin.*

– Romayî 12:9–1O, MSG

Em çêbûne ku tevî Bavê û merivên başqe bikevine nava tevgirêdanê. Gelo emirê we wê bêyî heleqetîyê çi cûreyî bûya? Heger hemû heleqetîyên nava emirê we da dûrxistana, wê çawa bûya? Wî çaxî wê emirekî tenêbûnê û vala bûya.

*Şikir ji Xwedê, bona heleqetîya.* Hevalê xwedêparêz bêqîmet e. Hevalê baş fikira me û ruhê me saz dike, çawa ku hesin hesin tûj dike. Hevalê baş şaşîyê dide kivşê û rast dike, heger lazim e. Hevalê baş açixîyên we dide kivşê û wextê çetinaya jî piştgirîyê dide we.

> Bona te diha baş e, ku hevalê te hebe, lê ne ku tenê bimînî, çimkî wî çaxî tê lezeta mezin ji Wî bistînî, çi tu qazinc dikî. Heger tu bikevî, hevalê te dikare alî te bike û te bilind bike. Lê heger tu bikevî û li rex te heval tune be, wî çaxî tu bi rastî nava qezîayê da yî.
>
> – Stiranên Silêman en Evîntîyê 4:9–1O, CEV

Em pê hesîyan ku sê derecên heleqetîya hene– ya fîzîkî, ya ruhdarî û ya ruhanî. Gelo zanebûna derheqa vê yekê da alî we dike, ku hûn heleqetîyên niha fem bikin? Gelo wextê heleqetîya tevî kê ev zanebûn diha gelekî karê didin? Bona çi?

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

Heleqetîya here kûr û ya here fikirdar, kîjan dikare tevî meriva hebe, ya li ser dereca ruhanî ye. Wê heleqetîyê şirove bikin. Gelo heleqetîya dereca ruhanî ji ya fîzîkî, yan jî ruhdarî bi çi va bilindtir e?

Gelo merivên usa hene, tevî kîjana hûn dixwezin heleqetîyên kûr bidine pêşxistinê? Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, ez çi dikarim bikim, ku tevî wan meriva nava heleqetîyên ruhanî da bim, kîjan Te anîne nava emirê min?”. Xwe bedeng bikin û guhdar bikin. Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku Ew we ra dibêje.

**Duakirina bona tevgirêdanên xwedêtîyê:**

*Ruhê Pîroz, tevgirêdanên xwedêtîyê bide min. Çawa ku Yonatan bû bona Dawid, çawa ku Hrût bona Noyêmîyê û Yûhenna bona Îsa, usa jî tevgirêdana bona min saz bike tevî wan meriva, tevî kîjana Tu dixwezî ku ez nava tevgirêdana da bim. Kerema Xwe bide min bona pêşxistina hevaltîyên saxlem, nava kîjana da wê bibin usa jî hevaltîyên li ser dereca ruhanî. Bi navê Îsa. Amîn.*

**Bona lêkolînkirina paşê…**
Gotinên Silêman 13:2O, 19:9,17, 27:6, 1O,17, Yûhenna 15:13, A Yûhenna 1:7, A Padişa 18:1–4.

Ders Roja 5–emîn

# TEVÎ XWEDÊ LI SER ASTA HERE KÛR BIKEVINE NAVA TEVGIRÊDANA

*...Hîn bibe, Xwedêyê Bavê xwe nas bike û bi dil û can Wî bihebîne, çimkî Xudan hemû dila guvtugo dike û her meremekî fikira zane.*

–A Dîrok 28:9, NLT

Cecandina Xwedêye here mezin ji nêzîk va naskirina we ye. Ew pêşnîyar dike, ku hûn temamîya emirê xwe tevî Wî derbas bikin. Gelo ji vê pêşnîyarê zêdetir dikare pêşnîyareke mayîn hebe? Pawlos got: "Û serda jî ez her tiştî bi zîyan hesab dikim û himberî vê yekê nakim, ku Xudanê xwe Mesîh Îsa nas bikim, ku kara ser kara ye! Bona xatirê Wî ez ji her tiştî qetîyam û çawa gemar hesab dikim, bo ku Mesîh qazanc bikim" /Fîlîpî 3:8, NLT/.

*Naskirina kûrayên Îsa Mesîh* xwestina Janna Gîyonê bû. Mîsîya wî cûreyî bona wê awqas girîng bû, wekî ewê kitêbek nivîsî, hema bi wê sernivîsarê. Evê jina fransiz, ku sedsala 17–a da hatiye dinîyayê, hukum nava emirê bawermendên usa da hiştîye, yên mînanî Con Vêslî, Hadson Têylor û Woçman Nî. Ew derheqa nêzîkayê da dinivîse:

> "Îzinê bidin ji we bipirsim… gelo hûn dixwezin bi kûrayî Xudan nas bikin? Xwedê jîyana vî cûreyî *kirîye tiştê bûyînê.* Ewî bi wê keremê usa kirîye, kîjan Ewî daye hemû lawên Xweye xilazbûyî. Ewî ew yek bi destê Ruhê Pîroz kirîye. Dêmek, çawa dikarin bêne cem Xudan, ku bi kûrayî Wî nas bikin? Kilîta wê hema duakirin e".

Weyê duakirin çawa şirove bikira, çawa mecala naskirina Xwedêye ji nêzîk va? Bi guhdarî duayê Îsa Metta 6:5–15–a da bixwînin. Hûn ji Wî çi dikarin nava emirê xwe da bidine xebatê?

Çawa ku em pê h’esîyan, wextê ku em tên dinîayê, Ruhê Pîroz nava me da îdî jîyanê îzbat dike. Ruh bi destê ruhê me tevî me dikeve nava tevgirêdana. Janna Gîyon gotina xwe didomîne: “Hûn dikarin Xudan tenê nava ruhê xweda bivînin. Hema li wir Ew dijî. Carekê Xudan soz da, ku wê bê û wê nava me da bijî /Yûhenna 14:23/. Ewî soz da, wekî wê rastî wana bê, yên ku pesinê Wî didin û xwestina Wî li vir diqedînin. Xudanê nava ruhê we da *rastî we bê*. Hema dilê we berbi Xudan vegere, hûnê hazirîya Wî texmîn bikin”.

Mecala here nêzîk, bi kîjanê em dikarin Xwedê nas bikin, ya bi Ruhê Wî ye, bi Ruhê Wîyî Pîroz, Kîjan Ewî daye me /bixwînin A Korintî 2:9–12/. Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, gelo nava min da hene kêmasîyên usa, yên derheqa Te da, kîjan texmînkirina min, ya derheqa Te da dide navhevxistinê? Bi guhdarî guhdar bikin. Hîvî ji Wî bikin, ku Ew hemû fikirdarîyên ku we ji Hazirîya Wî dûr dihêlin, dûrxe. Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku Ew elam dike.

Dora vê rastîyê bifikirin: hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku dilê we da kemala vê beşê elam bike.

> Lê gava yek li Xudan vegere, hingê ew xêlî tê hildanê.Û ew Xudan Ruh e û Ruhê Xudan li kîderê be, li wê derê jî azayî heye. Awa ew hemû jî rûkî bêxêlîkirî mînanî neynikê şewqa rûmeta Xudan vedigerînin û em tên guhastinê, dibine xût ew sûretê wî û rûmetê da hêdî– hêdî pêşda diçin, ev yek bi alîkarîya Xudan e, ku bi xwe Ruh e.
>
> – B Korintî 3:16–18, NLT

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz" çawa beşeke "Berevoka Mêsîncêr"–êye dersa lêkolîn dikin, em hîvî dikin, ku hûn vîdêoya dersaye sisîya temaşe bikin.*

1 I Îsa got, wekî fêrisîya erf–edetên xwe ji qedirê Gotina Xwedê girîngtir hesab dikirin. Erf– edetên meriva çi ne û bona çi ew zîyanê didine heleqetîyên meye tevî Afrandar? Meselekê bînin ber çava, ku meriv çawa erf– edetên xwe ji rastîya Gotina Xwedê girîgtir hesab dikin.

2 I Ruhê Pîroz dixweze bibe hevalê meyî herî baş û Ew tevî me nava heleqetîyên nêzîk da be. Li vê dinîyayê tiştên usa hene, kîjana guhdarî û hizkirina Civînê /bawarmenda/ dizîne. Bi fikira we ew tişt kîjanin? Gelo wê çi biqewime, heger em vê dinîyayê hiz bikin– berbi xweşîyê, hebûnê û tiştên mayîn bicedînin, lê ne ku berbi heleqetîya tevî Ruh?

3 I Îsa nava gotina Yûhenna 2O:29–a da çi elamî Tûmayê şandî dike? Ev rastîya çi cûreyî nava B Korintî 5:16–a da gotinên Pawlosê şandî va tê girêdanê? Anegorî vê rastîyê, heleqetîya meye nêzîke tevî Xudan bi çiva baştir e?

4 I *Hersê derecên heleqetîya* nav bikin û şirove bikin, kîjan tevî meriva hene. Heleqetîya here kûr kîjan e? Em çawa dikarin tevî meriva bikevine nava heleqetîya bi asta here kûr?

5 I Nava Ruhê Pîroz da pêşkêşa nebînayî bona me hatîye dayînê– karebûna naskirina Xwedêye ji nêzîk va. Guhdarîyê bidine ser A Korintî 2:11–16. Gelo Ruhê Pîroz nava vê becşê da bona naskirina Xwedê çi elam dike?

6 | Cêribandina Petrûs û şagirtên mayîn hebû, ew tevî Îsa ketibûne nava tevgirêdana. Cêribandina Pawlose wî cûr’eyî tune bû, feqet ew jî bi cûrê qewat ji alîyê Xwedê da hate xebitandinê. Ew yek çi cûreyî dikaribû biqewimîya?

**Zêde bixwîne:** Yûhenna 2O–29, B Korintî 5:16 û B Petrûs 3:15–16

7 | Gelo heleqetîyên me û yên Xwedê wê çi cûreyî bin, heger em necedînin tevî Ruhê Pîroz nava heleqetîya da bin. Heger hûn dixwezin tevî koma xwe bi mecalên praktîk fikira pevbiguhêrin, bi kîjana hûn tevî Ruhê Pîroz ketine nava heleqetîya û we hevaltîya Wî texmîn kirîye.

KIVŞKIRIN

## TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Heger em dixwezin bi kûrayî û ji nêzîk va tevî Xwedê bikevine nava heleqetîya, em gerekê Wî bi Ruhê Wî nas bikin.
- Tenê Ruh zane û tenê Ew fikirên dilê Xwedê û meremên Wî elam dike.
- Ruhê Xwedê bona me hatîye dayînê: Ew dersdarê herî mezin e, Yê ku nava temamîya rastîyê da rêberîyê li me dike.
- Hizkirina vê dinîayê dide kivşê ku meriv dijminê Xwedê ye.
- Ruhê Pîroz cêntilmên e: Ewê xwestin û hevaltîya Xwe li me nede mecbûrkirinê.
- Her sê astên heleqetîya evin: ya fîzîkî /ya here nimiz/, ya ruhdarî /yan jî şexsî/ û ya Ruhanî /ya here kûr û ya here nêzîk/.
- Em dikarin bi kûrayî û ji nêzîk va Xwedê bi destê Ruhê Wî nas bikin, lê ne ku bi tevgirêdana bi fîzîkî ya bi bedenîye tevî Îsa.

## 4

# BI RUH VA QEWATBÛYÎ

### Roja 1–emîn

Niha padişakî sedsalêd navîn bînine ber çava. Bicêribînin wî cihî û wan dor– bera bivînin, li kîderê Ew dima: kela Wî, merivên dor– berên Wî, şerên Wî, padişatîya Wî û navê Wî. Gelek cara dihate hesabê, wekî padişatî û koma wana ji alîyê Xwedê da hatibûne qerarkirinê û bo wê yekê jî bindestîyên wî himberî padişa xof texmîn dikirin û ew jî nava dewlemendtîyê da emirê xwe derbas dikirin. Gotina padişê qanûn bû û qerarên wî jî yên dawî bûn. Padişê baş fem dikir, wekî ew borcdar bû, merivên ku nava sînorên padişatîya wî da diman, biparêze. Ewî usa jî gerekê berjewandîyên padişatîyê biparasta, sînorên welatê xwe berfireh bikira û rêsûrsên zêde dest bianîna.

Ev qulix ya bi cabdarî bû û serkarîya mezin destê padişê da bû. Ez derheqa serkarên formal da xeber nadim /yêdn mînanî dema niha, wextê ku cûrên serkarîkirinê yen hîmlî sîstêmên dêmokratîkin/. Ez derheqa serkarîya wî çaxî da dibêjim. Niha bînine ber çavê xwe, wekî padişê wî cûreyî ewê serkarîyê înkar dike, kîjan bona wî hatîye dayînê, yan jî ew ha ji wê yekê tune ye. Gelo wî çaxî padişatîya wî da wê çi biqewime? Zûtirekê dijminê welatê wî dagirke, binelîyên wî wê çawa dîl hilde û hemû tiştên welatê wî wê hilde destê xwe. Ew yek tenê bes nîne, wekî padişa tenê cihê xwe da rûnî. Ew gerekê *borcdarîyên padişê* biqedîne, kîjan tenê wî çaxî dikarin bêne mîaserkirinê, wextê ku *ewî bi serkarîya anegorî tabîya xwe cihê xwe girtîye.* Tabîya padişê wî çaxî kardar nîne, dema ku ew wê serkarîyê nade xebatê, kîjan tevî tabîya wî hatîye dayînê.

Çawa zarokên Xwedê, em tevî Îsa bûne Peyîhatî. Nava kaxeza romaya da nivîsar e: “Û heger zarin, usa jî xweyîwarin, warê Xwedê ne û tevî wartîya Mesîh in. Belê , heger em tevî cefayê Mesîh bûne, emê

tevî rûmeta wî bibin jî” /Romayî 8:17/. Derheqa vê tabîyê da usa jî nava Efesî 2:6–da hatîye nivîsarê: “Yektîya Wî da em ji mirinê rakirin û tevî Wî em li dîyarê ezmana dane rûniştandinê, bi saya *Mesîh Îsa*”. Me nava Mesîh da bi saya Wî cihê xwe girtîye.Em îdî zarokên vê dinîyayê nînin, lê endamên malbeta padişatîyê û nava padişatîya Ezmîn da xweyîwar in. Çawa xweyîwarên vê padişatîyê, em bona mîaserkirina mîsîya Xudan cabdarin. Topraxên ku Wî hildane û padişatîya Wî bûne yên me, çimkî em k’etine nava bera Wî. Feqet mînanî p’adiþê nava mesela meda, eger em dixwezin li ser tabîya xwe kardar bin, kîjan nava Mesîh da ne, em gerekê wê serwêrîyê bivînin û bidine xebatê, kîjan tevî wê tabîyê bona me hatîye dayînê. Nava evê beşa kitêbê da emê lêkolîn bikin, ku Xwedê bi çi va qewat da me, ku em rola xwe ya nava belakirina padişatîya Wî da biqedînin.

Petrûs elam kir:

> Lê hûn qebîleke jibare ne, kahînên padişatîyê, miletên buhurtî, cimeta Xwedê, wekî keremetên Wî bikine dengî, Yê ku hûn ji tarîstanîyê gazî ronahiya Xwe ya hijmekar kirine.
>
> –A Petrûs 2:9, NLT

Hetanî berdewamkirinê, girîng e wê yekê bidine kivşê, wekî tabî her dem pêşîya qewatê ye. Em gerekê nava Mesîh da bin, hetanî ku bikaribin tiştekî bona padişatîya Wî bikin.

## EW QEWAT, YA KU BO ME PÊWÎST E

> Carekê, gava Ewî tevî wan nan dixwar, temî da wan û got: “Ji Orşelîmê dernekevin, lê belê, hîvîya Sozê Bavê bisekinin, bona kîjanî we ji Min bihîst. Yûhenna bi avê nixumand, lê hûnê çend roja şûnda bi Ruhê Pîroz bêne nixumandinê.
>
> –Karên Şandîya 1:4–5

*Îsa pêşnîyarî* şagirta nekir, ku hîvîya Sozê Bavê bin, lê ne jî *şêwir da wan*, ku peyî emirkirina Wî herin. Dewsa wê yekê Ewî “*Temî dida* wan, ku ji Orşelîmê dûr nekevin”, hetanî ku Sozê Bavê bê. Îsa mecbûr

bû bi wê derecê gotina Xwe girîng hesab bike, çimkî Qewata Ruh bona karê temamîya padişatîya Xwedê girîng bû. Ewî zanibû, wekî şagirta gelekî dixwest ku derheqa Mizgînîya rabûna Wî ya ji nava mirîya gilî bikirana. Diqewime wana sebir nekira hetanî hatina Sozê Ruhê Pîroz. Nava Karên Şandîya 1:3–da em divînin, wekî wana çend roj tevî Îsa derbas kirin û wana guhdarîya xwe dida ser wê yekê, ku çawa Ewî derheqa padişatîya Xwedê da hîn dikir. Kitêba Pîroz dide kivşê, wekî şandîya "şedetîyên" derheqa rabûna Wî da stendin /Karên Şandîya 1:3, NKJV/.

Hewce nîbû ku wana ra bigotana, ku rabûna Îsa ya ji nava mirîya rast bû, çimkî ew bi xwe bûne şedê wê yekê, ku çawa Mesîh mirin alt kir. Bi gilîkî mayîn, ew îdî hazir bûn derbasî şuxul bûna.

Feqet Îsa li wan nihêrî û got: "Awa ezê Sozê Bavê Xwe we ra bişînim. Orşelîmê da bimînin, heta hûn qewatê ji jor bistînin" /Lûqa 24:49/. Ez bawerim, wekî Îsa anegorî Gotina Xwedê ev yek teslîmî nêzîkî 5OO merivî kir /bixwînin A Korintî 15:6/. Feqet nava Karên Şandîya 1:15–a da em divînin, wekî li vir hejmara meriva kurt bibû, gihîştibû 12O–î. Gelo çi li wan 38O meriva qewimî, ku ew bûne 12O? Diqewime 38O meriv, yên ku ji wir dûrketin, difikirîn: *"Werin, em vegerin, civîna destpê bikin û derheqa rabûna Îsa ya ji nava mirîya gilî bikin. Bi kutasî wê diha rast be, qet rojekê jî unda nekin û wê yekê bela bikin"*. Tenê 12O meriv hazir hîvîyê sekinîn, çawa ku Xudan teslîm kiribû.

Niha hûn dikarin bifikirin:

> "Belê, Con, bêfitîya ew gerekê hîvîya Ruhê Pîroz bisekinîyana. Wana hela hê Ew nestendibû. Îro usa nîne, çimkî em Ruhê Pîroz distînin, dema ku em xilaz dibin".
>
> –Bixwînin Yûhenna 2O:21–22:

> "Edilayî ji we ra. Çawa ku Bavê ez şandim, usa jî Ez dişînim. Ev yek, ku got, pifî ser wan kir û wan ra got: "Hanê, Ruhê Pîroz bistînin".

Îsa pifî ser şagirta kir û got: "Hanê, Ruhê Pîroz bistînin". Zimanê

yûnanî da xebera “hanê” dide kivşê “hema niha bistînin”. Eva nîşaneke tiştekî nîbû, kîjan gerekê hela hê ji nû va biqewimîya. Şagirta bi rastî Ruhê Pîroz *stendin*, hetanî ku Îsa berbi ezmîn hate hilatinê. Feqet wana hetanî *tijîbûna* bi Ruh qewat xwe nekiribûn, kîjan roja Pêntêkostê qewimî.

## ROJA PÊNTÊKOSTÊ

> Gava Roja Pêncî ya hesab hat, hemû jî bi hev ra li cihekî bûn. Nişkêva ji ezmîn mînanî dengê bayê qayîm dengek hat û temamîya wê mala ku têda rûniştibûn tijî kir. Hingê zimanên mîna alava agir wan va xuya bûn û li ser her yekî ji wan dianîn. Hemû bi Ruhê Pîroz tijî bûn û destpê kirin zimanên mayîn xeberdan, çawa ku Ruhê Pîroz ew didane xeberdanê.
>
> –Karên Şandîya 2:1–4

Ez zanim, wekî ji me geleka tiştên vî cûreyî wextê dersên mekteba roja yekşemê dîtine. Hîmlî li ser jora serên bawermenda zimanên bi agir tên kivşê. Meriv dikare bêje, wekî ev cûre, çi ku qewimîye, gelekî baş raber nake. Kitêba Pîroz a Kevin da agir sîmvola hazirîya Xwedê ye. Bi nivîsara “ziman, *çawa ji agir*” xudanê nivîsarê derheqa hazirîya Xwedê da tîne ber çava. Peyîhatîyên Îsa, him jin, him jî mêr guhdarîya xwe li ser hazirîya Xwedê dabûne merkezkirinê, yan jî nava hazirîya Xwedê da hatibûne nixumandinê. Ev hazirîya eyanbûyî jî bi “bayê qayîm” hate kivşkirinê. Çawa ku me serê kitêbêyî ewlin da got, Ruhê Pîroz “bayê qayîm” nîne, Ew Şexs e. Hatina Wî ya li wir bi cûrê bayê qayîm hate kivşê.

Ew xebera ku Karên Şandîya 2:4–da, ku çawa “tijîbûn” hatîye tercimekirinê, xût bi fikira “têrbûn”–e ye. Xebera *têrbûn* tê şirovekirinê çawa “ji normê der”. Ewên ku li wir hazir bûn, *ji normê der* bi Ruhê Pîroz va tijî bûn. Bi kivşbûna bi cûrê agir û bayê, nîşaneke mayîn, ya tijîbûna bi Ruhê Pîroz va heye. Bawermenda destpê kir bi zimanên başqe xeberdin.

**Roja 2–emîn**

# BONA ÇI ZIMAN?

Xebera “ziman” li vir hema wî zimanî dide kivşê, bi kîjanî xeber didin. Heger ez li Îspanîyayê bûma û rastî yekî bihatama, yê ku bi îspanî xeber nedida, min dikaribû ji wî bipirsîya: “Zimanê we yê dayîkê kîjan e?”. Ji alîkî mayînva jî, heger ez rastî yekî mayîn bihatama, yê ku înglîzî xeber bida, hewce nîbû ku ji wî bipirsîya, ku zimanê wî yê dayîkê kîjan e? Minê ew fem bikira, çimkî înglîzî zimanê minî dayîkê ye. Bo wê yekê jî înglîzî bona min zimanê “eyan e”. Lê zimanê mayîn min dikaribû hesab bikira çawa zimanê “neeyan”. Hinekî dereng emê derheqa wê yekê da diha bi hûr–gilî xeber bidin.

Roja Pêncî ya hesab li Orşelîmê ji welatên cuda–cuda bona cejina Ruhanî yahûdî berev bibûn. Ew yahûdî li gelek welata û rêgîona diman û bona wê yekê jî gelek “zimanê wan ên dayîkê” hebûn.

> Wî çaxî Orşelîmê da yahûdiyên /cihûyên/ xwedêxof diman, ew ji nav hemû miletên bin perê ezmîn da hatibûn. Gava ew deng hat, cimeteke giran civîya û tevî–hev bû, çimkî dibihîstin, ku ewana bi zimanên wan her yekî xeber didan û heyr– hijmekar, zendegirtîmayî digotin: “Ev hemûyên ku xeber didin, ne ji Celîlê ne? Lê çawa ji me her yek wî zimanî dibihê, yê ku em nav da dinyayê ketine?
>
> –Karên Şandîya 2:5–8

Guhdarîyê bidine ser wê yekê: Kitêba Pîroz dibêje, wekî “Gava ew deng hat, cimeteke giran civîya û tevî–hev bû”. Ewê yekê guhdarîya geleka teglîfî li ser xwe kir. Cimet zendegirtî mabû, wekî ji merivên Celîlê, ji kîjana gelek nexwendî bûn, bi zimanên cuda–cuda xeber didan. Şuxulkarîya Ruhê Xwedê ya vî cûreyî bona wana nîşan bû, yên ku peyîhatîyên Îsa nîbûn.

> “…em dibihên, ku eva bi zimanê me kirên Xwedê yên mezin dibêjin”. Hemûya heyr– hijmekar, şaşmayî hevdu ra digotin: “Ev çi hewal e?” /Karên Şandîya 2:11–12/.

Evê yekê mecal bona Petrûs çê kir, ku xeberdaneke xweye eyan, kîjan Kitêba Pîroz da ye, mîaser bike, kîjanê da ewî got: “Eva ew Îsa bû, yê ku Xwedê ew ji mirinê rakir, ku em hemû jî şede ne. Xwedê ew hilkişand, da kêlaka xwe ya rastê, Ewî jî Ruhê Pîrozî sozdayî ji Bavê stend û jorda barand, çawa ku hûn niha dibînin û dibihên” /Karên Şandîya 2:32–33/. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî hemûya qewata Ruhê Pîroz him didîtin, him jî dibihîstin.

Peyî çend gotina ra, berevbûya gotin:

> Cimetê ev yek ku dît mînanî tîrekê dilê wan ket, Petrûs û şandîyên mayîn gotin: “Em çi bikin, gelî bira?”.
>
> –Karên Şandîya 2:3

Petrûs wan ra got:

> “Tobe bikin û bira ji we her yek bi navê Îsa Mesîh bona baxşandina guneya bê nixumandinê û hûnê Ruhê Pîroz pêşkêş bistînin. Ev soz bona we û zarên we ye, usa jî bona hemûyên dûr en ku Xudan Xwedêyê me wê gazî wan bike”.
>
> –Karên Şandîya 2:38–39

Çimkî nivîsar dibêje: “Kî gazî navê Xudan bike, wê xilazbe” /Romayî 1O:13/. Petrûs elam kir, wekî pêşkêşa Ruhê Pîroz bona her bawermendekî hatîye dayînê. Ev soz derheqa her bawermendekî da ye, dixwezî pêşda be, dixwezî niha be û dixwezî paşê be.

## ÇAR QEWIMANDIN

Nava kitêba Karên Şandîya da dîsa çar qewimandinên derheqa wê yekê da hene, wekî meriv peyî Roja Pêncî ya hesabê dîsa bi Ruhê Pîroz va tijî dibin. Wextê lêkolînkirina van qewimandina ez dixwezim, wekî guhdarîya mexsûs bidine ser du tişta. Ya ewlin, nava wan qewimandina da, xêncî ji yekê, ku qewimandina tijîbûna bi Ruhê Pîroz va ji cêribandina xilazbûnê cuda ye, başqe ye. Ya duemîn, wekî ew meriv, yên ku li vir hazir bûn, wextê ku yên paşdavegerîayî bi Ruhê Pîroz va tijî dibûn, şedetîya hazirîya Ruhê Pîroz him *didîtin*, him jî *dibihîstin.*

## Fîlîpo û samerî

Qewimandina ewlin nava Karên Şandîya 8–da tê şirovekirinê. Fîlîpo bona dannasînkirina Mesîh şandine Samerîayê. Ewî xebera Mizgînîyê da û temamîya bajêr hişyar dît. Merivên seqet qenc dibûn, ruhên heram derdiketin û geleka Mizgînîya Xwedê ya xilazbûnê qebûl dikirin.

> Lê gava bawerîya xwe wê Mizgînîya Fîlîpo anîn, ya ku bona padişatîya Xwedê û Navê Îsa Mesîh dida, him mêr, him jin, hemû jî pê avê hatine nixumandinê. Şimhûn bi xwe jî bawer kir, hate nixumandinê û her dem tevî Fîlîpo bû. Û gava ew nîşan û keremetên zor, ku dibûn didît, ecêbmayî dima.
>
> –Karên Şandîya 8:12–13, NIV

Gelo samerî careke mayîn hatine dinîyayê, wextê ku bawerîya xwe li Mizgînîya Îsa Mesîh anîn? Wextê ku meriv bawerîya xwe Kitêba Pîroz tîne, ew Îsa Mesîh qebûl dike û dibe lawê Xwedê. Evên teze paşdavegerîayî bi avê hatine nixumandinê, çawa nîşana wê yekê, ku ew bawerîya xwe Mesîh tînin. Paşê ji gotina zelal tê kivşê, wekî rêberên civîna ewlin zanibûn, ku tiştek jî heye. Tevî paşdavegerandinê û nixumandina bi avê wana gerekê usa jî nixumandina Ruhê Pîroz qebûl bikira.

> Şandîyên Orşelîmê da gava bihîstin, wekî Samerîyayê xebera Xwedê qebûl kirîye, Petrûs û Yûhenna şandine cem wan. Ew ku li berjêr bûn, bona wan dua kirin, ku Ruhê Pîroz bistînin, çimkî heta hingê hê Ruhê Pîroz nehatibû ser li wan tu kesî, ew tenê bi navê Xudan Îsa hatibûne nixumandinê.
>
> –Karên Şandîya 8:14–16, NIV

Bi bihîstina derheqa wê yekê da, wekî Samerîayê Mizgînî qebûl kiribû, şandîya qerar kirin, ku Petrûs û Yûhenna bişînine cem wan. Gelo bona çi şandîya her du endamên xwe yên here qedirbilind şandin, ku bona samerîya dua bikin? Samerîya êdî xilazbûn qebûl kiribû û bi avê hatibûne nixumandinê, bo çi ew şandine li wir? Petrûs û Yûhenna şandine li wir, ku ew dua bikin “bona ku wana bikaribûya Ruhê Pîroz

bistenda" /Gotina 15–a/. Bîr bînin, wekî Samerîya 56 kîlomêtra ji Orşelîmê dûrtir bû. Îro ew dûrayî gelek nayê kivşê, lê avtomaşînên şandîya tune bûn û ne jî cûrê transporta wedê niha hebû. Ew gerekê 58 kîlomêtr rê, yan pîya, yan jî ser pişta heywanekî derbasbûna, ya here kêm nava rojekê, yan duda da. Tiştekî femdarî ye, wekî ew rêya kin nîbû.

Em carekê jî biwekilînin. Lazime bidine kivşê, wekî ew merivên paşdavegeriyayî bi navê Îsa Mesîh hatine nixumandinê. Ew êdî zarokên Xwedê bûn.Nava pêşkêşa xilazbûnê da parek hebû, kîjan wana hela hê texmîn nekiribû. Diqewime hûn bifikirin: "*Con, deqekê bisekine, ez difikirîm wekî Ruhê Îsa Mesîh dilên me da dijî, wextê ku em pêşkêşa xilazbûnê qebûl dikin*". Ew yek rast e. Nava gotina A Korintî 12:3–da nivîsar e: "Tu kes tune ku bi rêberîya Ruhê Xwedê xeber bide û bêje: "Îsa Xudan e, eger ne bi rêberîya Ruhê Pîroz". Bêyî hukumê Ruhê Pîroz em nikarin Îsa çawa Xudan qebûl bikin, lê eva mînanî wê yekê nîne, ku çawa bi Wî *tijî dibin*.

Kitêba Pîroz zelal elam dike, ku ew hemû kes, yên ku nava Mesîh da nin, bi Ruhê Pîroz buhurtî– jibare dibin /bixwînin A Petrûs 1:2, Efesî 1:13/. Dêmek, şikberî tune, wekî *hazirîya* Ruhê Pîroz ya ku nava me da dijî, pareke xilazbûnê ye. Ew we dinihêre û Xwedê Ruhê Kurê Xwe divîne. Bîr bînin, wekî bi stendina xilazbûnê hûn tabîke nû nava Mesîh da dest tînin. Hûn dibine beşeke Wî û padişatîya Wî. Feqet hûn hela hê bi *qewata* Ruh tijî nabin, çimkî we hela hê bona wê yekê hîvî ji Bavê nekirîye.

Îsa got:

> Hûn ku xirab bin, zanin tiştên qenc bidine zarên xwe, lê Bavê Ezmana wê çiqas zêde Ruhê Pîroz bide *ewên ku ji Wî dixwezin.*
>
> –Lûqa 11:13, NKJV

Îsa Xwedê çawa "Bavê we Yê ezmana" nav kir. Tê kivşê, wekî Ew derheqa bawermenda da dibêje. Em vê yekê zanin, çimkî nava Mizgînîya Yûhenna da Îsa digot: "…ewe ew Ruhê ku rastîyê elam dike

û dinîya nikare Wî qebûl bike, çimkî ne Wî dibîne, ne jî Wî nas dike" /Yûhenna 14:17, ESV/. "Dinîya" ew merivin, yên ku nava padişatîya Xwedê da nînin. Her kesê, ku teslîmî serwêrîya Îsa nebûye, nikare Ruhê Pîroz qebûl bike.Dêmek, gotina derheqa hîvîkirina ji "Bavê we" derheqa xilazbûnê da nîne. Ew yek derheqa wê tijîbûnê da ye, kîjanê ew meriv dikarin bistînin, yên ku xilaz bûne.

Niha werin em paşda vegerine li ser Karên Şandîya 8:

Hingê Petrûs û Yûhenna destên xwe danîne ser wan û wana Ruhê Pîroz stend. Gava Şimhûn *dît*, wekî bi destdayîna şandîya Ruhê Pîroz distînin,, pere dirêjî wan kir û got:

> "Evî hukumî bidine min jî, ku ez destê xwe daynime ser kê, Ruhê Pîroz bistîne".
>
> –Karên Şandîya 8:17–19, NLT

Petrûs û Yûhenna destê xwe danîne li ser bawermenda û wana Ruhê Pîroz stend. Tijîbûna bi Ruh ber çava bû, çimkî Kitêba Pîroz da nivîsar e, wekî "Şimhûn dît, wekî bi destdayîna şandîya Ruhê Pîroz distînin". Şimhûn, yê ku bawermend bû, awqasî zendegirtî ma, wekî pere dirêjî şandîya kir, ku ew wî jî hîn bikin /Kirina wî cûreyî ya ji alîyê Şimhûn da ne cih da bû û bo wê yekê jî Petrûs ser li wî hêrs ket/.

Temamîya kitêba Karên Şandîya da tijîbûna bi Ruh bi nîşandayîna der va tê kivşê, kîjana dikaribûn *bidîta* û *bibihîsta*, diha gelekî bi cûrê zimana, yan jî pêxembertîyê. Awa ev bû menî, wekî şandîya her dem digot, ku Ruhê Pîroz "*dihate ser* bawermenda". Nava şirovekirina qewimandina li Samarîayê nayê kivşkirinê, wekî peyî tijîbûna bi Ruhva ziman, yan jî pêxembertî dihatin. Em dikarin bêne ser wê fikirê, wekî tiştên wî cûreyî qewimîbûn. Heger usa nîbûya, Şimhûnê şedetîya hazirîya Ruh, ya nava bawermenda da, nedîta.

## Roja 3–emîn

### Şaûlê ji Tarsûsê

Dîroka tobekirina Şaûl beşeke Kitêba Pîroz a hewaskar e. Ez dixwezim guhdarîyê li ser vê yekê bidime merkezkirinê. Karên Şandîya 9–da Şaûl berbi Şamê diçe, ku li wir bawermenda bizêrîne.

> Gava diçû, nêzîkî Şamê bû, nişkêva ji ezmîn ronahîkê dora wî şewq da. Ew kete erdê û dengek bihîst, ku wî ra digot: "Şaûl, Şaûl! Tu çima min dizêrînî?" Ewî jî got: "Tu kî yî, Xudan?" Wî dengî gotê: "Ez ew Îsa me, Yê ku tu dizêrînî. De niha rabe here bajêr, wê te ra bê gotinê ku tê çi bikî".
>
> –Karên Şandîya 9:3–6

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Şaûl Îsa çawa "Xudan" nav kir. Wextê ku Îsa Mesîh dibe Xudanê emirê me, em carekê ra ji nû va tên dinîyayê. Ez bawer im, wekî Şaûl wî çaxî bû bawermend, wextê ku ewî serwêrîya Îsa nas kir.

Piştî vê rasthatina tevî Xudan, Şaûl sê roja rojî girtin û hîvîya emirkirina sekinî. Xudan hîvî ji şagirtekî kir, navê kîjanî Hananîya bû, ku here cem Şaûl. Ji wê emirkirinê Hananîya xemgîn bû, çimkî ewî gelek tişt bihîstibûn ku Şaûl çawa bawermenda dizêrîne. Xwedê gote wî: "Tu here, çimkî Min ew çawa hacetek bijartiye, wekî navê Min necihûya, padişa û zarên Îsraêlê ra bide naskirinê" /Karên Şandîya 9:15/. Wextê ku Hananîya hate wê malê, li kîderê Şaûl bû, ewî destê xwe danî li ser Şaûl û got: "*Şaûl bira!* Xudan ez şandime, ew Îsa Yê ku rêva rastî te hat, wekî tu dîsa bibînî û *bi Ruhê Pîroz tijîbî"* /Karên Şandîya 9:17/. Eyan e, wekî Hananîya zanibû ku Şaûl xilazbûyî bû, çimkî ewî ew çawa "Şaûl bira" nav kir. Nenihêrî wê yekê, wekî Şaûl êdî bawermend bû, Xwedê Hananîya şand, ku bona wî dua bike, ku Şaûl bihata qenckirinê û bi Ruhê Pîroz va tijî bûya.

Careke mayîn bêjin, wekî nava vê serpêhatîyê da jî em divînin, wekî tijîbûna bi Ruhê Pîroz piştî stendina pêşkêşa xilazbûnê qewimî. Nava Karên Şandîya 9–da hûnê tu ciha nebînin, wekî Şaûl /yan jî Pawlos/ bi

zimana xeberda. Şikberî tune, wekî Pawlos bi zimana xeber dida, çimkî paşê ewî nivîsî: "Ez ji Xwedê Yê xwe razî me, ku ji we hemûya zeftir bi zimanên xerîb xeber didim" /A Korintî 14:18, ESV/. Ez bi xwe bawer im, wekî Pawlos ji wî çaxî da destpêkir bi zimana xeber bide, wextê ku Hananîya bona wî dua kir. Pawlos gerekê tijîbûn bistenda, nenihêrî wê yekê, wekî ew xilazbûyî bû. Qewatbûna bi Ruhê Pîroz bona qulixa Pawlos girîng bû, kîjanê Îsa li ber necihûya, padişa û zarên Îsraêlê elam kiribû /bixwînin Karên Şandîya 9:15/.

## Petrûs û Kornêlîyo

Karên Şandîya 1O da em wedekî henekê Xwedê texmîn dikin. Gotina ewlin me Kornêlîyo ra dike nas, yê ku ofîsêrê romayî bû. Kitêba Pîroz dibêje, wekî Kornêlîyo merivekî rehm û xwedêxof bû. Himberî kesîba ew rehm bû û gelek cara dua dikir. Wî çaxî Mizgînîya xilazbûnê hela hê necihûya ra nehatibû gilîkirinê û Xwedê milayaketek şande cem Kornêlîyo, Milyaket bernama Xwedê ya xilazkirinê elamî Kornêlîyo nekir, lê gote wî, ku ew gazî Petrûs bike, li wî cihî, li kîderê milyaket gotibû.

Petrûs li Yafayê bû, li kîderê tişt hatine ber çavê wî. Wî çaxî Xwedê çend şikil dane xebatê, bona ku elamî Petrûs bike, ku ew gerekê wan tişta çawa yên nepaqij nav neke, kîjan Xwedê paqij kiribûn /bixwînin Karên Şandîya 1O:9–15/. Xwedê zanibû, wekî Petrûsê bi dijwarî fikira wê yekê fem bikira, bona wê yekê jî Ewî sê cara ew yek nîşanî Petrûs kir. Hetanî ku Petrûs dora wê yekê difikirî, merivên Kornêlîyo gihîştine wê malê, li kîderê Petrûs bû. Ruhê Pîroz emirî ser Petrûs kir, ku tevî wan meriva here. Xwedê negote Petrûs, ku bona çi wî dişîne cem Kornêlîyo, nenihêrî edetên wî çaxî, wekî cihûyên rehmparêz nediçûne cem necihûya. Wextê ku gihîştine mala Kornêlîyo, Petrûs got:

> Hûn bi xwe zanin, ku ne edetê mêrê cihû ye, ku tevî necihûya rabe– rûnî, yan hev va herin– bên. Lê Xwedê ber min vekir, wekî ez tu kesî pîs, yan heram hesab nekim. Bona wê yekê jî gava gazî min kirin, min na– na nekir, rabûm hatim. Û ez niha dipirsim, we bona çi gazî min kirîye.
>
> –Karên Şandîya 1O:28–29, NLT

Petrûs dest pê dikir çi tiştên ku ewî dîtibûn û rasthatina tevî necihûya himberî hev bike. Ewî dest pê kir Mizgînîyê bo Kornêlîyo gilî bike. Nişkêva, wextê xeberdana Petrûs, Ruhê Xwedê eyan bû û merivên necihû destpê kirin bi zimana xeberdin. Rûyê wê yekê da, Ewî Ruhê Xwe kire li ser necihûya, *pêşîya wê yekê,* ku Petrûs gerekê dua bikira, yan jî ew bi avê binixumandana. Eva şedetîya wê yekê bû, wekî merivên ne ji cimeta Îsraêlê jî diketine nava progirama xilazbûnê.

> Bawermendên esilê xwe da cihû, yên ku tevî Petrûs hatibûn, zendegirtî bûn, ku Ruhê Pîroz çawa pêşkêş li ser necihûîya jî barî, çimkî dibihîstin, ku wana bi zimana xeber didan û şikirî didane Xwedê. Hingê Petrûs got: "Îdî kî dikare nehêle ku evana pê avê bêne nixumandinê, yên ku mîna me ne Ruhê Pîroz jî stendin?". Wî çaxî emir kir, ku bi navê Îsa Mesîh bêne nixumandinê.
>
> –Karên Şandîya 1O:45–48, NLT

Cihûyên li wir hazir nikaribûn înkar bikirana, ku Xwedê ewên necihû xilaz kirin, çimkî wana qewata Xwedê ya nava wan da /tijîbûna bi Ruhê Pîroz/ *dîtin* û *bihîstin*. Bawermendên cihû zendegirtî mabûn. Xwedê ne tenê xilazbûn da necihûya, lê tijîbûna bi Ruh wan ra şand. Nava Kitêba Pîroz da eva qewimandina tek– tenê ye, wextê ku Xwedê vî cûreyî dike.

Cihên mayîn da barandina Ruhê Xwedê *piştî* tobekirinê diqewime. Ez bawer im, wekî Xwedê ev yek kir, çimkî zanibû, k1 bona cihûya nîşan lazim bû, k1 ew bêne ser wê fikirê, k1 Xwedê pêşkêşa Xwe ya xilazbûnê usa jî li ser necihûya dibarand.

## Efesî

Qewimandina çara, kîjanê ez dixwezim lêkolîn bikim, Karên Şandîya 19 ye.Wextê rêwîtîke xwe Pawlos hate Efesê. Kitêba Pîroz dibêje, wekî çaxê Ew hat, ew rastî komeke meriva hat, yên ku şagirtên Yûhenna yê Nixumdar bûn. Pirsa ewlin ku ewî da wan meriva, ev bû: "Gava we bawer kir, we Ruhê Pîroz stend?" /Karên Şandîya 19:2/. Heger eva pirsa ewlin bû, ku Pawlos da van efesîya, wî çaxî gerekê em jî vê pirsê

bidine her bawermendekî nû.

Careke mayîn biwekilînin, ku nixumandina bi Ruhê Pîroz bona çi bo rêberên Civîna Ewlin awqasî girîng bû? Menî ew e, wekî nava Mesîh da bona mîaserkirina mîsîya me tu tişt nikare dewsa qewatbûna bi Ruhê Pîroz bigire. Gelo bona çi kesekî ji me gerekê bixweze seheteke jî bêyî wê qewatê bijî /bixwînin Karên Şandîya 1:8/. Bona kardarîyê nava padişatîya Bavê da tabîya me ya nava Mesîh da gerekê hebe û em jî bi Ruhê Pîroz va qewatbûyî bin.

Pawlos da zelalkirinê, wekî ew efesî şagirtên Yûhenna ê nixumdar bûn, wana mizgînîya xilazbûna Îsa nebihîstibûn û ewî jî Mizgînî bona wan xwend.

Çawa ku min êdî da kivşê, stendina tabîya me ya nava Mesîh da pêşîya wê qewatê ye, kîjanê em ji Ruhê Wî distînin. Xilazbûn her dem pêşîya qewatbûnê ye.

Bo wê yekê jî, peyî bihîstina gotinên Pawlos ra, efesî berê ewlin "…bi navê Xudan Îsa hatine nixumandinê" /Karên Şandîya 19:5/. Bi van gotina wana xilazbûn stend, kîjan tenê nava Îsa Mesîh da ye û tenê bi destê Wî ew yek tê dayînê. Feqet rasthatina wan a tevî Pawlos tenê bi wê yekê va ser hevda nehat: "Wextê ku Pawlos destê xwe danî ser wan, Ruhê Pîroz hate ser wan û wana bi zimana xeber didan" /Karên Şandîya 19:6/.

Tijîbûna bi Ruhê Pîroz piştî wê yekê hat, wextê ku bawermendên nû bi navê Xudan Îsa va hatine nixumandinê. Pêşîya rasthatina tevî Pawlos wan meriva hindik tişt derheqa Îsada zanibûn, lê wextê ku bi Ruh tijî bûn, wana *pêxembertî kirin*, kîjan dide kivşê, wekî wana berbirîbûna Îsa Mesîh elam kirin. Wana qewat stend û dest pê kirin pêxembertîyê bikin, derheqa çida pêşda nizanibûn. Ew yek tenê bi destê Ruh dibe. Ew yek tiştê bûyînê nîne, ku bawermend şêwirên Xwedê, bêyî naskirina Ruhê Wî, elam bike /bixwînin A Korintî 2/.

Ez awqasî razîme, wekî tu cara ezê mecbûr nîbim bêyî qewatbûna bi Ruh qulix bikim. Bi qewata xwe ez xeberdankir û nivîskarê baş nînim. Ji alîyê zimanê înglîzî da ez awqasî sist bûm, wekî min întamên xwe teribandin. Ji min baştir tu kes nizane, wekî ez ew merivim, yê ku bi kerema Xwedê û bi qewata Ruhê Pîroz e. Bêyî qewatbûna bi Ruh minê

nikaribûya ev kitêb binivîsîya. Ew kanîya karebûn û qewata min e. Bêyî Wî minê nikaribûya ew xebat bona padişatîya Xwedê bikira, kîjan bona min hatîye dayînê. Ruhê Pîroz kerema Xwedê dide min.

## Roja 4–emîn

# GELO ZIMAN SEKINÎNE?

> Hizkirin tu cara kuta nabe. Çi ku derheqa pêxembertîyê da ne, ewê derbasbin, çi ku derheqa zimana da ne ewê jî derbas bin, heger zanebûn hebe, wê derbasbe– here. Belê, em ji pirî– hindikî zanin û ji pirî– hindikî pêxembertîyê dikin. Lê gava kamiltî bê, hingê nekamiltî wê derbazbe– here /A Korintî 13:8–1O, ESV/.

Niha wextê ku me îdî serhatîyên kitêba Karên Şandîya, yên derheqa tijîbûna bi Ruhê Pîroz, lêkolîn kirin, ez dixwezim derbasî pirsekê bim, kîjan li cem geleka pêşda tê. Ez gelek cara dibihêm, ku çawa meriv dibêjin, wekî ziman sekinîne. Hîmlî ew gotina para 1Oa ye li jorê tînine ber çava. Ewên ku wê fikirê ra qayîl dibin, bawer dikin, wekî Pawlos bi fikira Kitêba Pîroz usa digot, kîjan gerekê bihata, wextê ku dinivîsî: *"...lê gava kamiltî bê, hingê ne kamiltî wê derbasbe, here". Ew wa difikirin: "Wextê ku niha kamiltî /Mizgînî/ hatîye, usa ye ziman sekinîne".*

Ew yek girîng e, ku bi guhdarî em vê beşê lêkolîn bikin, ku Pawlos çi dixwest bigota. Heger em hemtêksta gotina 1Oa binihêrin, wî çaxî wê zelal be, wekî ew fikir bêhîme. Heger hesab kin, ku ziman sekinîne, wî çaxî zanebûn û pêxembertî jî sekinîne. Gelo zanebûn û pêxembertî sekinîne? Bêfitîya, na. Dêmek kîjan e kamiltî, derheqa çi da Pawlos dibêje? Caba wê pirsê gotina 12a da nivîsar e:

> Niha em çawa qeretûkî neynikê da dibînin, lê hingê emê bi rû bi rû bivînin. Niha ez ji pir'î– hindikî zanim, lê hingê ezê tam nas bikim, çawa ez hatime naskirinê /A Korintî 13:12, ESV/.

Pawlos derheqa rasthatina rû bi rû ya tevî Îsa dibêje. Eve menî, ku ew xebera “kamiltî” dinivîse. Ew derheqa naskirina Îsa da dibêje. Gelo niha em wê yekê texmîn dikin, Wî dibînin? Wextê emirê li ser vê dinîyayê heleqetîya me ya tevî Îsa mînanî qeretûkî neynikê da ne, lê dinîya mayîn da, kîjan tê, emê Îsa usa nas bikin, *çawa ku Ew me nas dike.* Evê bibe nîşan, wekî “kamiltî” hatîye. Nenihêrî wê yekê, wekî rêwîtîya li ser dinîyayê dest pê dibe, ewê ser hevda neyê, hetanî ku em Wî nava dinîya heta– hetayê da rû bi rû nebînin.

## ÇAR CÛRÊN ZIMANA

Pirsek jî heye, kîjanê gelek cara didine min: “Con, bo çi A Korintî 12:3O da nivîsar e: “Çima hemû zimana şirove dikin?”. Gelo ev yek nade kivşê, wekî ne hemû kes bi zimana xeber didin?”. Belê, usa ye, feqet nava vê beşê da Pawlos derheqa *cûrê* zimana yê mexsûs da dibêje, bi kîjana ne hemû bawermend xeber didin. Bona femkirina vî tiştî, em gerekê çar cûrên zimana lêkolîn bikin, derheqa kîjanada Kitêba Nû da hatîye nivîsarê.

Ezê zimana bona fesalbûnê pareveyî ser du para: *tomerî* û *şexsî* bikim.Bi gotina “tomerî” ez dixwezim bidime kivşê, wekî heger şexsek bi wî zimanî qulix dike, kîjan ewî ji Ruh stendîye, ji mêriv, yan jî koma meriva ya başqe. Zimanên “şexsî” me hev va didine girêdanê, çawa şexs, kîjan alî dikin, ku diha nêzîkî Xwedê bin. Yan jî karebûnê didin, ku bi sidqê qenc xeberdin. Werin em van cûra, her yekî başqe–başqe lê binihêrin.

### Ya ewlin: Ziman çawa nîşana bo bêbawera

Cûrên zimana yê ewlin, bona nîşandayîna bi tomerî, bi massayî ye.

> Awa pêşkêşa zimanên xerîb nîşanek e, ne ku bona bawermenda, lê bona nebawera /A Korintî 14:22/.

Ev pêşkêş wî çaxî kar dike, wextê ku Ruhê Pîroz ji fikira me derbaztir dibe û karebûna xeberdana bi zimanê xerîb dide me, bi taybetî bi wî

zimanî, kîjanî em nizanin û hîn nebûne. Ev cûrê zimana bi destê şandîya roja Pêntêkostê kar kir.

> Wî çaxî Orşelîmê da cihûyên xwedêxof diman, ew ji nav hemû miletên bin perê ezmîn da hatibûn. Gava ew deng hat, cimeteke giran civîya û tevî–hev bû, çimkî dibihîstin, ku ewana bi zimanên her yekî xeber didan û heyr– hijmekar, zendegirtî mayî digotin: "Ev hemûyên, ku xeber didin, ne ji Celîlê ne? Lê çawa ji me her yek wî zimanî dibihê, yê ku em nav da dinê ketine? Partoyî, medî, elamî, binelîyên Mesopotamyayê, Cihûstanê, Kepedokyayê, Pontosê, Asyayê, Firîgyayê, Pamfîlyayê, Misirê û yên li alîyê Lîbyaya nêzîkî Kûrênê û usa jî yên xerîb ên ji Romê hatî, cihû û necihûyên ku hatine ser bawerîya cihûya, usa jî kirêtî û ereb. Em dibihên, ku evana bi zimanê me kirên Xwedê yên mezin dibêjin".
>
> –Karên Şandîya 2:5–11, NIV

Van cihûya bihîstin, ku çawa bawermenda bi zimanê wan her yekî xeber didan. Eva nîşana wê yekê bû, wekî Xwedê navbera bawermendên Mizgînîya Îsa da kar dikir, çimkî ew yek tiştê bûyînê nîbû, ku binelîyên Celîlê ên nexwendî bikaribûna bi awqas zimana keremetên Xwedê elam bikirana. Geleka bi saya qewata Ruhe wî cûreyî Îsa nas kirin.

Çend sal pêşda min li civînekê, li Sprîngsa Koloradoyê, qulix derbas dikir. Wextê qulixê jineke ji teşkîla qulixa me li alîyê sera civînê ya mayîn rûniştibû. Wextê qulixê, çi ku min digot, ewê qewata duakirina bi zimana ya dengê nimiz texmîn dikir. Piştî qulixê, merivek, yê ku li ser cêrga pêşin rûniştibû, nêzîkî wê bû û gotê:

–Hûn bi zimanê fransî ê tam xeber didin. Hûn bi zaravê zimanê fransî ê kevinar dibêjin. Ez dersdarê fransî me û nava salên xebata xwe da tu cara rastî merivekî usa nehatime, ku bi fransî usa xeber bida çawa hûn.

–Ez fransî nizanim,– ewê jinê bersiv da.

Ew meriv zendegirtî mabû. Ewî got:

We ne tenê bi zimanê fransî ê tam xeber dida, lê bi wê yekê va tevayî we xeberên Mizgînîyê yên bi zimanê fransî dida xebatê û peyî we ra

Con hîvî dikir, ku merivên berevbûyî wan xebera vekin. We pêşîya xwendina wî ew xeber didane xebatê.

Ew cêribandin bona wî merivî nîşan bû. Ewî îzbatbûna derheqa wê berbirîbûnê tda stend, kîjan Xwedê bi destê min gîhandibû. Meremê zimanên ku nîşan didin ew e, ku guhdarîya wan meriva teglîf bikin, yên ku hela hê bawermend nînin.

## Ya duemîn:Zimanên wergerandinê

Cûrê zimana yê duda dîsa bona qulixa bi masayî ye. Himberî zimanên, ku çawa nîşan qulix dikin, ev ziman yên ezmînin û li ser dinîyayê tu kes wana nizane. Pawlos zimanên wergerandinê çawa pêşkêşa Ruhanî hesab kirîye û nivîsîye: "...yekî din ra *zimanên xerîb*, yekî ra jî *şirovekirina wan zimana*" /A Korintî 12:1O/. Çawa ku em zanin, wekî ev ziman ne yên dinîyayê ne, bo wê yekê jî ew hewcê şirovekirinê ne.

Çend sal pêşda min gerekê li civîneke Sîngapûrê qulix derbas bikira. Wextê qulixê merivekî bi zimanekî neeyan dest pê kir xeber bide. Min carekê ra fem kir, wekî ew ziman ne yê dinîyayê bû, lê yê ezmana bû. Hemû kes li serayê zendegirtî mabûn. Wextê ku ewî merivî xeberdana bi wî zimanî ser hevda anî, çi ku ewî gotibû, şirove kir. Wergerandina wî bi rastî anegorî wê gotinê bû, çi ku Xwedê bona vê civînê dabû min. Ez fikirîm: "*Xwedê, ez gelekî ji vê îzbatbûna ecêb razîme*". Xwedê *pêşkêşa şirovekirina zimana* da xebatê, ku ew gotin îzbat bikira, kîjan danîbû li dilê min. Ew yek him bona min, him bona hemûya nîşan bû.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî ez xebera "şirovekirin", lê ne ku "tercimekirinê" didime xebatê, wextê ku ez derheqa vî cûrê zimana da dibêjim. Zimanên ezmîn, nikarin bêne tercimekirinê, çimkî ew ji fikirdarîya me zêdetir in, lê dikarin bên şirovekirinê.

Wextê ku pêşkêşa *şirovekirina zimana* kar dike, ziman gerekê her dem bi şirovekirinê va bêne rêberkirinê. Ev cûrê ziman bona çêkirina civînê hatîye dayînê /bixwînin A Korintî 14/, lê bêyî şirovekirinê civîn çê nabe.

Pawlos bi fikira vî cûrê zimana digot, çaxê pirsî: "Gelo hemû kes bi zimana xeber didin?". Niha werin vê gotinê bi têkstê va bixwînin:

> Û Xwedê pêşîyê hinek civînê da kirine şandî, ya duda pêxember, ya sisîya dersdar, paşê yên keremetkir, peyî ra yên xweyê pêşkêşên nexweşqenckirinê, komekdarîyê, sebîtîyê û yên zimanên xerîb. Çima hemû şandî ne? Çima hemû pêxemberin? Çima hemû dersdar in? Çima hemû keremeta dikin? Çima hemû xweyê pêşkêşên nexweşqenckirinê ne? Çima hemû bi zimanên xerîb xeber didin? Çima hemû zimana şirove dikin?
>
> –A Korintî 12:28–3O

Pawlos derheqa wan pêşkêşên tomerî da xeber dide, kîjan Xwedê li Civînê bona qulixê dane. Gelo hemû şandî ne? Na xêr. Gelo hemû pêxember in? Na xêr. Gelo hemû dersdar in? Na xêr. Bi wî cûreyî jî gelo hemû bi zimana xeber didin, yan jî wana *bona qulixa tomerî* şirove dikin? Na xêr. Pawlos dixwest bigota, wekî hemû gerekê wê pêşkêşê bidine pêşxistinê, kîjan Xwedê daye me û nava wê da em kar dikin. Li civînê hemû kes nîne, ku pêşkêşa şirovekirina zimana li cem wî heye.

## Firqîya navbera her du zimanên tomerî da / massayî/

Peyî ra, nava nama bona Korintîya Pawlos firqîya navbera wan herdu zimana da şirove dike:

> Awa pêşkêşa zimanên xerîb nîşanek e, ne ku bona bawermenda, lê bona nebawera...Heger temamîya civînê pê va bicive û hemû jî zimanên xerîb xeber bidin, hingê hineke nezan, yan nebawer bikevine hundur, wê nebêjin: “Evana dîn bûne?”.
>
> –A Korintî 14:22–23

Heger hûn fem nekin, wekî cûrên zimana yên cuda–cuda hene, hûn dikarin bifikirin, wekî Pawlos bi nivîsara xwe miqabilî xwe derdikeve. Pêşda ew dibêje: “Ziman nîşana bona nebawera ye”. Peyî wê yekê ra, dinivîse: “Heger hûn bi zimana xeber bidin, bêbawerê bifikirin, ku hûn dîn bûne”. Çi jî hebe, bi zanebûna wê yekê, wekî çar cûrên zimana hene, em dikarin fem bikin, wekî Pawlos derheqa du cûrên zimana da dinivîse.

Cûrê zimana ê ewlin, çawa ku Pawlos dinivîse, nîşaneke bona bêbawera ye, çimkî ew çawa nîşan bona wan qulix dike.Cûrê sisîya /zimanên şirovekirinê/ tenê bona sazbûna civînê ne. Ev ziman nîşana bona bêbawera nînin.

Bi rastî, Pawlos dibêje, ku heger bawermend bi cûrê zimana yê duda xeberdin, bêyî şirovekirina wana, bêbawerê bifikirin, ku em dîn bûne.

Hûn dikarin rojeke yekşemê ya qulixê bînine ber çavê xwe, li kîderê hemû kes hîn dikin û pêxembertîyê dikin. Kirina wî cûreyî wê kardar nîbûya. Bi wî cûreyî jî Pawlos emirî li ser civînê dikir, ku atmosifêra tevîhevbûnê saz nekin, bi şaş xebitandina zimanên şirovekirinê. Kirina wî cûreyî, ya nava atmosifêra şaş da dikare tehevbûnê pêşda bîne û wê bona tu meremekî qulix neke. Pêşîya wê yekê, Pawlos zelal dibêje, wekî meremê zimana sazkirina tevîhevbûnê nîne, lê anîna femdarîyê û eyantîyê ye.

> Ez ji Xwedê Yê xwe razî me, ku ji we hemûya zeftir bi zimanên xerîb xeber didim. Lê belê, civînê da ez hê dixwezim pênc xeberên femdarî bêjim, wekî hinekên din jî hîn bikim, ne ku bi hezara xeberên xerîb.
>
> –A Korintî 14:18–19

Hemû tişt zelal e, heger zimanên şirovekirinê bona qulixa bi massayî tên xebitandinê, ew gerekê bêne şirovekirinê, bona ku hazirên li wir karê bistînin. Heger usa nîbe, diha baş e li wir bi zimanekî eyan bi hev ra xeberdin.

## Roja 5–emîn

## Ya sisîya: Zimanên bona duakirina şexsî

> Çimkî gava ez bi zimanên xerîb dua dikim, ew ruhê min dua dike, lê hişê min da tu tişt rûnanî. Ez çi bikim? Ezê him bi ruhê xwe dua bikim, him jî bi hişê xwe, him bi ruhê xwe bistirêm, him jî bi hişê xwe.
>
> –A Korintî 14:14–15

Her du cûrên zimana ên ewlin, kîjan me lêkolîn kirin, bona xebitandina bi massayî ne. Meremên wana ew e, ku gotineke Xwedê derbasî nava meriva bikî. Meremê zimanên bona nîşanê kivşkirî ew e, ku bighîjine bêbawera û bona wan qulix bikin. Meremê zimanên şirovekirinê jî bona wê yekê ye, ku bo bawermenda qulix bikin. Nava xebera jorin da Pawlos cûrê zimanayî sisîya raber dike– *zimanên duakirina şexsî*. Ew êdî derheqa qulixa tomerî da /bi massayî/ xeber nade, lê hîn dike, wekî zimana dikarin bona meremên xwe ên şexsî jî bidine xebatê. Ev cûrê zimana bona pirsên şexsî ne. Pawlos dibêje, wekî em dikarin "Bi fikirê dua bikin",– çi jî bona min dide kivşê, ku ez bi zimanê înglîzî dua bikim. Em usa jî dikarin "bi ruh dua bikin", kîjan dide kivşê, ku bi zimanê nenas, bi zimanê ezmîn dua bikin. Ew dibêje, wekî em dikarin usa jî bi van her du cûra bistirên /pesin bidin/.

Nava xebera Korintî 14:2 da nivîsar e: "Ewê ku bi zimanê xerîb xeber dide, ew ne ku mêriv ra xeber dide, lê Xwedê ra". Em zanin, wekî xwenîşandayîna Ruhe vî cûreyî nikare derheqa zimanên nîşanê da be, çimkî roja Pêntêkostê şagirta meriva ra xeber dida û karên Xwedê bi zimanê xerîb elam dikirin. Pawlos jî nikaribû derheqa zimanên şirovekirna da bi wî meremî raber bikira, çimkî wextê xebitandina wê pêşkêşê bawermend xebera bi zimanên ne eyan dibêje, kîjan hewcê şirovekirinê ne. Pawlos li vir derheqa şexsa da dibêje, yê ku bi ruh "ne ku meriva ra xeber dide, lê Xwedê ra".

Nava dua şexsî da xeberdana bi zimana tevgirêdana şexsî ya Xwedê û mêriv da ne, yê ku dua dike. Meremê wan zimana ew e, ku merivê dua dike bidine qewatkirinê. "Lê hûn, delalno, xwe bidine ser avakirina bawerîya xwe ya pîroz, bi Ruhê Pîroz dua bikin, xwe nava wê hizkirina Xwedê ya hindava xwe da xweyî kin" /Cihûda 2O:21, ESV/. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, Cihûda elam dike, ku dema em bi Ruhê Pîroz /bi zimana/ dua dikin, em xwe didine ser avakirina bawerîya xwe ya pîroz. Lê wextê ku em bi zimanên şirovekirinê tevî bawermendên Civînê xeber didin, wî çaxî em karê didine Civînê /bixwînin A Korintî 14:5/. Xwedê her dua jî dixweze, herdu jî girîng in.

Gelek bawermend pirsê didin: "*Gelo ew yek tiştê bûyînê ye, wekî ez bi Ruhê Pîroz tijîbûyî bim û bi zimana dua nekim*?". Belê, ez bawerim,

wekî meriv dikare bi Ruh tijîbûyî be û bi zimana dua neke. Ezê serda zêde bikim, wekî her kesê, ku bi Ruhê Pîroz tijîbûyî ye, *karebûna wî ya bona duakirinê heye*. Gelek bawermend vê pêşkêşê nadine xebatê, çimkî ew hela hê bi bawerîyê xwe teslîmî wê yekê nekirine. Her pêşkêşeke Xwedê bi bawerîyê tê qebûlkirinê û xebitandinê.

Bînine ber çavê xwe, wekî du meriv dikevine nava çêm. Ji wana yek qerar dike li wir bisekine, lê yê mayîn teslîmî çêm dibe, çawa çem dikişe. Herdu meriv jî nava çêm da nin, lê yê xilazîyê xwe teslîm dike. Meriv dikare merivê ku bi zimana dua dike himberî wî merivî bike, yê ku xwe teslîmî çêm kir. Ew bawermendê ku hela hê bi zimana dua nake, dîsa nava çêm da ne, lê xwe hela hê teslîmî çêm nekirîye /heger hûn dixwezin bizanibin, ku xwe çawa teslîmî Ruh bikin, emê serê kitêbê yê mayîn da wê yekê guvtugo bikin/.

Heleqetîya tevî Ruhê Pîroz ji wan gelek dua ne, kîjan bi saya mirina Îsa û hilatina Wî nêzîkî me ne. Wextê ku em xilaz dibin, em temamîya qewata vê helqetîyê texmîn nakin. Telebext ra, gelek bawermend hinek alîyên pêşkêşa xilazbûnê texmîn nakin. Ew yek gelekî grîng e, wekî em berbi *wî hemû tiştî* bicedînin, çi ku Xwedê bona me çêkirî ye.Em gerekê wî hemû tiştî eşkere bikin, çi ku Îsa bi mirina Xwe daye me. Eva meremekî mesîhîtîyê ê girîng e. Çawa ku me êdî got, Ruhê Pîroz qewatê dide me û me sîlih dike, ku em wan hemû gotina mîaser bikin, kîjan nava padişatîya Xwedê da teslîmî me kirine. Heger em wan pêşkêşa hesab hilnedin, kîjan Ruh dane me, emê tevî Xwedê nekevine nava heleqetîya kûr, ku bi cûrê anegor qulixî Wî bikin.

## Ya çara: Zimanên bona xeberdana bi sidqê qenc

> Usa jî Ruhê Pîroz tê hewara bêtaqetîya me, çimkî em nizanin gerekê çawa dua bikin, lê Ruhê Pîroz bi xwe bi gotinên kesere nayêne ser zar– zimana, bona me lava– navçêtîyê dike û yê dila guvtugo dike, zane fikira Ruhê Pîroz çiî ye, çimkî ew weke qerara Xwedê bona merivên Xwedê lava– navçêtîyê dike.
>
> –Romayî 8:26–27

Pawlos vê beşê dest pê dike û dibêje, wekî “Ruh alî *bêtaqetiya me dike*”. Derheqa kîjan bêtaqetîya da ew dibêje? “Çimkî em nizanin gerekê çawa dua bikin, lê Ruhê Pîroz bi xwe bi gotinên kesere nayêne ser zar– zimana, bona me lava– navçêtîyê dike”. Bi gilîkî bêtaqetîya me ev e: femdarîya me ya derheqa wê yekê da, ku li dor– berê me çi diqewime, sînorkirî ye. Rûyê wê yekê da jî tiştên usa hene, wextê ku em nizanin, çawa dua bikin. Lê wextê ku em îtbara xwe Ruh tînin û bi ruh lava– navçêtîyê dikin, Ew bi me xwestina Xwedê dua dike.

Wextê xwendina li ûnîvêrsîtêta “Pûrdyû”–ê min dersên lêkolînkirina Mizgînîyê derbas dikirin, tevî kîjana dibûn xwendikarên ûnîvêrsîtêtê. Nêzîkî 6O xwendikara tevî wan dersa dibûn, yên ku berê neçûbûne civînê, yên mayîn jî ji civînên cuda–cuda bûn. Nava wan da keçek ji wê civînê bû, li kîderê bawer dikirin, wekî ziman sekinîne. Êvarekê, dema ku min derheqa Ruhê Pîroz da hîn dikir, ewê fem kir: “Ziman îro jî hene. Mizgînîyê da derheqa wê yekê da nivîsar e”. Hema wê êvarê ew bi Ruhê Pîroz va tijî bû.

Rojtira mayîn, berbangê, ji zengilê têlêfonê ez hişyar bûm. Ewê keçikê têlêfon dikir, ya ku hîvî kir, ku rastî hevdu bên. Ew li avayê jîyînê ê bona keçika dima, kîjan pêşberî avayê xorta bû. Ez bi çetinayî ji cihê xwe rabûm, ji avayî derketim û derbasî wî berê rê bûm, li kîderê ew hîvîya min bû.

Ez xewixî bûm û rûyê zû hişyarbûnê da hinekî jî beşera min ne xweş bû. Min jê pirsî:

–Çi qewimîye?

–Xwedê ez seheta pênca hişyar kirim,– ewê got.– Min texmîn kir, wekî gerekê min bi zimana dua bikira û min dua kir. Min fem kir, wekî ez bi lava–navçêtîyê xeber didim û min hîvî ji Xwedê kir, ku nîşanî min bide, ku bona çi bi zimana awqasî bi kel û ced dua dikir. Xudan got: “Tu bo emirê merivekî yaşê xwe da mezin dua dikî, lava– nêçêtîyê dikî”. Min dîsa bi zimana dua kir. Seheta şeşa ewê keçikê ra têlêfon kirin û gotinê, wekî dilê kalikê wê qolayî ye. Ew biribûne nexweşxanê û doxtira ra li hev hatibû emirê wî xilaz bikin.

–Ruhê Pîroz min ra xeber da,– ewê got.– Ewî gote min: “Te bona wî merivî dua dikir”.

Eva mesela xebitandina zimanên bona xeberdana bi sidqê qenc e. Ew keçik qet ha ji pê jî tune bû, ku emirê wî merivî bin qezîyayê da bû, lê Ruhê Pîroz derheqa wê yekê da zanibû. Heger ewê tenê bi fikira xwe dua bikira, ewê tu cara nikaribûya bona wî merivî lava– navçêtî bikira.

Dayîka min li Florîdayê dijî û ez nizanim nava emirê wê da niha çi diqewime. Ez nizanim, ku nava emirê xwîşka min da çi diqewime, ya ku li Kalîfornîayê dijî. Feqet Ruhê Pîroz xwestina Xwedê zane û Ewê bi destê min bona wana lava– navçêtîyê bike, heger ez gumana xwe bidime ser Wî û nava duakirinê da tevî Wî hevkarîyê bikim.Ruh hemû tiştî guvtugo dike û hemû tiştî zane. Xêncî wê yekê em bi edilaya mezin va tijî dibin, dema ku em fem dikin, wekî îzinê didine Ruhê Pîroz, ku bi destê me dua bike.

## ZELALKIRINA DERHEQA ZIMANÊN "ŞEXSÎ"–DA

Tiştek grîng e, ku em cudatîkê bidine kivşê, girêdayî du cûrên zimanên "şexsî"–ra. Bawermendên bi Ruh va tijîbûyî gelek cara berev dibin, ku tevayî bi zimana dua bikin. Wextê ku li wir tenê bawermendên bi Ruh va tijîbûyî hazir in, îzin heye, ku hemû bi Ruh dua bikin. Usa jî dibe, dema ku bawermend gerekê bi dengê bilind, bi massayî, zimanên duakirina xwe nedine xebatê. Pawlos wa got:

> Heger temamîya civînê pê va bicive û hemû jî zimanên xerîb xeber bidin, hingê hineke nezan, yan nebawer bikevine hundur, wê nebêjin: "Evana dîn bûne?".
>
> –A Korintî 14:23

Nava vê beşa derheqa du komên meriva da nivîsar e. Berê ewlin Pawlos *bêbawera* bîr tîne. Gilî derheqa wan meriva da ye, kîjana Îsa Mesîh çawa Xudan qebûl nekirine, dêmek ew ji bawerîyê der in. Koma duda yên *nezan in*. Ev meriv jî Îsa bawer dikin, lê ew derheqa zimanê Ruh da hîn nebûne. Merivên van her du koma wê xwe nava atmosifêreke nebaş da texmîn bikin, li kîderê meriv bi zimana dua dikin. Ew hêsa dikarin bifikirin, yan jî bêjin: "Hûn dîn bûne?".

Telebext ra ez carekê, yan duda bûme şedê wê yekê, ku gelek meriv

çawa bi dengê bilind, wextê qulixkirinên roja yekþemê, bi zimana dua dikin. Rêbera digotine bawermenda, ku gerekê wî cûreyî bikin. Min jî rêberî li wan meriva kirîye, rûyê kêmasîya zanebûnê da. Wextê qulixên wî cûreyî, şebeqa yekşemê, merivên teze hene, kîjan ji komên *bêbawera* û *nezana ne.* Bi texmîn ew difikirin: “Ev meriv dîn bûne?”. Min dîtîye, wekî civînên vî cûreyî bi çetinayî pêşda diçin û dighîjine wan ciha, li kîderê ew dijîn. Diqewime menî ew e, wekî ew wî cûreyî nakin, çawa ku nava gotina A Korintî 14:23–a da nivîsar e. Ez guman im, ku heger ew her dem wî cûreyî bikin, merivên *bêbawer* û *nezan* wê paşda venegerine cem wan.

Bêfitîya, civîn usa jî qulixdarîyên duakirinê derbas dikin, li kîderê tenê bawermend hazir in. Derheqa van berevbûna da hemû kes him *ha ji pê hene*, him jî *bawermend in.* Meremê van berevbûna qulixa bo Xudan e. Li vir hemû kes dikare bi zimana dua bike.

Bi gilîkî, Pawlos nabêje, wekî bawermend tu cara nikarin li cihekî berevbin û “bi zimanên şexsî” dua bikin. Ew awqasî dibêje, wekî wextê ku nava me da *bêbawer*, yan jî *merivên nezan* hene, wî çaxî gerekê pêşkêşa zimana bi cûrê anegor bidine xebatê.

## XWESTINA XWEDÊ YA BO WE

> Awa xwîşk– birano, heyra pêxembertîkirinê da bin û dengê yên *bi zimanên xerîb xeber didin nedine birînê.* Tenê her tişt bira bi terbyet, cî bi cî û maqûlî be.
>
> –A Korintî 14:39–4O

Pawlos zanibû, wekî civînê pêkêşa zimana bi cûrê şaş bida xebatê, bo wê yekê jî ew dibêje me: “Cûrê zimana rast, cihê rast bidine xebatê û xeberdana bi zimana qedexe nekin, çimkî hinek bawermend ev pêşkêşa Ruh şaş didine xebatê”. Telebext ra, Civîn derheqa gelek tiştên Ruh da nizanin. Eva tragêdîya ye, çimkî Ruhê Pîroz Ew e, Yê ku bona qewatkirina Civînê hatîye şandinê. Xwedê Civîna Xwe bijart, çawa mecala belakirina padişatîya Xwe. Heger em bona wê qewatê hişyar nebin, kîjan bi saya tabîya nava Mesîh da ya meye, emê bibine mînanî

padişakî, yê ku serwêrîya xwe hesab hilnade.

Gelo çiqas bawermend mecala pêşkêşên Ruh ji destê xwe berdidin, çimkî bawer dikin, wekî ziman sekinîne. Xwedê xwestina dilê Xwe zelal dide kivşê: "Ez dixwezim, ku hûn hemû bi zimana xeberdin" /A Korintî 14:5/. Hinek meriv wê wa bêjin: "Ev gotin Pawlos dinivîse, lê ne ku Xwedê". Temamîya Kitêba Pîroz bi gotinên Xwedê hatîye nivîsarê û ev gotin jî cuda nîne /bixwînin B Tîmotêyo 3:16/.

Tu cara bîr nekin, wekî pêşkêşa zimana faktoreke qewatbûna Ruhê Pîrozî girîng e, usa jî mînanî alîkî heleqetîya nêzîk a tevî Xwedê. Bo wê yekê jî ez hema wê yekê dixwezim, çi ku Pawlos dixwest. Ez dua dikim, ku hûn vê pêşkêşê qebûl bikin, wekî her roj bi qewata Ruh bigihîjin û diha gelekî nava hazirîya Wî da bijîn.

# RUH BERBI *KIRINÊ* DIBE

*Xwedê, bi dayîna keremetên cûre– cûre, kirên qewat û pêşkêşên Ruhê Pîroz, şedetîya wê yekê da, dema ku Ewî xwest.*
– Îbranî 2:4, NLT

Ruhê Pîroz her dem berbi kirinê dibe. Ew bi gelek cûra eyan dibe. Kitêba Pîroz da Ew bi sîmvolên *kevotikê, agir*, *ba* û *şerabê* hatîye raberkirinê. Bi femkirina wan tişta, emê diha baş xeysetê Wî nas bikin û bizanibin, ku Ew nava me da û bi destê me çawa kar dike.

**Ruh çawa kevotk:** Nava her çar Mizgînîya da nivîsar e, wekî Ruh mînanî kevotkê peyayî li ser Îsa dibe. Xeysetê kevotka gelekî nerm e. Wana dikarî rehet ji xwe dûr bixî. Ew bona hêsabûnê li wan ciha peya dibin, li kîderê bêqezîya ye û ew xwe rehet texmîn dikin. Wextê bijartina heval yan jî hevala xwe, ew hetanî dawîya emirê xwe ji hev naqetin. Gelo ev yek çawa alî we dike, ku hûn Ruhê Pîroz diha baş fem bikin û diha nêzîk tevî Wî bikevine nava heleqetîya?

__________________________________________________________
__________________________________________________________
__________________________________________________________
__________________________________________________________
_________________________________________________________

**Bixwînin** Metta 3:16–17, Marqos 1:9–11, Lûqa 3:21–22, Yûhenna 1:32–33

**Ruh çawa agir:** Li cem Mûsa Ew bi alava agir, lê bona Îsraêlê çawa stûna agir eyan bû. Roja Pêntêkostê Ruh meriv nixumandin "…zimanên mîna alava agir wan va xuya bû" /Karên Şandîya 2:3/. Ew ew Agir bû, ku Îsa anî li vê dinîyayê û em gerekê fesal bin, ku wî agirî netemirînin. Agir paqij dike, ronahyê û germayê dide û hemû tiştî dikişîne xwe. Ev zanebûna derheqa vê yekê da çawa alî we dike, ku hûn agirê Ruhê Xwedê nava emirê xwe da fem bikin? Çi Agir pê

dixe û çi alî dike, ku wî gur bikin?

____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

**Bixwînin:** Karên Şandîya 2:3–4, Lûqa 12:49, A Têsalonîkî 5:19–21, Metta 3:11–12, Lûqa 3:16–17, Yêrêmîya 2O:9, Îbranî 12:29.

**Ruh çawa Ba:** Ew roja Pêncî ya hesab eyan bû, ne tenê çawa agir, lê usa jî çawa ba. Ba cûre– cure ne, ji bayê nerm destpêkirî hetanî bagerê. Derheqa wê yekê da bifikirin, ku ba çi dike. Bayê Ruh çi cûreyî dikare nava emirê we da kirinê pêşda bîne? Ew nava emirê we da çi dikare bike?

____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

**Bixwînin:** Yûhenna 3:5–8

**Ruh çawa şerab:** Roja Pêncî ya hesab şagirta bi zimana xeberdan û kirên Xwedê elam kirin. Wê yekê guhdarîya hemûya usa kişande ser xwe, wekî hineka gotin, ku ew ji şerabê kêfxweş bibûn. Feqet Petrûs got, wekî ew Ruh bû. Bisekinin û bifikirin. Vexwerina şerabê çi cûreyî hukumî li ser însan dike? Şeraba Ruhe nû çi cûreyî dikare hukumî li ser we bike?

____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

**Bixwînin:** Karên Şandîya 2:13–18, Lûqa 5:37–38 /usa jî Marqos 2:22, Metta 9:17/, Efesî 5:18–19, Yêstêr 1:1O, Yêrêmîya 31:11–13.

*"Ezman nikare Ruhê Pîroz cih bike, lê çawa jî hebe, Ew dilên xulamên Xwe da dijî. Em paristgeha Wî ne. Her kirineke Wî razîbûnê û şikirîyê me da pêşda tîne. Heger Ew mînanî ba ye, emê bibine mînanî zengilên biçûk, kîjan wextê bayê dikine zingîn: heger Ew mînanî çiqila dare ye, emê kulîlka bidin: heger Ew agire, emê bi kel û ced bişuxulin. Ew çawa jî nava me da bilive, emê hazir bersiva dengê Wî bidin".*

– Çarlz Spêrcên

# *ŞEDETÎYA* HAZIRÎYA WÎ

*Şedetîya hazirîya Ruh bona kara hemûya xuya dibe.*
– A Korintî 12:7, GW

Hazirîya Ruhê Xwedê her dem bi şedetîyê va tê rêberkirinê. Çem û behr paşda vedikişin. Çavên kor û guhên ker vedibin. Seqet digerin û lal xeber didin. Tirs bin dikeve û dîsa guman pêşda tê. Nîşanên pircûre û tiştên vî cûreyî cihê xwe li ser emirê me dihêlin, wextê ku em ji nêzîk va tevî Ruhê Xwedê dikevine nava heleqetîya.

Serpêhatîyên kitêba Karên Şandîya dîsa îzbat dikin, wekî wextê ku Ruhê Pîroz hazir bû, meriva şedetîya derheqa wê yekê da dibihîstin û didîtin. Vegerin û emirê xweyî derbasbûyî binihêrin. Hûn şedetîyên hazirîya Ruhe çi cûreyî dikarin bîr bînin? Cumlekê, yan duda binivîsin û wan xala bînine ber çava, kîjanada Ruh xuya bûye û emirê we daye guhartinê.

Tê bîra min, wextê ________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

Tê bîra min, wextê ________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

Tê bîra min, wextê ________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________

Lez nekevin. Dora rehmbûna Wî bifikirin. Îzinê bidin, ku Ruh emirê

nû û aktîvbûnê bide we, wextê ku hûn bîr tînin, ku Ew himberî we çi cûreyî bûye.

*Ezê carekê jî wê yekê bîr bînim, ku Xwedê çi kirîye: carekê jî kirinên Wî bîr bînim û dora wê yekê bifikirim, ku Te çi kirîye û ezê bi heyr–hijmekar kirên Te binihêrim.*

*Xwedê: rîya Te pîroz e. Tu xwedêk awqas mezin nîne, çiqas Xwedê ye. Tu ew Xwedê yî, Yê ku kar dike: Te nîşanî hemûya kir ku çi dikarî bikî.*

– Zebûr 77:11–14, MSG

Ruhê Pîroz pêşda alî we kirîye û Ew dixweze dîsa wê yekê bike. Gelo hûn hewcê wê yekê ne, ku Ew niha alî we bike û çi cûreyî bike? Xwe bêdeng bikin, nêzîkî Wî bin û hîvî bikin, wekî Ew careke mayîn wê yekê bike. Hîvî ji Wî bikin, ku Ew şedetîya derheqa wê yekê da bide, wekî Ew rast e û bi rastî derheqa we û merivên dor– berên we da difikire. Bêdeng bimînin. Ew çi dibêje we?

______________________________________________________________________________

______________________________________________________________________________

______________________________________________________________________________

_____________________________________________________________________________

Bisekinin û pesinê Xödan bidin. Bona Wî **dua yê** pesindayînê û razîbûnê **binivîsin**. Ew hêja ye!

______________________________________________________________________________

______________________________________________________________________________

______________________________________________________________________________

_____________________________________________________________________________

# TIJÎBÛN HER DEM BERDEWAM DIBE

*Û bi şerabê serxweş nebin, çimkî ewê emirê we pûç bike, lê bi Ruhê Pîroz va tijî bin.*

– Efesî 5:18, NLT

Gotina Xwedê ya derheqa tijîbûna bi Ruhê Pîroz va, kîjan Ewî bi destê Pawlos da, tiştekî girîng e. “Xebera “tijîbûn” zimanê yûnanî da xebera “plêroo”–ye, kîjan dide kivşê “tijîbûn û belabûna nava şexsekî da”. Ev cûrê vê xeberê bi kemala xwe va gelekî ferz e. Ew ya qismê nêytral e, dema wê ya emirkirinê ye û bi wedê niha ye. **Qismê nêytral** dide kivşê, wekî ev yek gerekê tevî we biqewime. **Cûrê emirkirinê** dide zelalkirinê, wekî eva temî ye, lê ne ku pêşnîyar e, lê **wedê niha** jî nîşan dide, wekî ew kirin hema usa berdewam dibe.

Efesî 5:18, ya nava Mizgînîya diha berfireh da /AMP/, wê yekê dide kivşê: “Bi şerabê serxweş nebin, çimkî ew yek rêderketin e, lê her dem bi Ruhê Pîroz va **tijî bin**”. Tijîbûna bi Ruhê Pîroz hemû tiştî dide, çi ku em hewce ne, ku em mînanî Îsa bijîn û xwestina Xwedê bînine li ser vê dinîyayê, çawa ku ew yek li ezmîn e. Nivîskarê Mizgînîyê Smît Vîgglsvort got:

“Ezê tu cara nikaribim bi cûrê tam wê yekê qîmet bikim, ku nixumandina bi Ruhê Pîroz bona min çiîye…”. Tijîbûna bi Ruh bedewetî ye, lê bi wê yekê va tevayî ew yek bona me emirê Xwedê ye… Bi nixumandina Ruhê Pîroz, ez her dem *tijî dibim.* Hûn gerekê şebeqê, nîvro û êvarê bi zimana xeber bidin. Wextê ku hûn nava Ruh da bijîn û pêpelîngên mala xweva peya bin, mîrêcin wê mecbûr be ji pêşîya we dûrkeve. Hûnê himberî mîrêcin serketî bin.

…Bi jîyana nava Ruh da hûn dileqin, kar dikin, dixun, vedixun û hemû tiştî bo şikirîya Xwedê dikin. Berbirîbûna me ev e: “Bi Ruh va tijî bin”. Emirê nava Ruh da ew cih ye, kîjan Xwedê bona we çê kirîye. Ew ji emirê dinîyayê bilindtir e, çawa ezman ji dinîyayê bilindtir e. Xwe

bidine Xwedê, bona ku Ew we tijî bike”.

Petrûs, Yûhenna û şagirtên mayîn roja Pêncî ya hesab bi Ruh va hatine nixumandinê. Ew careke mayîn, wextê duakirinê bi Ruh va tijî bûn. Bi guhdarî Karên Şandîya 4:23–31 bixwînin. Ji vê serhatîyê hûn çi dikarin hîn bin, bona ku hûn her dem bi Ruh va *tijîbûyî* bin?

________________________________________________________________
________________________________________________________________
________________________________________________________________
_______________________________________________________________

Xwedê bi destê Pawlos dibêje: “Hindava wê pêşkêşa xwe ya Ruhanî da bêxem nîbe” /pêşkêşa Ruhê Pîroz/, lê “Agirê pêşkêşa Xwedê hê gur bike, ya ku bi destdanîna min te ra hate dayînê /A Tîmotêyo 4:14, B Tîmotêyo 1:6, tercima Fîlîps/. Bi guhdarî gotinên Efesî 5:18–19, 6:18 û Cihûda 2O bixwîne. Ruh derheqa gurkirina agirê Xwe ê nava we da çi nîşanî we dide?

________________________________________________________________
________________________________________________________________
________________________________________________________________
_______________________________________________________________

*Awa ez çi dixwezim, ku hûn bi alîkarîya Xwedê bikin. Çawa mesele, hildin emirê xwe ê her roje–razanê, xwerinê, çûyîna li ser kar, pêşdaçûyîna emirê xwe û wî hemû tiştî çawa qurbanî daynine ber Xwedê. Tiştê herî baş, ku hûn dikarin bona Xwedê bikin ev e: wî hemû tiştî qebûl kin, çi ku Ew bona we dike. Guhdarîya xwe bibine berbi Xwedê. Hûnê ji hundur hetanî der bêne guharitinê.*

– Romayî 12:1–2, MSG

Ders Roja 4–emîn

# EWÎ BI MEREMÊ MEXSÛS PÊŞKÊŞ DANE WE

*Bona hemû kesî tiştek hatîye dayînê bona ku tiştekî bike, çi jî nîşan dide, ku Xwedê kî ye? Rola her kesî heye: her kes karê dest tîne.*

– A Korintî 12:7, MSG

Ruhê Pîroz pêşkêşen mexsûs dane me, ku em wê xebatê bidomînin, kîjan Îsa dest pê kir. Pêşkêş cûre– cure ne, "Tenê Ruh e ku her kesî ra başqe–başqe pareve dike. Tenê Ew qerar dike ku her kes çi pêşkêşê wê bistîne" /A Korintî 12:11, NLT/.

Gelo ew pêşkêş roja îroyîn dixebitin? Gelo em gerekê wan kira bikin, kîjan Îsa kirin? Belê. Nivîskar Rêynhard Bonnkê dibêje:

> "Ez guman im, wekî Xwedê afrandarê cimeta Xwe ye. Ez bawerîya xwe li wan nîşana tînim, kîjan peyî Îsa diçûn, wextê ku Ew li ser vê dinîyayê digerîya. Ew dikarin roja îroyîn jî bibine rastî. Îsa gote şagirtên Xwe: *Ewê ku kirên Min bawer dike, kîjana Ez dikim, ewê jî bike û wê tiştên hê mezin bike, çimkî Ez diçime cem Bavê Xwe*".

Bi guhdarî bixwînin **Romayî 12:3–8** û pêşkêşên kivşkirî yên nava vê beşê da nav bikin. Bi tomerî hildayî hûnê wan pêşkêşa çi cûreyî şirove bikin /merem û şuxulkarîya wana/?

__________________________________________________________

__________________________________________________________

__________________________________________________________

__________________________________________________________

__________________________________________________________

Niha bixwînin **A Korintî 12:4–11** û neh pêşkêşaa başqe bikin.

Bi tomerî hildayî hûnê van pêşkêşa çi cûreyî şirove bikin/ merem û şuxlkarîya wana/?

_______________________________________________
_______________________________________________
_______________________________________________
_______________________________________________
______________________________________________

Wan pêşkêşaa lêkolîn bikin, kîjan nava van her du beşa da hatine kivşkirinê. Gelo ji van pêşkêşa kîjan nava we da dişuxule?

_______________________________________________
_______________________________________________
_______________________________________________
_______________________________________________
______________________________________________

Dijwar e bersiva vê pirsê bidin? Ji van pêşkêşa kîjan we ruhdar dikin? Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew nîşanî we bide, ku pêşkêşên çawa Ewî dane we.

Dema ku hûn bi van pêşkêşa dişuxulin, kîjan Ruh dane we, ew yek grîng e, ku hûn hindava meriva çi cûreyî ne. Xwedê dibêje: "Mesîh Îsa ser çi nêt–fikirê bû, ji we her kes jî usa bifikire" /Fîlîpî 2:5/. Rêynhard Bonnkê vê yekê îzbat dike û serda zêde dike:

> "Açixîya karê Xwedê ji me va girêdayî nîne… Hemû tişt bi rîya girêdayîbûna Wî va dibe. …Ez tu tişt nînim û Xwedê min dikare tenê bona wê yekê bide xebatê, wekî ez dengê Wî ji dengên mayîn zêdetir qîmet dikim… Ez gerekê tu cara xwe ji xulamên Xwedê yên mayîn zêdetir hesab nekim".

Bi guhdarî bixwîne A Korintî 12:12–26 û Romayî 12:3–5. Ruh derheqa nêzîkbûna we ya wî cûreyî da çi elam dike? Pêşkêşa her merivekî, usa jî ya we, bi çiqasîva girînge? Gelo Bedena Mesîh wê çawa be, heger hûn pêşkêşa xwe hesab hilnedin?

**Bona lêkolînkirina paşê…**
Derheqa nêzîkbûna rast da: Fîlîpî 2:1–8, B Korintî 8:9, Metta 23:11–12.
Ruh jî bi meremê mexsûs bawermenda bona qulixkirina kivş dike: A Korintî 12:28–31, Efesî 4:11–14.

# ÎZINÊ BIDINE WÎ, KU EW BI DESTÊ WE XWESTINA XWEDÊ DUA BIKE

*Ruhê Xwedê li rex me ye û her dem alî me dike. Heger em nizanin çawa yan jî çi dua bikin, ew yek grîng nîne. Ew dewsa me– nava me da û bona me dua dike, bi duakirina ji keserên me.*

– Romayî 8:26, MSG

Gelo usa qewimîye, ku hûn awqas ji emir şikestî bûne, wekî we nizanibûye çawa dua bikin. Hûn tenê nînin. Wan çaxa Xwedê dixwexze, ku hûn *birevin cem Wî*, lê ne ku ji Wî birevin. Ew dixweze, ku hûn dilê xwe vekin. Wextê hûn nizanin çi bêjin, yan jî çi dua bikin, Ruhê Mesîh, Yê ku nava we da dijî, derheqa wê yekê da zane.

Gelekî girîng e ku hûn dilê xwe da , lê ne ku fikira xwe da, bizanibin, wekî Ruhê Xwedê nava we da dijî. Bona fikirmîşbûna dora van gotina, wede başqe bikin. Ruhê Pîroz serwextîke çawa elamî we dike?

**Dora van gotina bifikirin:** Galattî 4:6, Romayî 8:16, A Korintî 6:19, Yûhenna 14:23, A Yûhenna 3:24, 4:12–13, Hîvî ji Ruh bikin, ku bi rastî Wî nas kin.

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

Xwedê dixweze, ku em "her dem û nava hemû halê pêşdahatî da bi Ruh dua bikin" /Efesî 6:18, NLT/. **Voçman Nî,** yê ku zêrandinênn bi fîzîkî dîtine û bi sala ser hev girtî bûye, dinivîse:

> "Razîbûn bo Xwedê, wekî Ruhê Pîrozî ku hemû tiştî dikare bike, tevî me ye, ku alî me bike. Em gerekê xwe bispêrine

> Ruhê Pîroz, Yê ku bi qewatê nava me da kar dike, çimkî Ew wextê zeyîfbûn û sistbûna me alî me dike. Nenihêrî wê yekê, wekî em nizanin çawa dua bikin, Ruhê Pîrozî nava me da, Yê ku xwestina Xwedê zane, wê me hîn bike, ku em anegorî fikira Xwedê dua bikin”.

Bisekinin û bifikirin. Hûn bi çiqasîva zanin, ku çawa bona xwe, bona merivên başqe, usa jî bona wan halên pêşdahatî dua bikin, rastî kîjana hûn tên? Gelo nêzîkbûna me ya hindava Xwedê da gerekê çawa be, wextê ku em du dikin?

____________________________________________________

____________________________________________________

____________________________________________________

____________________________________________________

**Bixwînin** Gotinên Silêman 3:5–8, 28:26, Lûqa 18:9–14, Aqûb 4:6–1O.

Gelo hûn dixwezin nava xwestina Xwedê da bijîn? Ruhê alî we bike: Ewê bi rîya qare–qar, keserên we û zimanên dinîyayê dua bike. “Û Yê dila guvtugo dike, zane fikira Ruhê Pîroz çiîye, çimkî ew weke qerara Xwedê bona merivên Xwedê lava– navçêtîyê dike” /Romayî 8:27, NLT/. Bi guhdarî evê beşê bixwînin. Ruh bi van gotina çi elamî we dike?

> Çimkî heger karebûna we ya xeberdana we ya bi zimana heye, hûnê tenê Xwedê ra xeber din... Hûnê bi qewata Ruh xeber din. Ew merivê ku bi zimana xeber dide, nava şexsê xwe da qewat dibe... Çimkî heger ez bi zimana dua dikim, ruhê min dua dike, lê ez fem nakim ku ez çi dibêjim. Dêmek, ez çi bikim? Ezê bi ruh dua bikim û ezê jî bi wan xebera dua bikim, kîjana ez fem dikim. Ezê bi ruh bistirêm û ezê jî bi wan xebera bistirêm, kîjana fem dikim.
>
> – A Korintî 14:2,4, 14–15, NLT

____________________________________________________

____________________________________________________

____________________________________________________

____________________________________________________

*"Wextê ku hûn xwe teslîmî Ruh bikin, Ewê we û hewcetîya we li ber textê Bavê raber bike. Ruhê Pîroz fikir û qerara Xwedê zane. Ew dilê we guvtugo dike û ji we hê baştir zane, ne ku hûn bi xwe, Ewê wê hewcetîyê bîne ber textê Xwedê. Hûn nikarin tê berdin, wextê ku Ruhê Pîroz bi destî we dua dike".*

– Kêtrîn Kûlman

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz: Naverok"–ê lêkolîn dikin,*
*çawa beşeke dersa ya ji "Berevoka Mêsîncêr"–ê, em hîvî dikin,*
*vîdêoya çara ya bona hînbûnê temaşe bikin.*

1 I Ew yek girînge ku fem bikin, wekî wextê xilazbûnê jîyana Ruhê Pîroz a nava me da û tijîbûna bi Ruhê Pîroz va cêribandinên cuda ne. Hûnê çawa van her du cêribandina şirove bikin?

2 I Bi fikira we bona çi Îsa temî da şagirtên Xwe, ku hîvîya tijîbûna bi Ruhê Pîroz bisekinin, hetanî kirinek a bona padişatîya Wî? /bixwînin Karên Şandîya 1:4–5/. Hûn ji prînsîpa "hîvîya qebûlkirina qewata jorin bisekinin" çi dikarin hînbin? Roja îroyîn hûn çawa dikarin wê yekê bidine bikaranînê?

3 I Tijîbûna bi Ruhê Pîroz qewatê dide me, ku em bi zimana xeber bidin. Em wan zimana nizanin, bi kîjana em xeber didin. Bînine ber çavê xwe, wekî hûn ji wan cihûîyên rehmparêz in, derheqa kîjanada nava beşa Karên Şandîya 2 da nivîsar e û hûn ji welatekî xerîb çûne Orşelîmê girêdayî roja Pêntêkostê ra. Bi fikira we, weyê çi bigota, heger we bibihîsta, ku bawermend bi zimanê we ê dayîkê derheqa wê xilazbûnê da xeber didan, kîjan bi Îsa Mesîh e?

4 I Wextê ku Ruhê Pîroz bawermenda tijî dike, bona çi her car ew her du tişt diqewimin? Menî kîjan e, wekî Xwedê carekê ra xilazbûn û tijîbûna bi Ruhê Pîroz da Kornêlyos û malbeta wî? Derheqa serpêhatîkê da gilî bikin, ku Xwedê çawa ji "wî qalibê Ruhanî" derket, nava kîjanîda we Ew danîbû û fikirên we derheqa Wî da dane berfirehkirinê.

5 I Heger karebûnên xeberdana pêxembertîyê û bi zimana, usa jî derheqa bawermendên roja îroyîn da nin, wî çaxî nêta Pawlos çi bû, wekî ewî digot, ku *ne hemû kes bi zimana xeber*

*didin* /bixwînin A Korintî 12:27–3O/ û ku *zimanê bisekinin* / bixwînin A Korintî 13:8–12/? Bi guhdarî wan gotina bixwînin û şirove bikin.

6 | Încîl derheqa çar cûrên zimana da dibêje. Van beşa bixwînin û navê wan cûrên zimana bidin, şirove bikin, ku bona çi Xwedê ev kirinên R'uhê Pîroz ên cuda–cuda dane Civîna Xwe?

A Korintî 14:22

A Korintî 12:1O

A Korintî 14:14–15

Romayî 8:26–28

Gelo femkirina cudatîyên cûrên di navbera zimana da bona çi girîng e?

7 | Bawermend dikare bi Ruhê Pîroz va tijî bibe, lê bi zimana xeber nede? Bona çi erê, yan jî bona çi na? Bona tiştên wî cûreyî diqewime? Çend menîya nav bikin.

KIVŞKIRIN

## TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Qewatbûna Ruh bona xebata temamîya padişatîya Xwedê ferze girîng e.
- Tijîbûna bi Ruhê Pîroz halekî cuda ye, kîjan peyî xilazbûnê ra tê.
- Xilazbûn tabîya nû nava Mesîh da dide me: tijîbûna bi Ruh qewatê dide me, bona jîyana mînanî Wî.
- Ziman nesekinîne: ewê bixebitin, hetanî ku em rû bi rû Îsa nebînin.
- Çar cûrên zimana hene: zimanên çawa nîşana bona bêbawera, zimanên bona tercimê, zimanên bona duakirina şexsî û zimanên bona xeberdana bi sidqê qenc. Her du cûrên ewlin bona xebitandina tomerî ne, lê her du cûrên mayîn bona meremên şexsî ne.

# 5

# ZIMANÊ RUH

*Eger hûn bi zimanê şexsî pesinê Xwedê didin, Ew we fem dike… çimkî hûn bi nêzîkayî tenê di navbera xwe û Wî da dikevine nava tevgirêdanê.*

– A Korintî 14:2, MSG

## Roja 1–emîn

Ew yek gelekî min xweş tê, ku çawa Încîla “Berbirîbûn” /MSG/ rasthatina şexsî ya tevî Xwedê Yê me tîne ber çava. Bi rîya xebitandina zimana ya wî cûreyî tevgirêdaneke gelekî baş “tenê di navbera we û Wî da /Xwedê/ diqewime”.

Serê kitêbêyî derbazbûyî da me çar cûrên zimana lêkolîn kirin, kîjan kitêba Pîroz a Nû da hatine şirovekirinê: zimanên çawa nîşana bona bêbawera, zimanên bona tercimê, kîjan li civînê tên xebitandinê, zimanên bona duakirina şexsî û zimanên bona xeberdana bi sidqê qenc. Her du cûrên zimana ên ewlin gerekê wextê qulixa tomerî bêne bikaranînê /wextê hazirîya du meriva, yan jî ji du meriva zêdetir/, lê her du cûrên mayîn yên şexsî ne. Nava evî serê kitêbê da emê cûrê tevgirêdana şexsî a tevî Ruhê Pîroz lêkolîn bikin, dikeve nava kîjanî xeberdana him bi zimana û him jî bi fikirê. Ev gotinên duakirinê tevayî dibine zimanê Ruh.

Careke mayîn îzinê bidin, ku ez zelalkirinê bikim. Bi navkirina van tişta çawa yên “şexsî”, ez wê yekê nabêjim, ku gerekê wana tenê wî çaxî bidine xebatê, wextê ku meriv tenê ye. Ez dixwezim bêjim, wekî bi zimanên dinîyayê ev tişt gerekê hindava wan meriva da bidine xebatê, kîjana Încîl çawa “nezan” yan jî “bêbawer” nav dike. Tiştên wî cûreyî dikarin wî çaxî bidine bikaranînê, wextê ku meriv tenê ye, yan jî tevî bawermendên başqe ye, yên ku xwenîşandayîna

Ruh fem dikin. Mesele, malbeta min da hene têmayên *şexsî,* kîjan minê tevî merivên ku ji nû va nas dikim, guvtugo nekirana, çimkî ewê min fem nekirana /bixwînin A Korintî 14:22–25/.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî A Korintî 14:2 da Pawlos xebitandina van zimana çawa "zimanê şexsî" nav dike. Telebext ra, gelek komên civînê pêşkêşên şexsî yan şaş fem kirine, yan jî înkar kirine, çimkî wana fem nekirîye, wekî nêzîkayî dewa *wede* û *cih* dike.

Her merivek bona heleqetîyên nêzîk ên tevî merivekî mayîn wede, cih bona heleqetîyên nêzîk başqe dike. Gelo ev yek pêşîya zewacê diqewime? Na xêr. Diqewime nava cihekî civakî da? Bêyî şik na. Ew çi ku bedew e û ji alîyê Xwedê da hatîye pêşdakişandinê, dikare li cihekî başqe baş neyê qebûlkirinê. Xwedê têra dîtîye, wekî heleqetîyên nêzîk ên bi bedenê cihê xewile derbas dibin û tenê peyî zewacê ra. Wî cûreyî jî hinek cûrên zimana gerekê tenê li cihên xewile bêne bikaranînê, çimkî meremê wana hema heleqetîyên nêzîk in. Gelo mesîhî gerekê ji heleqetîyên bedenî paşda bisekinin, heger merivatîyê meremê Xwedê ê derheqa wê yekê da nav hev xistîye? Bêguman na. Wî cûreyî jî em dikarin pêşkêşa zimana hesab hilnedin.

Ez zanim, wekî geleka li Civînê dîtîye, ku çawa cûrên pêşkêşa zimana şaş hatîye xebitandinê. Çawa jî hebe em gerekê ji hînkirina Bedena Mesîh paşda nesekinin, bi wê menîyê, wekî hineka şaş fem kiriye, yan jî şaş dane bikaranînê. Bona vê yekê jî vî serê kitêbê da ez dixwezim binyatê zimanê dinîyaêyî nêzîk lêkolîn bikim û alî we bikim, ku hûn diha baş meremê wî û girîngîya wî ya nava emirê me da baş fem bikin.

Bîra xwe da xweyî kin, wekî Ruhê Pîroz Ruhê Rastîyê ye. Dema ku hûn xwe teslîmî serwaxtîya Gotina Xwedê bikin, Ruhê *temamîya* rastîyê elamî we bike. Hinekî bisekinin û Wî dewat kin, ku Ew tevî we wedê bona hînbûnê derbas bike. Hîvî ji Wî bikin, ku ew ji fikirdarîya we wan fikira dûr bixe, kîjan dijî Gotina Wî ne. Hûnê tu cara nikaribin tijîbûna Xwedê texmîn bikin, heger îzinê bidine fikira xwe, ku ew mezinaya Wî ya bêsînor bide sînorkirinê.

# SEROKÊ WELÊT Û PADIŞA

Çawa welatîyê Wîlaêtên Amêrîkaêye Yekbûyî minê çawa qedirekî mezin hesab bikira, heger min dewatkirina bona nanxwerina tevî serokê welatê me bistenda. Serokê welatê me li temamîya dinîyayê merivekî herî eyan û herî hukumdar e. Bi hesabhildana wan ajansa, kîjan bin bandûra wî da nin, hindik înformasîya hene, wekî ew nikare bistîne. Zanebûnên serokê me ên derheqa karên welêt da ji yên min zêdetir in. Ew fermandarê Sereke ye, lê ez welatîkî sade me, yê ku ne xweyê qulixa nava hukumatê da ne. Bo wê yekê jî wextê guvtugokirina karên welatê me, serokê welêt wê dest pê ke tevî min li ser dereca zanebûnên min xeber bide. Heger ew usa neke, ezê nikaribim tevî wî bikevime nava heleqetîya, çimkî bona heleqetîyên baş em gerekê dora têmayên tomerî xeber bidin.

Hema wî cûreyî jî, bi ketina nava heleqetîyên tevî Padişê erşê ezmîn, ezê tu cara nikaribim tevî Wî li ser dereca Wî bikevime nava heleqetîya. Diqewime serokê Amêrîkayê gelekî derheqa welatê me da ha ji tişta hebe, lê Xwedê hemû tiştî zane û tu tişt ji Wî veşartî nîne. Dereca sînorkirî, ya bona heleqetîyên Wî ên tevî zarokên Xwe têra Xwedê ne dikir. Bo wê yekê jî ewî mecal da me, ku em tevî Wî *li ser dereca* Wî bikevine nava heleqetîya. Ew yek Ewî bi rîya pêşkêşa Ruhê Xwe kir. Xwedê tê bêjî digot: “Ez dixwezim tevî zarokên Xwe li ser dereca usa bim, kîjan ji zanebûn, femdarî û serwaxtîya Min nimiztir e. Ez dixwezim, wekî ew bi cûrê nêzîk tevî Min bikeve nava heleqetîya. Hema bo wê yekê jî Ezê Alîkarê Xwe, Ruhê Xwe bidime zarokên Xwe”. Hazirîya Ruhê Pîroz û tevgirêdana Wî îzinê didine me, ku em Afrandar ra gelekî nêzîk bin.

Qerara Xwedê û rêên Wî ji fikira me ya sînorkirî zêdetir in, lê wextê ku em bi Ruh dua dikin em anegorî fikira xwe dua nakin, lê anegorî qerara Ruhê Wî. We ev yek fem kir? Wextê ku em bi Ruh dua dikin, *em anegorî qirara Xwedê dua dikin.*

# ZIMANÊ ŞÊR

> Çimkî şerê me ne dijî xwîn û goşt e, lê dijî serwêrtî û hukumetîya ye, dijî mîrên vê dinîya tarîye û miqabilî ordîyên ruhanî ye xirab ên li dîyarê ezmana ne.
>
> –Efesî 6:12, ESV

Gelek cara em bi hêsanî bîr dikin, wekî mîrêcin dijî merivatîyê şer elam kirîye, hemû qewata û mecala dide xebatê, kîjan bin hukumên wî da nin. Stratêjîya wî her dem ew bûye, ku me ji Afrandarê me biqetîne, Yê ku kanîya jîyanê ye. Feqet Xwedê fikirên dijmin zane. Bi serwaxtîya Xwe a bêsînor, Ewî stratêjîya hazir kirîye, ku progiramên mîrêcin biteribîne. Pawlos nava A Korintî 2:7–8–da wê stratêjîyê şirove dike: "Lê serda jî em derheqa serwextîya Xwedê a *sure* veşartî da xeber didin, ya ku Xwedê hê berî afirandina dinîyayê, bona rûmeta me qerar kir. Ji serwêrên vê dinîyayê tu kesî ev serwaxtî fem nekir, çimkî heger fem bikirana, wê Xudanê rûmetê xaç nekirana" / NLT/. Pawlos qewata xaç şirove dike, wê *surê*, ya ku "berê veşartî bû", lê piştî mirina Îsa û hilatina Wî eyan bû. Qurbanîya Îsa ya li ser xaç mecal da me, ku em diha ji nêzîk va tevî Xwedê bikevine nava heleqetîya û bi vî cûreyî progiramên dijmin ên berê hazirkirî bidine ter'ibandinê.

Progirama Xwedê ya bona xaç sura tek– t'enê nîbû, ya ku ji serwêrê dinîyayê hatibû veşartinê. Serwaxtîya Xwedê /Qerara Wî/ ji gelek alîya va veşartî ye, ya ku dikare tenê bi Ruhê Wî bê cudakirinê. Em, bawermend, dikarin derheqa wan sura da bizanibin, dema ku em tevî Ruh bikevine nava heleqetîya. Çawa ku min evî serê kitêbê da bîr anî, Xwedê tenê bi "xilazkirina" me têr nebû. Xwedê usa jî tabî *nava Mesîh da* û serwêrî û qewata li ser dijmin da, yê ku êdî wedekî dirêj e, ku me dizêrîne. Niha em peyîhatîyên padişatîya Xwedê û şerkarin. Meremê me ew e, ku em karê Mesîh bela bikin. Bi serwaxtîya Xwe, Xwedê mecalek saz kir, bi kîjanê dikare progirama Xwe ya xewile elamî wan bawermenda bike, kîjan bona meremên Wî şerkarîyê dikin.

Wextê şera leşkera "ziman" hazir dikirin, ku program û

înformasîayên xwe bi cûrê xewile elam bikin. Gelek cara wana sîstêmên signal yên çetin çê dikirin û înformasîayên xwe bi wê rê derbas dikirin. Menî çi bû? Bi saya xewilebûnê, bona emirên wan wê qezîya tune bûya, heger progiramên wan bi cûrên baş ser hev da bihatana. Heger dijmin progiramên wana eşkere bikirana, wî çaxî ewê êrîşa bi înformasîayên berfireh destpê bikira. Em zarokên Xwedê ne û bi rîya Ruh ew înformasîya ezmîn ya xewile dighîje me. Ew îzinê dide me, ku em surên Xwedê yên stratêjî eşkere bikin, bêyî eşkerekirina progiramên Fermandarê me li ber dijmin. Pawlos gotina xwe didomîne:

> Bi hemû dua û reca her gav dua bikin bi Ruhê Pîroz. Ser vê yekê hişyar bimînin û bona temamîya cimeta Xwedê her dem dua bikin.
>
> –Efesî 6:18, NLT

Xwedê gote me, ku em bi menîya mexsûs dua bikin. Li ser dinîyayê em lekerên Wî ne û em gerekê dijî qewata tarîyê şerkarîyê bikin. Sîliheke me ya here qewat duakirina bi Ruh e.Wextê ku bi Ruh em dua dikin, dijmin derheqa stratêjîya Xwedê, program û meremên Wî da ha ji pê tune.

Nava wede da Xwedê wê dilê dayîkekê ra xeber bide, ku ew bona kurê xwe bi sidqê qenc xeber bide. Diqewime ew nizanibe, ku nava emirê kurê wê da çi dibe, lê bi destî Ruh ewê fem bike, wekî gerekê dua bike. Bi duakirina bi sidqê qenc, bi zimanên dinîyayê ewê nava rastîya ruhanî da fermana bide û wê qerara Xwedê nava emirê kurê xwe da elam bike. Bo wê yekê jî nivîsar e: “Şêr bi şêwira serwaxt derbazke” /Gotinên Silêman 2O:18, NKJV/.

Zimanê meyî Ezmana ji fikira me derbaztir dibe û nava wede, yan jî cih da sînorkirî nîne. Wextê ku em bi ruh dua dikin, em li ser fikira xwe nasekinin û dewsa wê yekê xwe dispêrine mezinaya serwaxtîya Wî ya bê sînor. Ev yek ji wan menîya ye, ku bo çi Pawlos got: “Ez dixwezim ku hûn bi zimana xeber bidin”. Dijmin nikare zimanê me ê ezmana eşkere bike, çimkî ew yek pevguhartina heleqetîya ye di navbera Xwedê û zarokên Wî da ne. Bo wê yekê jî ew yek

mecaleke kardar e, ku progiramên dijmin ên xirab nava emirên me û bawermendên me da bêne teribandinê.

> Awa Min hukum daye we… li ser temamîya qewata dijmin.
>
> –Lûqa 1O:19, ESV

Em– bawermend, sîlihkirî ne, ku bi qewatê padişatîya Xwedê belakin /bixwînin Metta 11:12/.

Civîn, li ser vê dinîyayê Bedena Mesîh e. Çawa ku me dît, Îsa êdî li ser dinîyayê nîne. Em bayloz /sefîr/ û şerkarên padişatîya Xwedê ne. Li ser me qewata Wî ya werguhastina heye û em wan meriva razî dikin, yên ku hewcê dasekinandin, azayî û xilazbûnê ne. Feqet emê tu cara nikaribin bêyî qewatbûna Ruhê Wî bibine Bedena Mesîh li vê dinîya undabûyî û ya ku dimire. Mîrêcin û eskerên wî ji we natirsin. Ew ji *heyîna we ya nava Mesîh da û ji wê qewatê* ditirsin, *kîjan* ya we ye çawa kur yan keça Wî.

### Roja 2–emîn

## ZIMANÊ NÊZÎKAYÊ

Min tevî jina xwe, jîyaneke dirêj derbas kirîye û me zimanê xweyî biçûk pêş xistîye. Ez dikarim bêjim, “SMA” û jina minê fem bike, ku ez çi dixwezim bêjim. Gilî derheqa wê yekê da ne, wekî wextê ku em teze zewicî bûn, me texmîn dikir , wekî hemû navên qulixdarîyên mesîhîtîyê yên tezesazbûyî diketine nava gotina “Încîla Navnetewî”. Min û Lîzayê qerar kir, ku em qulixdarîya “Încîla Navnetewî ya Bedew” /ÎNB/ dest pê bikin. Me dikaribû li hev binihêrîya û bigota: “ÎNB”, û me zanibû, wekî em gerekê hev hembêz bikin û herine rûyê hev. Heger yekî me guhdar bikira, diqewime, bifikirîya: *“evana çi xeber didin?”*. Ew ziman hinekî tê bêjî yê pêkenînê bû, lê ew zimanê me yê bona nêzîkayê bû, kîjan ez û Lîza tenê zanin. Eva tenê meseleke ji mecalên tevgirêdanên nêzîk e.

Hema bi wî cûreyî em dikarin bi nêzîkayî Xwedê ra bikevine

nava heleqetîya, wextê ku em bi zimanê ezmana dua dikin. Merivek dikare bêje: "Con, lê ez wê yekê fem nakim, çi ku ez dua dikim. Încîlê da nenivîsar e: "…çimkî gava ez bi zimanên xerîb dua dikim, ew ruhê min dua dike, lê hişê min da tişt rûnanî" /A Korintî 14:14/. Belê, rast e, lê gotina pêşîyê da nivîsar e: "…ewê ku bi zimanên xerîb xeber dide, bira du bike, ku şirove ke jî" /gotina 13–a/. Wextê ku ez duayî Xwedê dikim, yan jî bi zimana tevî Wî dikevime nava heleqetîya, ez hîvî ji Wî dikim, ku şirovekirina dua bide min. Hûn zanin, ku wî çaxî çi diqewime? Fikir, serwaxtî û eyantî dest pê dikin ji ruhê min bilind bin. Cûrê herî baş, bi kîjanî ez dikarim vê yekê şirove bikim, ev e: ev fikir mînanî hulm–gulma hewê ne, kîjan ji kûraya berhê bilind dibin. Ew ji kûraya merivê hundurê min da derdikevin û dighîjine fikira min.

Îzinê bidin, ku ez meselekê bînim. Wextê ku ez gotineke Încîlê dixwînim û fem nakim, ez dibêjim: "Ruhê Pîroz, min hîn ke", û ez duakirina bi zimana dest pê dikim. Diqewime eyantî carekê ra neyê, çimkî ew gelek cara dereng tê, wextê mesele ez avtomaşînê diajom, avê li xwe dikim, yan jî hêsa dibim. Wî çaxî di hundurê min da nişkêva birq vedide. Ev eyantî feydayên nêzîkaya tevî Ruhê Pîroz e. Ez hîvî dikim, wekî Ew serwaxtîya Xwe elamî min bike. Xwedê surên Xwe elamî şikestîya dike. Wextê ku em xwe teslîm bikin /bi hîvîkirina rêberîya Ruh/, emê ji diha ji nêzîk va tevî Wî bikevine nava heleqetîya û emê eyantîya ruhanî ya diha mezin bistînin.

Hema ew jî bona qewata ruhanî rastî ye. Pawlos ev gotin nivîsîn, kîjan ewî ji Ruhê Xwedê stendibûn.

> "Kerema min besî te ye, çimkî qewata min nava sistaya da mîaser dibe". Awa ezê bi dilekî şa halê sistîyên xwe da bifirim, wekî qewata Mesîh min da be /B Korintî 12:9, ESV/.

K'erema Xwedê, kîjan qewata Wî ye bona şikestîya tê dayînê /Pawlos dide kivşê, wekî ew gura Xwedê da ye û derheqa "sistîya" xweda xwe mikur tê/. Qewata Xwedê wê gelek li ser we be, wextê ku hûn xwe teslîmî serwaxtîya Ruhê Wî yê bêsînor bikin. Ev jî feydayekî nêzîkaya tevî Ruh e.

Civaka Rojavayê li ser feyda hatîye merkezkirinê. Gelek cara, wextê ku em feydayên cedandin û învêstîsîyaên lez navînin, em qewînbûna qerara xwe unda dikin. Em gerekê fem bikin, wekî wextê ku em bi Ruh dua dikin, em învêstîsîayê, emek dikine nava pêşeroja xwe. Gelek cara wede lazime, hetanî ku eyantî bilind be, bighîje fikira me. Bona duakirina bi Ru dewa bawerîyê tê kirinê, çimkî ew li wir dest pê dibe, li kîderê fikira mey ya sade ser hev da tê. Duakirina bi Ruh bawerî û karebûna me bona femkirina serwaxtîya Xwedê zêde dike.

## DUAKIRINA BI FIKIRÊ

Ev serê kitêbê derheqa duakirina bi Ruh da ne, feqet duakirina bi fikirê jî gelekî kardar e. Pawlos zelal got, wekî em gerekê him bi fikirê û him jî bi Ruh dua bikin.

> Ez çi bikim? Ezê him bi ruhê xwe dua bikim, him jî bi hişê xwe, him bi ruhê xwe bistirêm, him jî bi hişê xwe /A Korintî 14:15/.

Wextê ku ez bi fikira xwe dua dikim, fikira min çêbûnê distîne. Ev duakirin nava min da şabûnê û aktîvbûnê pêşda tîne. Duakirina bi fikirê min wî merivî ra dide girêdanê, bona kîjanî ez dua dikim– Lîzayê, zarokên min, hevalên min û yên mayîn. Hema bi wî cûreyî jî, wextê ku ez ji hişê xwe xeber didim, bi elamkirina mezinaya Bavê xwe, ez razîbûnê texmîn dikim.

Xêncî wê yekê, carna ez anegorî rêberîya Ruh bi fikirê dua dikim. Bi rastî eva duakirina bi Ruhe başqe ye. Feqet ez diha gelekî pêşda bi Ruh dua dikim, lê paşê Xwedê zanebûnê derheqa wê yekê da dide min, ku min çi dua kirîye û ew gotin mînanî çêm fikira min gur dikin.

Bi nivîsara derheqa girîngîya duakirina bi Ruh, ez tu cara pêwîstîya duakirina bi fikirê kêm nakim. Ez dixwezim bidime kivşê, wekî duakirina saxlem, ya bi Ruh û bi fikirê dike nava xwe. Her du jî bona me nava Xwedê da girîng in.

# KANÎYA EMIRÊ ME

Nava Gotinên Silêman 2O:27a da nivîsar e: “Ruhê mêriv bo çi Xudan e. Ew di hundurê dil da hemû tiştî guvtugo dike”. Cudatîyên Ruhê Xwedê ronahiyê didin û ew dikevine nava Ruhê me, lê ne ku nava fikira me. Eve menî, wekî wextê em bi Ruh dua dikin, em gerekê bawerîya xwe li şirovekirinê bînin û bo wê yekê hîvî bikin. Eyantî, kîjanê Ruhê Pîroz dide ruhê me, wê bighîje fikira me.

Nava Gotinên Silêman 2O:5a da nivîsar e: “Sura dilê mêriv ava kûr e /serwaxtî, rêberî, merem/, lê merivê aqil wê wê derxe”. Bi qewata xaç Xwedê dilê nû daye me /bixwînin Yêzêkîêl 36:26/. Niha em dikarin sura Xwedê ji kûraya dilê çêkirî der bînin /navekî Ruhê Pîroz Şêwirdar e/. Gotinên Îsa nava Yûhenna 7:38–39a da vê yekê îzbat dikin:

Her yek, yê ku bawerîya xwe Min tîne, dikare bê û vexwe.Çimkî Kitêba Pîroz elam dike: “Çemên ava sax wê ji *dilê wî* bikişin” /Bi gotina “ava sax”, Ewî derheqa Ruh da xeber dida, Yê ku wê xwe bida her yekî, heger bawerîya xwe Wî bianîya. Feqet Ruh hela hê nehatibû dayînê, çimkî Îsa hela hê neketibû nava rûmeta Xwe/. /NLT/

Ev gotina dîsa Îşaya 12:3 bîr tîne:

Hûnê bi şabûn ji kanîya xilazbûnê /ji ava sax/ vexun, hetanî ku têr bin. /NLT/

Yûhenna zelal “ava sax” da dîyarkirinê, ya ku, çawa Îsa got, wê ji dilên me bikişe û ew jî “Ruh e”. Bona çi Îsa Ruh himberî avê kir? Av emir e û qewatên lazim nava wê da hene. Bêyî avê emirê li ser vê dinîyayê bisekinîya. Bi navkirina Ruh çawa “ava sax”, Îsa dixwest bigota, wekî Ew hema heyîna emir e.

Xwedê dibêje: “Cimeta min rûyê tunebûna zanebûnê da qir bû” /Vovsê 4:6/. Xwedê derheqa zanebûna çawa da xeber dide? Ew hîmlî derheqa rêyên Xwe û meremên xwe da xeber dide. Çiqwes tiştekî baş e, wekî Xwedê Ruhê Xwe şandîye, ku em bikaribin bi emirê tijî bijîn û dilê Wî nas bikin.

Ew yek tiştê bûyînê nîne, wekî bêyî femkirina, ku Xwedê kî ye,

qulixî wî bikin, çawa ku endamên koma min nikarin rast qulixî min bikin, bêyî pêşda naskirina dilê min. Wextê ku em gotina Xwedê dixwînin û wede nava duakirinê da derbaz dikin, Ruh dilê Xwedê elamî me dike. Eva ew qewat e, yê ku bona emirê bi şabûnê va tijî lazim e. Nêmîya 8:1O da nivîsar e: “Şabûna Xudan qewata we ye”. Bi gotinên mayîn, wextê ku em nava Wî da bi şabûn dijîn, em bona wî hemû tiştî qewatê distînin, çi ku pêşerojê da hîvîya me ye. Ez nizanim hûn çawa, lê ezê qet rojekê jî nexwezim bêyî şabûna Wî bijîm.

## SURÊN XWEDÊ

Nava xeberên jorgotî da em dikarin bivînin, wekî surên Xwedê, yan jî serwaxtîya veşartî dikevine nava ava sax ya ku ji dilê me tê. Em jî zanin, wekî Xwedê bi Ruhê xwe serwaxtî û surên Xwe eyan dike. Heger usa ye, werin em carekê jî gotinên Pawlos nava A Korintî 2:7 da bixwînin: “Lê ser da jî em derheqa serwaxtîya Xwedê ya sur a veşartî da xeber didin”.

Ew xebera yûnanî, kîjan çawa “şêwir” hatîye tercimekirinê, nade kivşê, wekî ew yek eyan nîne, lê dide kivşê– “veşartî, yan jî bi temamî eşkerenekirî”.

Bînin ber çuvê xwe, wekî hûn li rêstroneke gelekî giranbiha ne. Merivê ku xwerinê çê dike, nêzîkî we dibe, ku bizanibe hûn çi dixwezin bixun. Piştî wê yekê, ew xwerina xwe ya sereke çê dike, anegorî xwestina we. Wextê ku xwerin hazir e, ofîsîant nêzîkî we dibe û wê xwerinê diatîne ber we. Xwerin bin qalpax da ye, çimkî wê rêstoranê xwerinê pêşîyê vedişêrin, hetanî ku wedê bilindkirina qalpax bê. Hûn zanin, wekî li ber we xwerina we ya sereke danîye, lê çi nav da ne, bona we veşartî ye.

Wextê ku wedê rast tê, ofîsîant nêzîk dibe û qalpuax bilind dike. Niha hûn wê xwerinê divînin, kîjan bo we çê kirine. Hetanî bilindkirina qalpax ew xwerin hebû, li wir bû. Ofîsîant *sura* şîva we da eşkerekirinê. Yê ku xwerin çê kiribû, bona wî eyan bû, lê ji we ew xwerin veşartî bû, hetanî bilindkirina qalpax.

Xwedê bi Ruhê Xwe wê perdê ji ser progirama Xwe ya veşartî– ji ser *sura* Xwe dûr dixe. Niha em tevî Ruh hevkarîyê dikin, û…

> …lê serda jî em derheqa serwaxtîya Xwedê ya *sur a* veşartî da xeber didin. …wekî em wan tiştên ji Xwedê da me ra dayî fem bikin. Em bona wan tişta bi gotinên ji serwaxtîya merivayê hînbûyî xeber nadin, lê bi gotinên hînkirina ji Ruhê Xwedê xeber didin, tiştên Ruhanî wan ra şirove dikin, yên ku xweyî Ruhê Xwedê ne /A Korintî 2:7,12–13/.

Diha dereng hema vê name da Pawlos nivîsî: "Ewê ku bi zimanê xerîb xeber dide, ew ne ku mêriv ra xeber dide, lê Xwedê ra, çimkî kesek wî fem nake. Ew bi qewata Ruh sura dibêje" /A Korintî 14:2/. Hûn wê tevgirêdanê, ku li vir heye, divînin? Wextê ku em bi zimana xeber didin, em surên Xwedê dibêjin. Em êdî zanin, wekî ev sur kûraya dilê me da veşartîne /bixwînin Gotinên Silêman 2O:5/, û ew derdikevin, wextê ku ava serwextîya Ruh ya sax ji me dikişe /bixwînin Yûhenna 7:38–39/. A ev e menî, wekî bona çi duakirina bi zimana şênbûnê dide me. Ew "ava sax" tîne der, ku em bikaribin surên Ruh yên here veşartî fem bikin.

Çawa ku min êdî da kivşê, gelek cara ez nava Încîlê da rastî gotineke usa hatime, kîjan min fem nekirîye. Wextê ku usa dibe, ez bi Ruh dua dikim û paşê femdarîya derheqa wê yekê da distînim. Gelek cara, wextê ku min kitêbek dinivîsî, ez nişkê va li ber hesarê disekinîm. Wî çaxî min texmîn dikir, ku îdî gotinên min tune ne. Tiştên tek– tenê, wekî ez dikarim nava halê wî cûreyî da bikim ew e ku ez ji kompyûtêrê dûrkevim û dest pê bikim bi zimana dua bikim. Bi kirina vê yekê, ez gelek cara eyantîya nû distînim. Gelo wî çaxî çi diqewime? Ji dilê min ava sax, ya Ruhê Xwedê dikişe.

Heger tevgirêdana we ya tevî Xwedê tune, hinek sur wê ji fikira we ya sade veşartî bimînin. Niha çend meselên wan sura: Hûnê herine kîjan civînê? Hûnê kê bistînin? Hûnê xebata çawa bibijêrin? Kîjan malê hûnê bikirin? Hûnê bona rêberên xwe çi dua bikin? Çawa wan dijwariya altkin, kîjan li cem zarokeke we hene?... Gelo hûn şa nînin, wekî Xwedê nehiştiye ku bi femdarîya xwe em pirsên xwe bidine

helkirinê? Bi Ruhê Wî em dikarin programên Wî eşekre bikin /kîjan yên here baş in/ bona emirê me û nava aşîtîya Wî ya sozdayî da bijîn.

## Roja 3–emîn

# AŞÎTÎ: PÊŞKÊŞA NÊZÎKAYÊ

Nava serê kitêba Galattî 5 da nivîsar e, wekî aşîtî nîşana hazirî û qayîlîya Ruh e. Ew duakirina ecêb e, kîjan nava emirê îroyîn da gelekî praktîk e.

Wextê ku ez hela hê nezewicî bûm, min pirs dida xwe, ku jina min wê kê be. Wî çaxî ez rastî keçikeke bi navê Lîza Toskano dihatim. Min ew çawa şexs begem dikir, lê xêncî wê yekê ew gelekî berbiçav bû. Feqet min dixwest ew keç bistenda, kîjan Xwedê bona min bijartibû. Lîza li Arîzonayê dima, lê ez li Têxasê. Me her dua jî dixwest rêberîya Xwedê bistenda, bona heleqetîyên me yên pêşerojê. Usa bû, ku min pêşnîyarî Lîzayê kir:

–Were em nava 3O roja da , rojê 3O deqeyî bi Ruh dua bikin. Dilê xwe guhdar bike. Heger tu tiştekî nerihet t’exmîn bikî, wî çaxî wê usa be, wekî Xwedê dibêje me, ku em heleqetîyên xwe berdewam nekin. Heger em aşîtîyê texmîn bikin, dêmek Ruhê Pîroz piştgirîya me dike, wekî em gava bi sirê nava heleqetîyên xwe da biavêjin.

Wextê ku me dua dikir, em bi aşîtî û edilayê va tijî dibûn. Wextê ku 3O roj derbaz bûn, me bi hev ra got, ku wextê duakirinê me çi texmîn dikir û me zelal kir, wekî me her dua jî hema ew yek texmîn dikir. Me heleqetîyên xwe berdewam kirin û bi kutasî em zewicîn. Eva êdî ji 3O salî zêdetir e ku derbas bûye û ez bo texmînkirina wê edilayê gelekî razî me.

Nava Romayî 8:14 da nivîsar e: “Ewên ku bi Ruhê Xwedê tên rêberîkirinê, ew in lawên Xwedê”. Berdewama vê beşê şirove dike, ku Ruh çawa rêberîyê lawên Xwedê dike: “Hema ew Ruh bi xwe tevî ruhê me *şedetîyê dide*, ku em zarên Xwedê ne” /8:16/. Eva ew mecala sereke ye, bi kîjanê Ruh rêberîyê li me dike: bi edilayî, yan

jî *şedetîya* Xwe.

Gelo li cem we tiştekî usa bûye, wextê ku we xwestîye gavekê biavêjin, kîjan we çawa ya rast texmîn kirîye, lê her car, wextê ku hûn derheqa wê yekê da fikirîne, we nerihetî texmîn kirîye? Diqewime we ji xwe pirsî ye: "*Menî kîjan e? Bona çi ez tiştên vî cûreyî texmîn dikim? Ev qerar tê bêjî bona min gelekî rast e"*.

Heger wî çaxî hûn tevî Ruhê Pîroz ketine nava tevgirêdanê, Ewî bi wê nerehetîyê êdî gotîye we: "Usa neke". Min gelek cara ew yek dîtîye. Carna rêberîya rast tê bêjî bêfikir dihate texmînkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî peyî sala ra hemû tişt zelal dibû. Ez hîn bûm li ser Wî guman bim. Bîr bînin, wekî serwaxtîya Wî bi wede û cih va nayê sînorkirinê. Ew yek dide kivşê, wekî Ew her roj rêberîyê li we dike û her dem derheqa pêşeroja we da difikire.

Carên mayîn, min edilayîke mezin texmîn kirîye, wextê ku qerara min çawa rîskeke mezin dihate texmînkirinê.Wî çaxî dilê min da edilaya Mesîh serwêrî dikir. Van gotinên Pawlosê Şandî bixwînin:

> Û îzinê bidin ku edilaya ji Mesîh serwêrtîyê nêt– fikirên we bike /mînanî hakimê sportê/. Bona wê edilayê hûn hatine gazîkirinê, ku bibine mîna bedenekê /endamên bedena Mesîh/ /Kolosî 3:15, AMP/.

Li min gelekî xweş tê, ku çawa tercima berfireh /AMP/ Ruhê Pîroz himberî hakimê sportê dike. Hakimê sportêyî baş teslîmkirina dide. Hema bi wî cûreyî jî Ruhê Pîroz wê hemû pirsa /qerara, xemgînîya û tiştên mayîn/ bide zelalkirinê, kîjan fikira we da bilind dibin. Ewê bi serwaxtîya xwe va we ra nîvî be, heger hûn îzinê bidin, ku Ew teslîmkirina bide we. Gelek cara teslîmkirina Wî bi edilayîke usa tê elamkirinê, kîjan ji fikira merivatîyê bilindtir e, Eva şedetîya Ruh e. Kitêba Pîroz dibêje:

> Û edilaya Xwedê, ku ji her hiş–aqilî derbaztir e, wê dil û fikirên we yekîtîya Mesîh da xweyî bike.
>
> –Fîlîpî 4:7

Em nava *Îsa Mesîh* da nin. Usa ye em dikarin bibine xweyê wê edilayê, kîjan rojên me da kêm dibe. Îsa Serwêrê Edilayê, Aşîtîyê ye û bo wan meriva edilayî soz daye, yên ku nava Wî da nin. Heger em Ruhê Pîroz dewat kin, ku tevî me qerara qebûl bike, Ewê her dem bi rîya edilayê şedetîya Îsa Mesîh bide.

## EDILAYÎ Û QEBÛLKIRINA QIRARA /BIRÎYARA/

Çawa serkarê qulixdarîya "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–ê, ez gelek qerara qebûl dikim, kîjan tenê bi edilaya Wî hatine îzbatkirinê. Diqewime pirsa pêşîya me çawa ya gelekî çetin hatîye texmînkirinê, lê edilaya Xwedê îzin ne daye, ku ez bi fikira xwe mecalên "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–ê bidime sînorkirinê.

Gelek cara min zelal bihîstîye, ku çawa R'öh' min ra xeber daye. Mesele, wextê ku ez hazir dibûm vê kitêbê binivîsim, bi rastî min program dikir, ku kitêbeke bi têmake başqe binivîsim. Wextê duakirinê û rojîya, Ruhê Pîroz gote min, wekî dewsa têma qerarkirî ez derheqa Şexsê Wî da binivîsim.

Piranîya qerarên min bi edilaya Xwedê tên rêberkirinê /kîjan her dem Gotina Wî ra hatine qayîlkirinê/, lê ne ku bi emirkirinekê. Çawa jî hebe, wedê usa hebûne, wextê ku Ruhê Xwedê min ra xeber daye. Min daye zelalkirinê, wekî ew yek wî çaxî diqewime, wextê ku Xwedê bi alîkî nûva rêberîyê li min dike. Îzinê bidin ez meselekê bînim.

Meremê qulixdarîya "Mêsîncêr Întêrnêyşinil"–ê dayîna şênbûnê, ya bona civînên cî. Em bawer in, wekî civîna cî mecala stratêjîya Xwedê ya mezin e, ku alî undabûya bikin, gumanê bidine feqîra û mileta hîn bikin. Li Amêrîka Bakûr ji 2O hezarî zêdetir civîn dersên me dane xebatê. Bi sala ser hev meremê meyî hîmlî ew bûye, ku alî civînên li Ştatên Amêrîkaê yên Yekbûyî, Kanadayê, Avstralîayê û Padişatîya Yekbûyî bikin.

Feqet 31–ê gulana sala 2O1O–a Xwedê min ra xeber da, wextê ku min kitêba Danîêl dixwend:

–Nava karê alîkirina civînên dinîya ku bi zimanê înglîzî xeber

dide, tu rast bûyî. Niha ez te dişînim, ku li temamîya dinîayê berbi hemû mileta herî.

Ew wedekî gelekî baş bû, lê min nizanibû, ku ew yek wê çawa bibûya. Min serwêrên qulixdarîya me teglîfî rasthatinê kirin û min derheqa wê yekê da gilî kir, wekî Xwedê çi kirîye dilê min û min gote wana, wekî nava sala 2O11a da ez dixwezim 25O OOO kitêba nava rêberên mesîhî yên welatên ku pêşda diçin, bela bikim.Serwêrekî qulixdarîya min û çend merivên başqe dest pê kirin pirsa bidin. Bi kutasî ewî serwêrî hîvî kir, ku bi duakirinê wî meremî bînine ber Xwedê.

Min ji Xwedê zelal bihîstibû, wekî em gerekê alî serwêrên temamîya dinîayê bikin, lê Xwedê ne gotibû min, wekî çawa gava ewlin gerekê 25O OOO kitêb bêne belakirinê. Bo wê yekê jî min bi duakirinê ew merem anî pêşîya Wî. Min edilayî texmîn kir. Ruhê Pîroz hewce nîbû, ku tevî min bi dengê guhdarkirinê xeber bide, çimkî min zanibû, ev merem anegorî teslîmkirina Wî ya pêşîyê ye. Min nava wê pirsê da *şedetîya* Wî texmîn kir. Wextê ku min derheqa wê yekê da koma xwe ra gilî kir, wana carekê ra piştgirî da min. Bêyî şik, Xwedê bi cûrê baş kar kir û ewê salê me karibû ji 27O OOO kitêba zêdetir belayî li ser serwêrên civînêd 47 welata bikin.

Sala 2O11–a ez li Bêyrûtê rastî serwêrekî îraqî hatim /ez li Rohilata Navîn bûm û min bona 25OO serwêra qulix dikir/. Civîna wî li bajêr ya here mezin bû. Ew cahil bû– 36–salî bû. Ewî min ra got:

–Birêz Bîvêr, hûn tê bêjî bavê min bin. Min hemû kitêbên we xwendine, kîjan min karibûye dest bînim. Min karta xweye bankê jî daye xebatê, ku ji sayta we ya întêrnêtê matêrîyala derxim.

Wextê ku ewî ew yek min ra got, min dixwest ez erdê da biçûma. Ev meriv li welatekî usa dima, yê ku nava şêr da bûye û niha jî mecalên wan ên fînansîyê kêm in. Feqet ewî hemû tişt dikir, ku matêrîyalên “Mêsîncêr Întêrnêyşinil”–ê dest bîne. Vê yekê careke mayîn ez mecbûr kirim, ku ez carekê jî gazî Xwedê bikim. Min serwaxtî ji Xwedê hîvî kir, ku ez bikaribim alî wan civîna bikim, qewatê bidime rêberên wana. Wextê dukirina bi ruh min ew fikir

stend, wekî em dikarin ne tenê kitêba, lê usa jî programên dersa yên tomerî bidine serwêrên welatên, ku pêşda diçin. Sala mayîn me 1,3 mîlîon matêrîyal pareveyî li ser serwêrên wan civîna kirin. Ji wî çaxî da reqemên wan matêrîyala zêde dibin.

Ev beş vî şikilî ya girîng min wextê duakirina bi Ruh stend, ew sayta CloudLibrary.org bû, kîjan îzinê dide serwêrên civînên cih, usa jî endamênn olên civîna, ku ew belaş matêrîyalên bi zimanê wan ê dayîkê dest bînin. Sala 2OO1–ê me ji 27O OOO–î zêdetir matêrîyal bela kirin, lê niha ew matêrîyal her meh çend cara zêde dibin. Bi vî cûreyî Xwedê dikare nava me da û bi destî me xebateke mezin bike, wextê ku em peyî *şedetîya* Ruhê Pîroz yê edilayê diçin.

## Roja 4–emîn

# STENDINA RÊBERÎYÊ

Govekek heye, kîjan piranîya bawermenda xemgîn dike. Gilî derheqa stendina rêberîya Xwedê da ne. Meriv gelek cara dibêjine min: “Ez nizanim, ku Xwedê ji min çi dixweze”. Aqûb dibêje, wekî em gerekê çawa bikin, heger dixwezin rêberîyê bistînin: “...heger yek kêmasîya serwaxtîyê ji we dibîne, bira hîvî ji Xwedê bike” /1:5/. Xebera “serwaxtî” zimanê yûnanî da xebera “sofîya”–ye, kîjan çawa “karebûna karkirina bi serwaxtîyê, femkirinê û çawa feydayê wê yekê” şirove dike. Ev yek dide kivşê, wekî bi serwextîya Xwedê em dikarin pêşda fem bikin, lê *paşê* kar bikin.

Kî femkirina serwaxtîyê û karebûna xebitandina wê yekê dide me? Ruhê Pîroz. Ez ketime nava halên usa, nava kîjana da ez hewcê rêberîyê bûme. Wextê ku min destpê kirîye bi zimana dua bikim, serwaxtîya Xwedê û rêberîya Wî ji ruhê min berbi fikira min bilind bûne. Duakirina bi zimana me ronahî dike, rêberîya Xwedê bona me dide eyankirinê.

Werin em carekê jî Gotinên Silêman 2O:5 A bixwînin: “Sura dilê mêriv ava kûr e, lê merivê aqil wê ewê derxe”. Nava hinek tercimên

înglîzî da dewsa xebera “sur” xebera “merem” tê xebitandinê. Nava Mesîh da we xebat, yan jî meremek stendîye, kîjan tenê ya we ye. Ev merem wê qerar bike, ku hûnê çi bikin û ew yek kûraya dilê we da veşartîye. Wextê ku hûn bi Ruh dua bikin û sura Xwedê eşkere bikin, Ewê meremê emirê we eyan bike. Eva nava rojekê da nabe. Wextê ku hûn wede nava Qerara Xwedê û duakirinê da derbas bikin, Ewê meremê emirê we eyan bike. Kurekî min wa dibêje: Încîl xerîta me ye, lê Ruh jî Rêberê gera me ye.

Pêşkêşa Rêberîya Xwedê bona her govekeke emirê we ye. Heger zarokek ji bin kontrolê derdikeve, gura we nake, bisekinin û wede bona duakirina bi Ruh başqe bikin. Ewê nîşanî we bide, ku hûn çi bikin. Heger hûn karmend in /bîznêsmên in/ û nizanin çi bikin, derê ofîsa xwe bigrin û ji Wî serwaxtîyê hîvî bikin, Yê ku hemû tiştî zane. Ew îdî nava we da dijî. Niha hemû tiştî derxin, çi ku hela hê bona we nehatîye eyankirinê. Ew dixweze rêberîyê li we bike. Nava Îşaya 48:17 da nivîsar e: “Ez im Xwedê ê te, wekî tiştên kardar te hîn dikim, wekî li ser rêya te rêberîyê li te dikim”. Xwedê dixweze, ku meremê xwe hûn bona padişatîya Wî bidine mîaserkirinê û hela serbara serda jî Ew dixweze gav bi gav nava wê yekê da rêberîyê li we bike.

Carna meriv dibêjine min: “Con, ew yek ji çapê zêdetir “ruhanî ye” û hinekî tê bêjî ne usa ye. Em nikarin tiştên wî cûreyî ji Xwedê hîvî bikin”. Berê ewlin, nava Xwedê da tu tiştekî usa tune û heger Ew tevî hemû govekên emirê me be, nava wê yekê da şikberî tune. Em gerekê sozê Xwedê her dem hesab hildin, çimkî gelek meriva ew yek teribandine.

Ya duda, Xwedê dibêje me: “Bêyî sekinandin dua bikin” /A Têsalonîkî 5:17/. Gelek mesîhî hemtêksta vê gotinê lêkolîn nekirine, ku fem bikin fikira wê çiî ye. Eyan e, wekî Pawlos naxweze bêje: “Bira lêvên we bi duakirinê temamîya rojê, her deqe bilivin”. Bi kutasî, Încîl dibêje me, ku em meriva ra derheqa Kitêba Pîroz da gilî bikin û ber dilê hev da bên. Em nikarin ne wê, ne jî wê bikin. Heger her deqe em lêvên xwe bi duakirina Xwedê bilivînin.

Bi rastî Pawlos derheqa *heleqetîya hertimî ya tevî Ruhê Xwedê*

dide kivşê. Pawlos caba wê yekê dide, gotina xwe didomîne: "Ruh netemirînin" /gotin 19/. Duakirina her dem dide kivşê, wekî hazirîya Ruhê Pîroz netemirînin. Ev yek dide dîyarkirinê, wekî hûn derheqa hazirîya Wî da zanin û dengê wî nas dikin. Bi gilîkî mayîn tevbûna Wî ya nava emirê we da înkar nekin. Ruh dixweze tevî her govekeke emirê we bibe. Ew dixweze rêberîyê li we bike, bi saya çi nava emirê we da wê edilayî, qewat û rêberîya Wî hebin.

Ez bona karmendîyê /bîznêsmênîyê/ ne hatime gazîkirinê, lê heger bihatama gazîkirinê, wî çaxî minê bona karê xwe bi Ruh dua bikira. Peyî wê yekê ra minê qerar bikira, ku ez dilê xwe da peyî edilayê herim. Tu cara stendina karebûna we ya ji Afrandar nekine bin şikberîyê, wekî hûn nava "qulixa her wedekî da nin". Ew rêberîyê usa li rîya we dike, çawa ya min.

## WEDÊ DUAKIRINA ŞEXSÎ

Min zelal kirîye, wekî wedê duakirina min diha gelekî kardar e, wextê ku ez Încîlê dixwînim. Gotina Xwedê fikira min zelal dike. Tê bêjî ji ruhê min rê berbi fikira min vedibe. Peyî xwendinê ra, ez diha gelekî Ruhê Pîroz va têm girêdanê û wedê duakirina min bi hazirîya Wî va tijîbûyî ye.

Min ew yek jî zelal kir, wekî Xwedê lez Xwe dide eyankirinê, wextê ku şikirîyê didime hazirîya Wî ya nava emirê min da. Wextê ku ez dora mezinayî û rehmbûna Wî da difikirim, Ruhê Pîroz nişkêva Xwe eyan dike.Bo ç? Zebûr caba vê pirsê dide: "Hemû kes gerekê bi xof nêzîkî Xwedê bin, yên ku dora Wî ne" /Zebûr 89:7, NKJV/. Heger hûn dixwezin nava hazirîya Xwedê da bijîn, hûn gerekê bi xof nêzîkî Wî bin. Wextê ku hûn usa bikin, Ruhê Pîroz wê hazirîya Xwe eyan bike, çimkî Ew zane, wekî em bi xof nêzîkî Wî dibin. Hazirîya Wî wê aqilmendîyê, serwaxtîyê, zanebûnê û qewatê bide me. Ew bi rastî kanîya emirê me ye. Bona çi em gerekê bixwezin ji Wî biqetin?

# PITGIRÎYA BI RUH

Wextekê min gelek cara tevî serwêrekî dua dikir, yê ku hevalê min bû. Wextê duakirinê me gelek cara bi zimana piştgirî dida. Carekê wextê dukirinê, me zanibû, wekî li Rohilata Navîn derheqa rêgîonekê da behs tên. Rojtira mayîn em pê hesîyan, wekî li Tirkîyayê erdhejeke mezin qewimîye. Min tevî hevalên xwe dua dikir, piştgirî dida cimeta li wir. Tevgirêdana me ya tevî wana bi Ruh hebû, çimkî Ruh nava hemû bawermenda da dijî. Xwedê xwestina Xwe bi destî me bona cimeta li Tirkîyayê e'lam dikir.

Ev piştgirîya ruhanî bona belakirina padişatîya Xwedê gelekî girînge. Dijmin wê yekê hiz nake, wekî em dikarin xwestina Xwedê nava emirên xwîşk û birayên me da elam bikin, yên ku ji me gelekî dûr in. Meremê wî ew e, Civînê bidine pearçekirinê û ew dixweze, ku piştgirîya me bi zanebûnên me va bê sînorkirinê.

Diqewime we tu cara fem nekirîye, ku hûn bi bawermendên li temamîya dinîyayê va girêdayî ne. Diqewime hûn bêyî şaşî piştgirîyê bidine bawermendên li welatên mayîn, bêyî zanebûna derheqa wana da.

Carekê, wextê ku ez li Kênîyayê bûm, ez rastî merivekî ji eşîra Masa hatim. Paşê ew li Amêrîkayê qesidî û li Pênsîlvanîayê, li mala hevalê min bi mêvandarî hate qebûlkirinê. Ew meriv nêzîkî mehekê tevî hevalên min ma. Ewî çend cara derheqa endamên malbata xwe da wana ra gilî kir, yên ku li Afrîkayê diman. Paşê kevanîya malê pirsî:

–Hûn ji kîderê zanin, ku malbata we çawa ye? Qet têlefona wan jî tune.

Ewî bersiv da:

–Pawlos zanibû, ku li civînên Kolosîyê û Korintîyê çi diqewimî, wextê ku ew ji wana dûr bû. Wextê ku ez bi Ruh dua dikim, Xudan nîşanî min dide, ku endamên malbata min çawa nin û li wir çi diqewime.

Ewî dixwest ev gotinên Încîlê çawa mesele bianîya: Kolosî 2:5:

“Rast e, ez bedena xwe da ji we dûr im, lê Ruhê Xweda tevî we me û ez şa me, ku pergalîya we ya tifaq û ew bawerîya ser Mesîh şidîyayî dimînin”, û A Korintî 5:3: “Rast e, ez bi xwe tevî we nînim, lê ez bi Ruh tevî we me /NLT/. Tevgirêdana Pawlos a tevî wan civîna hebû û ew ha ji karên wana hebû, bêyî hazirîya wî ya bi fîzîkîye li wir.

Ez gelek cara pê hesîyame, wekî ji endamên koma min, yan jî hevalkarên min bona min dua kirine. Gelek cara ez ketime nava halên çetin û bi qezîya, wextê ku Xwedê nişkêva tevî wê yekê dibû. Ez zanim, wekî wî çaxî kesekî bona parastina min dua dikirin û bi Ruh piştgirî bo min dida.

## HÊSABÛN

> Birano, hişê xwe da zarok nîbin...Qanûnê da nivîsar e, ku “Ezê bi merivên xweyê zimanên xerîb û zarên xerîba vê cimetê ra xeber bidim” /A Korintî 14:2O–21/.

Diqewime êdî we fem kirîye, wekî Pawlos A Korintî 14a da gelekî derheqa zimana da dinivîse. Nava van gotina da Pawlos gotinên Îşaya dide xebatê.

Xwedê bi saya Îşayî pêxember bû pêpxember, wekî xeberdana bi zimana wê rehetîyê pêşkêş bike. Carekê hevalekî min, yê ku serwêrê civînê bû, tevî serwêrekî civîneke mayîn xeber dida. Serwêrê mayîn gote hevalê min:

–Ez xwe hazir dikim qulixê bihêlim. Ez êdî westîyame, qewata min tune.

–Tu êdî bi Ruhê Pîroz dua nakî, usa nîne?,– hevalê min gotê.

–De... – ewî serwêrî gotina xwe temam nekir.

–Tö çiqas wede bona dukirina bi Ruh derbaz dikî?,– hevalê min gotê.

Serwêrê mayîn nedixwest xwe mikur bê û got:

–De, ez her dem qulixê amede dikim û gelek xebatên min li civîna 15OOO –ê hene, û....

–Tu bi Ruh dua dikî?,– hevalê min careke mayîn jê pirsî.

Bi kutasî wî serwêrî got:

–Na xêr. Heger rast bêjim, na.

–Tu dest pê bike bi zimana dua bike,– hevalê min gote wî.

Hinek wede şûnda ewî serwêrî, yê ku wedekî qewata xwe unda kiribû, êdî nedixwest ji qulixê dûrk'eve. Roja îroyîn him ew û him jî civîna wî gulvedidin.

Gelo bona çi ew yek gelekî grîng e, ku serwêr bi zimana dua bikin? Em hêsabûna zor û qewatê distînin, wextê ku em bi Ruh dua dikin.

Doktor Ço çawa dikare rêberîyê li civîna bi endamên 8OO OOO–ê bike û qewata xwe unda neke? Ew bi Ruh dua dike. Ez nikarim serwêrekî bîr bînim, li ser milên kîjanî hukum û cabdarîke usa hebe, çawa li cem doktor Ço. Civîna wî Korêya Başûr da guhastinê û ew li temamîya dinîayê serwêrê herî qedirbilind e. Ez zanim, wekî doktor Ço xwe nade ser fikira xwe. Ew pêşda derheqa wedê duakirinê da difikire û her roj bi seheta bi Ruh dua dike. Wedê duakirinê qewatê û hêsabûna mezin dide wî.

Lêstêr Samral qulixçîkî bi qewat bû. Çend cara min ra li hev hatîye tevî wî wede derbas bikim. Doktor Samral nava şevê da tenê çar seheta radiza û bi wê yekê va tevayî karibû çar kitêba binivîse. Endamên teşkîla wî ya qölixdarîyê, yên ku gelekî cahil bûn, bi qewata xwe ser wî ra nîbûn. Gelo ew qewat ji kîderê bo wî dihat? Ewî gelek wede nava duakirina bi Ruh derbas dikir.

Hîvî dikim, fem bikin, wekî em gerekê bedenên xwe badîhewa nedine xebatê. Xwedê zelal dibêje me, ku em qedir bigrin û roja şemîyê xweyî bikin. Em hemû kes jî gerekê reh'etîyê bidine bedenên xwe. Ez golfê dilîzim, çimkî ew guhdarîya min ji xebatê dûr dixe. Fikir, usa jî bedena min bi wê yekê hêsa dibin. Ew lîstik bona min kanîya hêsabûnê ye. Feqet tevî xweyîkirina hêsabûna roja şemîyê, dukirina bi ruh wê rehetîyê bide bedenê û şexsên me. Telebext ra gelek meriv ji wede zûtir temirîne, çimkî wana nava Ruh da rehetî ne dîtîye.

**Roja 5–emîn**

## MERIVÊ HUNDURÊ ME DA

> Ewê ku bi zimanê xerîb xeber dide, tenê bawerîya xwe ava dike /A Korintî 14:4/.

Xebera “avakirin” zimanê yûnanî da xebera “oykodomêo” ye, kîjan “çêkirin, yan jî avakirinê” dide kivşê. Wextê ku em bi Ruh dua dikin, em wê karebûnê zêde dikin, kîjan di nava me da heye, bona cihkirina hazirî û qewata Xwedê. Îsa hema ew xebera yûnanî da xebatê, wextê ku got: “Kî ku van gotinên Min dibihê û wana dide xebatê, ew mînanî merivekî serwaxt e, ku mala xwe li ser zinar çê dike /oykodomêo/” /Metta 7:24, NIV/.

Hema bi wî cûreyî jî Xwedê bi destî Cihûda dibêje:

Lê hûn delalno, xwe bidine ser avakirina bawerîya xwe ya pîroz, bi Ruhê Pîroz dua bikin /Cihûda 2O/.

Tê bîra min, wekî kurê hevalekî min gelekî nexweş bû. Doxtira fem nedikir çi diqewimî, lê hevalê min jî nizanibû çi bikira. Ew çû ofîsa xwe û pênc seheta bi Ruh dua kir. Ew ji ofîsê derket û bi avtomaşînê hate malê, paşê carekê ra çû oda kurê xwe. Ewî bi serwêrtîke mezin gote kurê xwe, ku ji nav cihîya rabe. Ji wî çaxî da kurê wî qenc bû. Çi qewimî? Ew sehetên ku hevalê min bona duakirina bi Ruh bacqe kirin, karebûna wî zêde kirin, ku ew piştgirîyê bide û bona kurê xwe qulix bike. Ew çi ku em ji Xwedê distînin, bi bawerîyê ye, rêke başqe tune. Wedê tevî Ruh derbazkirî karebûna me zêde dike, ku em soz û hazirîya Xwedê ya eyanbûyî bistînin, çimkî duakirina bi Ruh avabûnê dide merivê di hundurê me da.

## PESINDAYÎNA DIHA KÛR

Duakirina bi zimanê ezmana mecalê dide me, ku em li ser dereca diha kûr pesinê Xwedê bidin. Pawlos dinivîse:

> Heger tu bi ruhê xwe şikirîyê bidî, ewê ku mîna nezana sekinîye, wê çawa razîdarîya te ra qayîl be, bêje: “Amîn”, çimkî ew nizane tu çi dibêjî. *Tu rind razîbûnê didî* /A Korintî 14:16–17/.

Pawlos derheqa şikirdayîna bi komê dibêje û dide kivşê, wekî wextê “em bi ruh dua dikin” /em bi zimana şikirîyê didine Xwedê/, em karê nadine yê li rex me.Çimkî şikirdayîna bi zimana gotina şexsî ye, ew avabûnê dide wî şexsî, lê ne ku komê. Pawlos şikirdayîna bi zimana bêqîmet nake. Ew awqasî dibêje, wekî bona wê yekê cih û wede heye.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, ku Pawlos çawa gotina xwe ser hevda tîne:

> “Tu rind razîbûnê didî”.Wextê ku em bi zimana şikirîyê didin, pesinê Xwedê didin, em îzinê didine Ruh, ku ew bi destî me keremetên Xwedê bide bilindkirinê. Dereca /asta/ pesindayînê û şikirdayînê ya diha kûr heye û ew cûre wî çaxî diqewime, wextê ku em bi zimanê ezmana pesinê Xwedê didin. Bo vê yekê jî Pawlos him bi Ruh û him jî bi fikirê distira /bixwînin A Korintî 14:15/.

## HER KES JÎ DIKARE BI RUH TIJÎ BIBE

Dilê min diêşe, wextê ku mesîhî wan bawermenda rûyê wê yekê da bêhurmet dikin, wekî ew bi zimana xeber nadin, yan jî dua nakin. Ew xwîşk û bira nava Mesîh da hela hê ew pêşkêşa Ruh nedîtine. Lazim nîne, wana bidine şermê, yan jî hesabhilnedanê, çimkî em hemû nava Mesîh da nin.

Çawa ku me serê kitêbê yê derbazbûyî da da kivşê, pêşkêşa xeberdana bi zimana bona her bawermendekî tiştê bûyînê ye û ewên ku hela hê bi zimana xeber nadin, ji wî sozî hela hê miqûf nemane. Îsa got: “Ewên ku bawer dikin, ev nîşan wê wan ra dîyar bin... bi zimanên nû wê xeberdin” /Marqos 16:17/. Pawlos got: “Ez dixwezim ku hûn *hemû* bi zimana xeber bidin”

/A Korintî 14:15/. Xwedê bi dil dixweze, ku hemû lawên Wî van tişta bivînin.

## ÇAWA RUHÊ PÎROZ QEBÛL BIKIN?

Hetanî berdewamkirinê, îzinê bidin pêşda bidime dîyarkirinê, wekî ji hevalên min geleka tijîbûna bi Ruh li avtomaşînê, li malê û ofîsên xwe da qebûl kirine. Em tenê gerekê hîvî bikin û Bavê ezmana wê Ruhê Xwe bide me. Heger we êdî hîvî kirîye, wî çaxî hûn gerekê hîn bin, ku çawa xwe teslîmî Wî bikin.

Berê ewlin hetanî ku hûn bikaribin tijîbûna bi Ruhê Pîroz qebûl bikin, hûn gerekê Îsa Mesîh çawa Xudan û Xilaskir qebûl bikin. Îsa got, wekî ev dinîya /ewên ku xilasbûn qebûl ne kirine/ nikare Ruhê Pîroz qebûl bike /bixwînin Yûhenna 14:17/. Heger we Îsa çawa xudanê emirê xwe qebûl nekirîye, hûn dikarin hema niha teslîmî serwêrîya Wî bin.

Heger hûn îdî lawê Xwedê ne, lê nava emirê we da gunehê bi *zanebûn* û yê ku berdewam dike heye, wî çaxî ewê nehêle, ku hûn tijîbûna Ruh bivînin. Xwedê Ruhê Pîroz dide "ewên ku xwe teslîmî Wî dikin" /Karên Şandîya 5:32/. Ev yek dide kivşê, wekî hûn gerekê li ber Wî ta bin û xwe teslîmî xwestina Wî bikin. Wî çaxî Xwedê wê kerema Xwe bide, ku hûn guneh alt bikin û hûnê careke mayîn bona tijîbûna bi Ruh vekirî bin.

Nava emirê gelek bawermenda da bêhurmetkirin kanîke gurênekirinê ya mezin e. Hûn gerekê bi zanebûn wana bibaxşînin, yên ku himberî we şaş bûne. Min texmîn kirîye, wekî wextê ku bawermendê xeyîdî, yê ku dixweze tijîbûna bi Ruhê Pîroz qebûl bike, dibaxşîne û Ruh carekê ra Xwe eyan dike. Niha hinekî bisekinin, wana bibaxşînin, yên ku hindava we da şaş bûne û hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew nêzîkbûna dilê Xwe himberî wana bide kivşê. /Ez derheqa xeyîdê da kitêba "*Tela şeytan*" da wê yekê bi hûr gilî guvtgo dikim/.

## AWQASÎ BI BAWERÎYÊ HÎVÎ BIKIN...

> Û ji we kîjan bav, heger kurê wî nan, yan jî masî jê bixweze, dewsê wê mehr bidê, yan jî hêkê bixweze, dûpişkê bidê? Hûn ku xirab in, zanin tiştên qenc bidine zarokên xwe, lê Bavê Ezmana wê çiqas zêde Ruhê Pîroz bide ewên ku ji Wî dixwezin /Lûqa 11:11–13/.

Hineka hîn kirine, wekî bi hîvîkirina Ruhê Pîroz hûn dikarin ruhê xirab bistînin. Gotinên Îsa gerekê wê tirsê bidine dûrxistinê. Xwedê pêşkêşên bi rehm dide /bixwînin Aqûb 1:17/. Heger hûn ji Bavê Ruhê Pîroz hîvî dikin, Ewê cin nede we. Ewê Ruhê Xwe bide we. Netirsin, dilê xwe vekin bona tijîbûna bi Ruhê Wî. Peyî vekirina dilê xwe ra bona Ruhê Pîroz, usa nefikirin, wekî Ewê zimanê we bigre û we mecbûr bike, ku hûn xeber bidin. Ewî xwestina aza daye we. Ruh cêntilmên e, Yê ku wê tu cara miqabilî we dernekeve. Mîrêcin dijî we derdikeve, lê Ruhê Pîroz rêberîyê dike. Ruhê xebera bide we, lê hûn gerekê lêv, ziman û dengê xwe teslîmî Wî bikin. Wî çaxî zimanê ezmana wê ji ruhê we bilind be. Diqewime pêşda hûn tenê xeberekê bêjin, lê heger hûn bi bawerîyê wê yekê bêjin, wê hê zêde bibe. Ew hemû tişt, çi ku em ji Xwedê bi bawerîyê distînin, ew yek wî cûreyî jî pêşkêşa zimana ye. Wê yekê bêjin, çi ku Ew bi bawerîyê dide, nenihêr'î wê yekê, wekî hûn tam nabêjin, lê paşê ewê bibe zimanê tam.

## DERECÊN /ASTÊN/ HÊ BILIND

Min bi meremê mexsûs her du serên kitêbê yên dawî pêşkêşî pêşkêşa zimana kir. Ez hêvîdar im, wekî Xwedê dixweze, ku zimanê me yê ezmana hebe, kîjanê me Wî û cimeta Wî va bide girêdanê, bona meremên padişatîya Wî. Ruhê Pîroz dixweze, ku hemû kes Îsa nas bike. Wextê ku em diha gelekî tevî Wî nava hevkarîyê da bin, Ewê nihêrandina me bilind bike û wê vê dinîyayê bi ronahîya nû nîşan bide. Emê bivînin, wekî dinîya bi gumanbirî hewca Mesîh e, lê emê dinîyayê bi Ruhê Wî bivînin û bizanibin, ku rola me ya nava

eyankirina Mesîh da kîjan e.

Ez hêvîdar im, wekî ev têma ya derheqa Ruhê Xwedê da we begem kir. Çi ku hûn nava van serên kitêbê da hîn bûn, parçekî heyîna Wî ye bêsînor e. Ew dixweze her roj we bibe li ser derecên diha bilind. Ez piştgirîyê didime we, ku hûn dîsa vê kitêbê bixwînin, ku Ruh bikaribe dilê we hişyar bike, bona ku hûn bi cûrê diha nû û diha kûr Wî nas bikin.

Ruhê Pîroz şa dibe, wextê ku Îsa dide eyankirinê. Qedirê hazirîya Wî bigrin û Wî dewatî li her govekeke emirê xwe bikin, ne tenê govekên "ruhanî". Ewî soz daye tu cara ji we dûr nekeve. Bo wê yekê jî sozê Wî her roj û her deqe qebûl bikin. Bi xwendina Gotina Xwedê û bi derbaskirina wede ya nava hazirîya Wî da, hûnê diha gelekî ji nêzîk va Ruh nas bikin. Behseke şabûnê heye: naskirina Wî bê sînore. Her dem wê tiştên diha zêde hebin, ku Ewê bixweze elamî we bike. Wê yekê ra nebêjin bes e, çi ku we bihîstîye, dîtîye, yan jî hûn zanin. Îzinê bidin, ku Ruhê Îsa Mesîh nava emirê we da serwêrîyê bike. Ez guman im, ku heger hûn usa bikin, hûnê şikirîya Xwedê û mezinaya Wî nava emirê xwe da bivînin.

Ders Roja 1–emîn

**Duakirina bi Ruh...**

# BONA NÊZÎKAYA DIHA KÛR DERÎ VEDIKE

*Heger hûn bi zimanên xwe yê şexsî şikirîyê didine Xwedê, Ew we fem dike...çimkî hûn bi nêzîkayî di navbera we û Wî da dikevine nava heleqetîya.*

– A Korintî 12:2, MSG

Dua yê herî mezin, yê bona duakirina bi zimanê Ruh, nêzîkaya tevî Xwedê ya diha kûr e. Xudanê temamîya afrandarîyê awqas gelekî dixweze tevî me bikeve nava heleqetîya, wekî Ewî Ruhê Xwe kire nava ruhên me, qewat da me, ku em Wî ra bikevine nava heleqetîyên li ser dereca Wî. Serwêr Kênêt Hêgî dinivîse:

"Xwedê Ruh e.Wextê ku em bi zimana dua dikin, ruhê me tevî Xwedê dikeve nava tevgirêdanê, Yê ku Ruh e. Em bi rîya xwedêtîyê Wî ra xeber didin... Xeberdana bi zimanên başqe ne tenê şedetîya tijîbûna bi Ruhê Pîroz ya *ewlin e*, lê usa jî cêribandin e, kîjan *berdewam dibe,* ya ku hetanî dawîya emirê me dikişîne. Meremê wê yekê ew e, ku nava şikirdayîna Xwedê da alî me bike.

Duakirina bi zimana û şikirdayîna Xwedê alî me dike, ku em hazirîya Wî ya nava xwe da fem bikin. Heger ez bikaribim her roj hazirîya Xwedê ya ku nava me da dijî fem bikim, ewê ese hukumî li ser cûrê emirê min bike".

Wextê duakirina bi Ruh em ne ku bi fikira xwe dua dikin, lê bi fikira Xwedê. Ruhê Wî xwestina Xwedê bi destî me dup dike.

Duakirina he roje ya bi Ruh û xwerina bi Gotina Xwedê gelekî girîng e, çimkî wî cûreyî em Wî va tên girêdanê. Gelo em her roj Xwedê va tên girêdanê?: heger erê, wî çaxî li kîderê û bi çiqas wedeyî va? Ruh çi cûreyî hizkirina Xwe ya kûr û şexsî nîşanî we daye?

Heger wede û cihê we yê dakirinê tune, wî çaxî dua bikin û ji Ruhê Pîroz bipirsin, ku li kîderê û kengê Ewê bixweze rastî we bê û hizkirina Xwe ya kûr ya hindava we da bide eyankirinê.

Gelo we pêşkêşa xeberdana bi zimana bêhurmet kirîye, yan jî hesab hilnedaye? Heger erê, wî çaxî bona çi? Gelo vê dersê alî we kir, ku hûn zimanê Ruh bin ronahîya baş da bivînin?

Heger we pêşkêşa zimana hesab hilnedaye, yan jî bêhurmet kirîye, hîvî ji Xwedê bikin, ku ew we bibaxşîne û ji nû va Ew we bi Ruhê Xwe va tijî bike.

Hinek meriva ra dijwar e zimanên duakirina xwe bidine xebatê, çimkî xeberek yan du xeberên wan hene. Gelo ev yek derheqa we da ne? Heger erê, wî çaxî bînine ber çava, wekî Ruh bi cûrê nerm dibêje we: "*Ez te hiz dikim. Tê wî hemû tiştî bidî xebatê, çi ku Min daye te. Gelo tê Min hiz bikî û qedirê Min bigirî, bi gotina wan xebera, kîjan cem te hene. Rast e, ew hindik in, lê navbera Min û te da ew mexsûsin*".

Zimanê duakirina cûrê nêzîk himberî zimanên merivên başqe nekin. Hûn bibine xweyî ên wan xebera, kîjan Ruh dane we. Heger hûn nava yên biçûk da þikestî bin, Ewê hê zêde bide we. Bixwînin Metta 25:14–23, guhdarîyê bidine ser gotinên 2O–23 a.

Ders Roja 2–emîn

**Duakirina bi Ruh…**

# SURÊN XWEDÊ EŞKERE DIKE

*Ulmê derheqa padişatîya ezmîn da bona we hatîye dayînê…*
*Ewên ku van sura fem dikin, wê diha gelekî zanebûna bistînin û*
*ewê bi femkirina wana pêşkevin…*
– Metta 13:11–12, GW

Îsa got, wekî we mecal stendîye, ku surên padişatîya Wî fem bikin. Hûn çawa wan sura distînin û fem dikin? Surên Xwedê wî çaxî eyan dibin, wextê ku hûn bi Ruh dua dikin û wede tevî Wî derbas dikin.

**Osvald Çêmbêrs** avtor û serwêr bû. Xêncî wê yekê ew bi nêzîkayî xwe pêşkêşî Xwedê kiribû. Nava kitêba xwe ya eyan da, ya bi sernavê “Hemû tişt, çi ku ez dikarim bona şikirîya Wî bikim”, ew dinivîse:

> “Nîşana hevaltîyê kîjan e? Wekî ew derheqa derdên xwe yên veşartî da gilî dike? Na xêr, lê wextê ku ew derheqa şabûnên xwe yên veşartî da gilî dike. Gelek meriv wê derdên xwe yên veşartî we ra gilî bikin, lê nîşana hevalitîê ya dawî gilîkirina şabûnên veşartî ye”.

Kîjane sureke Xwedê ya here ecêb, kîjan Ruh we va eyan kirîye? Bo çi ew bona we mexsûs e?

__________________________________________________________

__________________________________________________________

__________________________________________________________

Gelo hûn derheqa fikirên xwe yên şexsî da û xwestinên xwe va tevî Ruh nîvî dibin, gilî dikin? Gelo hûn derheqa xiyalên xwe û tirsên xwe da tevî Wî xeber didin? Heval bi têmayên vî cûreyî va xeber didin. Bisekinin û tevî Wî derheqa wê yekê da xeber bidin, çi ku dilê we da

giranbiha ye, derheqa çi da we pêşda gilî nekirîye, yan jî wedekî dirêj bîr ne anîye.

Heger hûn derheqa wan tişta da tevî Ruh xeber nadin, menî çiîye? Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew nîşanî we bide, ku menî çiî ye, ku ew alî we bike, wekî hûn aza dilê xwe li ber Wî vekin.

Tevgirêdana tevî Xwedê tenê xeberodan nîne, lê usa jî guhdarkirin e. Ev her du alîyên heleqetîya gerekê balanskirî bin. Heger em bona guhdarkirinê wede baþqe nekin, wî çaxî emê nebihên ku Ruh çi dibêje. Çêmbêrs ser da zêde dike:

> "Gelo we îzin daye, wekî Xwedê derheqa şabûneke Xwe da we ra gilî bike, yan hûn awqas gelekî derheqa surên xwe da Xwedê ra gilî dikin, wekî mecala Wî tune ku we ra xeber bide? Destpêka emirê mesîhîtîyê da em gelek tişta ji Xwedê hîvî dikin, lê paşê zelal dibe, wekî Xwedê dixweze tevî me bikeve nava heleqetîya, nasîya me bide meremên Xwe. Gelo me awqasî xwe pêşkêî fikira duakirina Îsa Mesîh kirîye, wekî em suên Xwedê distînin?".

Xwedê dibêje, wekî bona hemû tiştî wede heye û ew yek jî dide kivşê, wekî nava duaê da wedê xeberdanê û xwekerkirinê heye /Binihêre Gotinên Silêman 3:1-17/. Ji Ruh bipirsin: "Gelo ez bêyî sekinandin, wextê duakirinê xeber didim? Gelo ez wedê Te ji Te distînim, wextê ku Tu dixwezî surên Xwe min ra bidî eyankirinê? Gelo Te cêribandîye tiştekî min ra bêjî, bona guhdarkirina kîjanî min xwe ker kirîye? Heger erê, wî çaxî çi?". Xwe bêdeng bikin û guhdar bikin. Ruhê Pîroz çi dibêje we?

*Eve dua yê min. Wekî Xwedê… serwaxtîya Ruhanî bide we, ku hûn derheqa Wî da zêde bizanibin, wekî hûn bikaribin ronahiya ruhe hundur bistînin, kîjanê usa bike, ku hûn fem bikin, ku bi çiqasî va ew guman mezin e, bona kîjanê Ew gazî we dike,– mezinaya wê mîratê, kîjan bona mesîhîya hatîye sozdayînê,– û çiqas mezin e ew qewat, ya ku dighîje me, yên ku Xwedê bawer dikin.*

– Efesî 1:17–19, tercima Fîlîps

Ders Roja 3–emîn

**Duakirina bi Ruh…**

# NAVA MEDA EDILAYÊ PÊŞDA TÎNE

*Lê Ruhê Pîroz nava emirên me da berên vî cûreyî pêşda tîne:… edilayî…*
– Galattî 5:22, NLT

Çiî ye edilayî? Carna em tiştekî fem dikin, wextê ku pê dihesin, ku ew yek usa *nîne.* Edilaya rast–edilayî ya Xwedê, ew edilayî, kîjanê Îsa bi Ruhê Xwe dide, *nade* kivşê, ku gerekê seh'et– qewata baş, mala bedew û hebûna mezin, yan jî heleqetîyên bêyî pevçûyîna hebin.

Edilaya rast, edilaya Xwedê, bi menîyên der yan jî bi qewilava nayê sînorkirinê.Ew nava çetinaya da qewîn bûne. Ew yek karebûnê dide, ku meriv nava çetinaya da bi fîzîkî û bi ruhanî edil be û li ser hişê xwe be.

Bisekinin û ji xwe bipirsin:

> "Ez edilayê çawa fem dikim? Edilayî li ser çi hatîye bingehkirinê? Şirovekirina min a derheqa edilayê da ji edilaya Ruhe rast bi çi va tê cudakirinê? Ez gerekê çi biguhêrim?".

____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
____________________________________________________________
___________________________________________________________

Bi saya qurbanîya Mesîh edilaya me ya *tevî Xwedê* heye. Bi saya tijîbûna Ruhê Pîroz edilaya *Xwedê* bona me hatîye dayînê. Îsa bi xwe got:

> "Ez edilayê tevî we dihêlim: Ez edilaya Xwe û pêşkêşa

> Xwe didime we, kîjan mînanî edilaya vê dinîyayê nîne. Hûn gerekê xemgîn nîbin û hûn gerekê netirsin”.
>
> – Yûhenna 14:27, tercima Fîlîps

Gelo em çi gerekê bi edilayê bikin, kîjan me ji Serwêrê Edilayê stendîye?

> Îzinê bidin, wekî edilaya ku ji Mesîh tê, dilê we da serwêrîyê bike /bi zelalkirina hemû pirsa, kîjan nava fikirên we da nin, nava halê edil da/bona kîjanê, çawa bedenek /endamên bedena Mesîh/, hûn hatine gazîkirinê /bona jîyanê/.
>
> – Kolosî 3:15, AMP

Bînine ber çavê xwe, wekî wextê lîstika bêysbolê hûn gerekê derbê bighînin û hûn li ser tabîya xwe sekinîne. Li piş we Hakimê Edilayê sekinî ye, lê her topek, kîjanê diavêjine alîyê we, qerarkirîne, kîjanê gerekê hûn qebûl bikin. Niha careke mayîn Kolosî 3:15 bixwînin. Gelo emirkirinên hakimê sportê bi çiqasîva girîng in? Ruhê Pîroz çi nîşanî we dide? Hûnê çawa îzinê bidine Wî, ku Ew bibe Hakimê Edilayê?

Mecala sereke, bi kîjanê berbi xwestina Xwedê Ruh rêberîyê li me dike, edilaya di nava me da ne. Kitêba Pîroz dibêje: “Hema ew Ruh bi xwe tevî ruhê me şedetîyê dide” /Romayî 8:16/. Gelo niha qerar hene, bona qebûlkirina kîjana hûn hewcê rêberîya Xwedê ne? Bisekinin û bi Ruh dua bikin. Peyî wê yekê ra hîvîya şedetîya edilaya Wî bin.Ew çi dibêje we?

Ders Roja 4–emîn

**Duakirina bi Ruh…**

# SERWAXTÎYÊ Û RÊBERÎYÊ DIDE

*Heger hûn dixwezin bizanibin, ku Xwedê çi dixweze, ku hûn bikin, hîvî ji Wî bikin û Ewê bi şabûn bêje we, çimkî Ew her dem hazir e ku bi merdanî zanebûnê bide hemûya, yên ku ji Wî hîvî dikin. Ewê rûyê wê yekê da beşera xwe xirab neke.*

– Aqûb 1:5, TLB

Kî serwaxtîyê û rêberîyê dide? Ruhê Pîroz. Îşaya Wî çawa Ruhê serwaxtîyê û merîfetê, Ruhê ulm û şêwirê nav dike. Îsa got, wekî Ew Dersdarê me ye, Yê ku nava temamîya rastîyê da rêberîyê li me dike. Dersdarê me li kîderê dijî? Li paristgeha Xwe, nava me da. Wextê ku kêmasîya zanebûnê heye û hûn nizanin çi bikin, bi fikira xwe û bi Ruh dua bikin, û Ewê rêberîyê bide we, hewcê kîjanê ne hûn.

Dora van gotinên mezin wede başqe bikin û bifikirin. Bîra xwe da xweyî bikin, wekî Xudan û Ruh yekin.

Bo vê yekê Xudan dibêje…

> "Ez– Xudan, Xwedêyê te me, Yê ku te wî tiştî hîn dike, çi ku bona te qenc e û bi wan rîya rêberîyê li te dike, bi kîjana tu gerekê herî".
>
> – Îşaya 48:17, NLT

Heger bizvirî ile rastê, yan jî ile çepê, guhên te wê ji te dengekî bibihê, yê ku dibêje:

> "Ev e rîya te: bi vê rê here".
>
> – Îşaya 3O:21, NIV84

Ezê /Xudan/ te hîn bikim û ezê te nava vê rê da hîn kim, bi

> kîjanê tu gerekê herî. Ezê şîreta bidime te û ave Min wê ser te be.
>
> – Zebûr 38:2, AMP

> Heval– Ruhê Pîroz, Yê ku Bav wê bi hîvîkirina Min bişîne, wê bona we hemû tiştî bide zelalkirinê.
>
> – Yûhenna 14:26, MSG

> Wextê ku Ruhê Rastîyê bê, Ewê nava temamîya rastîyê da rêberîyê li we bike.
>
> – Yûhenna 16:13, NLT

> Xudan, wê rê nîşanî min bide, bi kîjanê ez gerekê herim: rîya rast nîşan bide, bi kîjanê gerekê ez bigerim. Rêberîyê li min bike: min hîn ke, çimkî ue w Xwedêyî, Yê ku xilasbûnê dide min. Gumana min tenê li ser Te ye… Ewê wan rîya hîn ke, kîjan bona wana yên heq in û yên here baş in, yên ku gura Wî da nin… Ew meriv li kîderê ye, yê ku ji Xudan ditirse. Xwedê wê Wî hîn bike, ku tiştê herî baş çawa bibijêre.
>
> – Zebûr 25:4–5, 9, 12, TLB

Bona çi hûn hewcê serwaxtîyê û rêberîyê ne? Bona xebatê? Bona saxlemîya we? Bona zewacê? Bona zaroka? Bona fînansa? Bona heleqetîyên hevaltîyê? Halê we çi cûreyî be jî, bicêribînin van gava biavêjin:

1. *Elamî Xwedê bikin, ku hûn bona çi serwaxtîyê ji Wî hîvî dikin,* bi razîbûna bona wê rêberîyê, wekî Ewî pêşda daye we /bixwînin Fîlîpî 4:6–7/.

2. *Bi Ruh dua bikin*. Bona duakirinê awqas wede pêşkêşa zimana bidine xebatê, çiqas Ruh dixweze /bixwînin Efesî 6:18, Romayî 8:26–27/.

3. *Şirovekirinê ji Ruh hîvî bikin*. Ewê sura duakirina we eyan ke /bixwînin A Korintî 14:13/.

4. *Çi ku Ew eyan dike, binivîsin* /Bîra xwe da xweyî bikin, wekî eyantî dikare carekê ra neyê, lê ewê bê/.

5. *Ji Ruhê Pîroz keremê hîvî kin*, bona ku hûn anegorî wê rêberîyê bikin, kîjanê Ew dide.

**Nava vê pirsê da berê ewlin serwaxtî û r'êberî lazim e:**

**Awa ew serwaxtî û rêberî, kîjan Ruhê Pîroz dide min:**

**Duakirina bi Ruh…**

# QEWATÊ Û ŞÊNBÛNÊ DIDE WE

*Ew merivê bi zimanê xerîb xeber dide, nava şexsê xwe da qewat dibe…*

– A Korintî 14:4, NLT

Gelo dijmin bona çi şerkarîyê dike, wekî îzinê nede we, ku hûn bi zimana dua nekin? Nava A Korintî 14:4 da menîke girîng heye, ew naxweze, ku hûn qewat bin. Hûn bi çiqasî va zêde ruhê xwe da qewat bin, hûnê awqasî nava Mesîh da qewat bin û hûnê bona padişatîya mîrêcin bibine qezîya.

Çawa ku gênêratora avtomaşîna we qewatê dide akûmûlyatorê, usa jî duakirina bi Ruh qewatê dide ruhê we. Ew tirsê, gumanbirîyê û beşera xirab dûr dixe. Ew şênbûnê dide we. Wextê ku hûn bi zimana dua dikin, hûn wê karebûnê zêde dikin, kîjan nava weda heye –bona cîwarkirina hazirîya Xwedê û qewata Wî.

Gelo hûn *her dem* bi Ruh du dikin, yan *carna* ? Heger her dem hûn dua dikin, *çiqas wede carekê* û *çiqas wede.* Heger hûn carna dua dikin, menî çiî ye?

Gelo di nava we da çi diqewime, wextê ku bona duakirina bi zimana hûn wede baþqe dikin? Gelo nava emirê we da rezê Ruh hatîye kivşê? Ew hemû tişt piştgirîyê dide we, ku hûn dua bikin?

Hûn çi dikin, wextê ku hûn xwe gumanbir û westîyayî texmîn dikin? Gelo we duakirina bi zimana cêribandî ye? Bisekinin û dua bikin: “Ruhê Pîroz, bi rîya duakirina bi zimana, nêzîkbûna min ya xirab ya tebyetî berbi ya baş ya qewat biguhêre. Bi xwe min mînanî her deman tijî bike”.

Ruhê Pîroz gavên çawa nîşanî we dide, ku hûn biavêjin, bona ku Ew diha gelekî nava emirê we da be? Wana binivîsin û mîaser bikin.

Bêyî şik, dijmin fikir dane we û nava we da tiştên cûre– cûre pêşda anîne, ku îzinê nede we, ku hûn bi zimana dua bikin. Ew vî cûreyî nêzîkî pir’anîya bawermenda dibe. Jêrê çend meselên menîyên belabûyî û xweafûkirinê hene, kîjana ew pêşnîyar dike. Gelo hûn vana ra nas in? Çend heba jî hûn binivîsin, kîjana hûn dikarin bîr bînin, lê paşê dua bikin û hîvî bikin, ku Ruhê Pîroz bersiva ji Xwedê qewatbûyî bide her derewekê, kîjan ji dijmin tê.

*Eva Xwedê nîne:eva te li ber xwe derxistîye.*

*Li cem min texmînkirineke bêfikir heye, wekî ez xeberên bêfikir dibêjim.*

*Tu wan tişta diwekilînî, çi ku yekî mayîn dibêje.*

*Eva mijûlîya bêfayde ye.*

*Ez naxwezim bi zimana dua bikim.*

*Tenê xeberek, yan du xeberê min hene.*

*Gelo ew meriv wê derheqa min da çi bifikirîyana, heger min guhdar bikirana.*

Heval, îzinê nedin, ku dijmin we bixapîne û we ra bêje, ku hûn gerekê bi zimana dua nekin. Wan hemû fikir û texmînkirinên ji wî hatî ji xwe dûr bixin. Devê xwe her roj vekin û "fesal şênbûnê nava evê bawerîya here pîroz da bidine xwe, bi duakirina bi Ruhê Pîroz" /Cihûda 2O, MSG/.

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz: Naverok"–ê çawa beşeke "Berevoka Mêsîncêr"–ê ya dersa lêkolîn dikin, video ya dersa ya 5–a temaşe bikin.*

1 I Duakirina bi zimana /bi zimanê Ruh/ gelekî kardar e. Çend deqa başqe kin, ku hûn feydayên duakirina bi zimana nav bikin, kîjana hûn bîr tînin. Niha bona we feydayê herî baş û bi qîmet kîjan e? Heger hûn rê pê ra divînin, bêjin bona çi.

2 I Menîke ku bona çi Xwedê pêşkêşa zimana daye me, ew e, wekî dijmin derheqa şuxulkarîya me da nizanibe. Xwedê her tiştî zane, lê mîrêcin na. Mîrêcin heyîna zimanê Ruh yê xwedêtîyê fem nake. Derheqa wê yekê da gilî bikin, wextê ku we bi zimana dua kirîye /piştgirî daye/ û hûn himberî programên mîrêcin serketi ne, him nava emirê we da, him jî nava emirên merivên başqe da.

**Bona serwêra:** Gotinen ku dikarin bixwînin: Lûqa 1O:19, Efesî 6:1O–18, B Korintî 1O:3–5, Metta 11:12, Eyantî 12:11.

*Her dem bi Ruh dua bikin. Nava duakirinên xwe da her dem bona hemû bawermenda hişyar bimînin.*

– Efesî 6:18, NLT

3 I Duakirina bi Ruh bona stendina rêberîya xwedêtîyê, ya nava wan halan da, nava kîjana da em hewcê serwaxtîyê ne, kilîta girîng e. Bi guhdarî bixwînin beşên Gotinên Silêman 2O:5, A Korintî 14:13 û Yûhenna 7:38–39. Wê yekê şirove bikin, ku duakirina bi zimana çawa sura Xwedê eyan dike, ya ku dilên me da ye.

4 I Bi saya tevgirêdana her deman ya tevî Ruhê Pîroz, "surên" veşartî li me eyan dibin. Nava van sura da tê gotinê, ku em gerekê herine kîjan civînê, t'evî kê emê bizewicin, xebata me wê çawa be,

kîjan malê emê bikirin, bona merivên başqe emê çawa dua bikin, çawa meriv dikare bibe malxwê, yan jî kevanîya baş, çawa li cîyê xebatê çetinaya alt kin. Heger hûn dixwezin, derheqa wê yekê da, ku çawa duakirina bi Ruh caba wan pirsa daye, gilî bikin.

5 I Nava A Korintî 14:15a da em divînin, wekî duakirina him bi Ruh him jî bi fikirê girîng e. Çend zêdayên duakirina bi fikirê nav bikin. Duakirina bi Ruh çi cûreyî alî we dike, ku hûn bi fikirê dua bikin?

6 I Nava Têsalonîkî 5:17 a da me ra tê gotinê, ku em “bêyî sekinandin dua bikin”. Gelo ev yek dide kivşê, wekî em gerekê rojê 24 seheta û hevtê hevt roja dua bikin, yan tiştekî mayîn? Bixwînin A Têsalonîkî 5:16–19 û wê yekê guvtugo bikin, ku Xwedê çi dibêje me.

7 I Hinek bawermenda, yên ku bi Ruhê Pîroz va tijî ne, ew meriv bêhurmet kirine, yên ku ev Pêşkêş nestendine, ew hesab kirine çawa mesîhîyên dereca duda. Gelo bûye usa, wekî wî cûreyî nêzîkî we bûne? Heger bûye, wî çaxî ewê yekê çi cûreyî hukumî li ser heleqetîyên we yên tevî Xwedê û bawermendên mayîn kirîye? Gelo hûn wî cûreyî nêzîkî yekî mayîn bûne, yan bi zanebûn, yan jî bi nezanî? Nêzîkbûna me ya himberî tijîbûna bi Ruh va gerekê çawa be?

## KIVŞKIRIN

## TOMERÎKIRINA SERÊ KITÊBÊ

- Ruhê Pîroz Şexsekî Xwedêtîyê ye, Yê ku bereketa Bav Xwedê û Kur Xwedê li ser Xwe dibe.
- Ew şexsê bêsifet û bêşikil, yan jî qewata xwedêtîyê nîne: Ew Xwedê ye.
- Ew bi wede yan jî bi têrîtorîyayê nayê sînorkirinê: Ew carekêra dikare tevî gelek meriva nava tevgirêdana da be û alî wan bike.
- Ew nava emirên bawermendên ewlin da bû. Roja îroyîn jî Ew gelekî dixweze nava emirên me da be.
- Bêyî Wî emirê mesîhîtîyê tune ye. Ew merivên ku hevaltîya Wî qebûl dikin, emirê tijîbûyî hîvîya wana ye.
- Bi xwe Wî nas bikin.

# SERÊ KITÊBÊYÎ ZÊDEKIRÎ

# PIRS Û BERSIV

*Ev matêrîyal ji bernama "Pirs û bersiv" hatîye hildanê, kîjan bi tevbûna Con û Lîza Bîvêra hatîye dengnivîsarê. Ev bername him bi cûrê deng û him jî bi cûr'ê vîdêoyê dikarin dest bînin, çawa beşeke dersa, ya "Berevoka Mêsîncêr"–e "Ruhê Pîroz: Naverok".*

**Lîza: Te derheqa wê yekêda xeber dida, wekî hinek civîna guhdarîya xwe awqas li ser sazkirina atmosifêra baş dane merkezkirinê, wekî wana hazirîya Ruhê Pîroz bîr kirîye. Gelek civîn dixwezin bizanibin, ku çawa dikarin careke mayîn hazirîya Ruhê Pîroz dewat bikin, bêyî paşdavegerandina qulixdarîyên dirêj, hewcetîya kîjana tune ye. Ew çawa dikarin wê yekê bikin?**

**Con:** Gerekê hîvî bikin. Çawa ku min îdî got, Ruhê Pîroz cêntilmên e. Ew îzinê dide, ku em gava ewlin biavêjin.

Gelek cara, wextê ku ez li civîna qulix dikim û meriv bona xilazbûnê pêşda tên, ez dibêjim: "Ruhê Pîroz, hîvî dikim, Xwe bispêre wana". Tenê çend deqe lazim in, wekî hazirîya Wî eyan be û merivên li temamîya civînê destbi girî dikin. Ez wê yekê hiz dikim, çimkî Încîl derheqa ewê pêşkêşa ezmîn da dibêje /bixwînin Îbranî 6:1–6/, û min zelal kirîye, wekî meriv diha gelekî paşda vedikişin, heger wana pêşkêşa ezmîn, hazirîya Ruh, dîtîye.

Carekê, ez li civîneke mezin bûm, kîjan diha gelekî nêzîkî qulixdarîyên xarîzmatîkî bû. Wextê berevbûnekê, Ruhê Xwedê hazirîya Xwe eyan kir. Merivên li wir destbi girî kirin. Hazirîya

Xwedê gelekî nêzîk bû. Xudan gote min: “Lê niha bêje wan meriva, wekî wedê razîdarîya bo Xwedê û dayîna pesinê Wî ye”. Min usa jî kir û qulix ser hevda anî. Hinekî şûnda serwêrê civînê gote min: “Çiqas baş bû! Ez fikirîm: *Emê dîsa sehet û nîvekê li vir bimînin. Ev cûrê qulixêyî li vir wê mînanî berê biwekile*”. Ewî xeberdana xwe berdewam kir: “Ew yek min xweş tê, ku çawa Xwedê rêberî li te kir. Wextê te got, wekî Xwedê karên Xwe êdî ser hevda anîye, min dikaribû ew yek texmîn bikira, tê bêjî Ewî meremê Xwe mîaser kiribû. Te peyî wê yekê ra carekê ra got– “Werin em qulixê ser hevda bînin””.

Min dît ku çawa nava du deqa da hazirîya Ruhê Xwedê eyan bû û Xwe sparte meriva.

**Lîza:** Van axirîya ez û Con, me bi têmakê qise dikir. Carna bona qulixê tenê 35 deqe tê dayînê, lê bi rastî ew 35 deqe yên me ne. Usa dertê, wekî dewsa xeberdana 35 deqa…

**Con:** 3O–î deqeyî biaxivin.

**Lîza:** 3O–î deqeyî biaxivin. Yan jî nîvê xeberdana xwe da bisekinin û wede bidine Ruhê Pîroz. Îzinê bidin, wekî Ruhê Pîroz bişuxule. Carina qulixçî awqas mijûl in, wextê ku dicêribînin diha gelek înformasîya bikine nava xeberdana xwe, wekî bîr dikin, ku gerekê xeberdanên wan bi Ruhva tijîbûyî bin.

**Lîza: Te gelekî derheqa wê yekê da xeber daye, ku Ruhê Pîroz çawa “me tijî dike”, lê tu dikarî derheqa wê yekê da bêjî, ku Ew çawa me qedexe dike?**

**Con:** Kitêba Kolosîya me hîn dike: “Edilaya Xwedê bira serwêrîyê dilên we da bike” /bixwînin Kolosî 3:15/. Lê beşa Romaya ya 8 a da nivîsar e: “Çimkî ewên ku bi Ruhê Xwedê dikin, ew lawên Xwedê ne”,– /gotina 14–a/. Xebera “law” bi zimanê yûnanî “hûyos” e. Ew him derheqa kura da ne, him jî derheqa keça da û dide kivşê “lawên gihîştî”. Her Mesîhîk nîne, ku bi Ruh tê rêberkirinê. Gelek bi

texmînkirinên xwe va, bi fikir û halên pêşdahatî va tên rêberkirinê. Xwedê dibêje, wekî kur û keçên gihîştî bi ruh tên rêberkirinê. Ruh çi cûreyî rêberîyê li me dike? Ew şedetîyê dide ruhên me /gotina 16–a/. Bi gilîkî mayîn, mesele, ez dixwezim herime şeherekî, lê ez xemgînîyê ruhê xwe da texmîn dikim…

**Lîza:** Gelo usa bûye, wekî tu çûyî cihkî, li kîderê gerekê neçûyayî?

**Con:** Belê.

**Lîza:** Û paşê çawa bû?

**Con:** Min qerar qebûl kir: "Ezê tu cara usa nekim". Hal gelekî xirab bû. Min fem kir, wekî wextê ez eşaretîya wî cûreyî distînim, gerekê bisekinim.

Carekê, ez qayîl bûm herime li berevbûnekê, lê peyî wê yekê ra min texmîn kir, wekî Xudan nedixwest ku ez biçûma. Feqet min soz dabû. Min got: "Xwedê, Gotina Te dibêje, wekî ez gerekê merivekî usa bim, yê ku sond dixwe û wê yekê xweyî dike, heger ew zîyana wî be jî. Ez gerekê herime li wir û ez hewcê parastina Te me". Ew miqabil derneket. Ew rêwîtî cuda nîbû, lê min parastina Wî texmîn dikir.

Çi jî hebe, wê diha baş bûya, wekî pêşda min eşaretîya Wî fem bikira: "*Wê yekê neke. Tê nexwezî herî li wir"*. Bi rastî tiştekî ecêbmayînê ye, wekî hûn dikarin eşaretîyên Wî nas bikin. Ew gelekî berbiçav in. Hûn çiqas gelekî tevî Wî nava heleqetîya da bin, hûnê awqas gelekî eşaretîyên Wî texmîn bikin.

**Lîza:** Te derheqa Doktor Ço û karên wî ye ecêb da xeber dida, kîjan ewî kirine. Te digot, wekî ewî her dem bona tijîbûna bi Ruhê Pîroz dua dikir. Ez jî kilîteke ji kilîta zanim, wekî gelek fem nakin: Doktor Ço bona gelek tişta dibêje "na", bona ku wî wedeyî biparêze, kîjan ew tevî Ruh derbas dike. Ruhê Pîroz wê nava hinek pirsa da me ra bêje "na", kîjan yên *bûyînê ne*, bona ku tiştên *nebûyînê* nava

emirê me da bike.

**Con:** Nava beşa duda, ya kitêba Karên Şandîya, şagirt bi Ruhê Pîroz va tijî bûn, lê peyî wê yekê ra Karên Şandîya 4:8 a da, Petrûs tevî serwêra “bi Ruhê Pîroz va t’ijîbûyî” xeber da û dîsa Karên Şandîya 4:31ê da bawermend “bi Ruhê Pîroz va tijî bûn”. Tijîbûna bi Ruhê Pîroz tenê carekê nabe. Xwedê dibêje: “Bi şerabê serxweş nebin, lê **her dem** bi Ruh va **tijî bin**” /bixwînin Efesî 5:18, AMP/. Ew yek usa nîne, ku ew tijîbûn “kêm dibe”. Awqasî em dixwezin her dem bi Ruh va tijîbûyî bin. Wextê zewaca me gelek wede usa bûye, wextê ku em bi hizkirinê va tijîbûyî bûne. Gelek cara em ji hev dûr bûne û peyî wê yekê ra em dîsa hewcê tijîbûnê bûne.

**Lîza:** Hûn gerekê bi zanebûn wê yekê bikin.

**Con:** Bi zanebûn wê yekê bikin. Her dem tijîbûyî bin. Tijîbûna bi Ruh şuxulkarîya hertimî ye û her dem berdewam dike /bixwînin Efesî 5:18–2O/. Hûnê nişkê va dest bi stiranê bikin. Nava vê hevtê da min diha gelekî stiraye, ne ku…

**Lîza:** Têlêvîzîonê bitemirînin.

**Con:** Belê, têlêvîzîonê bitemirînin.

**Lîza:** Wan tişta bidine sînorkirinê, kîjanê we bidine “hişkkirinê”.

**Lîza:** Gelo hemû bawermend dikarin bi pêşkêşên ruhanî va kar bikin, yan tenê qulixçî dikarin wê yekê bikin?

**Con:** Ez bawerim, wekî her bawermendek dikare bi her pêşkêşeke Ruh kar bike. Heger bawermendek hewcê wê yekê ye, ku nava emirê wî da keremet bibe, wî çaxî pêşkêşa keremetê wê nava emirê wî da bixebite. Xwedê jî pêşkêşên mexsûs bona merivên cuda dide û ew pêşkêş her dem nava emirê wan da kar dikin.

Ez û Lîza, me merivek nas dikir, li cem kîjanî pêşkêşa qenckirina nexweşîyên dil hebû. Merivê ji parçên Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî yên cuda–cuda, li cem kîjana nexweşîyên dil hebûn, diçûne cem

wî, ku tevî berevbûnên wî bibin û qencbûn distendin. Ew pêşkêşa doxtirîyê alî wî kir, ku ew wê qulixê mîaser bike, bona kîjanê ew hatibû gazîkirinê.

Niha ez serhatîke hevalekî xwe bîr tînim, kurê kîjanî li hemamê xeniqîbû. Ênêrgîya êlêktrîkî ew kuştibû û ew 45 deqa mirîtî mabû. Hevalê min gilî dikir: “Con, min 3O–î deqeyî dua kir û tu tişt neqewimî. Xebatkarên ambûlansê bi cûrekî min dinihêrîn. Nişkêva tiştekî tê bêjî serê min xist. Kesekî bi çavê min nihêrî û min gote kurê xwe, ku Tê bijîyî û tê nemirî”. Û kurê wî ji nava mirîya rabû. Ewî bawer kir û “pêşkêşa bawerîyê” bû, ya ku bi destî wî kar kir. Wî çaxî ew hewcê wê pêşkêşê bû.

**Lîza:** Wî çaxî ew qulixçî nîbû.

**Con:** Ew ofîsêrê polîsîyayê bû.

**Lîza:** Ewî serkarîya tu qulixdarîkê nedikir?

**Con:** Ew ji berevbûnekê hatibû malê û nava emirê xwe da cara ewlin ewî qulix kiribû.

**Lîza:** Ez dixwezim bidime zelalkirinê, wekî…

**Con:** Bawermend, her bawermendek.

**Lîza:** Her bawermendek, yê ku nava her wedekî emirê xwe da bi Ruhê Pîroz va tijîbûyî ye.

**Con:** Hewce nîne, wekî hûn hîvîya kesekî bisekinin, li cem kîjanî pêşkêşa qenckirinê heye. Îsa got: “Ewên ku bawer dikin, ev nîşan wê wan ra dîyar bin. Bi navê Min wê destên xwe daynine ser nexweşa û nexweşê qenc bin /bixwînin Marqos 16:17–18/. Ev yek dide kivşê, wekî hûn gerekê bona qenckirina meriva bi bawerîyê dua bikin û Xwedê wê qedirê gava we bigire, çimkî Ew qedirê Gotina Xwe digire.

**Lîza:** Hewce nîne, ku serwêrê we we li ber dikê bide sekinandinê.

Hewce nîne, ku hûn li sivdera civînê hîvîya qulixçîkî bisekinin, ku rastî wî bên. Hûn dikarin qewata Xwedê û sozên Xwedê nava emirê xweyî herroje da bidine bikaranînê. Heger hûn texmîn dikin, wekî Ruh rêberîyê li we dike, ku hûn tevî kesekî biaxivin, xwe bispêrine kesekî, bona kesekî dua bikin, yan jî himberî kesekî merd bin, diqewime hûn gerekê ji merdanîyê dest pê bikin. Ewê gelekî baş be. Em dikarin li peyî rêberîya Wî herin.

**Con:** Pêşkêşa dayînê, yan jî merdanî pêşkêşeke Xwedê ye.

**Lîza: Em zanin, wekî Ruhê Pîroz hatîye Îsa bide eyankirinê. Nava 2O salên dawî da em bûne şedê gelek tişta– ricaf, ken, ketin, gelo ew çawa Îsa eyan dikin?**

**Con:** Încîl derheqa nîşana da dibêje, lê çawa qanûn ew nîşan yên wedekurt in. Wedê usa tê, wextê ku nîşanên nebînayî û keremet diqewimin û meriva berbi Îsa dibin. Bona min gelekî tiştekî nebaş e, wextê ku meriv bona wan tişta xwe pêş dixin, lê ne ku bona Wî Yê ku pêşkêşê dide.

Carekê ez bona qulixê li civîneke Sîngapûrê bûm. Pêşîya çûyîna min qulixçîkî ku qenc dike hatibû li wê civînê. Pêşkêşa wî hebû, wextê kîjanê meriv bi dînanî dikenîyan.

Wextê qulixa me, min nişkêva texmîn kir, wekî hazirîya Xwedê hazir dibû peyayî li ser wê civîna mezin bibe. Nişkêva ken li meriva girt û ew yek usa ne baş bû, çawa ku tu mix li ser texte ra bivî–bînî. Min hema niha jî ew yek ruhê xwe da texmîn kir.

**Lîza:** Diqewime wana tiştên rast dema şaş da dikirin?

**Con:** Min gote wana: “Bisekinin. Hûn li ser wê nişanê sekinîne, hûn dîna xwe nadine Ruhê Xwedê. Vê carê Ew hazir nedibû wî cûreyî bike. Ew hazir dibû, bi kûrayî bi xofa Xudan xwe bisparta hemûya. Niha emê guman bin, wekî Ruhê Xwedê wê paşda vegere û qulixî we bike”. Peyî wê yekê ra min careke

mayîn nava duakirinê da rêberî li wan meriva kir. Ruhê Xwedê hat û merivên li serayê dest bi girî kirin. Nava halên wî cûreyî da, wextê ku meriv dest pê dikin bi cûrên nîşandayînê xwe bidine kivşê, ew nîşan antîsîmpatîayê pêşda tîne. Du merivên zewicî, yên bi hev ra nêzîk, wê li ber hemûya nekevine nava heleqetîyên nêzîk. Meriv wê nêzîkayê nîşan didin, kîjan Xwedê daye wan û tê bêjî dixweze bêje: “Binihêrin, em ruhanî ne”. Min ew yek texmîn kirîye, wekî tu çiqas gelekî Ruhê Pîroz nas dikî, tu awqasî dixwezî Wî bi qedir, biparêzî /Pêşkêşên Wî, karebûna Wî û qewata Wî/, lê ne ku Wî bitemirînî. Încîl derheqa temirandina Ruh da nava beşa A T’êsalonîkî 5:19–21da dibêje. Hûn Ruh ditemirînin, wextê ku qewata Wî û pêşkêşên Wî ditemirînin. Usa nekin. Dewsa wê yekê qedirê Wî bigrin. Wî usa nîşan nedin, çawa ku Ew hukum û qewateke arzan be.

**Lîza:** Ez dixwezim bidime dîyarkirinê, wekî em gerekê hîvî bikin û Xwedê dewat kin, ku ew wî hemû tiştî bike, çi ku Ew dixweze. Min lêkolîn kirîye, wekî Ruhê Pîroz carna wê usa kar bike, yan jî wî wedeyî, wextê ku diqewime bona me bêfesal be jî, lê Ewê bona dijîderketinê tu tiştî neke. Ew nacedîne guhdarîya meriva berbi Xwe bibe, lê berbi Xwedê. Hîmlî gerekê atmosifêra û hazirîya anegor hebe, bona ku Ew kar bike.

Van axirîya ez tevî komeke meriva bûm. Min bihîst, wekî çawa ji wana hinek qerfên xwe li wan nîşana dikin, kîjan, bi fikira min, wextekê rast bûne, lê paşê meriva ew yek xweyî kirîye, çimkî gumana wana hebûye, wekî Xwedê gerekê bona wan tişta dua bikira, çawa ku berê kiribû. Şuxullkarîya wan nîşana nava wede da unda bibû, lê cûrê wê mabû û wana qerfên xwe wî cûreyî dianîn. Em qerfên xwe tu nîşanekî naynin. Em wî hemû tiştî dixwezin, çi ku ji Ruhê Pîroz e, lê wekî ew hemû tişt bi bawerîyê bibe. Em dixwezin, wekî ew bi hazirîya Xwedê bêne rêberkirinê.

**Lîza: Gelo tiştên usa diqewimin, ku meriv bi rastî derheqa**

**tiştekî da edilayê texmîn bike, lê ew ji Xwedê nîbin?**

**Con:** Belê, nava beşa 14a da, ya Yêzêkîêl da Xwedê derheqa wan meriva da xeber dide, yên ku bi pûtên dilên xwe da tên cem Wî. Pût çiî ye? Peymana Nû da pûtparêzî timayî ye /bixwînin Kolosî 3:5/, dêmek xwestina tiştekî ya bi cûrê şaş. Ew meriv, yên ku dilên wan da pût hene, diçine cem pêxemberekî dibêjin: "Hîvî dikim bona min dua kin û nava emirê min da gotina Xudan bêjin". Xwedê got: "Ezê anegorî gelekbûna pûtên dilên wan da caba wan bidim" /bixwînin Yêzêkîêl 14:4/. Dema ku ez nava hazirîya Xwedê da têm û tiştekî hîvî dikim, ez gerekê guman bim, wekî dilê min nava tabîya nêytral da ne /ne vir da, ne wê da/. Usa qewimîye, wextê ku min dîna xwe nedaye vê prînsîpê. Dilê min nava tabîya nêytral da nîbû û li cem min edilayî hebû, kîjan ji Xwedê nîbû. Paşê min gelekî heyfa xwe bona qirarên wî çaxî qebûlkirî anîye. Awa bo vê yekê jî ez şa me, wekî ez û Lîza wî çaxî li bajarên cuda bûn, dema ku me dest pê kir rastî hevdu bên. Me 3O rojî bona wê yekê dua kir, ku gelo em gerekê heleqetîyên xwe berdewam kin, yan na? Ez usa bengî bibûm, wekî bona min 25 roj hatine xwestinê, bona ku ez ewê yekê alt kim. Feqet nava wî 3O rojî da ez gihîştime xaleke usa, wextê ku min zanibû, heger Xwedê bigota "na", ezê dijî derneketama. Min zanibû, wekî ew yek wê bida kivşê, wekî bona min jineke mayîn heye û mêrekî mayîn jî bona wê heye. Wextê ku ez gihîştime ewê tabîya nêytral, min bi rastî ji Xwedê bihîst.

Heger ez diçime cîhê duakirinêyî xewile û texmîn dikim, ku tabîya dilê min ne ya nêytral e, ez gerekê li ser wê yekê bi Qerara Xwedê û duakirinê bixebitim, ku ewê tabîya nêytral dest bînim. Ez gerekê bikaribim guhdar kim– yan "erê", yan jî "na", çimkî heger nêzîkbûna min cûrekî mayîn be, ewê bibe stendina edilaya feş.

**Lîza:** Me gelek cara ev yek nava wan êtapên emirê xwe da kirîye, wextê ku em difikirîn: *"Hemû tişt wê bi cûrê meyî qerarkirî cihê xwe da bisekine, li cihê meyî qerarkirî û wedê meyî qerarkirî"*, lê

paşê me fem kirîye, wekî anegorî texmînkirina me wê tu tişt nebûya. Em gerekê “temamîya textê ku li ser dinivîsin” paqij kin û bêjin: “Xwedê, wî hemû tiştî bike, çi ku tu dixwezî”.

Tu derheqa “ulm da” xeber didî, kîjan ji Ruh tê. Wextê ku min bona kitêba “Qewata dilovanîya jinê” lêkolîn dikirin, ez şirovekirina xebera “femkirina li hundur, yan jî “întûîsîya”–ê digerîyam. Ew xeber ji xeberên latînî yên “în” û “tûêor” pêşda hatîye, kîjan didine kivşê “dersdarê hundur’”. Ruhê Pîroz dersdarê meyî hundure. Ew dilê nû dide me /bixwînin Yêzêkîêl 35:26/ û dest pê dike me hîn bike.

**Lîza: Nava emir da qewimandinên usa hebûne, girêdayî halên cûre– cûre, yan jî meriva va, wextê ku li ber çava hemû tişt rast tê kivşê, wekî di hundurê me da tê texmînkirinê şaş e?**

**Con:** Her car dema, ku min guhdarîya wî dersdarê hundur nekirîye, dema ku min ruhê xwe da texmîn kirîye, wekî tiştek şaş bûye, feqet ji der va hemû tişt baş bûye, ez ketime telê.

**Lîza:** Tu pêşda bersiva ewlin texmîn dikî, lê paşê destpê dikî wê yekê bifikirî?

**Con:** Belê, hîmlî caba pêşin ji Ruhê Xwedê ye. Problêmên wî cûreyî wî çaxî jî pêşda hatine, dema ku min şêwira te hesab hilnedaye, Lîza.

Îzinê bide, ez vê yekê jin û mêra ra bêjim. Wextê ku em teze zewicîbûn, min rojê sehet û nîvekê dua dikir. Çiqas ez zanim, Lîzayê rojê deh deqa dua dikir, wextê ku dikete hemamê.


**Lîza:** Ez bi meaşa tam dixebitîm.

**Con:** Gelek cara usa dibû, ku min pêşnîyar dikir: “Lîza, ez hêvîdarim, wekî em gerekê vî cûreyî bikin. Ez texmîn dikim, wekî em gerekê gava vî cûreyî biavêjin”, lê ewê digot: “Ez texmîn nakim, wekî em gerekê wî cûreyî bikin”. Paşê ew rast derdiket. Wê yekê tê

bêjî hêrsa min radikir.

Rojekê min got: “Xwedê, her şebeq ez sehet û nîvekê dua dikim. Lîza li hemamê deh deqa dua dike. Feqet nava pirsên me yen nîvê pirê da ew rast derdikeve”.

Xudan gote min: “Doranekê bikişîne”. Min li ser kaxez doranek kişand. Xwedê gotina xwe berdewam kir: “Niha nava temamîya wê doranê da herfên “x” dayne. Min dest pê kir herfên “x” nava doranê da bikşînim. Ewî got: “Niha navbera doranê da xetekê bikişîne”. Min xetek di navbera doranê da kişand.



Ewî gotina xwe berdewam kir: “Te guhdarî da ser wê yekê, wekî nîvê herfên “x” li alîkî man, lê yên mayîn jî li alîyê mayîn. Con wextê ku tu zewicî yî tu û Lîza bûne bedenek û ev doran te û Lîzayê dide kivşê. Tu beşa çepê yî, lê ew beşa rastê ye”.

Peyî wê yekê ra Xwedê got: “Zanî, ku herfên “x” çi didine kivşê? Ewana ew behs in, hewcê kîjana yî tu ji Min, ku bikaribî qerarên serwaxt qebûl bikî. Pirs nava wê yekê da ne, wekî tu hemû qerara li ser hîmê nîvê wan înformasîya qebûl dikî. Tu gerekê hîn bibî, ku çawa ji jina xwe wê yekê hildî, çi ku Ez wê ra eyan dikim bona ku tu– malxwê malê, bikaribî bi heyîna hemû înformasîya qerara qebûl bikî”.

Çi ku derheqa femkirina hundur da ne, ez bêjim, wekî ez zyanê ketime, wextê ku min eşaretîya ewlin stendîye û min ew yek hesab hilneda ye. Feqet usa jî qewimî ye, wextê ku Lîzayê hinek tişt gotin e

min û min ew gotin hesab hilnedane, nenihêrî wê yekê, wekî gotina wê ji Ruh bû. Min ew yek zanibû, çimkî Ruh şedetî dida me.

Gelek cara Lîzayê tiştên usa gotine, –û ew yek çend sala carekê diqewime,– derheqa kîjana da min zanibû– *ev gotin ji bawerîyê nînin, lê ji tirsê ne û ezê wan ra qayîl nebim.*Feqet hîmlî dema ku Lîza xeber dide, ez kûraya ruhê xwe da zanim, wekî *ew rast e.* Heger ez wê şedetîyê hesab hilnedim, wî çaxî ezê heqê wê yekê bidim.

**Lîza:** Bi fikira min Con bi ruhê xwe va gelekî mezin e, lê ez dixwezim, ku meriv vê yekê fem bikin: dema ku Xwedê tiştekî dibêje wan, ew dikarin gumana xwe bidine ser gotinên Wî. Hinek lêkolîner dibêjin, wekî Ruh diha gelekî tişta texmîn dike, ne ku em fem dikin. Wextê ku em bi fikira xwe tev dibin û dest pê dikin cûrên başqe pêşnîyar kin, em xwe nakine bin şikberîyê. Wî çaxî em Xwedê dikine bin şikberîyê. Wextê ku Xwedê dest pê dike tiştekî bêje me, em gerekê gotina Wî ra qayîl bin.

Van axirîya, carekê, dema ku ez tevî komeke meriva avtobûsê da bûm, gerekê bêjim, wekî avtobûsa hiz nakim, tiştek qewimî. Koma me bi rastî li firegehê, avtobûsê da dirêj ma. Menî ew bû, wekî jineke ji koma me nikaribû ew rê bidîta, li kîderê em hemû gerekê biketana avtobûsê. Me gazî wê dikir, lê me nikaribû ew bidîta.

Bi kutasî me ew dît. Ew li ber taksîya sekinî bû, destê xwe dihejand û ew cî li wir nîbû, kîderê gerekê em berevbûna. Nava min da hêrs pêşda hat, lê bi nihêrandina wê, ez carekê ra fikirîm: *"Ez wê hiz dikim*". Di navbera dilên me da tevgirêdan çê bû. Min ew hiz kir, çawa ku min ew dît û navbera me da t'evgirêdaneke qewîn îzbat bû.

Xwedê wê merivên wî cûreyî bîne nava emirên we. Bi tomerî hildayî tê bêjî: "Gelo ez bona çi gerekê vê jinê hiz bikim?". Feqet min nêzîkbûna hizkirinê hindava wê da da kivşê. Îro min nameke êlêktronî ji wê jinê stend. Ewê nivîsîbû: "We carekê ra ez hiz kirim û ew hizkirina, ku min ji we stend, alî min kir, ku ez hizkirina Xwedê

wî çaxî texmîn bikim, wextê ku min xwe tenê texmîn dikir”. Awa em çi dikin, wextê ku em ew merivin, yên ku dikarin tevgirêdanên vî cûreyî tevî meriva îzbat kin, dewsa wê yekê îzinê bidin, wekî qewimandin wê yekê nîşanî me bidin.

Wedê usa jî hebûne, wextê ku Con derheqa kesekî da gotîye: “Lîza, texmînkirina min ya derheqa vê jinê da xirab e”. Min gotîye wî: “Delalê min, tu ne jinî. Hene tişt, ku tu usa fem nakî, çawa ku ez”. Ewî wî cûreyî sê– çar cara eşaretî daye min û ez her dem zyanê ketime, wextê min gura wî nekirîye.

**Con:** Îzinê bide, ku ez vê yekê bêjim. Di beşa Karên Şandîya 15 da, Pawlos û Barnabas dora pirsekê rastî neqayîlîyê hatin, ku gelo bawermendên ne cihû gerekê dîna xwe bidana qanûna Mûsa yan na? Civînê ew şandine Orşelîmê, ku rastî şandîya û serwêra bên. Bona çi Pawlos û Barnabas bi xwe dora wê pirsê qerar qebûl nekirin? Bona çi ew çûne cem rêberên Orşelîmê? Menî ew e, wekî qewat û rêberî nava yekîtîyê da nin. Bo vê yekê jî jin û mêr gerekê hemû tiştî bikin, çi ku nava qewatên wandane, ku nava yekîtîyê da bin. Nava yekîtîyê da em dikarin ji Xwedê cabên zelal bistînin.

**Lîza: Firqîya di navbera *pêşkêşên* Ruh û *rezê* Ruh kîjan e?**

**Con:** Pêşkêşa Ruh tiştekî usa ye, bi kîjanê Xwedê mêriv çê dike. Hewce nîne, ew bê hazirkirinê, yan jî pêşxistinê. Ew bi xwe kar dike. Tiştê tek– tenê, kîjan gerekê bê pêşxistinê ew e, ku ew meriv *çawa* wê pêşkêşê bide xebatê. Himberî wê yekê, rezê Ruh gerekê bê hazirkirinê. Dêmek, pêşkêş tê dayînê, lê rez tê hazirkirinê.

Rezê Ruh feydayê emir e, yê ku bi Ruh tê rêberkirinê. Wextê ku hûn bi ruh kar dikin, nava weda rez çê dibe û hûn bi şabûneke diha mezin, bi edilayê, bi sebirê, bi hizkirinê va tijî dibin /bixwînin Galattî 5:22–23/. Ew hizkirin, şabûn yan jî edilayî wê tevî we bin, çimkî hûn bi Ruh pêşda diçin û hûnê wî cûreyî hukumî li ser emirê xwe bikin. Rezê Ruh ew bingeh e, bi saya kîjanî hûnê nava emirê

xwe yî qulixdarîyê da çareserîyê bibînin. Feqet pêşkêşên Ruh emirê we yî qulixkirinê va girêdayî ye, lê telebext ra gelek meriv diha gelekî berbi pêşkêşa dicedînin, lê ne ku berbi rez.

Min dua kirîye: “Xwedê, ez naxwezim, wekî ew pêşkêş, kîjan Te dane min, diha gelekî bêne kivşê, ne ku rez, kîjan Te nava min da dane pêşxistinê”. Min dua kirîye, ku ez bi açixî şuxulkarîya xwe ser hevda bînim, çimkî gelek cara usa dibe, wekî meriv dest pê dikin berbi pêşkêşa bicedînin. Încîl dibêje: “Berbi hizkirinê bicedînin û pêşkêşên ruhanî bixwezin” /A Korintî 14:1, NKJV/, feqet meriv berbi pêşkêşa dicedînin û rez /hizkirinê/ hesab hilnadin.

Li cem pêşkêşa cudatîya usa tune, ku meriva nava çareserîyê da xweyî bikin û diqewime ew wana bidine undakirinê jî. Cihûda cin derdixistin û nexweş qenc dikirin, lê ew li cehnemê ye. Îsa got: “Bona wî wê diha baş bûya, ku ew tu cara nehata dinîyayê” /Metta 26:24, NET/. Nava emirê Cihûda da pêşkêşên Ruhanî kar dikirin, lê kivş e ewî rezê Ruh ne dabû pêşxistinê.

**Lîza: Hene meriv, yên ku bi pêşkêşên qewat kar dikin, lê rezê emirê wan dijî qewata pêşkêşên wan e. Ew yek çawa diqewime?**

**Con:** Niha Balam bîr bînin. Li cem wî pêşkêşa pêxembertîyê hebû. Derheqa wê yekê da nava Încîlê da nivîsar e. Ew gotinên ku ewî digotin, gotinên Xwedê bûn. Feqet Xwedê got, ku Balam hema bi şûrê wî bikujin, çimkî ew xirab bû û gurêda nîbû. Şaûlê padişa dîn bû. Ewî bi rastî aqilê xwe unda kiribû. Carna ew peyî Dawid diket, ku wî bikuje. Nenihêrî wê yekê, wekî rojekê ew tevî pêxembera bû pêxember /bixwînin A Padişatî 19/.

Ew yek, wekî pêşkêşên Ruhanî nava emirê mêriv da kar dikin, nade kivşê, wekî Xwedê wana begem dike. Îsa got: “Gelek wê Min ra bêjin: “Me bi navê Te cin derxistin. Me bi navê Te keremet kirin. Me karên mezin bi navê Te kirin. Em bûne pêxember û me bi navê Te terîf kirin””. Feqet Ewê bêje: “Ji Min dûrkevin, Min tu cara hûn

nas nekirine, yên ku xirabî kirine. We nava emirê xwe da rez nedaye pêşxistinê" /bixwînin Metta 7:22–23/. Rojekê Xudan min ra got: "Te dît, ku wana negot: "Me bi navê Te kesîb dane xwerinê. Em bi navê Te çûne li cem girtîya". Ew merivê, ku karên wî cûreyî dikin, nava emirên xwe da rez didine pêşxistinê". Pêşxistina rezê Ruhanî çareserî ye, bi saya kîjanî emê şuxulkarîya xwe bi cûrê açix ser hevda biînin.

Cara ewlin min ev rastî wî çaxî fem kir, wextê ku min li civînekê kar dikir, kîjan li dinîayê civîneke eyan bû. Terîfkirên here eyan û usa jî ne eyan dihatine cem me. Dikete nava borcdarîyên min, ku ez herime firegehê pêşîya wan, wana bi mêvandarî qebûl bikim. Min dît, wekî hinek qulixçî diketine avtomaşîna min û tê bêjî Îsa li rex min rûniştî bû. Wextê ku ew bona terîfkirinê radibûn, tê bêjî Îsa radibû û terîf dikir.

Dema ku qulixçîyên başqe diketine avtomaşîna min, ez difikirîm: "*Çi qewimî? Bona çi ez xwe usa qirêj texmîn dikim? Bona çi ew awqas nebaş xeber didin?"*. Paşê ew radibûne ser dikê û meriv xilaz dibûn, qenc dibûn, ji Xwedê temî distendin. Ew xilazkirin û qenckirin feş nîbûn, ew bi qewata Ruhê Pîroz diqewimîn. Ez difikirîm: *"Xwedê, ez vê yekê fem nakim. Çi diqewime? Ew çawa dikarin xwe wî cûreyî bidine kivşê, wextê ku ew tevî min in, lê paşê rabine ser dikê û terîf bikin û bibine şedê xilazbûna û qenckirina?"*. Awa ev e menî, wekî Xwedê nîşanî min da, wekî cihûda derheqa padişatîya Xwedê da terîf kir, cin derxistin, nexweş qenc kirin û keremet kirin, lê niha ew li cehnemê ye. Balam bû pêxember, lê Xwedê bi şûr ew kuşt. Şaûl jî bû pêxember, lê bi açixî şuxulk'arîya xwe ser hevda ne anî. Xudan gote min: "Rûnkirina Xwedê– pêşkêşên Xwedê, kîjan nava emirê mêriv da kar dikin, eseyî nîne, wekî bibine nîşana begemîya Xwedê". Hûnê wana hema bi rezê wan nas kin /bixwînin Metta 7:16/.

**Lîza:** Wî çaxî, meriv dikare bêje, wekî pêşkêş bona mêriv tê dayînê û rez nava wî da digihîje û ew xeysetê wî yê hundur e?

**Con:** Belê, te rast got.

**Lîza: Te derheqa wê yekê da digot, ku meriv dikare bi edilaya hundur va bê rêberkirinê, lê usa jî texmîn bike, ku çawa Ruh bi rîya e'şaretîyê qedexe dike û rûyê wê yekê da jî nava mêriv da nerihetî pêşda tê. Feqet hinek wê yekê didine kivşê, wekî roja îroyîn Xwedê me ra xeber dide. Ew bawar dikin, wekî Xwedê tenê bi rîya Kitêba Pîroz xeber dide. Tu bawer dikî, wekî îro Xwedê xeber dide û gelo Ew tenê anegorî Qerara Xwe xeber dide?**

**Con:** Berê ewlin Pawlos gote civîna Korintî: "…Hûn usa peyî pûtên kere– lal ketibûn, her alîya va ketibûne bin qolên wan" /bixwînin A Korintî 12:2/. Gotina "kere– lal" hema kerbûn û lalbûnê dide kivşê. Bi gilîkî mayîn, ew xwedê, bona kîjana korintîya qulix dikir, xeber nedida. Pawlos dibêje: "Firqî ew e, wekî Xwedê yê me xeber dide". Û Ew zelal xeber dide.

Xwedê çawa xeber dide? Peymana Nû gelek mecala dide kivşê, bi kîjana Ew tevî me xeber dide. Berê ewlin Xwedê bi rîya *şedetîya hundur*–texmînkirina edilayê xeber dide. Eva cûrê ewlin e, bi kîjanî Ew me ra xeber dide.

**Lîza:** Hela hê zêde, ne ku bi Gotina Xwe?

**Con:** Na xêr, Gotina Xwedê her dem anegorî wê yekê ye. Heger hûn nava pirsekê da edilayê texmîn dikin, kîjan ne anegorî Gotina Xwedê ye, guhdarîyê nedine ser wê texmînkirinê. Kivş e, wekî hûn dilê xwe da rastî menîyên şaş hatine. Pêşda hûn gerekê paşda veger'ine li ser halê dilê xweyî nêytral /ne vir da ne jî wê da/. Gotina dawî ya Încîlê ye.

**Lîza:** Gotin her dem him hîm e û him jî system e.

**Con**: Belê, r'ast e. Dêmek, şedetîya hundur mecala ewlin e. Ya duda– dengê *nerm û zirav e*, derheqa çi da Încîl dibêje. Îsa got:

"Berxên Min dengê Min nas dikin" /bixwînin Yûhenna 1O:27/. Ruhê Xwedê wê yekê dibêje, çi ku Ew ji Îsa dibihê. Hema ew e dengê nerm û zirav.

Hinek meriv ketine nava girêdanê, çimkî wana dest pê kirîye bêyî şedetîya hundur peyî denga herin. Her car, dema min dengê Xwedê bihîstîye, Ew bi şedetîya hundur hatîye rêberkirinê û her du jî anegorî Qirara Xwedê bûne. Hema ev e hîm, kîjan gerekê li cem we hebe–Qerar, şedetî û deng. Heger we deng bihîstîye, lê şedetîya we ya hundur tune, guh nedine wê yekê. Ez wextê wan berevbûna hazir bûme, li kîderê bona min pêxembertî kirine, lê min hazirîya Xwedê texmîn nekirîye û ne jî şedetîya min ya hundur hebûye. Ez guhdarîyê nadime ser pêxembertîyên wî cûreyî.

Mecala mayîn, derheqa kîjanê da Peymana Nû dibêje, *xewin in.* Nava Karên Şandîya 16 da serpêhatîke derheqa wê yekê da heye, wekî Pawlos xewin dît. Xewinê da yekî makêdonî nêzîkî Pawlos dibe û dibêje: "Hîvî dikim, were û alî me bike". Ruhê Pîroz ew xewin da bikaranînê û gote Pawlos:

> "Here Mekedonîayê". Tevî hineka Xwedê gelek cara bi xewina xeber dide, ne ku tevî yên mayîn. Xwedê gelek cara bi xewina jina min ra xeber dide, lê tevî min Ew bi şedetîya hundur û dengê nerm û zirav xeber dide.

Anegorî qerara Xwedê, mecala mayîn, bi kîjanê Xwedê meriva ra xeber dide, qeretû ne. Pawlos çi hatibû ber çavê wî şirove dike, dibêje: "Ez nizanim, ez nava bedena xwe da bûm, yan ji bedenê der bûm" /bixwînin B Korintî 12:2/. Wî çaxî hûn nizanin, hûn nava bedena xwe da nin, yan ji bedenê der in? Feqet hûn bi xebera gotî dinîya Ruhanî da nin. Sala 1989 a, wextê ku serwêrê min gote Lîzayê û min, wekî wede ye, ku em qulixa xwe dest pê bikin, ewî ew yek bi menîya qeretûyê kir. Wextê berevbûna serwêrîyê, ewî got: "Şeva derbazbûyî min xewin dîtîye. Min tê bêjî ew yek bi ekrana

têlêvîzîonê didît. Serwêrno, hinek wede şûnda ji we yekê dûrkeve. Tê li dinîayê rêwîtîyê bikî û tê bibî dua yê bona Bedena Mesîh". Ewî xeberdana xwe dom kir: "Con Bîvêr, tuyî ew meriv". Xwedê derheqa wê yekê da heyşt meh pêşda nava dukirinê da gotibû min û gotina serwêr bona min îzbatî bû.

Mecala xilazîyê, bi kîjanê, anegorî Peymana Nû, Xwedê me ra xeber dide, *zeftkirina fikirê ye.* Petrûs beşa Karên Şandîya 1O da rastî zeftkirina fikirê hat. Wî çaxî, wextê ku fikir tê zeftkirinê, di hundurê me da hemû tişt wedelî, çi ku em texmîn dikin, disekine, kar nake. Bi vî cûreyî ew yek ji qeretûyê tê cudakirinê, çimkî wextê ku qeretû tê, di hundurê me da hemû tişt kar dike. Him Pawlos him jî Yûhenna dikaribûn bilivîyana, wextê ku ew çûne ezmîn. Nava zeftkirina fikirê da hûn tiştekî *divînin* û dengê Xwedê *dibihên*. Hemû texmînkirinên mayîn wedelî kar nakin.

Feqet kesek dikare pirsê bide: "Lê hûnê derheqa hirîya Gêdêon da çi bêjin?". Hirî mecala bihîstina Xwedê ya Peymana Kevin e. Hûn gerekê wî tiştî hildin, çi ku Peymana Kevin da bû û bona guvtugokirinê bînine ber xaç. Xaçê wê yekê derbas bike, lê binhêre, yan jî paqij bike.Ez hirîyê xaç va derbaz dikim û dibînim, wekî xaç wê paqij dike. Încîl dibêje: "Çimkî ewên ku bi *Ruhê Xwedê* kar dikin, lê ne ku "ewên ku bi hirîyê va tên raberkirinê" /bixwînin Romayî 8:14/. Peymana Nû da Ruhê Xwedê nava meriva da nedima, Xwedê tevî wan bi cûrekî mayîn xeber dida û hirî meseleke ji wê yekê ye. Ezê bi xwe piştgirîyê nedime bawermendên Peymana Nû, ku hirîyê bona bihîstina Xwedê didine xebatê. Bi Gotinê û şedetîya hundur bixebitin ku bêne rêberkirinê. Hirî nava heyîna fîzîkî da ne û çetin hûn bixwezin nava wê heyînê da şaş bin. Em bona jîyan û karkirina nava Ruh da hatine gazîkirinê.

**Lîza:** Ez dixwezim tiştekî zêde bikim. Ev hemû bersiv derheqa heyîna ruhanî da nin. Temîke zelal bona me heye, ya derheqa wê yekê da, ku heger hûn birayên xwe nava hewcetîyê da dibînin, îsafa

xwe ji wî kilît nekin /bixwînin A Yûhenna 3:16–18/. Carna hewce nîne, ku hûn ji ezmîn deng bibihên. Carna hûn gerekê hewcetîya kesekî *bibînin* yan jî *bibihên*. Wextê ku me *bihîst,* wekî meriva rûpelên kitêba diqelaştin û derbasî yên mayîn dikirin, me got: “Hûn çawa dikarin îsafa me kilît bikin?”. Me tu cara ew yek nedîtîye, lê wextê ku me derheqa wê yekê da *bihîst*, me got: “Emê bersiva wê hewcebûnê bidin”.

**Con:** Wextê ku me derheqa keçika da bihîst, yên ku dihatine kirîn– frotanê, Xwedê min ra xeber neda, lê min got: “Lîza, em gerekê alî bikin”.

**Lîza:** Min derheqa wê yekê da kovarekê da *xwend*. Min ew yek dît, wextê ku ez li welatên mayîn bûm. Carna meriv wî çaxî hîvîya nîşanê, zeftkirina fikirê, qeretû, yan jî xewinê ne, wextê ku Încîl dibêje: “Heger *bibînî*”.

**Con:** “Heger tu bibînî, ku birayê te nava hewcetîyê da ne”.

**Lîza:** Û em ji bira yan jî xwîşka xwe ya nava hewcetîyê da dest pê dikin. Em ji mesîhîyên feqîr dest pê dikin. Em ji wana dest pê dikin, kîjana dikarin bibînin, ji wana kîjana dikarin xwe bispêrine wan, dengê kîjana dikarin bibihên û em nikarin îsafa xwe kilît kin. Min daye zelalkirinê, wekî her car em bersiva wê yekê didin, çi ku nava rastîya tebyetê da dibînin. Xwedê nava rastîya ruhanî da diha zêde îtbara xwe li me tîne. Ew dibêje: “Ez dibînim, ku tu nava vê yekê da paqij î, ez dikarim hinekî zêde nava rastîya bawerîyê da îtbara xwe li te bînim”.

## Bersivên zêdekirî yên ji Con

**Pirs: Kifirîya hindava Ruhê Pîroz da çi dide kivşê?**

**Con:**Îsa derheqa kifirîya hindava Ruhê Pîroz da Metta 12:22–32 da digot. Nava kitêbên Metta û Marqos da em têksta gotinên Wî

zelal dibînin. Rêberên ruhanî Îsa gunekar kirin, wekî Ewî bi qewata Bêxzêbûx cin derdixistin. Hema wî çaxî Îsa got: "Her guneh û kifirî wê li meriva bêne baxşandinê, lê ewê ku kifirîya Ruh bike, li wî nayê baxşandinê"/Metta 12:31/. Bo vê yekê jî kifirîkirina Ruhê Pîroz dide kivşê, ku eşkere derheqa Wî da xirab xeberdin, usa didine kivşê, tê bêjî kirinên Ruhê Pîroz yên mîrêcin in.

**Pirs: "Gelo ew yek anegorî Încîlê ye, ku rast usa duayî Ruhê Pîroz dikin, çawa bona Bavê yan Kur'".**

**Con:** Belê. Ruhê Pîroz Xwedê ye û gerekê mînanî Xwedê pesinê Wî bidin. Yûhenna 4:24 da nivîsar e: "Xwedê *Ruhe* û *yên ku Wî dihebînin* jî, gerekê bi Ruh û rastîyê Wî bihebînin". Ez bawer im, wekî hûn gerekê Ruhê Pîroz usa bihebînin, çawa ku hûn Bav Xwedê û Kur Xwedê dihebînin.

**Pirs: Meriv çawa bizanibe, ku çi cûreyî duayî Ruh bike?**

**Con:** Îsa gote şagirtên Xwe:

Hê gelek tişt hene, ku Ezê we ra bêjim, lê niha hûn nikarin wana bibin. Lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, Ewê we berbi temamîya rastîyê bibe. Çimkî Ewê ne ku xwe serî xwe xeber bide, lê çi ku bibihê, Ewê wê yekê bêje û tiştên ku hê neqewimîne, wê we ra gilî bike. Ewê rûmeta navê Min bilind bike, çimkî Ewê ji min bistîne û we ra gilî bike…

Hinekî şûnda hûnê Min nebînin û dîsa hinekî şûnda hûnê Min bibînin, çimkî Ez diçime cem Bavê.

*…Ewê rojê hûnê ji Min tu tiştî nepirsin. Ez rast bêxêlif we ra dibêjim, ku hûnê pê navê Min ji Bavê bixwezin, Ewê bide we /Yûhenna 16:12–14, 16,23/.*

Em bi navê /bi serwêrîya/ Îsa hîvî ji Bav Xwedê dikin. Peyî ra em Ruhê Pîroz ra dik'evine nava heleqetîya /dêmek, dikevine nava

tevgirêdana, qise dikin, yan jî pirsa didin/ Ev kitêb hema derheqa heleqetîyên tevî Ruhê Pîroz da ne.

**Pirs: Gelo ew yek anegorî Încîlê ye, ku hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew "bê" tevî berevbûn, yan jî qulixê bibe, bi hesabhildana wê yekê, wekî Ew her dem heye?**

**Con:** Belê. Încîl him derheqa wê yekê da hîn dike, ku Xwedê her dem heye, him jî derheqa eyantîya hazirîya Wî da dibêje. Em ji gotinên Dawid divînin, wekî Xwedê her tiştî dikare bike:

Ji Ruhê Te ku da herim,
Rûyê Te da ku da birevim?
Heger bême ezmîn, Tu li wirî,
Û heger herime cehnemê, awa Tu li wirî.
Heger perên ronahîyê hildim
Û li xilazîya berhê bijîm,
Li wir jî destê Te wê rêberîyê li min bike,
Û milê Teyî rastê, wê min xweyî ke.

–Zebûr 139:7–1O

Încîlê da jî nivîsar e, wekî Xwedê tu cara wê me nehêle û neçe /bixwînin Îbranî 13:5/. Nava van gotina da derheqa wê yekê da tê kivşkirinê, wekî Xwedê li her dera, li her cihîya hazir e.

Xêncî wê yekê, usa jî hazirîya Xwedê ya eyanbûyî heye. *Eyankirin* dide kivşê, ku tiştê ku nayê kivşê, kivş be, tiştê ku nayê guhdarkirinê, bê guhdarkirinê, yan jî tiştên ne eyan eyankin. Wextê ku Xwedê hazirîya Xwe eyan dike, em dikarin Wî texmîn bikin /bixwînin Yûhenna 14:12–24/. Ez bawer im, wekî hîvîkirina wî cûreyî anegorî Încîlê ye.

**Pirs: Bona çi em dua dikin, ku Xwedê Ruhê Xwe birêje?Gelo Ewî hetanî niha ew yek nekirîye?**

**Con:** Nava Zakarîya 1O:1da nivîsar e: “Ji Xudan baranê hîvî bikin, wextê barana axirîyê”. Kitêba Pîroz da baran her dem sîmvola rêtina Ruhê Pîroz e. Ez bawer im, wekî wextê em hîvî ji Xwedê dikin, ku Ew Ruhê Xwe birêje, wî çaxî em barana Ruh ya teze li ser civîn, bajar û mileta hîvî dikin. Em wî çaxî hazirîya Wî ya hê mezin hîvî dikin, kîjanê qewatê bide me, ku em karê Wî mîaser bikin û Ewê rêberîyê li me nava çinîna mezin ya bona padişatîya Xwedê bike.

**Pirs: Ez çawa dikarim tevî Ruhê Pîroz bikevime nava heleqetîyên diha kûr? Ez çawa dikarim diha gelekî hazirîya Wî û qewata Wî bivînim?**

**Con:** Bi derbazkirina wedê tevî Xwedê û Qirara Wî. Hûn dikarin diha gelekî bi hûrgilî serên vê kitêbê yên duda û sisîya da derheqa wê yekê da bixwînin, ku çawa nêzîkaya tevî Xwedê bidine pêşxistinê.

**Pirs: Heger Ruhê Pîroz hemû tiştî zane, bona çi gerekê em Încîlê bixwînin?**

**Con:** Xwedê ji alîyê Xwe da kitêbên Pîroz dane me, çimkî ew “bona hînbûnê, rastkirinê û şîretdayîna nava heqîtîyê da kardarin, bona ku xulamên Xwedê bona karên qenc bi temamî sîlihkirî bin” /B Tîmotêyo 3:16–17, NIV/. Ruhê Pîroz vê Gotina /yûnanî *logos*/ nivîsar dide xebatê, bona ku gotina Xwe ya gotî bide me /rêma/. Ruh *logosê* dide saxkirinê û ew dibe *rêma,* kîjan bona me ye. Heger em nava *logosê da* wede derbas nakin, bona ku dilên xwe bona Ruh vekin, wî çaxî diha çetin emê gotina *rêma bistînin.* Civîna Çînstanê ya binxet /nelêgal/ bi Ruh va tijîbûyî bû, lê bi sala ser hev ew bawermend bi gumanbirî hewcê Kitêbên Pîroz bûn. Wana dixwest Gotina Xwedê bixwenda, ku Ruhê Pîroz bikaribûya bi rîya Gotinê xeber bida û dilên wan da ew yek sax bikira. Xwendina Kitêba Pîroz gelekî girîng e. Gotina Xwedê û Ruhê Xwedê tevayî kar dikin /dişuxulin/. Eva hevkarî ye.

Bîra xwe da xweyî bikin, wekî Kitêba Pîroz da şîretên Xwedê

nivîsar in û Ruhê Pîroz wan şîreta bona me eyan dike. Heger hûn bêyî hukumê Ruh parekê ji Kitêba Pîroz bixwînin, hûnê tenê bivînin, ku bi zimanê meriva li wir çi nivîsar e. Feqet bi Ruh hûn dikarin kemala ewê nivîsarê ya Ruhanî fem bikin, kîjan ji fikira merivatîyê zêdetir e, çimkî nava Ruh da fikira Mesîh heye.

> Lê serda jî em derheqa serwaxtîya Xwedê ya sur ya veşartî da xeber didin, ya ku Xwedê hê berî afirandina dinîyayê, bona rûmeta me qerar kir. Ji serwêrên vê dinîyayê tu kesî ev serwaxtî fem nekir, çimkî heger fem bikirana, wê Xudanê Rûmetê xaç nekirana. Lê çawa nivîsar e: "Ew tiştên ku çava nedîtine û guha nebihîstine, dilê mêriv ra derbas nebûne, Xwedê bona wana hazir kirine, yên ku Wî hiz dikin". Lê belê, Xwedê bi Ruhê xwe ev yek li ber me vekir. Çimkî Ruh her tiştî guvtugo dike, heta nêt– meremên Xwedê yên kûr jî. Kî ha ji kêl–menîyên mêriv heye, pêştirî wî Ruhê nava Wî da? Usa jî kes ha ji ya Xwedê tune, pêştirî Ruhê Xwedê. Me ne ku ruhê vê dinîyayê stendîye, lê ew Ruhê ji Xwedê, wekî em wan tiştên ji Xwedê da me ra dayî fem bikin. Em bona wan tişta bi gotinêd ji serwextîya merivayê hînbûyî xeber nadin, lê bi gotinêd hînkirina ji Ruhê Xwedê xeber didin, tiştên Ruhanî wan ra şirove dikin, yên ku xweyî– Ruhê Xwedê ne. Lê merivê ne xweyî– Ruh wan tiştên Ruhê Xwedê qebûl nake, bi ya wî ev yekana bêhişî ne û nikare jî fem bike, çimkî halê wan tişta bi Ruhanî tên guvtugokirinê. Lê yê xweyî– Ruhê Xwedê her tiştî guvtugo dike, lê belê,bi xwa ji kesekî nayê guvtugokirinê. Çawa nivîsar e: "Kê nêt– fikira Xudan pê hesîya, ku şîretekê bide wî?". Lê nêt–fikira Mesîh serê me da ye.
>
> –A Korintî 2:7–16

**Pirs: Li wê civîna ku ez diçimê, zihabûna ruhanî heye. Çawa endamekî cuda, ez çi dikarim bikim, bona ku hazirîya Ruh li wir hê zêde be?**

**Con:** Heger hûn li wê civînê serwêr nînin, tiştê tek– tenê ku hûn dikarin bikin, ew duakirin e. Çawa gava ewlin, Ruh dewatîî nava e’mirê xwe bikin, bona ku hazirîya Wî ya eyanbûyî tevî xwe bînine civînê. Ya duemîn: hîvî bikin, ku Xwedê tevî dilên rêberên we bixebite û ewê hindava hazirîya Ruhê Pîroz diha vekirî bin.

# PIRSÊN BONA GUVTUGOKIRINÊ

*Heger hûn kitêba "Ruhê Pîroz: Naverok"–ê çawa pareke "Berevoka Mêsîncêr"–e dersa ya tomerî lêkolîn dikin, em hîvî dikin, ku hûn vîdêoya hînbûnê ya şeşa temaşe bikin.*

1 | Karebûna hemû bawermenda ya bona xebitandina pêşkêşên ruhanî heye. Meriv çawa dikare wan ji doranên pêşkêşa "qulixdarîya" resmî der bide bikaranînê?

2 | Wextê ku hûn bawer dikin, wekî Xwedê derheqa qerarekê da edilayê dide we, hûn bi çi dikarin guman bin, wekî we ji Wî rast bihîstîye?

3 | Gelo usa bûye, ku Ruhê Pîroz bi mêr yan jî jina we ra xeber dide, lê ne ku hema carekê ra tevî we? Bi fikira we, Ew bo çi wî cûreyî kar dike û gelo hûn dikarin wê rêberîyê nava emirê xwe da qebûl bikin?

4 | Wextê ku hûn hewce ne nava emirê xwe da qerara qebûl bikin û tê texmînkirinê, ku hûn rêberîyê nabînin, hûn çi dikarin bikin?

Bixwînin Gotinên Silêman 11:14, 15:22, 24:6 û Romayî 8:26–17

5 | Hûn bawer dikin, wekî roja îroyîn Xwedê hela hê cimeta Xwe ra xeber dide? Ewî wer'a çawa xeber daye?

KIVŞKIRIN

# ZÊDEKIRIN

# ÇAWA XILAZBÛNÊ BISTÎNIN

*Heger tu bi devê xwe îqirar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xwe da bawer bikî, ku Xwedê Ew ji nava mirîya rakirîye, tê xilazbî. Çimkî bi bawerîya dilê te ye, ku tu li ber Xwedê xwe afû dikî û bi îqirara devê te ye ku tu xilaz dibî.*

– Romayî 1O:9–1O, NLT

Ruhê Pîroz dixweze her deqe tevî we nava heleqetîya da be, ku piştgirîyê bide û we sîlih bike bona naskirina Xwedê û belakirina Padişatîya Wî. Feqet gava ewlin, ya bona nêzîkbûna tevî Ruhê Xwedê stendina xilazbûnê ye bi destî Kurê Xwedê Îsa Mesîh.

Bi rîya mirina Îsa û rabûna Wî ya ji nava mirîya Xwedê rê vekir, ku hûn bikevine nava padişatîya Wî, çawa kur û keçên Wî yên hizkirî. Qurbanîya Îsa yu li ser xaç bona emirê we hate dayînê. Xilazbûn bona we pêşkêşa Xwedê ye. Hûn tu tiştî nikarin bona qazanckirina xilazbûnê, yan jî bona ku hûn layîqî wê yekê bin, bikin.

Bona stendina vê pêşkêşa giranbiha berê ewlin hûn gerekê xwe mikur bên, wekî hûn nava jîyana ji Afrandar başqe /serbest/ hûn gunekar in /çimkî eva menîya hemû guneha ye, kîjan we pêşda kirine/. Tobekirin hema qewilekî grîng e bona stendina xilazbûnê. Petrûs derheqa vê yekê da kitêba Karên Şandîya da got, hema wê rojê, wextê ku 5OOO meriv xilaz bûn: “Dêmek tobe bikin û paşda vegerin, ku gunehên we paqij bin” /Karên Şandîya 3:19 NKJV/. Kitêba Pîroz elam dike, wekî ji me her yek çawa xulamê guneh hatîye dinîyayê. Koka wê xulamtîyê gunehê Adem e, yê ku gura Xwedê nekir. Tobekirin qerara bona berdana gurêkirina şexsê xwe û mîrêcin e, yê ku bavê derewê ye û usa jî bona wê yekê ye, ku hûn

gura Xudanê xweyî nû da bin– Îsa Mesîh, Yê ku emirê Xwe bona we da.


Hûn gerekê nava emirê xwe da serwêrîyê bidine Îsa. Wî çaxî ew yek dide kivşê, wekî emirê we /ruh, şexs û beden/ û hemû tiştên we hebûna Wî ne. Serwêrîya Wî ya nava emirê we da dibe tiştekî cuda. Wî çaxî, wextê ku hûn wê yekê dikin, Xwedê we ji tarîstanê aza dike û cîguhastî nava ronahî û rûmeta padişatîya Xwe dike. Zelal gotî, hûn ji mirinê derbasî emir dibin, hûn dibine lawên Wî.

Heger hûn dixwezin bi destî Îsa xilazbûnê qebûl kin, vî duayî biwekilînin:

> Xwedê Yê, ku li ezmana yî, ez fem dikim, wekî ez gunekar im û ji norma Te ya heq ketime. Ez rûyê gunnehê xwe da layîqî dîwana heta–hetayê me. Ez razîme ku Tu min nava vî halîda nahêlî, çimkî ez bawer im, wekî Te Kurê Xweyî tek–tenê Îsa Mesîh şand, Yê ku ji Meryema qîz hate dinîyayê, bona ku Ew bona min bimira û li ser Xaç bihata dîwankirinê. Ez bawer im, wekî roja sisîya Ew ji nava mirîya rabû û niha jî Ew çawa Xudan û Xilazkir li alîyê milê Te yê rastê rûniştî ye.Îro ez tobe dikim, ku ez ji Te dûr bûme û emirê xwe bi temamî teslîmî serwêrîya Îsa dikim.
>
> Îsa, ez Te çawa Xudan û Xilazkirê Xwe îqirar dikim. Bi Ruhê Xwe were nava emirê min. Min biguhêre û bike lawê Xwedê. Ez wan hemû tişta qebûl nakim, çi ku tarîstanê va girêdayî ye û min wede dida wê yekê. Ji roja îroyîn da dest pê kirî ezê îdî bona xwe nejîm, lê bi kerema Te, ezê bona Te bijîm, çimkî Tu mirî , bona ku ez bikaribim heta–hetayê bijîm.
>
> Spas, Xudan. Niha emirê min bi temamî hildayî destên Te da ye û anegorî Gotina Te, ezê şermî nemînim.

Tu bi xêr hatî li malbeta Xwedê! Ez piştgirîyê didime we, ku hûn vê Mizgînîyê bawermendên mayîn ra gilî bikin. Ew yek girîng e ku hûn bighîjine civîna cihî, li kîderê bawerîya xwe Încîlê tînin û tevî wan meriva dikevine nava heleqetîya, yên ku dikarin nava bawerîyê da piştgirîyê bidine wan. Hûn dikarin aza qulixdarîya me va bêne girêdanê, bona ku em alî we bikin, ku li rêgîona we hûn civînê bibînin /Werine sayt'a: MessengerInternational.org/.

We nava emirê xwe da rêwîtîya here balkêş dest pê kirîye, kîjan nêzîkbûna tevî Xwedê Yê Herî Bilind e. Bila her roj hûn diha gelekî tevî Wî nêzîk bin.




## TELA ŞEYTAN

Ji tela dijmin ya mirinê birevin. Kitêba "Tela Şeytan" tela here bi fêlbazî veşartî eşkere dike, kîjan mîrêcin, bona ku bawermenda ji xwestina Xwedê bide dûrxistinê, dide bikaranînê. Gilî derheqa xeyîdandinê da ne. Gelek meriv, yên ku tela şeyt'an qebûl dikin, wê yekê fem nakin. Neyêne xapandinê. Hûnê tevî xeydê bêne xapandinê, lê we va girêdayî ye, ku ew yek wê çawa hukumî li ser tevgirêdanên we yên tevî Xwedê bike. Caba we wê pêşeroja we qerar bike. Heger hûn bi cûrê rast xeyîdê alt bikin, hûnê diha qewat bin.

Hûnê caba pirsên vî cûreyî bibînin:

- Gelo bo çi ez fikira xwe ya derheqa serhatîyê da we ra gilî dikim?
- Ez çawa dikarim dijî fikirên şikber û bêbawer şer bikim?
- Ez çi dikarim bikim, ku birînên pêşda careke mayîn bîr neynim?
- Ez çawa îtbarîya xwe wan meriva bînim, kîjana ez xeyîdandime?

Ev kitêb wê alî we bike, ku hûn ji "tela xeyîdê" dûr bimînin, usa jî wê qewatê bide we, ku hûn ji xeyîdê aza bijîn. Nava feydayên wê yekê da hûnê bikaribin bêyî çetinaya tevî Xwedê nava tevgirêdana da bin.




## RUHÊ KU NAYÊ ŞIKÊNANDINÊ

Hûn bona qewatê hatine qerarkirinê. Nava kitêba "Ruhê ku nayê şikênandinê" da hûnê bivînin, ku çawa ji alîyê altkirî da çetinaya binihêrin û hûnê bizanibin, çawa her tengasî û qezîyakê alt bikin, rastî kîjana hûnê bên.

- Bivîne xweyê wan sozdayîna û qewatê, kîjan nava Mesîh da bona we hatine dayînê.
- Kanîya tengasîyên xwe eşkere bikin.
- Serketî /altkirî/ bikevine nava serwêrîya ruhanî.

Bona mecalên zêde herine li vê malperê www.CloudLibrary.org

**www.CloudLibrary.org**

Ji vê zêdetir dixwezin?
Vî şikilî pêl kin

# HÛN DERHEQA WÎ DA  ZANIN, LÊ GELO HÛN WÎ NAS DIKIN?

Şagirt  sê sala ser hev tevî Îsa bûn. Ew tevî Îsa digerîyan û ew hemû tişt  guhdar dikirin, çi ku Ewî wan ra digot. Feqet Îsa gote hevalên Xwe yên here  nêzîk, wekî Ewî gerekê ew bihiştana û biçûya, ku Ruhê Pîroz bikaribûya bihata û wê bona wana diha baş bûya, heger Ew biçûya /Yûhenna 16:7, 13-14/. Heger ev yek bona şagirta rastî ye, yên ku her roj tevî Îsa bûn, wî çaxî bi çiqasî va em hewce ne ku Ruhê Pîroz  tevî emirên me yê hertimî be?

Telebextra, gelek cara meriv Ruh şaş fem dikin: gelek nizanin, ku Ew Kî ye û Ew çawa li Me eyan dibe. Gelek cara Ruhê Pîroz çawa  şikilê “nefemdarî” tê kivşê, lê Încîl zelal nîşanî me dide, wekî Ruh *şexsê mêriv* nîne. Ew *Şexs* e, Yê ku soz daye, ku wê tu cara ji we dûr nekeve. Nava vê kitêba întêraktîv da Con Bîvêr we dewat dike, ku hûn bi xwe şexsê ku li Civînê şaş hatîye femkirinê û nehatîye hesabhildanê-Ruhê Pîroz  bibînin.

Evê naveroka ku mêriv zendegirtî dihêle tê bernedin.

- Ev kitêba întêraktîv van matêrîala raber dike:
- Matêrîalên dersên herroje
- Pirsên bona guvtugokirina bi komê

Serê kitêbêyî zêdekirî, li kîderê bersivên cêrge pirsên cetin yên derheqa Ruhê Pîroz da nin



CON BÎVÊR û jina wî Lîza, hîmdarên qulixdarîya “Mêsîncêr Întêrnêyinil”-ê ne. Con, yê ku nivîskar û terîfkirê eyan e, bêyî berdaxustina, bi serxwebûn û ênêrgîya mezin, rastîyê terîf dike. Ew dixweze piştgirîyê bide civînên cih û bi matêrîyalên mesîhîtîyê serwêra bide çareserkirinê, nenihêrî wê yekê, ku ew li kîderê dijîn, bi çi zimanî xeber didin, yan jî halê wanî fînansîyê çi cûreyî ye. Hetanî roja îroyîn, matêrîalên wî bi ji 6O-î zêdetir zimana  hatine tercimekirinê /wergerandinê/. Wextê ku Con li male ye, ew dicêribîne tevî Lîzayê golfê bilîze, usa jî tevî her çar kurên xwe, bûk û nebîyên xwe wedê xwe derbas dike.

Bona mecalên zêde herin li vê malperê www.CloudLibrary.org

Ji vê zêdetir dixwezin?
Vî şikilî  pêl kin

Messenger International
MessengerInternational.org

Ev kitêb pêşkêşa ji alîyê xudanê wê da ne û nayê frotanê.